

KT

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

DI PEYDABÛNA EDEBIYATA KURDÎ YA LI CIZÎRA
BOTAN DE KARÎGERIYA BAJARVANIYÊ

ZÜLKÜF ERGÜN

10711006

Şêwirmend

PROF. DR. KADRÎ YILDIRIM

Mêrdîn-2012

JI BO RÊVEBIRIYA ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEYÊ

Ev xebat ji aliyê jûriya me ve di Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî de weku teza lîsansa bilind hatiye pejirandin.

(îmza)

Serok :.....

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmza)

Endam :.....

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmza)

Endam :.....

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmza)

Endam :.....

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmza)

Endam :.....

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

Pesendkirin

Ez pesend dikim ku înzayên jorîn ên endamên hîdekariyê yên navborî ne.

Îmza

.....

Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav

Birêvebirê Enstîtûyê

(Mor)

KURTE

DI PEYDABÛNA EDEBIYATA KURDÎ YA LI CIZÎRA BOTAN DE

KARÎGERIYA BAJARVANIYÊ

ZÜLKÜF ERGÜN

Ev xebat ji destpêkek û çar beşan pêk tê û di mînaka Cizîra Botan de di peydabûna edebiyata Kurdî de rola bajarvaniyê vedikole. Peywendiya bajar û edebiyatê ji bajarên pêşî û vir ve dewam dike, lewra ji bajarên sumerî û vir ve hinek diyardeyên bajarvaniyê bûn sedem ku bingeha edebiyata nivîskî li bajaran bê danîn. Niştecibûn, dewlet, xanedan, dîn, nivîs û şaristanî weku girîngtirîn diyardeyên bajarvaniyê derdikevin pêş.

Di serdema îslamî de û bi taybetî di dawîya xelîfetiya Ebbasî de hin xanedanên kurdan derketin holê û di paytextên van xanedanan de bingeheke bihêz a bajarvanî û edebiyatê hat danîn. Lê di pêvajoya avabûna vê bajarvanî û edebiyatê de xanedanên kurdan û bajarên wan ketin ber pêla dagirkeriya tirk û moxolan û heta sedsala çardeh û panzdehan ev rewş neguherî. Piştî vê demê, li hin herêmên Kurdistanê mîrekên kurd derketin holê û paytextên van mîrekan bûn cihê peydabûna edebiyata nivîskî ya kurdî.

Mîr Ebdulezîz di destpêka sedsala çardehan de dawî li hukmê moxolan anî û Cizîrê kir paytexta Mîrekiya Azîzan. Bi vî awayî ji sedsala XIVan heta sedsala XIXan bi evraz û nişûv be jî bajar di bin rêvebirîya Mîrekiya Azîzan de ma û bû yek ji wan navendên herî bihêz ên edebiyata kurdî. Lewra bajar ji ber rêvebirî, bingeha aborî, heterojeniya civakî, avadanî û dezgehên xwe yê xwendin û rewşenbîriyê bû navenda dahênana edebî. Li ser vê bingehe, piştî ku xanedaneke kurd li Cizîrê hat ser hukum û nesaqamgîriya siyasî ji holê rabû, di sedsala XVIan de bi riya Melayê Cizîrî li Cizîra Botan edebiyateke bihêz a kurdî serî hilda.

Mela di nava hel û mercên libar ên Cizîrê de pêgihîşt û bi saya parastina mîrên Cizîra Botan li Medreseya Sor bû muderis. Ji xwe her du qesîdeyên Melayê Cizîrî yê ku ji bo pesindana Mîrê Cizîra Botan Mîr Şerefê Sêyem hatine nivîsîn û danberheva Mîr Umadîn û Mela vê peywendiya xurt a Mela ya digel seraya Cizîra Botan berçav dîkin. Ev jî nîşan dide ku Mela mîna helbestvanên bajarî yê serdema xwe ji sîstema parastinê ya hukmdaran veder nebûye û ev sîstema parastinê ji bo peydabûna edebiyata wî bûye hokareke girîng. Ji bilî pesindana mîrên Cizîra Botan salixdana hin bûyer û kesayetên girîng ên dîroka Cizîra Botan û weku nîşaneyê edebiyata bajarî wesifdana evîneke pîralî

jî taybetmendiyên girîng ên edebiyata Melayê Cizîrî ne ku peywendiya wê bi bajarvaniya Cizîra Botan re heye.

Cizîra Botan ji ber bingeheên xwe yê bajarvaniyê dibe cihê serdana helbestvanan û mijara berhemên edebî. Di vê çarçoveyê de Ehmedê Xanî digel ku ne helbestvanekî Cizîrî ye jî şakara xwe ya edebî *Mem û Zînê* li ser çîrok û efsaneyên Cizîra Botan nivîsiye û Cizîr kiriye navenda bûyerên berhema xwe. Weku taybetmendiyên berhemên edebiyata bajarî di *Mem û Zînê* de jî pesnê Mîrê Cizîra Botan û seraya Cizîrê hatiye dayîn û bi vî awayî taybetmendiyên bajarvaniya Cizîra Botan hatine berçavkirin.

Feqiyê Teyran jî digel ku ne ji Cizîrê ye demekê li vî bajarî maye û digel Melayê Cizîrî danberheveke helbestî daniye. Di vê çarçoveyê de Melayê Cizîrî ji ber ku damezirînerê xwendengeha edebî ya Cizîra Botan e, îlham daye gelek helbestvanan û li dora wî bizaveke edebî peyda bûye. Ji xwe Remezanê Cizîrî jî yek ji wan şagirtên Melayê Cizîrî bûye ku li ser şopa wî helbest nivîsiye û bûye yek ji helbestvanên hêja yê Cizîra Botan. Bi vî awayî derdikeve ku Cizîra Botan ji ber derfetên xwe yê bajarvaniyê weku bikerên edebî rê li ber pegihîştin û pevgihîştina helbestvanan vekiriyê û ji ber van diyardeyên xwe yê bajarî, bûye navendeke girîng a edebiyata kurdî.

ÖZET

CIZİRA BOTAN'DA KÜRT EDEBİYATININ ORTAYA ÇIKIŞINDA ŞEHİRLEŞMENİN ETKİSİ

ZÜLKÜF ERGÜN

Bu çalışma bir giriş ve dört bölümden oluşup Cızıra Botan örneğinde Kürt edebiyatının ortaya çıkmasında şehirleşmenin rolünü incelemektedir. Şehir ve edebiyat ilişkisi dünyanın ilk şehirlerin beri süregelen bir süreçtir. Sümer şehirlerinden beri bazı şehirleşme olguları yazılı edebiyatın temellerinin şehirlerde atılmasını sağladı. Yerleşik hayata geçme, devlet, hanedan, din, yazı ve medeniyet bu şehirleşme olgularının başlıcalarıdır.

İslami dönemde özellikle Abbasi Halifeliğinin son dönemlerinde bazı Kürt hanedanlıkları ortaya çıktı ve bu hanedanlıkların başkentlerinde güçlü bir şehirleşme ve edebiyatın temeli atıldı. Fakat bu şehirleşme ve edebiyatın kurulması sürecinde Kürt hanedanlıkları ve şehirleri Türk ve Moğol işgallerine maruz kaldılar ve bu durum on dördüncü ve on beşinci yüzyıla kadar değişmedi. Bu tarihten sonra Kürdistan'ın bazı bölgelerinde Kürt emirlikleri ortaya çıktı ve bu emirliklerin başkentleri Kürt yazılı edebiyatının ortaya çıkış merkezleri oldu.

Emir Abdulaziz, ondördüncü yüzyılın başlarında Moğolların hakimiyetine son verip Cizre'yi Azizan Emirliğinin başkenti yaptı. Cızıra Botan böylece XIV. yüzyıldan XIX. yüzyıla kadar inişli çıkışlı da olsa Azizan emirlerinin yönetimi altında kaldı ve bu emirliğin başkenti olarak Kürt edebiyatının en güçlü merkezlerinden biri oldu. Cızıra Botan; yönetimi, ekonomik altyapısı, toplumsal heterojenliği, imarı ve ilmi kurumları vasıtasıyla bir edebi üretim merkezi oldu. Bu temel üzerine, Cizre'de Kürt bir hanedan yönetimin başına geçip siyasi istikrarsızlık ortadan kalktıktan sonra XVI. yüzyılda Melayê Cıziri vasıtasıyla Cızıra Botan'da güçlü bir Kürt edebiyatı ortaya çıktı.

Mela, Cizre'nin uygun koşulları içinde yetişti ve Cızıra Botan emirlerinin himayesi sayesinde Medreseya Sor'da müderris oldu. Bu çerçevede Melayê Cıziri'nin Cızıra Botan Emiri III. Emir Şeref'i övmek amacıyla yazdığı iki kasidesi ve Emir İmadüddin ile yaptığı muşa'arası Mela ile Cızıra Botan sarayı arasındaki bu güçlü ilişkiyi açıkça ortaya koymaktadır. Bu da gösteriyor ki Mela döneminin şehirli şairleri gibi hükümdarların himaye sisteminin dışında kalmamış ve bu himaye sistemi onun edebiyatının ortaya çıkmasında önemli bir etken olmuştur. Cızıra Botan emirlerinin

övlmesinin yanında Cizre tarihinin bazı önemli olay ve şahsiyetlerinin tasviri ve şehirli bir edebiyatın göstergesi olarak çok yönlü bir aşk tasviri de Cızira Botan şehirleşmesinin etkisinde gelişen Melayê Cıziri edebiyatının önemli özelliklerindendir.

Cızira Botan şehirleşme temellerinden dolayı şairlerin ziyaretgahı haline gelmiş ve edebi eserlerin konusu olmuştur. Bu çerçevede de Ehmedê Xani her ne kadar Cizreli bir şair olmasa da edebi şaheseri olan Mem û Zin'i Cızira Botan'ın hikaye ve efsaneleri üzerine yazmış ve Cizre'yi eserinde geçen olaylarının merkezi yapmıştır. Şehirli edebiyatın özellikleri olarak Mem û Zin'de de Cızira Botan emiri ve Cizre sarayı övülmüş ve Cızira Botan şehirleşmesinin özellikleri gösterilmiştir.

Feqiyê Teyran da Cizreli bir şair olmamasına rağmen, bir süre bu şehirde kalmış ve Melayê Cıziri ile bir muşa'ara yapmıştır. Bu çerçevede Melayê Cıziri, Cızira Botan'ın edebi ekolünün kurucusu olduğu için birçok şaire ilham kaynağı olmuş ve etrafında edebi bir akım oluşmaya başlamıştır. Zaten Remezanê Cıziri de Melayê Cıziri'nin takipçilerinden biri olup onun izinde şiir yazmış ve Cızira Botan'ın değerli bir şairi olarak yerini almıştır. Böylece Cızira Botan şehirleşme imkanları sayesinde edebi özne olarak şairlerin yetişme ve buluşmasını yol açmış ve bu şehirleşme olguları Cizre'yi Kürt edebiyatının önemli bir merkezi haline getirmiştir.

SUMMARY
THE EFFECT OF URBANIZATION IN THE EMERGENCE OF
KURDISH LITERATURE IN CIZIRA BOTAN
ZÜLKÜF ERGÜN

This study consists of one introduction and four chapters and deals with the role of urbanization in the emergence of Kurdish literature in the example of Cizira Botan. City and literature relation has continued since the first cities on the world. Some urbanization phenomena laid the foundation for written literature in cities since Sumer's cities. Transforming into a settled life, state, dynasty, religion, writing and civilization are among these major urbanization phenomena.

In the Islamic period, especially in the last period of Abbasid Caliphate, some Kurdish dynasties appeared and in the capitals of these dynasties a foundation was laid for a strong urbanization and literature. But during the budding process of this civilization and literature, Kurdish dynasties were exposed to Mongol and Turk invasions and these conditions continued until 14th and 15th centuries. Since then Kurd emirates came out in some regions of Kurdistan and the capitals of these emirates became the centres of emerging of Kurdish literature.

Emir Abdulaziz ended Mongol dominance at the beginning of fourteenth century and made Cizre the capital of Azizan Kurd Emirate. Thus Cizira Botan stayed under the rule of the Kurdish emirate, though not stable, from 14th to 19th century and as a capital became one of the most powerful centres of Kurdish literature. Cizira Botan became a literary centre due to its administration, economic infrastructure, social heterogeneity, public works and scientific establishments. On this base, after a Kurdish dynasty had come to power and the political instability had ended up, a powerful Kurdish literature appeared via Melayê Ciziri in XVI century in Cizira Botan.

Mela grew up in Cizire's convenient conditions and thanks to Cizira Botan emirates' patronage; he became professor in Medreseya Sor. In this frame, his two eulogies which were written to praise Cizira Botan emirate, Third Emir Şerefi and muşarrafı which he did with Emir İmadüddin, indicate the strong relationship between Mela and Cizira Botan Palace. This shows that he couldn't keep out of patronage system of emperors, and this patronage system became an important factor for birth of his literature. Except for his praises for Cizira Botan emirates, his depictions of some important events and figures in Cizre history and as an urban literature signs, an all-

around love depiction are also one of the important features of Melaye Ciziri's literature being improved under the influence of Cizira Botan urbanization.

Because of the strong basis of urbanization, Cizira Botan became a haunt for poets and topic of literal works. In this frame, even though Ehmede Xani was not a poet from Cizre, he wrote his literary masterpiece, *Mem û Zîn*, on Cizira Botan's histories and legends and presented Cizre as the stage of events happened in his work. In *Mem û Zîn*, too, Cizre Botan emirate and Cizira palace are praised and Cizira Botan's urbanization features are shown as urban literature features.

Feqiye Teyran, even though he was not a poet from Cizira, also stayed in this city and wrote a *muş'a'ara* with Melaye Cizira. In this frame, being the founder of Cizira Botan's literary ecol, Melaye Ciziri became a source of inspiration for many poets and a literary movement started to form around him. Remezane Ciziri was already one of the followers of Melaye Ciziri and wrote poet in pursuit of Melaye Ciziri and took place as a valuable poet of Cizira Botan. Thus, owing to urbanization opportunities Cizira Botan, as a literary subject, let poets trained and got together and this urbanization phenomenon made Cizre an important centre of Kurdish literature.

NAVEROK

KURTE	III
ÖZET	V
SUMMARY	VII
PÊŞGOTIN	XI
KURTEBÊJE	XIII
DESTPÊK	1
I. ÇARÇOVEYA GIŞTÎ	1
II. RÊBAZ	5
III. ÇAVKANÎ	8
BEŞA YEKEM	13
PÊVAJOYA BAJARVANIYÊ Û DERKETINA EDEBIYATA NIVÎSKÎ	13
1. QONAXÊN GIRÎNG ÊN BAJARVANIYÊ	13
1.1. Bajarên Antîk (Dêrîn):	14
1.2. Bajarên Serdema Navîn:	17
1.3. Bajarên Îslamî:	20
1.4. Bajarên Nûjen (Bajarên Pîşesaziyê):	23
2. PEYWENDIYA BAJAR Û DEWLETÊ	25
3. PEYWENDIYA BAJAR Û ŞARISTANIYÊ	28
4. LI BAJARAN PEYDABÛNA NIVÎSÊ Û DESTPÊKA EDEBÎYATA NIVÎSKÎ	31
5. DI NAVA KURDAN DE BAJARVANÎ Û DESTPÊKA EDEBIYATA BAJARÎ	38
BEŞA DUYEM	49
JI DESTPÊKÊ HETA DAWIYA MÎREKTIYA AZÎZAN DÎROKA CIZÎRA BOTAN	49
1. JI DESTPÊKÊ HETA HATINA ÎSLAMÊ WEKU BAJAREKÎ ANTÎK CIZÎR	49
2. JI DESTPÊKA ÎSLAMÊ HETA MÎREKTIYA AZÎZAN CIZÎR	52
3. DI SERDEMA MÎREKTIYA AZÎZAN DE CIZÎR	55
BEŞA SÊYEM	65
LI CIZÎRA BOTAN DI PEYDABÛNA EDEBIYATA KURDÎ DE KARÎGERIYA TAYBETMENDIYÊN BAJARVANIYÊ Û SEQAMGÎRIYA SIYASÎ	65
1. BINGEHA ABORÎ Û BAZIRGANIYA CIZÎRÊ	66
2. AVADANIYA CIZÎRÊ	68
3. HETEROJENIYA CIVAKÎ YA CIZÎRÊ	69
4. LI CIZÎRÊ RÊVEBIRÎ	72
5. LI CIZÎRÊ DEZGEHÊN XWENDIN Û EDEBIYATÊ	76
6. LI CIZÎRA BOTAN DI PEYDABÛNA EDEBIYATA KURDÎ DE ROLA SEQAMGÎRIYA SIYASÎ	80
BEŞA ÇAREM	84
DI SERDEMA MÎREKTIYA AZÎZAN DE EDEBIYATA KURDÎ	84
1. DI SERDEMA MÎREKTIYA AZÎZAN DE HELBESTVANÊN CIZÎRÎ	86
1.2. MELAYÊ CIZÎRÎ	86
1.2. REMEZANÊ CIZÎRÎ	130
2. DI SERDEMA MÎREKTIYA AZÎZAN DE HELBESTVANÊN BI CIZÎRA BOTAN RE PEYWENDÎDAR	134
2.1. EHMEDE XANÎ	134
2.2. FEQIYÊ TEYRAN	166
ENCAM	172

ÇAVKANÎ.....	175
--------------	-----

PÊŞGOTIN

Edebiyat weku dahênaneke mirovî, di encama jiyana civakî de peyda bû û li gorî derfet û geşesendina civatan her ku çû pêş ket. Lewra jiyana civakî ya mirovan ziman derxist holê û edebiyat jî li ser van her du diyardeyan weku hunera derbirîna hest û ramanê mirovan geş bû. Herçend di destpêkê de mirovan bi riya çanda devkî hest û ramanên xwe veguhestibin jî, piştî dahênana nivîsê edebiyat bi riya tomarkirinê geş bû û bi awayekî parastî ji bo nifşên paşerojê hat veguhestin. Ji ber ku bajar bûn qada herî berfireh a mirovan û jiyana civakî ya herî pêşketî li bajaran pêk hat, bi saya dezgehên bajarî û desthilatdariyê nivîs jî li bajaran peyda bû. Loma jî ji destpêka bajarên pêşî û vir ve, bajar weku navenda peydabûna edebiyata nivîskî derketin holê û bûn qadên berhemdar ên edebiyatê.

Bajar ji ber ku serçaviya şaristaniyê û hêlîna nivîs û edebiyatê ne, me pêwîst zanî ku em di vê xebata xwe de di mînaka Cizîra Botan de vê peywendiya zindî ya bajar û edebiyatê derxin pêş çavan. Lewra bi dîtina me li Cizîra Botan peydabûna edebiyata kurdî li ser bingeheên bajarvaniya Cizîra Botan û bi saya desthilatdariya xanedaneke kurd mumkîn bû. Eger ev diyardeya bajarvaniyê û parastina Mîrektiya Cizîra Botan nebûna, bi nûnertiya Melayê Cizîrî edebiyata kurdî bi zaravayê kurmançî ew çend xurt dernediket holê. Di vê çarçoveyê de piştî diyarkirina bingeheên edebiyata nivîskî, me di vê xebatê de hewl da ku li Cizîra Botan peydabûna edebiyata kurdî lêbikolin û weku hokareke sereke di derketin û geşbûna edebiyata Cizîrê de rola bajarvaniyê destnîşan bikin.

Bêguman amadekirina xebateke wuha hêsa nebû, lewra li ber destê me tu xebateke bi vî awayî nebû. Ji ber vê jî danîna çarçoveya vê xebatê û gihîştina encamên rast û durist gelek dijwar bû. Loma jî di amadekirina vê tezê de şîret û asankariyên mamosteyê min ê hêja Prof. Dr. Kadri Yıldırım û arîkariya dost û hevalên min ên hêja cihê rêzê ne. Ji ber vê çendê ez di serî de sipasiya mamosteyê xwe yê serperiştyar Prof. Dr. Kadri Yıldırım dikim. Lewra ku hewl û xebatên wî yên di warê ziman, edebiyat û çanda kurdî de nebûna û pêşengiya vekirina beşa ziman û çanda kurdî ya Zanîngeha Mardîn Artukluyê nekira min ê derfeta amadekirina xebateke wuha bi dest nexista. Ji ber vê keda wî ya mezin û ji ber rêberî û rênîşanderiya wî ya di teza min de ez bi dilgermî sipasiya wî dikim.

Herwuha ji bo ku di nava kar û barên xwe yê giran û gelek zêde de ji min re wext veqetand û teza min xwend ez sipasiyeke pir ji dil pêşkêşî Dr. Abdurrahman Adak dikim. Bi xwendin û nirxandinên wî û bi pêşniyazkirina hin çavkaniyên girîng vê xebatê dewlemend kir û ji metirsiyên çaverêkirî parast. Loma jî ez ji ber vê eleqe û dostaniya wî, minetkariya xwe pêşkêşî cenabê wî dikim. Dîsa ji bo peydakirina hin çavkaniyan û pêşniyazên wî yê di cih de ez sipasiya mamosteyê hêja Dr. Hayrullah Acar dikim.

Ji ber xwendina teza min, pêşniyazkirina hin çavkaniyên girîng û rexneyên wî yê di cih de ez malavahî li Dr. Serdar Şengül dikim. Eger pêşniyazên wî nebûna bi rastî jî dê ev xebat kêr bimaya û dê negihîştî armanca xwe. Loma jî ez deyndarê vê dostaniya wî ya dilsozane me.

Ji bo peydakirina hin çavkaniyên erebî û wergerandina wan ez sipasiya dostê xwe yê hêja Dr. Nesim Doru dikim û bi minet keda wî bi bîr tînim. Herwuha ji bo arîkariya wî ya di wergerandina pirtûkeke erebî de ez sipasiya Dr. Ebduselam Yûsif jî dikim û ji bo keda wî malavahî lê dikim.

Zülküf ERGÜN

Mêrdîn – 2012

KURTEBÊJE

b.d.: bê dîrok

bnr.: binêr

b.n.: berhema navborî

BOA: Başbakanlık Osmanlı Arşivi (Arşîva Osmanî ya Serokwezîrtiyê)

b.z.: berî zayînê

c.: cild

g.ç.: gotara çapnebûyî

g.n.: gotara navborî

h.b.: heman berhem

h.g.: heman gotar

j.: jîmare

K.T.: Komara Tirkiyeyê

m.: mirin

p.z.: piştî zayînê

r.: rûpel

t.ç.: teza çapnebûyî

vgz.: veguhêzer

DESTPÊK

I. ÇARÇOVEYA GIŞTÎ

Peywendiya bajar û edebiyatê di pêvajoya şaristaniyê de amaje bi jîngeha afirîner û gulvedana hest û xeyalên mirovî dike. Bajar di nava lêkdanên siruştê bêsêrûber de damezirandina jîngeheke mirovî û rêkxistina cîhaneke pênasikirî û sift e. Edebiyat jî di encama lêkdan û lêgerîna hest û xeyalên mirovê bajarî de peyda dibe ku di vê cîhana biçûk a rêkxistî de li dû asûdeyî û aramiya hiş û giyanê xwe digere. Herçend edebiyat di nava derfet û ewlehiya bajêr de serî hildabe jî di heman demê de hewldana derbaskirina sînorên teng ên bajêr û vegirtina cîhaneke berfireh e jî. Di vê maneyê de edebiyat di seranserê cîhanê de bizava pertûbelavkirina nîrx û estetîzma mirovê bajarî ye û daxwaza berfirehkirin û ciwankariya jîngeha mirovî ye.

Li bajaran peydabûna edebiyata nivîskî girêdayê hin taybetmendî û derfetên jîngeha bajaran û hewcedarê hin bingeheên madî û manewî yên civakî û mirovî ye. Li gorî bîrokeya ontolojiya nû çar astên hebûnê hene ku ji asta madî, asta civakî, asta derûnî û asta giyanî-eqlî pêk tên. Ji van astên hebûnê her yek li ser asta berî xwe ava dibe û bi hêza asta pêştir berê xwe dide asteke pêşketîtir a hebûnê.¹ Ji bo peydabûna van astên hebûnê jî pêdivî bi zemîneke guncaw heye ku ew jî bi dîtina me jîngeha bajaran e. Lewra bajar cihê kombûna şîyan û bîr û baweriya mirovên ciyawaz e û qada rêkxistina qabiliyetên wan ên madî û manewî ye. Li ser vê zemînê, çerxa jiyana bajarî, hemû hêzên madî û manewî yên mirovên bajarî di nava dîsîplînekê de ber bi armanceke diyarîkirî ve areste dike û di encama vê de bi destê mirovê bajarî di asta giyanî-eqlî ya hebûnê de nîrxên mirovî yên mîna zanist, huner û edebiyatê tîne holê.

Bêguman bajarên ku şaristanî û edebiyat hilberandin di encama hin qonaxên girîng de gihîştin vê astê. Ev bajar di nava rêzbendiya niştecîbûn, peydabûna otorîteya siyasî, dabînkirina seqamgîrî û ewlehiyê, komkirina malên zêde, dahênan a nivîsê, geşbûna bazirganiyê û avakirina damûdezgehên perwerdeyê de astên madî, civakî û derûnî yên hebûnê derbaskirin û gihîştin asta dawî ya hebûnê ku asta giyanî-eqlî ye. Bajarên ku ji van qonaxan derbasbûn û pêdawîstiyên van astên hebûnê dabînkirin di heman demê de mirovên azad û xwedan viyan jî pêgihandin ku edebiyat, huner û zanist li ser destê mirovên wuha hatin dahênan. Lewra di nava vê pêvajoya geşesendinê de dema bajar ji aliyê bingeheên xwe yên madî ve bihêz û fireh bûn, di heman demê de di

¹ Turgut Cansever, *İslamda Şehir ve Mimari*, İz, 1997, İstanbul, r. 13.

veguherîna mirovan de jî bûn bikerên girîng û di derbirîna kesayetîya mirovan de bûn organên bikêr. Li ser vê zemîn û jîngeha bajarî, xeyalên mirovên xwedan kesayet û dahêner, teşeyên nû girtin û bi vî awayî fantezî veguherîn diramayê, xwestekên zayendî veguherîn helbestê û beşên din ên hunerê.²

Di nava vê çarçoveyê de, edebiyata nivîskî cara pêşî di bajarên sumerî yên ku yekemîn bajarên ser rûyê cîhanê tên qebûlkirin, derket holê. Uruk ji ber ku di nava bajarên sumerî de bajarê herî pêşketî û navendî bû, di encama geşbûna bajarvaniya sumerî û dahênana nivîsê de yekemîn destan û berhema edebî ya cîhanê Gilgamêş jî li vî bajarî peyda bû. Ji ber vê çendê jî, Uruk weku yekemîn navenda dahênana edebiyatê rê li ber bajarên din jî vekir. Ji xwe piştî sumerîyan di serdema babîlî û asûrîyan de di bajarên mîna Babil û Nînovayê de edebiyat bêhtir geş bû û li van bajaran ji berhemên edebî û zanistî pirtûkxaneyên mezin hatin damezirandin.

Piştî herêma Mezopotamyayê bajarvanî li herêmên din ên cîhanê jî belav bû û bi vî awayî navendên nû yên edebiyatê derketin holê. Di serdema antîk de Misir, Yunan, Roma û Îran ji van herêman ên herî girîng bûn. Bajarên berê yên Misirê bi sedan sal navenda desthilata firewnan bûn û di nava seraya firewnan de bi dehan helbestvanên fermî hebûn ku bi helbestên xwe pesnê firewnan û jiyana serayê didan.³ Divê em ji bîr nekin çîroka Yusuf û Zuleyxayê ku karîgerîyeke mezin li ser edebiyata cîhanê hiştiye li Misirê peyda bû. Herwuha bajarê Îskenderiyeyê ku bi pirtûkxaneyên xwe yên mezin navendeke cazîbedar a xwendin û zanistê bû, dîsa li Misirê bû.

Berî zayînê di navbera sedsalên IXan û Ilyan de navendên herî berhemdar ên edebiyatê bajarên Yunanî bûn. Ev bajarên ku her yek bi serê xwe weku dewletên bajarî hatibûn damezirandin, ji ber girîngîdana maf û azadiya bajariyan û dabînkirina sîstemeke azadane ya rêvebiriyê herçend ji hemû hevkarî û beşdariyên bajarî sûd wergirtin jî, nehiştin kesayetîya mirovan li hemberî berhemên giştî lawaz bibin. Ji ber vê çendê, tu bajarekî mîna Atînayê di nava vê maweyê de nekarî ev çend kesayetên afirîner bîne cem hev.⁴ Di encama vê de Atîna weku navenda herî girîng a bajarên Yunanî di warê edebiyat, dîrok û felsefeyê de bû xwendîngeha gelek kesayetiyên navdar û jêdera berhemên binirx ên edebî û felsefî. Ji van kesayetan Homeros (b.z. IX) di warê

² Lewis Mumford, *Tarih Boyunca Kent*, Wergêr: Gürol Koca, Tamer Tosun, Ayrıntı Yayınları, Çapa Yekem, İstanbul, 2007 r. 126,146.

³ Atıf Bedir, "Dünyanın Anası: Kahire ve Kütüphane Şehri İskenderiye", *Hece*, j. 150/151/152, Ankara, 2009, r. 263.

⁴ Mumford, b.n., r. 190.

destanê de; Aisopos (b.z. VI) di warê fablê de; Hesidos (b.z. VIII), Alkaios (b.z. VII), Anakreon (b.z. V), Sappho (b.z. VI) û Theokritos (b.z. III) di warê helbestê de; Aiskhylos (b.z. 456), Sophokles (b.z. 406) û Euripides (b.z. 406) di warê trajediyê de; Aristophanes (b.z. 385) û Menendros (b.z. 292) di warê komedyayê de; Heredotos (b.z. 425), Thukydidēs (b.z. 400) û Ksenophon (b.z. 355) di warê dîrokê de û Sokrates (b.z. 399), Platon (b.z. 347) û Aristoteles (b.z. 322) di warê felsefeyê de berhem û fikrên hêja li dû xwe hiştin.⁵

Berî zayînê ji sedsala IIan heta dawiya Împaratoriya Romaya Rojava, navenda herî girîng a edebiyat û zanistê jî bajarê Romayê bû. Edebiyata Romayê li ser bingeha edebiyata bajarên Yunanî hat damezirandin û bi saya hêz û derfeta desthilata siyasî ya împaratoriye bû bingeha edebiyata hemû neteweyên Rojava. Di vê serdemê de edebiyatvan û bîrmendên mîna Ennius (b.z. 170), Plautus (b.z. 184), Terentius (b.z. 159), Cato (b.z. 149), Cicero (b.z. 43), Caesar (b.z. 44), Catullus (b.z. 54), Sallustius (b.z. 34), Titus Livius (p.z. 19), Vergilius (b.z. 19), Horatius (b.z. 8), Ovidius (p.z. 18), Lucretius (b.z. 53), Seneca (p.z. 65) û Tacitus (p.z. 120) pêgihîştin⁶ û bûn zimanhalê şaristanî û estefîzma Romaya ku xwe navenda hemû cîhanê dizanî.

Herêma Îranê ji ber ku ji mêj ve cihê derketina dewlet û împaratoriye mezîna bû, di heman demê de xwedî bajar û navendên girîng ên zanist û edebiyatê bû jî. Di nava dirêjahiya dîrokê de ji ber ku şop û bermahiyên van bajarên ji nav çûn, berhemên nivîskî yên van serdeman jî negihîştin nîfşên paşerojê, lê em vê dizanin ku berî hatina îslamê di serdema Sasaniyan de Gundîşapûr weku navenda herî girîng a vê dewletê xwedî bingeheke bihêz a şaristanî û edebiyatê bû. Piştî ku Împaratoriya Sasanî bi destê artêşên îslamê hate ruxandin, ev bingehekan zanistî û edebî ji nav çûn, lê 250-300 sal paşê li bakurê rojhilatê Îranê bi saya xanedanên Tahîrî, Saffarî û Samaniyan edebiyata farisî di bajarên mîna Buhara, Nîşabûr, Gazne, Zerenc, Gurgan, Rey û Semerqandê de careke din serî hilda⁷ û helbestvanên mezîna ên mîna Rûdekî (m. 981), Fîrdowsî (m. 1020), Ferruxê Sîstanî (m. 1038) û Unsûrî (m. 1039) pêgihîştin ku weku danerên edebiyata Farisî tên jimartin.

Piştî hatina îslamê jî bi saya dewlet û xanedanên îslamî gelek bajar û navendên edebiyatê peyda bûn, lê di nava van navendên rêvebiriye de bi taybetî bajarên paytext ji

⁵ Cevdet Kudret, *Batı Edebiyatından Seçme Parçalar*, İnkılap ve Aka Basımevi, İstanbul, 1980, r. 3.

⁶ Kudret, b.n., r. 63.

⁷ Zebîhullâhî Safa, *İran Edebiyatı Tarihi*, Wergêr: Hasan Almaz, Nûsha Yayınları, Çapa Yekem, Ankara, 2002, cild: 1, r. 75.

ber cazîbeya xwe ya madî û derfetên xwe yên boş zêdetir derketin pêş. Bo nimûne di serdema Emewîyan de Şam, di serdema Ebbasîyan de Bexdad, di serdema Eyyûbî û Memlûkiyan de Qahîre û di serdema Osmanîyan de jî Stenbol weku navendên bihêz ên edebiyatê derketin holê û bi saya desthilata serayên van bajarên, ji her cihê helbestvan û edîban berê xwe dan van bajarên û ber bi van navendan ve herikîn. Di encama vê de jî bi zimanên van xanedanan gelek berhem hatin nivîsîn û edebiyatên bihêz peyda bûn.

Kurd jî weku hevpişkên şaristaniya Îranî ji mêj ve di herêma xwe de xwedan pêgeheke xurt a bajarvanî û edebiyatê bûn, lê herweku edebiyata farsî berî hatina îslamê derbarê edebiyata kurdî de jî agahiyên têr û tijî bi dest neketine. Herçend kurdan jî mîna farsan di serdema Ebbasîyan de hukûmet û dewletên serbixwe yên mîna Şeddadî, Fedlewî, Hesnewî, Merwanî û Eyyûbîyan avakiribin jî bi qasî ku tê zanîn di serdema van xanedanan de tu berhemeke edebî ya kurdî bi dest neketiye. Lê di navbera sedsala XIVan heta sedsala XIXan li navçeyên ciya ciya gelek xanedanên kurd weku mîrektî derketin holê û li bajarên ku navendên van mîrektîyan bûn, bingeha edebiyata nivîskî ya kurdî hat danîn. Di nava van navendên mîrektîyan de bajarên mîna Cizîr, Bedlîs, Bazîd, Hekarî, Mukus, Amêdî, Sine û Silêmanî bi saya hukûmraniya mîrên van bajarên bûn qadên damezirandina edebiyata kurdî.

Ji van nimûneyan gişt diyar dibe ku edebiyata nivîskî bi saya dewlet û xanedanên bihêz di nava jîngeha afirîner a bajarên navendî de peyda bûye û li gorî seqamgîrî û temendirêjiya van desthilatan her ku çûye geştir bûye. Ji aliyê din ve weku di nimûneya bajarên Yunanî de jî tê dîtin ew bajarên ku digel seqamgîriya siyasî û bingeheke aborî û madî, rê li ber azadiya mirov û bîr û baweriyên ciyawaz vekirine zêdetir berhemdar bûne û gelek kesayetî û berhemên hêja derxistine holê. Loma jî weku encam mirov dikare bibêje ku hebûna desthilateke siyasî û xwedîderketina wan a li nivîskar û helbestvanan, avakirina bajarên cazîbedar û dabînkirina zemîna azadiya bîr û baweriyên ciyawaz ji bo derketina edebiyateke bihêz weku sê hokarên bingeheke hertim diyarker bûne.

II. RÊBAZ

Xebata me ji ber ku di çarçoveya peywendiya bajar û edebiyatê de ye, me di beşa pêşî ya xebata xwe de behsa damezirandina bajaran û qonaxên bajarvaniyê kirin, lewra destnîşankirina qonaxên bajarvaniyê di heman demê de qonaxên peydabûna edebiyatê jî berçav dike. Ji bo vê, li gorî taybetmendiyan wan ên ciyawaz me bajaran li ser bajarên antîk, bajarên serdema navîn, bajarên îslamî û bajarên nûjen ve dabeş kirin. Lê ji ber ku çarçoveya xebata me li dor edebiyata Cizîra Botan a serdema Mîrektiya Azîzan e û ev mîrektî jî di nîveya yekem a sedsala XIXan de dawî lê tê, em zêde li ser taybetmendiyan bajarên nûjen û karîgeriya wan a li ser edebiyatê nesekinîn. Lewra di vê serdemê de Cizîra Botan taybetmendiyan bajarên îslamî yên serdema navîn nîşan dide û xwedan dîrokeke bajarvaniya antîk e. Ji ber vê jî, di vê xebatê de em zêdetir li ser taybetmendiyan bajarên antîk, serdema navîn û îslamî sekinîn da ku em bikarin Cizîrê di nava vê fotoxrafa giştî ya bajarên hevta de bi cih bikin.

Bêguman di damezirandin û geşkirina bajaran de xanedan û dewlet xwedî roleke sereke bûn, herwuha di pêşketina sîstema dewletê de jî rola bajaran aşkera bû. Ji ber vê çendê di beşa yekem de piştî qonaxên bajarvaniyê di avakirina bajaran de weku hokareke bingeîn me behsa rola dewletê kir. Piştî vê, weku encama jiyana bajarî me di peydabûna şaristaniyê de behsa rola bajaran kir û weku xelesa dawî di encama peywendiya dewlet, bajar û şaristaniyê de me behsa derketina edebiyata nivîskî kir. Di derketina edebiyata nivîskî de ji ber ku xanedan, bajar û şaristaniya mirovê bajarî diyarker in, me di nimûneya Destana Gilgamêşê de şop û nîşaneyên van hokaran berçav kirin. Piştî vê çarçoveya giştî, me di nimûneya edebiyata nivîskî ya kurdî de rola bajarvaniyê lêkola û bi heman rêbazê weku hokarên bingeîn ên derketina edebiyata kurdî me behsa xanedan, bajar û şaristaniya kurdan kir û weku yekemîn berhema edebiyata bajarî, me di nimûneya Zembîlfiroşê de şopên bajarvaniya kurdî destnîşan kirin. Bi vî awayî me di beşa yekem de çarçoveya teorîk a xebata xwe danî, da ku em li ser vê zemînê bikarin di nimûneya edebiyata Cizîra Botan de behsa peywendiya bajar û edebiyatê bikin.

Beşa duyem bi giştî li ser dîroka siyasî ya Cizîra Botan e. Lewra li gorî veguheştina Pascale Casanova û bi gotina Henri James ji bo hilberîna piçek edebiyat carina pêwistiya mirov bi gelek agahiyên dîrokî çê dibe.⁸ Di vê çarçoveyê de herçend

⁸ Pascale Casanova, *Dünya Edebiyat Cumhuriyeti*, Wergêr: Saadet Özen-Filiz Deniztekin, Varlık Yayınları, Çapa Yekem, İstanbul, 2010, r. 98.

mijara me li dor serdema Mîrektiya Azîzan be jî, me pêwîst zanî ku em dîroka berî vê xanedana kurdî jî bizanin, da ku taybetmendiyên bajarvaniya Cizîra Botan ji bo me baştir aşkera bibe. Loma jî me di vê beşê de dîroka siyasî ya Cizîra Botan li ser sê qonaxan ve dabeş kir. Cizîr ji ber ku bajarekî dêrîn e, me di binbeşa yekemîn de ji destpêkê heta hatina îslamê behsa dîroka Cizîrê kir. Binbeşa duyem ji hatina îslamê heta mîrektiya Azîzan dîroka Cizîra Botan vedigire û binbeşa sêyem jî li ser dîroka Mîrektiya Azîzan e ku di vê serdemê de edebiyata kurdî li Cizîra Botan serî hildide.

Beşa sêyem li ser taybetmendiyên bajarvaniya Cizîra Botan û seqamgîriya siyasî hatiye nivîsîn. Lewra dahênana şaristanî û edebiyata kurdî ya li Cizîra Botan li ser bingeha bajarvaniya Cizîra Botan û bi dabînkirina seqamgîriya siyasî serî hilda. Ji ber vê çendê me pênc hokarên bajarvaniya Cizîra Botan di bin sernavên bingeha aborî û bazirganiya Cizîrê, heterojeniya civakî ya Cizîrê, avadaniya Cizîrê, li Cizîrê rêvebirî û li Cizîrê dezgehên xwendin û edebiyatê de nîşan dan û me ev hokar digel hokara seqamgîriya siyasî weku sedema peydabûna edebiyata Cizîra Botan berçav kirin.

Beşam çarem ku kakila vê xebatê ye li ser helbestvanên Cizîra Botan û helbestvanên ku bi Cizîra Botan re peywendîdar in hatiye nivîsin. Di nava van helbestvanan de bêguman di serî de, weku damezirînerê edebiyata klasîk a kurdî bi zaravayê kurmancî û helbestvanê herî navdar ê Cizîra Botan, me behsa Melayê Cizîrî kir. Di vê binbeşê de me pêşî derbarê jiyana Melayê Cizîrî de agahî dan, paşê bi armanca diyarkirina peywendiya Melayê Cizîrî digel Cizîra Botan me bi rêzê, behsa peywendiya Mela digel seraya Cizîra Botan û rengvedana vê têkiliyê di dîwana Melayê Cizîrî de kir. Di binbeşeke din de me di tesewira evîna Melayê Cizîrî de behsa karîgeriya bajarvaniyê kir û herî dawî me di helbestên Melayê Cizîrê de rengvedana dîrok û heterojeniya civakî ya Cizîra Botan berçav kirin. Weku duyemîn helbestvanê ku li Cizîra Botan derketiye, me cih da Remezanê Cizîrî. Ji ber ku tenê şeş helbestên Remezanê Cizîrî li ber dest hene, me nekarî bi van helbestên kêr bi rêkûpêkî peywendiya wî helbestvanî digel Cizîra Botan şîrove bikin, ji ber vê jî me tenê behsa jiyana wî kir û me cih da peywendiya wî û Melayê Cizîrî.

Cizîra Botan ji ber ku di nava paytextên mîrekên kurdan de bajarê herî girîng bû, bala gelek helbestvanên deverên din jî kêşaye ser xwe û mêvandariya gelek kesayetiyên edebiyata kurdî kiriye. Di nava van kesayetîyan de ê herî navdar bêguman Ehmedê Xanî ye. Xanî herçend helbestvanê mîrektiya Bazîdê be jî berhema xwe ya navdar *Mem û Zîn* li ser çîrok û efsaneyên devera Botan nivîsiye û navenda bûyera berhema wî ya navdar

jî Cizîra Botan e. Ji ber vê çendê piştî jiyana Xanî û peywendiya wî ya bi Cizîra Botan re, me di *Mem û Zîna* wî de behsa awayê nîşandana Cizîra Botan kir. Xanî jî mîna Mela di berhema xwe de behsa rola sereke ya mîr û seraya Cizîra Botan dike û ji bo berçavkirina jiyana serayê behsa meclis û xasbaxçeyê serayê dike. Herwuha bi boneya cejna Newrozê û şîna Mem derbarê dab û nêrîtên bajarê Cizîrê de agahiyên girîng dide û bi vî awayî Cizîrê weku navenda şaristanî û edebiyata kurdî dişayesîne. Her di vê beşê de piştî Ehmedê Xanî me behsa peywendiya Feqiyê Teyran digel Cizîra Botan kir. Feqî herçend helbestvanê devera Muksê be jî ji ber cazîbeya bajarvaniya Cizîra Botan demekê ew jî berê xwe dide vî bajarî û li gorî ragihandinan, li medreseyan Cizîrê dixwîne. Loma jî diçe ber Melayê Cizîrî û pê re danberheveke helbestî datîne. Ji ber vê çendê piştî ku me behsa jiyana Feqiyê Teyran kir, me behsa peywendiya wî ya digel Cizîra Botan û Melayê Cizîrî jî kir.

Bi vî awayî me bi van her çar beşan xwest ku di mînaka Cizîra Botan de hokarên derekî yên ku di avakirina edebiyata nivîskî de rol dibînin berçav bikin û nîşan bidin ku derketina edebiyatekê tenê bi hebûn û vîna helbestvan û nivîskaran ve girêdayî nîne, belku hin hokarên derveyê edebiyatê hene ku ji bo dahênana edebî weku mercên sereke derdikevin pêşberî me. Ji ber vê çendê jî, me edebiyat di nava jîngeha bajêr de weku encama desthilat, dewlemendî, dezgehên xwendinê, seqamgîriya siyasî û azadiya mirov destnîşan kir.

III. ÇAVKANÎ

Ev xebat xwe dispêre çendîn zanist û dîsîplînên civakî ku di derketina bajar û edebiyata nivîskî de gelek hokarên nihênî aşkera dikin û serpêhatiya mirov û şaristaniyê ronî dikin. Ji ber vê çendê me li ser encamên van dîsîplînan hewl da ku em bingehên edebiyata nivîskî ya bajarî destnîşan bikin û bi arîkarî û peywendiya dîsîplînên cîyawaz li ser hîsabê edebiyatê encamên baştir bi dest bixin.

Beşa yekem a xebata me ji ber ku derbarê pêvajoya bajarvaniyê û derketina edebiyata nivîskî de ye, me di vê beşê de zêdetir ji çavkaniyên arkeolojî, antropolojî, sosyolojî û ji dîroka bajaran û şaristaniyê sûd wergirtin. Çavkaniyên me yên vê beşê pîranî ji aliyê akademîsyen û lêkolerên rojavayî ve hatine nivîsîn ku her yek di warê xwe de xwedî şarezaiyeke baş e. Ji bo nîşandana bingeha vê xebatê em ê derbarê hinek çavkaniyan de agahiyên kurt bidin.

Di beşa yekemîn de yek ji çavkaniyên me yên girîng pirtûka Charles Keith Mailsels a bi navê *Uygarlığın Doğuşu* (Hilatîna Şaristaniyê) ye. Mailsels bi riya her du dîsîplînên arkeolojî û antropolojiyê dîroka şaristaniya mirovahiyê ji destpêkê heta roja îro lêdikole û bingehên şaristaniyê destnîşan dike. Mailsels herêma çiyayên Zagrosan yekemîn bingeha şaristaniya mirovahiyê dizane û bajarên sumerî jî yekemîn bajarên ser rûyê cîhanê qebûl dike. Ji bilî vê, di vê pirtûkê de behsa jiyana civakî ya gundan û bajaran, şêwe û cîyawaziyên civakan û peydabûna dewletê jî dike.

Kentlerin Doğuşu (Hilatîna Bajaran) ya ku ji aliyê Jean Louis Huot, Paul Thalman û Dominique Valbelle ve hatiye nivîsîn derbarê bajarên pêşî de agahiyên girîng dide. Me di vê pirtûka de ku ji gotarên sê nivîskaran pêktê zêdetir ji gotarên Jean Louis sûd wergirtin. Jean Louis di Zanîngeha Panthêon-Sorbonne de di Navenda Lêkolînên Arkeolojiya Rojhilat de profesorî kiriye û li ser bajarên sumerî gelek xebatên arkeolojîk kirine, ji ber vê çendê jî derbarê taybetmendiyên bajarên sumerî û destpêka damezirandina van bajaran de xwedî azmûneke baş e.

Lewis Mumfordê (m. 1990) ku li ser rexneya edebî, dîroka bajaran, şaristanî û mîmariyê xebitiye di pirtûka xwe ya bi navê *Tarih Boyunca Kent* (Di Dirêjahiya Dîrokê de Bajar) de ji destpêkê heta îro behsa serpêhatiya bajaran dike û bi nêrîneke rexnegirî şîroveya qonaxên bajarvaniyê dike. Me di vê pirtûkê de ji têbinî û şîroveyên Mumford sûd wergirtin û me gelek caran cih dan boçûnên wî.

Pirtûka Max Weber (m. 1920) a bi navê *Şehir* (Bajar), pirtûka R. J. Holton a bi navê *Kentler Kapitalizm ve Uygarlık* (Bajar û Kapîtalîzm û Şaristanî) û pirtûka Mehmet Alî Kiliçbay a bi navê *Şehirler ve Kentler* (Bajar û Şar) digel gotarên Jacques Le Goff, Georges Duby û André Chêdeville jî çavkaniyên girîng in û zêdetir li ser bajarên serdema navîn û bajarên nûjen agahî didin û behsa peywendiya bajar û şaristaniyê dikin.

Muqeddîmeya Îbnu Xeldûn jî yek ji çavkaniyên me yên girîng e. Îbnu Xeldûn (m. 1406) yek ji wan zanyarên pêşî ye ku derbarê bajaran û bingegehên bajarvaniyê de lêkolîn kiriye. Ji ber vê me derbarê bingegehên bajarvaniyê, taybetmendiya bajarên îslamî û peywendiya xanedan û bajaran de ji vê pirtûka hêja gelek sûd wergirtin.

Pirtûka Heme Kerîm Hewramî ya bi navê *Mêjûy Perwerde û Xwendin Le Hucrekanî Kurdistan da* jî çavkaniyeke girîng e. Hewramî di vê xebata xwe de behsa dîroka xwendin û perwerdeyê dike û bi rêzê taybetmendiya xwendingehên sumerî, akadî, asûrî, babîlî, sasanî, mesîhî, hîndîstanî, çînî, yahudî, misrî, yunanî, romanî, îslamî û kurdî dike. Me di vê pirtûkê de bi taybetî ji beşên ku derbarê bingegehên xwendin û edebiyata îslamî û kurdî de ne sûd wergirtin.

Me di beşa yekem de derbarê bajar û şaristaniya kurdî de jî herî zêde ji pirtûkên *Mêjûy Şaristanîyetî Kurda* Dr. Mehemed Mehmûd Mendelawî û pirtûka *Kurda Mehrdad* R. Izady sûd wergirtin ku her du lêkolêr jî Kurdistanê niha yek ji bingeha yekemîn a bajar û şaristaniyê li qelem didin û di destpêka şaristaniya mirovahiyê de rola sereke ya herêma Kurdistanê berçav dikin.

Beşa duyem û sêyem a xebata me ji ber ku li ser dîrok û bajarvaniya Cizîra Botan e, me zêdetir ji çavkaniyên dîrokî sûd wergirtin. Ev çavkaniyên me yên dîrokî piranî çavkaniyên yekemîn in, hinek jî weku berhevok û şîroveya van çavkaniyên yekemîn di asta çavkaniyên duyemîn de ne. Em ê li vir ji van çavkaniyan behsa hin çavkaniyên girîng bikin.

Seyahatnameya Evliya Çelebî (m. 1678) yek ji wan çavkaniyên yekemîn e ku têde gelek agahiyên girîng li berçav dikevin. Evliya Çelebî di naverasta sedsala XVIIan de li piraniya welatên jêr destê Osmanîyan digere û ji gelek alîyan ve derbarê van cihan de agahî dide. Di nava vê gera xwe de serdana Cizîra Botan jî dike û di encama vê serdanê de derbarê rêvebirî, bajarvanî û dîroka Cizîra Botan de agahiyên balkêş dide. Evliya Çelebî digel dêrînûna bajêr, zêdebûna baxçe û serayên nava bajêr, balê dikêşe ser hêza mîrên Cizîra Botan jî û di vê çarçoveyê de cih dide taybetmendiya bajarvaniya

Cizîrê. Ji ber vê çendê me derbarê dîroka antîk a Cizîrê û serdema Mîrektiya Azîzan de ji *Seyahatnameya wî gelek sûd wergirt*.

Orataçağ Cizre Tarihi (Dîroka Cizîrê ya Serdema Navîn) ya Dr. Muhemed Yusuf Xendûr weku nameya doktorayê hatiye nivîsîn û ji 815ê zayînî heta 1515an behsa dîroka siyasî û bajarvaniya Cizîrê dike. Dr. Muhamed Yusuf Xendûr di vê pirtûka xwe de ji çavkaniyên dîrokî û coxrafî yên serdema navîn a îslamî sûd wergirtiye û xebata wî derbarê dîroka Cizîrê de weku berhevok û kurte ya van çavkaniyan e. Me di vê pirtûkê de digel şîrove û nêrînên Xendûr ji *Murucu'z Zeheba* el- Mes'udî (m. 946), *Qissetu'l- Ekrad fî Şîmalî'l Îraqa* el- Xemrewî û *Tarîxa Ibnu Xeldûn* sûd wergirt û me cih dan agahiyên wan. Ji bilî vê pirtûkê, weku çavkaniyên yekemîn me ji *el- Kamil fî Tarîxa Ibnu'l Esîr* (m. 1233), *el- Alaku'l Xetîre fî Zikrî Mulukî's Şam wel Cezîreya Ibnu Şeddad* (m. 1285), *Kîtabu Sûretî'l Erda* Ibnu Xewqel (m. 988) û ji *Mu'cemu'l Buldana* Yaqut el Hemewî (m. 1129) jî sûd wergirt.

Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî (m. 1603) ji bo dîroka Mîrektiya Azîzan çavkaniyeke girîng e û di rêza çavkaniyên yekemîn de ye. Şerefxan di vê pirtûkê de behsa dîroka siyasî ya hemû xanedanên kurdan dike û di vê çarçoveyê de derheqê Mîrektiya Cizîra Botan de jî agahiyên têr û tijî dide. Şerefxan sîlsîleya vê xanedanê ji Mîr Ebdulezîz dide destpêkirin û heta Mîr Şerefê Sêyem behsa hemû mîrên vê xanedanê û bûyerên siyasî yên serdema wan dike.

Pirtûka Lûtfî (Ehmed Ramiz) (m. 1940) ya bi navê *Emir Bedirhan* (Mîr Bedirxan) ji bo serdema Mîr Bedirxan û rûxandina Mîrektiya Cizîrê çavkaniyeke girîng û sereke ye. Lûtfî di vê xebata xwe de cih dide jiyanameya Mîr Bedirxan û pêvajoya rûxandina mîrekiyê. Lûtfî ji ber ku di destpêka sedsala bîstem de li Stenbolê digel malbata Mîr Bedirxan di nava peywendiyê de ye bi ihtîmaleke mezin rasterast ji endamên malbatê agahî wergirtine û cih daye hin zanyariyên taybet.

Pirtûka Nazmî Sevgen (m. 1980) a *Doğu ve Güneydoğu Anadolu'da Türk Beylikleri* (Mîrekiyên Tirk ên Rojhilat û Başûrê Rojhilat) Anadolê li ser teza tirkirina kurdan hatiye nivîsîn. Nazmî Sevgen weku efserekî xanenişîn dîroka kurdan a piştî îslamê li ser vê nêrîna îdeolojiya resmî dinivîse û di vê pirtûkê de cih dide dîroka Merwanî, Hesenweyhî, Fedlewî, Mîrektiya Cizîrê, Mîrektiya Amêdiyê, Mîrektiya Hekariyê, Mîrektiya Baban, Mîrektiya Bedlîsê û Mîrektiya Mehmûdiyeyê. Ev pirtûk

herçend bi şayîşên siyasî hatibe nivîsîn û ji rêbaza zanistî dûr be jî, ji ber ku cih daye hin belgeyan, me pêwîst zanî em cih bidin agahiyên vê pirtûkê jî.

Pirtûka Ahmet Karam a *Cizre-Bohtan Beyi Bedirhan: Direniş ve İsyân Yılları* (Mîrê Cizîr û Botanê Bedirhan: Salên Berxwedan û Serhildanê) behsa serdema dawî ya Mîrekiya Cizîra Botan û serdema Bedirhan Beg dike. Ji ber ku Ahmet Karam xwe sipartiyê belgeyên Osmanî pirtûka wî ji aliyekî ve nêrîna dewleta Osmanî ya derbarê Bedirhan Beg û Mîrekiya Cizîra Botan dixêrê, ji aliyê din ve bi nirxandinên dîrokî û siyasî bûyera hilweşandina Mîrekiya Cizîra Botan destnîşan dike. Ji ber vê çendê me di beşa dawî ya dîroka Mîrekiya Azîzan de ji vê pirtûkê jî sûd wergirt.

Tarih Kültür ve Cizre (Dîrok Çand û Cizîr) ya Abdullah Yaşın ji destpêkê heta roja îro behsa dîroka siyasî û şaristaniya Cizîrê dike. Abdullah Yaşın ji ber ku çavkaniyên xwe diyar nekirine ji rêbaza zanistî dûr ketiye û hin caran agahiyên biguman ragihandine. Ji aliyê din ve Abdullah Yaşın ji ber ku nivîskarekî Cizîrî ye di pirtûka xwe de cih daye efsane û çîrokên devera Cizîrê û ji ber vê çendê jî di bin karîgeriya van efsaneyan de maye û ji rastiya dîroka Cizîra Botan dûr ketiye. Lê dîsa jî pirtûka nivîskar ji ber ku çarçoveya giştî ya dîrok û şaristaniya Cizîra Botan vedigire û cih dide dîroka devkî ya xelkê deverê xwediyê girîngiyeke taybet e û hêja ye.

Beşa çarem a xebata me derbarê peydabûna edebiyata kurdî ya li Cizîra Botan û helbestvanên Cizîrî de ye. Ev beş ji ber ku li ser jiyana helbestvanan û peywendiya wan a digel bajarvaniya Cizîra Botan hatiye nivîsîn, me di vê beşê de piranî ji çavkaniyên edebî sûd wergirtin. Di vê beşê de ji bilî berhemên helbestvanên Cizîrî, me ji pirtûkên *Mêjûy Edebî Kurdîya* Eladîn Secadî (m. 1984), *Mêjûy Edebî Kurdîya* Merûf Xeznedar (m. 2010), *Hozanvanê Kurda* Sadiq Behaedîn Amêdî, *Tarîxa Edebiyata Kurdîya* Qanatê Kurdo (m. 1985), *Dîroka Wêjeya Kurdîya* Feqî Huseyn Sağnîç (2002) jî sûd wergirtin.

Şair ve Patron (Helbestvan û Patron) a Xelîl Înalçik ji aliyê peywendiya helbestvan û seraya xanedanan pirtûkeke girîng e. Înalçik herçend pirtûka xwe li ser helbestvanên Osmanî û seraya vê dewletê nivîsandibe jî, ji aliyekî ve taybetmendiyên giştî yên edebiyata serdema navîn a hemû gelên musulman jî xistiye rû, lewra di serdema navîn de hewzeyeke hevbeş a çandî û edebî ya cîhana îslamî hebû û peywendiya helbestvan û serayên rêvebiriyê di nava vê îdeolojiya hevbeş de teşe digirt.

Ji ber vê çendê dema me peywendiya Melayê Cizîrî digel seraya Cizîra Botan lêkola, me ji vê pirtûka navborî sûd wergirt.

Di dawiyê de em dixwazin behsa pirtûka Walter G. Andrews a bi navê *Şiirin Sesi, Toplumun Şarkısı* (Dengê Helbestê, Strana Civakê) bikin ku ev pirtûk ji aliyê diyarkirina îdeolojiya helbesta serayên serdema navîn û peywendiya helbestê digel seray û bajarvaniyê pirtûkeke girîng e. Andrews di pirtûka xwe de zêdetir li ser xezelan disekine û di nava kevneşopa edebî ya îslamî de bingegehên estetîzma xezelê û edebiyata serayên xanedanên îslamî lêdikole û di nimûneya edebiyata Osmanî de analîza hin xezelan dike û xetên giştî yên edebiyata serdema navîn a îslamî nîşan dide.

BEŞA YEKEM

PÊVAJOYA BAJARVANIYÊ Û DERKETINA EDEBIYATA NIVÎSKÎ

1. QONAXÊN GIRÎNG ÊN BAJARVANIYÊ

Li ser destpêka avakirina bajaran boçûnên ciyawaz hebin jî bi giştî bajarên pêşî di dawîya çaremîn hezar sala berî zayînê de li Mezopotamyayê û li geliyê Nîlê hatine damezirandin û bajarvanî paşê li Filistîn, Sûriye, Anatoliya, Îran, Asyaya Navîn û li Geliyê Îndusê belav bûye.⁹ Hemû çavkanî li ser Mezopotamyayê hevray in ku yekemîn navenda derketina bajaran e. Sedema derketina bajaran li vê herêmê vedigere ser hin taybetmendiyên coxrafî, pêşketinên cotyarî û ajeldariyê. Lewra piştî kotahiya serdema qeşayê ya dawî, li Rojhilata Nêzîk niştecibûna hertimî, cotyarî û bajar derketin holê¹⁰ û weku pêngava yekem a bajarvaniyê herêma çiyayên Zagrosan bû qada kedîkirina bizin, beraz, dewar, genim, nîsk, polke, nok, zegerek û baqil.¹¹ Ji xwe li gorî qewlekî, sumeriyên ku damezirînerên şar û şaristaniya Mezopotamyayê ne, ji çiyayên Zagrosan çûne başûr û li ser vê bingehe, şaristaniya sumerî ava kirine.¹² Hin zanyar jî li Mezopotamyayê destpêka pêvajoya avabûna bajaran vedigerînin pênc hezar sal berî zayînê, serdema neolîtîk.¹³ Lewra di vê serdemê de avûhewayê ya herêmê ji bo cotyariyê guncaw dibe û li ser vê zemînê şoreşa cotyariyê çê dibe. Piştî şoreşa cotyariyê berhemên zêde kom dibin, ji bo xwedîkirina nifûseke zêde debara jiyanê tê dabînkirin û bajarên sumerî jî li ser vê bingehe tên avakirin.

Ji destpêka avakirina bajaran heta îro, ji ber geşesendin û taybetmendiyên wan, bajar di nava pêvajoya dîrokî de weku bajarên antîk, bajarên serdema navîn, bajarên îslamî û bajarên nûjen bi nasname û taybetmendiyên ciyawaz derdikevin pêş. Lê ji ber ku du hezar sal berî zayînê unsûrên sereke yên bajaran derdikevin meydana,¹⁴ digel ku ji destpêka bajarên sumerî heta bajarên îro di fonksiyon û avahiyên bajaran de gelek guhertin çê bûne jî, xetên giştî yên bajaran zêde neguherine.¹⁵ Ji ber vê jî çend cure bajar hebin bila hebin nasnameya bajaran ku bingeha şaristaniya mirovî û edebiyatê ye

⁹ Jean-Louis Huot, "Dünyanın İlk Kentleri", *Kentlerin Doğuşu*, Wergêr: Ali Bektaş Girgin, İmge Kitabevi, Çapa Yekem, Ankara 2000, r. 13.

¹⁰ Charles Keith Maisels, *Uygurlığın Doğuşu*, Wergêr: Alâeddin Şenel, İmge Kitabevi, Çapa Yekem, Ankara, 1999, r. 471.

¹¹ Maisels, h.b., r.103.

¹² Mumford, b.n., r. 76; Deham Ebdulfettah, "Pêşgotina Dastana Gilgamêşê", *Dastana Gilgamêşê*, Wergêr û Amadekar: Deham Ebdulfettah, Enstîtuya Kurdî ya Amadê, Çapa Duyem, Stenbol, 2006, r. 24.

¹³ Ali K. Metin, "Şehir ve Ötekisi", *Hece*, j. 150/151/152, Ankara, 2009, r. 177.

¹⁴ Mumford, b.n., r. 96.

¹⁵ Huot, b.n., r. 12.

her weku xwe maye. Di nava vê berdewamiya bajarvaniyê de ji destpêkê heta îro ji ber ku di naverok û fonksiyonên bajaran de heta radeyeke baş ciyawazî çê dibe, me pêwîst zanî ku em van cure bajarên navborî bi taybetmendiyan wan ên herî berbiçav destnîşan bikin.

1.1. Bajarên Antîk (Dêrîn):

Ji destpêka mirovahiyê heta seretaya serdema navîn re “dîroka antîk” tê gotin. Dawiya dîroka antîk jî di 476an de bi hilweşîna Împaratoriya Romaine ya Rojava bi encam digihîje. Li ser vê, mirov dikare bibêje ku ew bajarên ku di nav dîroka antîk de derketine holê bajarên antîk in.¹⁶ Bajarên serdema antîk li ser herêm û xelekên ciya ciya belav dibin. Weku di serî de jî hat gotin herêma yekemîn a ku bajar lê peydabûne Mezopotamya ye. Bajarên vê herêmê jî di nava xwe de weku bajarên sumerî, akadî, gutî, babîlî û asûrî dabeş dibin. Herwuha bajarên berê yên Misirê, Çînê, Geliyê Îndûsê, Sûriyeyê, Filistinê, Îranê, Anatoliyayê, Fenîkeyê, Yunanîstanê û Romaine jî weku bajarên antîk tên binavkirin.

Herçend bajarên herêmên navborî di nava xwe de xwedî ciyawaziyan taybet bin jî bi giştî mirov dikare bibêje ku ev bajar weku pêştir jî amaje pê hat kirin li ser şoreşa cotyariyê hatin avakirin. Lewra cotyarî pêş mercê şaristaniyê bû. Bi vî awayî bêtir ku mirov li pey xorakên pêwîst bigerin ketin nav hewldanên dîtir¹⁷ û di encama wê de jî bajarên ku bûn jêdera şaristaniya mirovahiyê damezirandin. Herçend di bingeha van bajaran de şoreşa cotyariyê hebe jî, paşê ev bajar bi bazirganî û karbeşîya nav xwe bêtir geşbûn û cihê xwe girtin. Li vir, ji ber ku yekemîn azmûna bajarvaniyê ye, em ê zêdetir li ser bajarên sumerî rawestin û taybetmendiyan bajarvaniya sumerî vekolin.

Li bajarên sumerî perestgeh, seray, sûr û bazar taybetiyên herî berbiçav ên bajarvaniya sumerî bûn û van her çar unsûran çar çînen sereke yên bajêr temsîl dikirin. Ew jî zîlamên dînî, rêvebir, leşker û zenaatkar bûn. Çavkaniyan herî zêde bal kişandine ser perestgehên bajarên sumerî ku van perestgehan hem di navenda bajaran de cih digirtin hem jî ji ber fonksiyonên xwe di navenda jiyana bajariyan de cihê xwe çê kiribûn. Lewra li gorî Jean Louis Huot, herçend damezirînerê bajarên sumerî hebe jî, bingeha van bajaran digihîşt xwedawendan. Loma di deqeke ku ji bo Gilgamêş hatiye nivîsîn de wuha tê gotin: “*Ey Uruk, berhemê xwedawendan.*”¹⁸ Ji ber vê jî bajarên

¹⁶ Vefa Taşdelen, “Antik Kentlere Doğru”, *Hece*, j. 150/151/152, Ankara, 2009, r. 29.

¹⁷ J. M. Roberts, *Avrupa Tarihi*, Wergêr: Fethi Aytuna, İnkılâp Kitabevi, İstanbul, 2010, r. 32.

¹⁸ Huot, “Sümer Kenti, Bir Kent-Devleti”, b.n., r. 81.

Mezopotamyayê weku bajarên perestgehî derdikevin pêş. Charles Keith Maisels jî dibêje: “*Li Urukê li navenda bajêr perestgehên Anu û İnannayê bi nêrdîwenan dorpêçkirî bûn û bi awayê prîzmayê bilind dibûn.*”¹⁹ Herwuha li Nippurê Enlîl, li Erîduyê Enkî, li Urê Nanna (Sin), li Larsayê û Sipparê Utu (Şamaş) weku xwedawendên van bajaran li naverasta van bajaran weku sembolên bajêr bilind dibûn.²⁰

Perestgehên sumerî jî bilî erkên dînî xwedî erkên civakî, aborî û siyasî jî bûn. Bo nimûne, hilberîna zêde ya gelê Urukê di perestgeha xwedawendên bajêr de kom dibûn û jî aliyê koma ruhaniyan ve dihatin bikaranîn.²¹ Ji ber vê jî bajarên Mezopotamayayê bi awayekî aşkera di bin karîgeriya perestgeh û zîlamên dînî de bûn. Vê çîna ruhanî hem dahata welat di bin destên xwe de digirt hem jî di encama vê de civak bi rê ve dibir. Bo nimûne, Lagaş jî ber van taybetmendîyan weku bajar-dewleteke dînî derdiket pêş.²² Ji ber vê jî di serî de hemû erkên aferîner ên bajêr bi dîn ve girêdayî bûn û peyamên herî girîng jî peyamên pîroz bûn.²³ Lê piştî hezar sal ser bi derbasbûna avakirina bajaran, qonax bi qonax hukumdar û çîna ruhban jî hev veqetîyan²⁴ û karîgeriya perestgehan jî nîsbeten şikiya. Ji ber vê, gelek çavkanî dema behsa bajarên pêşî dikin weku remzên van bajaran behsa perestgehên biîhtîşam, seray û depoyên zad dikin.²⁵ Lewra di yekemîn pêvajoya bajarvaniyê de dema mirov ji gundan ber bi bajaran ve çûn ax û hemû berhemên axê bûn mulkê perestgehan û xwedawendan, lê piştî ku hêza hukumdarên zêde bû, mulkên bajêr vê carê bûn malê qiraliyetê.²⁶ Ji ber vê çendê perestgeh bû remza desthilata xwedawendan, seray jî bû remza desthilata hukumdarên.

Bêguman serdestiya perestgehan tenê bi serdema sumerîyan re bisînor nema, piştî sumerîyan jî, di gelek bajarên Yunanî de akropol anku perestgeh ên ku ji bo xwedawendan hatibûn çêkirin li navenda bajaran li bilindahiyekê cih digirtin.²⁷ Sasaniyan jî dema cihek digirt li wir ji bo Yezdan (Ahoramazda) perestgehek ava dikir û di van perestgehan de hem dînê Zerdeştî hînî xelkê dikirin hem jî kar û barên dewletê bi rê ve dibirin.²⁸ Di deqên Hammurabî de jî tê dîtin ku huquq li ser navê xwedawendê wê

¹⁹ Maisels, b.n., r. 237.

²⁰ Huot, “Tanrîların İkametgahı Mezopotamya Kentleri”, b.n., r. 254.

²¹ Huot, “İlk Kentlerin Doğuşu”, b.n., r. 38.

²² Huot, “Sümer Kenti, Bir Kent-Devleti”, b.n., r. 73-74.

²³ Mumford, b.n., r. 125.

²⁴ Huot, “Sümer Kenti, Bir Kent-Devleti”, b.n., r. 75.

²⁵ Clive Ponting, *Dünya Tarihi*, Wergêr: Eşref Bengi Özbilen, Alfa, Çapa Yekem, İstanbul, 2011, r. 61.

²⁶ Mumford, b.n., r. 142.

²⁷ J. M. Roberts, b.n., r. 52.

²⁸ Heme Kerîm Hewramî, *Mêjûy Perwerde û Xwêndin Le Hucrekanî Kurdistanê*, Çapxaney Wezareti Roşinbîrî, Bergî Yekem, Hewlêr, 2008, r. 55.

serdemê yê bi navê Marduk li ser xelkê hatiye çespendin. Hammurabî wuha diaxife: “*Marduk xwest ku ez edaletê bidim mirovên welat û xwest ji bo mirovên welat rêvebirîyeke baş dabîn bikim, ji ber vê jî, min li her derê welat rastî û edalet bi cih kir û xelk serfiraz kir.*”²⁹ Ji van nimûneyan tê fêmkirin ku cihê taybet ê perestgehan û karîgeriya wan a zêde ya li ser civata bajarî yek ji taybetmendiyên herî berbiçav ê bajarên antîk bû.

Ji ber vê rola perestgehan, çîna ruhanî, ji serdema sumerîyan heta dawîya serdema navîn, ji her alî ve xwedî îmtiyazên taybet bûn. Bi gotina Max Weber, mulkên endamên çîna ruhanî ji bacê muaf bû û li derveyê taserufa karên resmî û dadgeha bajêr dima. Tevî ku papaz ji leşkeriyê û erkên pêwîst ên li ser gelê bajêr hatibûn azadkirin di heman demê de bi waqfiyeyên ku dewlemêndên bajêr bexşî kilîseyê dikirin malên wan her ku diçû zêde dibû.³⁰

Piştî ku bajar weku yekîneyeke nû ya niştecîbûnê derketin holê civat ji têkel bû û di nava hiyerarşiyekê de kar û pişeyên nû peyda bûn. Ji bilî hukumranên desthilatê û zîlamên dînî yê perestgehan, her cure rêvebir, katib, leşker, bazirgan, zenaatkarên pispor û gelê bajar her yek ji vana xwedî statuyên ciya ciya bûn.³¹ Ev çînen ciyawaz ên civata bajêr ji ber ku di bin nîzameke bajarî û dewletî de bûn, di nava hevkariyê de, bûn unsûrên jêner û pêwîst ên damezirandina şaristaniyê, loma jî hebûna wan çînen bajarî şiyana mirovan yekser bilind kir. Bi zêdebûna hêza mirovan avahiyên nû hatin çekirin, di navbera cihên dûr de digel çêbûna ragihandinê, malên bazirganiyê hatin veguhestin û bi vî awayî bajar bûn jêdera teqîna dahênanên mirovî.³² Bêguman bazar cihê van kar û pişeyên ji hev ciya bû û navenda pêkgihîştina wan çînen civatê bû.

Ji ber ewlehî û pêşketina bajaran di demeke kurt de nifûsa wan zêde bû. Lewra bajar, di nava hawîrdoreke kêr nifûs de cihê kombûna nifûseke zêde bû.³³ Ji xwe ji ber vê nifûsa zêde di bajaran de tevger û fikrên nû çê dibûn û ev tevger û fikrên nû jî dibûn sedema pêşketina mirovahiyê û geşepêdana şaristaniyê. Dema mirov bala xwe dide nifûsa Urukê û bi giştî bajarên sumerî mirov têdigihîje ku şaristaniya sumerî gihîştîye çî radeyê. Lewra hêja di wê serdemê de nîvê civata sumerî bajarî bûn.³⁴ Ev rêje li gorî

²⁹ Maisels, b.n., r. 453.

³⁰ Max Weber, *Şehir*, Wergêr: Musa Ceylan, Yarin, İstanbul, 2010, r. 267.

³¹ Huot, “Sümer Kenti, Bir Kent-Devleti”, b.n., r. 81.

³² Mumford, b.n., r. 45.

³³ Jacques Le Goff, “Ortaçağ Kenti”, *Şehirler ve Kentler*, İmge Kitabevi, Çapa Duyem, Ankara, 2000, r. 170.

³⁴ Maisels, b.n., r. 226.

bajarên serdema navîn pêşketin û asta bilind a bajarên sumerî nîşan dide, lewra di serdema navîn de di nava dewletên cîhanê de asta bajarvaniyê ji sedî 10 yan jî 15an derbas nedikir. Lê sê hezar sal berî zayînê reng e nifûsa Urukê ji bajarên din ên sumerî du car zêde bû û jimareya bajêr gihîştibû 40 000 kesî.³⁵

Sûr yan jî dîwarê dora bajaran, nîşaneyê girîng a bajarên antîk bû û heta sedsala XIXan jî wuha ma.³⁶ Bêguman sûr ji bo parastina şêniyên bajaran dihatin lêkirin û xala ciyabûna navenda bajêr bû ji çolteran. Sûrên bajaran li gorî baweriya mirovên wê serdemê, bajariyan ji ruhên xebîs, ajelên dirinde, dizên koçer û ji artêşên dagîrker diparast. Ji ber vê çendê û bi saya van sûran xelkê bajêr bi dilniyayî di nava ewlehî û asûdeyiyê de dijiyan. Loma jî dîroka çêkirina sûran bi damezirandina bajarên pêşî re dest pê dike. Lewra sûrên pêşî yên li Mezopotamyayê, ji dawiya 4000 salên berî zayînê mane û lêkirina sûran di dirêjahiya hezar sala sêyemîn de jî her berdewam bûye.³⁷ Sûr li hemberî tirs û fikara dijminan, dahênana herî biheybet a mirovên bajarî bû. Ji ber vê jî mirovên serdema antîk bi hewl û xîreteke mezin wan bedenên mezin lê kirine, da ku xwe ji metirsiyên muhtemel biparêzin. Bo nimûne, li dora Urukê bi dirêjahiya 10 kîlometreyî sûr hebûye.³⁸ Ji ber vê çendê jî di gelek deqên serdema antîk de behsa sûran hatiye kirin û bajar bi sûrên xwe hatine pesinandin.

Bî vî awayî bajarên antîk bi taybetmendiyan xwe yên madî û bi çînen xwe yên sereke çar erkên girîng bi cih dianîn. Rêvebiran di serayê de îtaeta li hemberî qanûnan dabîn dikir, zîlamên dînî di perestgehan de manewiyat û rewîştê civatê diparastin, zenaatkaran di bazarê de pêdiviyên şêniyên bajarî dabîn dikirin û leşkeran jî bi saya sûrên bajêr li hemberî êrîşên dijmin û dagîrkeran erkê bergiriyê bi cih dianî.³⁹

1.2. Bajarên Serdema Navîn:

Serdema navîn, ji bo Ewropayê bi hilweşîna Împaratoriya Romayê ya Rojava dest pê dike û heta şoreşa pîşesaziyê dewam dike. Di vê serdemê de ji bo ku hukmê dewleteke bihêz a navendî li ser bajarên Ewropayê namîne, di gelek deveran de û di serî de li Bakurê Îtalyayê bajarên nîv serbixwe derdikevin holê. Lewra di serdema

³⁵ Ponting, b.n., r. 65.

³⁶ Mumford, b.n., r. 84.

³⁷ Huot, "Sahte Neolitik Kentler" b.n., r. 29.

³⁸ Ponting, b.n., r. 65.

³⁹ Georges Duby, "Kente ve Kıra Bakmak", *Şehirler ve Kentler*, İmge Kitabevi, Çapa Duyem, Ankara, 2000, r. 164.

Împaratoriya Romayê de bajarên xweser ên împaratoriye ketibûn nav çendîn şeweyên otorîteyê û ji ber vê jî heta radeyekê ji aliyê van şeweyên otorîteyan ve hatibûn texrîbkirin.⁴⁰ Loma jî piştî jihevketina împaratoriye nasnameya bajarên serbixwe careke din ket rojevê.

Di serdema navîn de rêxistina bajarê azad ê ku li Rojavayê Ewropayê ji sedsala XIan dest pê kiribû û di sedsala XIIIan de fireh bûbû, di binyada xwe de, xwe dispart rêvebirîya bazirgan, zenaatkar û loncayan ku ji begên feodal xweserîya xwe stendibûn.⁴¹ Bajarê azad ê serdema navîn cihê milmilaneya çînen ciyawaz û serbixwe bûn. Ji aliyekî ve di her bajarekî de erk û selahiyata wan ciya be jî, lordek weku parêzer û karmendê herî mezin ê bajêr, çîna arîstokrat û rêvebir temsîl dikir,⁴² li aliyê din li kilîseyê hukmê zîlamên dînî her ku diçû xurtir dibû. Li navçe û çolteran begên feodal hukum dikir û di bazarên bajaran de jî çîneke nû ya burjuvayê serî hildabû. Ev çînen ku her yekê ji wan xwedî berjewendiyên taybet bûn, ji aliyekî ve di nava milmilaneya desthilat û berjewendiyê de bûn, li aliyê din jî bi vê pêşbirka xwe rê li ber guhertinê û fikrên nû vedikirin. Herçend bajariyên serdema navîn armancên mîna azadî, wekhevî, beşdariya demokratîk û xweseriyê di bajarên xwe de bi cih nekiribin jî piştî bajarên Yunanî di vê serdemê de bi awayekî xurtir ev fikir ketin rojevê. Ji ber vê jî taybetiya herî berbiçav a bajarên serdema navîn ev tevgera çînen civakî bû.

Li bajarên serdema navîn piştî ku danûstandin û bazirganî zêde bû, aborî li ser şaxên nû ve hat dabeşkirin û ji ber vê tevgera bazirganiyê jimareya kesên biyanî li van bajaran zêde bû,⁴³ bi zêdebûna kesên biyanî jî, heterojenîya civata bajarên serdema navîn zêde bû. Ji xwe bajarek bi sê taybetiyên xwe ji çolteran dihat ciyakirin: zêdebûna nifûsê, siftbûna mirovî û heterojenîya civakî.⁴⁴ Bêguman bajarên antîk jî li gorî hînterlanda xwe heterojen bûn, lê ev heterojenî di bin kontrolê de bû. Di serdema navîn de ji ber bazirganiya dorfireh rêjeya heterojenîya bajaran li gorî serdema antîk zêdetir bû û vê jî ji bo pêşketina civakên bajarî diyardeyeke nû ya bajarvaniyê anî holê.

Di bajarên Rojava de “meydan” piştî bazarê duyemîn zemîna heterojenîya civakî ya bajarên serdema navîn bû. Meydana ku di polisên yunanî yê antîk de jê re “agora” dihat gotin, cihê avahiyên giştî, hevdîtina mirovan herwuha navenda bazirganî,

⁴⁰ R. J. Holton, Kentler, *Kapitalizm ve Uygarlık*, Wergêr: Ruşen Keleş, İmge Kitabevi, Çapa Yekem, Ankara, 1999, r. 16.

⁴¹ Mehmet Ali Kılıçbay, *Şehirler ve Kentler*, İmge Kitabevi, Çapa Duyem, Ankara, 2000, r. 111.

⁴² Weber, b.n., r. 124.

⁴³ J. M. Roberts, b.n., r. 53.

⁴⁴ Keleş, b.n., r. 121.

pîşesaziye û dîn bû. Nişteciyên polîsan demên xwe yên ku ji ber malê û kar diman li vir derbas dikirin. Ji ber vê jî ev der navenda civak û siyasetê bûn.⁴⁵ Di bajarên Bakurê Îtalyayê yê serdema navîn de jî ji agorayê re pîazza dihat gotin. Pîazza jî hevçeşnê agorayê navenda komel û aboriyê bû. Lewra cara pêşî banka li vir hatibû avakirin, bûyerên mezin ên civakî li vir rûdabûn û mirov li vir hatibûn cezakirin. Bêguman di bajarên antîk de jî meydan hebû, lê dema mirov bûyerên dawîya serdema navîn tîne berçav di bajarên serdema navîn de meydan xwedî cihekî taybet bû. Ji ber vê jî mirov dikare bibêje ku meydan ji aliyekî ve bû nasnameya bajarên vê serdemê.

Di bajarên serdema navîn ên Ewropayê de, rola dîn û di diyarkirina nasnameya bajarên serdema navîn de rola kilîseyê berçav û diyar bû. Ji ber vê jî, çanda bajarî ya serdema navîn bi awayekî aşkera bi xirîstiyaniyê ve girêdayî bû.⁴⁶ Lewra piştî hilweşîna Împaratoriya Romayê li Rojhilatê Ewropayê tekane yekîtiya cîhanî ya bihêz kilîse bû. Kilîse weku dezgeh xwedî zewiyên gelek zêde bû û bi arîkariya dîndarên xirîstîyan gihîştibû hêzeke mezin a aborî. Ji ber vê çendê kilîse û manastiran di nava xelkê de roleke girîng didîtin. Manastir ji bo kesên bê mal û hal cihê xwelêgirtinê û mayînê bûn herwuha manastiran di avadaniya bajaran de jî rola xwe didîtin. Bo nimûne; pir didan çêkirin, bazar dadimezirandin, nexweşxaneyên gel vedikirin û bi vî rengî di pêşvebirina bajaran de pêşengî dikirin.⁴⁷ Ji aliyê din ve kilîse navenda kombûna şênîyên bajarî bû û ji ber vê çendê jî li teniştê bazarê li navenda bajaran dihat avakirin. Lewra kilîse ji bo xelkên bajar ji bilî pîroziya xwe di mîhrîcanê mezin de holeke mezin a xwarinê, hola pêşandana şanoyê herwuha di tatîlan de ji bo xwendekaran cihê perwerde û çalakîyên îlmî bûn.⁴⁸

Di vê serdemê de rûyekî din ê kilîseyê jî hebû ku ev bû sedema tevlihevî û aloziyên cîdî yên civakî û siyasî. Lewra kilîse bi vê hêza xwe ya zêde êdî ji dirûvê dezgeheke dînî derketibû û bûbû hêzeke desthilatdariyê. Ji ber vê çendê, çawa ku di avadanî û xizmetguzariyên civakî de rûyê xwe yê merhemetê nîşan dida herwuha bi gefa afarozkirinê tirsê dixist dilê qiralan jî. Kilîse di zordestiyê de ew çend pêş ve diçû ku ji bo îşkecedana mirovên heretîk hacetên îşkenceyê yên mekanîk dadihêna;⁴⁹ loma jî piştî demekê kilîse ji bo kesên azîdixwaz bû keleha zilm û azardanê û navenda zordestiya zilamên dînî. Herçend bizavên nû yên muxalîf li dijî vê tehdarî kilîseyê serî

⁴⁵ Kılıçbay, b.n., r. 42.

⁴⁶ Le Goff, g.n., r. 180.

⁴⁷ Mumford, b.n., r. 317.

⁴⁸ Mumford, h.b., r. 376.

⁴⁹ Mumford, h.b., r. 399.

hildabin jî, heta dawiya serdema navîn jî rasterast nekarîn li dijî otorîteya dînî rawestin yan jî hukmê wan ên li ser siyaset û civakê bişkînin. Lewra di nava cîhana xirîstîyan de xala herî bihêz hêjî dîn bû û armancên hevbeş ên civakî û stratejîk ji aliyê kilîseyê ve dihatin diyarkirin. Ji ber vê çendê jî çendîn car li dijî cîhana îslamî ji ber berjewendiyên ciya ciya li ser navê xirîstîyanîyê “seferên xaçî” hatin lidarxistin.

Di bajarên serdema navîn de ji bilî hukumdar û esîlzadeyên serayan, ruhaniyên kilîseyan û burjuvayên bazaran, di sedsala XIIIan de li der û dora dezgehên xwendinê û bi taybetî di wan zanîngehan de ku berhemê vê serdemê bûn çîneke nû ya rewşenbîr derket. Rewşenbîrên ku karê wan nivîsîn û hînkirinbû û bi awayekî profesyonel mamostetî û zanyariyê dikirin digel bajarên serdema navîn derketin holê⁵⁰ û ev kesayet bûn bikerên nû yên edebiyat û zanista serdema xwe.

1.3. Bajarên Îslamî:

Îslam weku dînekî asmanî li bajaran derket qada jiyanê û li bajaran geş bû. Ji ber vê çendê jî mirov dikare bibêje ku îslam dînekî bajarî ye, lewra di cîhana îslamî de şaristaniya ku rêvebirî, huquq, dîn û çandê digire nava xwe li bajaran peyda bû.⁵¹ Weber balê dikêşe ser vê taybetiya bajarên îslamî û dibêje di bingeha şaristaniya îslamî de bajar heye.⁵² Li ser peywendiya îslamê û bajaran Mustafa Demirci jî radigihîne ku: “*Îslam, li Mekkeyê hat xwarê, li Medîneyê dirûvekî siyasî wergirt, li Besra û Kûfeyê dest bi fethan kir, li Bexdadê jî pêşî veguherî umranê, piştî wî veguherî şaristaniyê.*”⁵³ Îslamê ji ber ku têgihîştineke nû anî û di demeke kurt de bi riya fethên serkevtî gihîşt desthilateke yekcar zêde, muslumanan, derfeta wê yekê dît ku li gorî prensîbên xwe weku mekanê jiyan û îbadetê bajarên xwe ava bikin. Helbet em nikarin bibêjin ku bajarên îslamî ji her alî ve ji bajarên serdema xwe ciyawaz bûn, lê em vê bi rehetî dikarin bibêjin ku bajarên îslamî xwedî taybetmendiyên xweser bûn û ji sedsala VIIan heta sedsala XIXan di herêm û dewletên ciya ciya de gelek bajarên îslamî li ser vê nasnameya xweser derketin holê.

Bajarê îslamî ji pênc kome avahiyên girîng pêk dihat: 1. Keleh, 2. Seray, 3. Navenda bajêr (ku ji mizgevtî inê, xan, bedesten û bazarê pêk dihatin), 4. Tax, 5. Taxên

⁵⁰ Jacques Le Goff, *Ortaçağda Entelektüeller*, Fransızcadan Çev: Mehmet Ali Kılıçbay, Ayrıntı, Çapa Duyem, İstanbul, 2006, r. 24.

⁵¹ R. J. Holton, b.n., r. 157.

⁵² R. J. Holton, Kentler, b.n., r. 154.

⁵³ Mustafa Demirci, “İslamın Ümran Şehri: Bağdat”, *Hece*, j. 150/151/152, Ankara, 2009, r. 251.

derve.⁵⁴ Bêguman herweku bajarên pêşî di bajarên îslamî de jî unsûra herî girîng seraya hukumdariyê bû. Di vê çarçoveyê de Bexdaya ku bajarê herî girîng ê serdema îslamî bû li ser çar beşan hatibû dabeşkirin û bi şeweyê xelekekê ji rojava heta rojhilat, ji bakur heta başûr bi kuçeyên nizim dorpêçkirî, di nava giroverekê de bû. Seraya hukumdariyê jî di navenda bajêr de bû. Ev pîlana bajêr jî sîmetriya nava civatê, hiyerarşiyê, cihê navendî yê xelîfe û belavbûna hukumraniya wî ya li çar aliyên cîhanê dinimand.⁵⁵

Hin lêkoler di mijara bajarên îslamî de bal dikêşin ser mizgevt, hemam, bazar, avahiyên hukumî, sûr û meydanê jî. Li gorî vana derketina bajarê îslamî bi mizgevtê ve girêdayî ye.⁵⁶ Ji ber vê çendê gelek lêkolerên ku li ser bajarên îslamî xebitîne behsa vê rola navendî ya mizgevtê kirine. Ji xwe heta destpêka Ebbasiyan jî di navenda bajarên îslamî de mizgevt û seraya hukumdariyê li teniştê hev bûn.⁵⁷ Loma jî di bajarên îslamî de mizgevt hem ji aliyê fîzîkî ve hem jî ji aliyê komeleyî ve di navenda jiyana muslimanan de bû. Ji ber vê çendê di nava civatê de xwedî rol û fonksiyonên girîng bû. Îbadet, fêkirin, perwerde, hevdîtin, çareserkirina kêşeyên civakî û siyasî tev li mizgevtê dihatin kirin û di vê maneyê de mizgevtê rola îbadetxane, xwendengeh, navenda rewşenbîrî û meclisa siyasî didît.⁵⁸

Herçend di destpêkê de mizgevt cihê xwendina Quran û îlmên îslamî bû, lê paşê deriyê xwe ji zanistên din ên beşerî re jî vekir. Di vê maneyê de hinek mizgevtan rola zanîngehan jî girtin ser xwe. Bi taybetî di serdema Ebbasiyan de di bajarên navendî yên cîhana îslamê de mizgevtên bi vî awayî peyda bûn ku di van mizgevtan de dersên edebiyatê jî dihat xwendin.⁵⁹ Mizgevtên ku van fonksiyonên girîng bi cih dianî, ji aliyekî din ve jî di navenda bazara bajêr de weku xala navendî cih digirt. Li nêzîkê mizgevtê pirtûkfiroş, cîltfiroş, şimikfiroş û firoşkarên kelûpelên çermîn cih digirt.⁶⁰ Bi vî awayî mizgevt di navenda jiyana de weku qîblenameya madî û manewî ya civata bajêr rol digêra, ji ber vê yê ku Hodgson dibêje mizgevt ji cihê îbadetê zêdetir cihê kombûna gel bû û ji perestgehên yunanî zêdetir beramberî agorayan dihat.⁶¹

⁵⁴ Rüstem Erkan, *Kentleşme ve Sosyal Değişme*, Bilim Adamları Yayınları, Çapa Sêyem, Ankara, 2010, r. 81.

⁵⁵ Ira M. Lapidus, *İslam Toplulukları Tarihi*, İletişim Yayınları, Wergêr: Yasin Aktay, Çapa Sêyem, İstanbul, 2005, c. 1, r. 142, 143.

⁵⁶ Alparslan Aliağaoğlu, "İslam Şehri", *Hece*, j. 150/151/152, Ankara, 2009, r. 196.

⁵⁷ Ferhad Hacî Ebûş, *El Medîne Kurdiye*, Spîrêz, Çapa Yekem, Erbil, 2004, r. 84; Yılmaz Can, *İslam Şehirlerinin Fiziki Yapısı*, Türkiye Diyanet Vakfı, Ankara, 1995, r. 102-108

⁵⁸ Hewramî, b.n., r. 258.

⁵⁹ Hewramî, h.b., r. 261-262.

⁶⁰ Keleş, b.n., r. 122.

⁶¹ M.G.S. Hodgson, *İslam'ın Serüveni*, İz Yayıncılık, İstanbul, 1993, c. 2, r. 238.

Di bajarên îslamî de piştî demekê li teniştî mizgevtan tekya û xaneqayan jî cihên xwe girtin. Tekya û xaneqa cihê perwerdeya rêbaza tesewufê bûn û ev der taybet bûn bo peyrewên terîqetan. Lê ji bilî rêûresmên taybet ên zikrê, xelkê din jî ji bo îrşad û şîretgirtinê dikarîn biçin van cihan. Li tekya û xaneqayan herçend tedrîseke formel a îlm û edebiyatê nehatibe dayîn jî, ji ber cazîbe û fezaya wan a manewî, di demeke kurt de ev mekan bûn navenda helbestvan û edîban. Gelek caran di van mekanan de ew fikrên ku li derve derfeta gotinê nebû dihatin bilêvkirin û di nava eşqeke ruhanî de ev cure fikir heta radeyekê dihatin tolerekirin. Ji ber vê azadiya rayderbirînê jî gelek helbestvan ji van deran derketin ku bi hunera xwe bûn rûyê geş ê cîhana îslamî.

Îbnu Xeldûn weku bîrmendekî musulman yekemîn kes e ku li ser teorîya bajar û şaristaniya îslamî raya xwe derbiriye. Li gorî wî, di nava Ummeta îslamê de nîsbet bi hêza wan avahî kêr in. Ev jî vedigere bo bedewîbûna ereban û hin prensîbên dînê îslamê ku li dijî îsrafê ne.⁶² Îbnu Xeldûn herçend avahiyên îslamî li gorî serdema xwe kêr dîtibe jî, di pêvajoya dîrokê de bajarên îslamî ji aliyê unsûrên mîmarîyê ve jî gihîştin pileyeke baş. Di serî de mizgevt, medrese, tekya, pir, kanî, hemam, turbe, seray, qeyserî û bedesten wek unsûrên mîmarî bûn beşeke girîng ji nasnameya bajarên îslamî.

Di bajarên îslamî de ji bajarên Ewropayê cihêtir rêvebiriyeke xweser a mîna şarevaniyê derneket.⁶³ Ji ber vê jî di bajarên îslamî de mîna bajarên serdema navîn ên Rojava, rêxistina bajarên azad peyda nebû. Lewra ew helûmercên siyasî û komeleyî di bajarên îslamî de nebûn. Eger em dawîya Ebbasiyan li derve bigirin, bajarên îslamî hertim di bin destên rêvebiriyeke bihêz ên navendî de bûn û ji ber vê jî, ji bilî çîna rêvebir, çînen ku bikarin karîgerî li ser rêvebiriya bajaran çê bikin derneketin holê. Lewra ji bo ev merc neyên holê rêvebiriyeke navendî çî ji destên wan dihat tefsîr nedikir. Bo nimûne, ji bo bajarên derûdor nekarin bi Stenbola paytexta dewlata Osmanî re reqabetê bikin dewlata Osmanî wan esnaf û zenaatkarên bajarên din bi zorê dianîn paytextê, da ku li van bajaran hêzeke aborî û siyasî li dijî navendê peyda nebe.⁶⁴ Di vê çarçoveyê de di nava bajarên îslamî de helbestvan û edîb herçend di medrese û tekyeyan de pêgihîştibin jî, li dora serayên rêvebir û bajarên paytext kom bûn û di bin sîbera serayên hukmdaran de derfeta jiyanê dîtin û seray û paytext bi vî awayî bûn navendên herî bihêz ên peydabûna edebiyatê.

⁶² Îbn Haldun, *Mukaddime*, Amadekar: Süleyman Uludağ, Dergâh Yayınları, Çapa Duyem, İstanbul, 1991, c. 2, r. 838.

⁶³ Ahmet Yaşar Ocak, *Ortaçağlar Anadolu'sunda İslam'ın Ayak İzleri Selçuklu Dönemi*, Kitap Yayınevi, Çapa Duyem, İstanbul, 2011, r. 19.

⁶⁴ Kılıçbay, b.n., r. 116.

1.4. Bajarên Nûjen (Bajarên Pîşesaziyê):

Çawa ku bajarên pêşî li ser şoreşa cotyariyê, bajarên serdema navîn li ser bazirganiyê ava bûn, bajarên nûjen jî, li ser şoreşa pîşesaziyê ava bûn. Ji ber vê çendê, şoreşa pîşesaziyê ji hemû aliyekî ve nasnameya bajarên vê serdemê diyar kir. Bêguman bajarên nûjen di hemû navçeyên Ewropayê de di carekê de derneketin holê. Lewra her welat ji aliyê pêşketinê pîşesaziyê ve mîna hev nebûn. Şoreşa pîşesaziyê ji ber ku cara pêşî di dawîya nîveya duyem a sedsala XVyan de li Bîrîtanyayê rû da, bajarên nûjen jî pêşî li vir derketin meydanê û hêdî hêdî li hemû welatên Ewropayê belav bûn.⁶⁵

Yek ji taybetmendiyên girîng ên bajarên pêşîsaziyê hilberîn bû. Ji ber vê çendê, nifûsa bajaran bi awayekî berçav zêde bû. Di 1800î de ji sedî 90ê nifûsa Ewropayê li çolteran dijiyan, lê di salên 1900î de li welatekî mîna Bîrîtanyayê ku ji aliyê pîşesaziyê ve bi lez pêş diket ji çaran sisêyê nifûsê li bajar û bajarokan dijiyan, herwuha ji pêncan yekê Bîrîtanyayê jî li Londraya paytext dijiyan.⁶⁶

Bajarên nûjen cihên geşbûn û belavbûna fikir û zanyariyê bûn, lewra ev bajar, ji ber pêşketinê fikrî û pîşesaziyê ji bajarên serdema navîn zêdetir ji bo azadiya mirov zemîn rexsandin. Fikrên nû yên ku fereziyeyên berê dikirin armanc li van bajaran derketin û ev rewş bi belavbûna xwendewariyê re her ku çû hêzeke cewawerî wergirt.⁶⁷ Ew pêşketinê mîna çapxaneyê ku di dawîya serdema navîn de pêk hatin bi rastî jî di serdema nûjen de encamên baş derxistin holê û bi vî awayî konseptê berê ku bingeha xwe ji serdema bajarên antîk werdigirtin bi temamî guherî. Lewra ji mêj ve xwendin û zanyarî di bin tekel û abluqeya çînên serdest de bû, lê bi belavbûna çapxaneyê û bi çapkirina pirtûkan, li Ewropayê fikrên nû derketin holê, li ser paradîgmaya berê gengeşeyên xurt hatin kirin û di bin sîbera bajarên azad de gav bi gav şaristaniya nûjen a Rojavayî geş bû.

Li Ewropayê ji serdema navîn û vir ve gotina “Hewaya bajar mirov azad dike” (Stadtluft macht frei)⁶⁸ weku gotineke pêşiyar cihê xwe girtibû û ev gotin bûbû remza rizgarbûna ji fişarên salane yên civakî û siyasî. Bêguman di bajarên serdema navîn de, bajarê azad, dihat wateya çînên azad, ku çîna burjuvayê nûnertiya wê dikir, lê di bajarên

⁶⁵ Erkan, b.n., r. 50.

⁶⁶ Ponting, b.n., r. 627.

⁶⁷ J. M. Roberts, b.n., r. 452.

⁶⁸ R. J. Holton, b.n., r. 18.

serdema nûjen de azadî zêdetir dihat wateya azadiya takekes. Lewra di bajarên mezin ên pîşesaziyê de peywendiya di navbera kesên ku hev dinasîn vediguherî ser şeweyên giştî, xeleka azadiyên takekesan fireh dibû û di encama vê de bi karîgeriya van bajaran kesayetiya mirovan bihêztir dibû.⁶⁹ Di vê wateyê de eger lokomotîf û bikerê bajarên serdema navîn çîna burjuvaziyê be, bikerê bajarên pîşesaziyê jî takekes e. Lewra bi şikandina sîstema huquqî ya berê û bi damezirandina paradîgmayeke nû ya huquqî, nasnameya takekesiyê ji aliyê sîstema siyasî û desthilatê ve jî hat pesendkirin û di dirêjahiya sedsala XXan de li ser dabînkirina mafê takekes gelek guhertin û çaksazî hatin kirin. Nasnameya takekesî ya ku di pêvajoya şoreşa pîşesaziyê de geş bû, helbet xwe dispart wê hişmendiya nasnameya bajarvaniyê ku ji bajarên berê mîrate mabû. Lê di bajarên pêş şoreşa pîşesaziyê de hêz û otorîteya dewletê li ser civatê û li ser tak zal bû, lewra jî azadiyeke sînordar hebû. Li hember vê, di bajarên nûjen de tevgereke civakî ya bihêz derket holê û bi vê re jî li van deran weku encama pêvajoya bajarvaniyê nasnameya takekesî xurt bû.⁷⁰

Di bajarên nûjen de ji ber ku civat ji modela cemaatê derdiket û vediguherî ser modela civakî ya cemiyetê⁷¹ di şûna têkiliyên derece yek ên civata adetî de, têkiliyên derece du yên giştî, rûkêşî, demkî û parçe parçeyî destpê dikir, cihê hevkarî û piştgiriye reqabetê digirt.⁷² Loma jî mirovê nûjen ji hestên xwe zêdetir bi hişê xwe derdiket pêş⁷³ û di peywendiyên civakî de piştî xwe bi qanûnan ve girê dida. Bi vî awayî têkiliyên navbera mirovan sûreteke fermî girt û kontrola civakî ya li ser mirovan kêmbû. Dema giraniya hişmendiya hevbeş li ser hişmendiya takekes sivik bû, tak xwe li hemberî civatê azadtir û bihêztir dît û li hemberî bawerî û nirxên hevbeş, nirx û baweriyên takekesî derxist pêş.⁷⁴ Vê yekê jî rê li ber takekeskirina çandê vekir. Ji ber van hemû hokaran jî bajarên nûjen ji bajarên berê zêdetir rê li ber derketina bikerên edebî vekirin û di vê çarçoveyê de ji bo geşbûna edebiyatê bûn jîngeheke berhemdar. Ji ber vê jî hem nasnameya takekesî û azadiya ku edîb pêdigihand hem jî civat û mirovên curbicur ku jêdera îlhamên edîb bûn her du jî li bajarên nûjen peyda bûn.

⁶⁹ R. J. Holton, h.b., r. 39.

⁷⁰ Metin, g.n., r. 178.

⁷¹ Celalettin Çelik, *Şehirleşme ve Din*, Çizgi Kitabevi, Çapa Yekem, Konya, 2002, r. 37.

⁷² Çelik, h.b., r. 34.

⁷³ Don Martindale, *Pêşgotina Şehîra Max Weber*, b.n., r. 43.

⁷⁴ Çelik, b.n., r. 71.

2. PEYWENDIYA BAJAR Û DEWLETÊ

Di avakirina bajaran de piştî şoreşa cotyariyê hokara duyem xanedan û dewlet in. Lewra jî piştî peydakirina berhemên cotyariyê û niştecibûna li gund û bajaran, mirovan ji bo bidestxistina berhemên zêdetir pêwîstî bi çêkirina coyên avê dîtin. Ji bo kontrolkirin û asayîşa van coyên avê jî pêdivî bi rêvebiriyeke navendî hebû. Ji xwe bajar û dewlet jî li ser vê bingehe hatin avakirin⁷⁵ û dewlet di nava pêvajoyeke wuha de bi awayekî siruştî û ji ber pêdiviyên jiyanî gav bi gav pêk hat.

Li ser peywendiya bajar û dewletê, boçûna Îbnu Xeldûn ew e ku xanedan û dewlet berî bajar û bajarokan in, lewra ji bo damezirandina bajar û bajarokan hebûna mulk, xanedanî û dewletê şert e.⁷⁶ Li gorî wî çanda niştecibûna li bajaran (hedaret) ji ber xanedanan derdikeve û bêdabiran bi dewama xanedanan rehê xwe ber dide erdê.⁷⁷ Ji ber vî qasî temenê xanedan û dewletê dibe temenê bajar jî û bajar bi qasî xanedaniyê dijî. Eger temenê xanedaniyê kurt be û dawî li xanedaniyê bê, jiyanî wî bajarî jî radiweste, şaristanî (umran) paş dikeve û bajar kaviyê dibin. Ku temenê xanedaniyê dirêj, maweya wê berfireh be, li wir bînavber kargehen nû vedibin, gelek avahî tên lêkirin, qada ku çarşî û bazarê vedigire fireh dibe û digihîje heta cihên dûr.⁷⁸ Bi vî awayî Îbnu Xeldûn di navbera dewlet û bajaran de peywendiyê rasterast çê dike, loma jî bi dîtina wî tenê fermanrewayên bihêz dikarî bajarên mezin û abîdeyên gewre ava bikin.⁷⁹

Bêguman hemû lêkoler, li ser vê peywendiya rasterast a bajar û dewletê yek deng in. Eger em li ser gotina Îbnu Xeldûn bibêjin bajar berhemê xanedan û dewletan in, wê demê divê em dezgeh û saziyên hukumî û sîstema huquqî jî weku berhemên bajaran qebûl bikin. Lewra ew dewletên berayî bi saya bajaran rê û rêbazên nû yên fermanrewatiyê dahênan û di encama vê de jî temenê hukumraniya xwe dirêj kirin. Loma jî cara pêşî qiraliyet di nava bajar-dewletên sumerî de geşesendin û di encama vê pêvajoya bajarvaniyê de derketin holê.⁸⁰ Ji vê jî derdikeve holê ku peywendiya bajar û dewletê karîgeriyeke yek alî ya biker û berkar nîne beravajî karîgeriyeke du alî ya du bikerên kara ye. Ji bo vê jî Georges Duby dibêje, dewlet, bajar diafirîne, dewlet li ser bajar saz dibe.⁸¹

⁷⁵ Korkut Tuna, “Şehirlerin Serüveni”, *Hece*, j. 150/151/152, Ankara, 2009, r. 196 r. 17.

⁷⁶ İbn Haldun, b.n., c. 2, r. 811-812.

⁷⁷ İbn Haldun, h.b., c. 2, r. 861.

⁷⁸ İbn Haldun, h.b., c. 2, r. 812.

⁷⁹ İbn Haldun, h.b., c. 2, r. 814.

⁸⁰ Maisels, b.n., r. 255.

⁸¹ Duby, g.n., r. 155.

Dewlet û bajar ji aliyê hiyerarşiya çînen civaka bajarî ve jî xwedî rolên hevbeş bûn. Herçend komên civakî ji ber şoreşa cotyarî, bizava bazirganî û şoreşa pîşesaziyê derketibin û geş bûbin jî, rêxistina van çînen xwedî maf û îmtiyazên ciya ciya bi hunera dewletê mumkîn bû. Li bajarên berî şoreşa pîşesaziyê, xizmetkarên ku hatibûn kolekirin û komeke biçûk a giregiran bi hev re dijiyan. Helbet ev diyarde bi saya dewletê û taybetmendiyên siyasî yên bajaran mumkîn bû.⁸² Lewra prensîba “syonecism”ê ya ku ji ber nêzîkbûnê mirovan pevgirêdana du alî çê dikir, rê li ber bercestebûna rêvebiriya siyasî vekir. Rêvebiriya siyasî (hukumet) jî bi piştgirêdana nivîsê, di warê aborî û îdeolojîk de bi rêvebirina raya giştî û bi şarezakirina yekîneyên çekdar, dewlet derxist holê, loma jî teşeyê pêşî yê bajar di sûretê bajar-dewletê de derket holê.⁸³ Bi vî awayî hêja di destpêka avakirina komela bajarî de, çîn û komên cihê bi awayekî ku muhtacê hev bimînin hatin birêvebirin û perwerdekirin. Ji ber vê jî bajaran û dewletê di nava konsensuseke siruştî de birêxistinkirina van çînan girtin hustuyê xwe û bi vî awayî bingeha şaristaniyê pêkve danîn.

Bajar weku navenda rêvebirin, şaristanî û pêşketinê ji destpêka avabûna xwe heta niha ji bo mirovan bûne xala cazîbeyê û qada li hev kombûnê. Bêguman gelek sedemên vê diyardeyê hene û li gorî helûmercên serdeman, li van sedeman sedemên nû zêde bûne. Îbnu Xeldûn sedema niştêcîbûn û bajarvaniyê du tişt dizane. Yek; meyla rehetî û aramiyê, du; ji ber êrîşên neyar û dijminan parastina mulk û berjewendiyan.⁸⁴ Ev her du meylên mirovî jî tenê li bajaran û bi saya asayîş û ewlehiya dewletê mumkîn bû. Ji ber ku mulk û berjewendî bi saya dewletê dihatin parastin, hukumdarên dewletan li ser mulk û samanên bajaran dibûn hêza herî mezin û di encama vê de jî sîstema desthilatdariyê ya bajaran mirovên derûdor ber bi navendê ve radikêşandin. Ji ber vê jî kê xwestibe bibe hevbajarî, para xwe ji desthilatê bistîne û di dezgehên hukumî de kariyer bike, hewl daye xwe bigihîne navenda bajêr.⁸⁵ Di vê çarçoveyê de dewletê û bajaran hertim hev xwedî kirine û ji ber vê jî mirov bi hêsayî ji hev dernaxe kî ji kê çê bûye. Loma jî bi gotina Charles Keith Maisels, derebegên ku bajar û bajarokên wan nebin û bi karên gundîtiyê re mijûl bibin dikare bê nîşandan; lê dewletên ku bajar û bajarokên wan nebin kes nikare nîşan bide.⁸⁶

⁸² Duby, h.b., r. 158.

⁸³ Maisels, b.n., r. 255 .

⁸⁴ Îbn Haldun, b.n., c. 2, r. 812.

⁸⁵ Duby, g.n., r. 157.

⁸⁶ Maisels, b.n., r. 491.

Di dirêjahiya dîrokê de dewletê, hin bajarên diyarîkirî kirin bingeha xwe ya rêvebirinê û bi hêza xwe ya siyasî ew kirin cihê cazîbeya mirovên derûdor. Lewra bajar ji bo dewletê amûra rêxistinkirina civakê bû, ji ber wî jî ji destpêka bajarên pêşî heta îro bajar weku navendên rêvebiriye derketin holê. Di nava bajaran de jî bajarê navendî di nava sistemeke serweriyê de, cihê dabînkirina nîzama giştî û xala kombûna hêz û selahîyetan bûn.⁸⁷ Ji ber vê jî ev bajarên navendî bi saya van derfetan, li gorî navçeyên din bêtir pêş diketin. Ji bo vê, nimûneya herî baş Bexdad e, lewra berî dewleta Ebbasî Bexdad weku bajarek nedihat zanîn, lê piştî ku Ebbasiyan vî bajarî kir paytexta dewleta xwe, Bexdad ji gelek bajarên dêrîn ên cîhanê mezintir bû û pêş ket. Helbet ev mezinbûn tenê bi şêniyên bajêr ve sînorkirî nema. Bajar bû cihê kombûna fikrên îslamî, xirîstîyanî, helenîstîk, yahudî, zerduştî û hîndûyî. Bi saya van cure fikran di demeke kurt de di asta cîhanî de bû paytexteke rewşenbîrî û di serdema xelîfeyê efsanewî Harun Reşîd de gihîşt lutkeya dewlemendiya xwe. Ji ber vê jî di Çîrokên Hezar û Yek Şevê de bû serbajarê çîrokên Şehrazadê.⁸⁸

Li ser vê peywendiya bihêz a bajar û dewletê mirov dikare bibêje ku dewlet û xanedan ji mêj ve weku hêzên damezirîner ên bajaran di pêşvebirina bajaran û di peyda bûna çanda bajarvaniyê de roleke girîng gêrane. Ji ber vê karîgeriya wan jî di berhemên edebî yên bajarî de hukumdar hertim weku lehengên kara yên berhemên edebî derketine holê û hemû bûyer li dora kesayetîya wan hatiye hûnandin. Ji ber vê çendê seray weku bingeha rêvebiriya hukumdarên û hukumdar jî weku bihêztirîn zîlamê dewletê û bajaran bûne yek ji hêmayên girîng ên edebiyata bajarî.

⁸⁷ Duby, g.n., r. 155.

⁸⁸ J. M. Roberts, b.n., r. 146-147.

3. PEYWENDIYA BAJAR Û ŞARISTANIYÊ

Piştî şoreşa cotyariyê û derketina bajar-dewletan bajar bûn navenda serîhildana şaristaniyê. Ji xwe di zimanê gelek neteweyan de di navbera peyvên bajar û şaristaniyê de hevbeşiyên etîmolojîk û peywendiyên semantîk ên rasterast hene. Di zimanê erebî de “medeniyet” ji peyva “medîne”yê (bajar) hatiye darijtin. Di zimanên Rojava de peyva civilisation ku ji civitasê (bajar) hatiye darijtin şaristaniyê îfade dike. Di zimanê fransî de zaravên urbaîn (bajarî), urbanité (bajarvanî), civilité (kubarî), civilisation (şaristanî) jî nîşaneyên peywendiyê ne. Weku van zimanan di zimanê kurdî de jî heman peywendî xuya dibe. Di kurmanciya jêrîn de “şar” di şûna “bajar”a kurmanciya jorîn de tê bikaranîn û peyva “şaristanî” jî ji vê peyvê hatiye darijtin. Ji van peyvên jî derdikeve holê ku piraniya gel û neteweyên cîhanê, şaristaniyê berî her tiştî weku diyardeyeke bajarî dîtine⁸⁹ û ji ber vê yekê jî bi riya van peyvên peywendiyê destnîşan kirine.

Peydabûna şaristaniyê bi saya niştecîbûnê, bi derbasbûna civata cotyariyê û bihêzbûna rêvebiriyên bajaran mumkîn bû. Lewra civata nêçîrvan û berhevkar nikarîbû tiştekî li siruştê zêde bike, beravajî, tiştê ku li siruştê hebû berhev dikir; lê çandin û çînîn zêdekirin û hilberandin bû. Ji ber vê jî bidestxistina xorakên pêwîst mirov bi axê ve hatin girêdan. Bi vî awayî mirovan xanî lê kir û bajar damezirandin. Piştî damezirandina bajaran mirov hînî pêkve jiyanê bûn û bi saya vê, hêz û şiyana xwe ya veşartî derxistin holê. Lewra şaristaniya ku bi destê bajariyan hat holê di hundirê xwe de hesta gihîştina paşerojê dihewand.⁹⁰ Vê hest û endîşeya paşerojê jî xwe bi mîmarî, berhemên dînî, edebî, felsefî û zanistî nîşan dida ku şaristanî weku encama vê endîşeya zindîmayîna hertimî derket holê.

Bêguman ew şaristaniyên ku di deverên ciya ciya yên cîhanê de derketin, li ser bajaran geş bûn. Şaristaniya Mezopotamyayê, şaristaniya Misirê, şaristaniya Îndusê, şaristaniya Îranê û şaristaniyên din, li ser bajaran ava bûn ku ev deverên navborî jêderka bajarên pêşî yên dunyayê bûn. Ji xwe li herêmên navborî sedema diyarker a bihêzbûna şaristaniyê jî ev bajar bûn.⁹¹ Lewra hemû ew nîrxên madî û manewiyên ku şaristaniyê pêk dianîn li bajaran dihat afirandin. Weku unsûrên madî yên şaristaniyê; perestgehên dêrîn, dêr, mizgevt, seray, pir, peyker, kanî, hemam, şanogeh û tiştên mîna vana tev li bajaran dihatin çêkirin. Herwuha xwendin, perwerde, rêxistina dîn û rêxistinên dînî,

⁸⁹ Kılıçbay, b.n., r. 14.

⁹⁰ Korkut Tuna, g.n., r. 26.

⁹¹ R. J. Holton, b.n., r. 184.

hiyerarşiya civakî, rêvebirin, nivîs, edebiyat, zanist û huner jî li bajaran derketin holê. Ji ber vê jî mirov dikare bibêje ku bajar destpêka pêvajoya şaristaniyê ne û bingeha şaristaniyê jî bi bajarvaniyê re hatiye avêtin. Bi gotina Muhammet Nurdoğan dara şaristaniyê rehê xwe di bajêr de berdaye erdê, li asîmanê bajêr gulî û şaxên wê ber girtine û bi bayê zindîker ê bajêr re berê xwe pêşkêşî mirovahiyê kirine.⁹²

Bajar ji ber ku li beramberî gundan çanda bilind û şaristaniyê temsîl dikin hemû unwan û nasnavên baş ên mirovî, têkiliya wan bi bajar û şaristaniyê re hene, berevajî wê jî ew nav û dirb ên ku ji bo rewîştên nebaş ên mirovî tên gotin têkiliya wan bi gundîtî û koçeriyê re hene. Weku li jor jî amaje pê hat kirin di fransî de peyvên civilisation (şaristanî) û civilité (kubarî) ji yek bingeşî serçaviya xwe digirin, li beramber de; rus (çol), ructici (bedewî) di wateya çorsî û bêtozeyiyê de tên bikaranîn, loma jî ji van peyvên navborî peyvên mîna rustque (çolterî), rusticité (çorsîya zêde), rustre (çors) hatine darijtin. Herwuha di nav sîstema nîrxên serdema navîn de jî duberekiya courtoisie (serayvanî, kubarî) û vilainie (gundîtî, çorsî) dihat dîtin.⁹³ Di kurdî de jî “gundî” ji bo wesifdana bêfamî û çorsiya kesên nezan tê bikaranîn, lê “şareza”ya ku ji peyva “şar” hatiye darijtin ji bo kesên zana û pispor tê gotin. Ji ber vê ciyawaziya çandî jî, kesên bajarî hertim xwe ji kesên gundî bilindtir û hêjatir dîtine. Bo nimûne, li Fransayê zarava “gundî” ji bo nizimkirina mirovan dihat bikaranîn. Dîsan hem di serdema klasîk de hem jî di sedsala XIXan de zaravên ku derheqê nişteciyên çolteran de dihat bikaranîn mesumîyet û xêvîtiyê nîşan dida.⁹⁴ Ev têgihîştina bajariyan bêguman xwedî paşxaneyêke dîrokî bû. Lewra di dîroka dunyayê de qada rasteqîn a guherîn û pêşketina civakî bajar bûn.⁹⁵ Lewra bajar; paytext, navendên rêvebirinê, navendên dînî, cihên bazarê, depoya malên bazirganî, bender, molgehên leşkerî, cihên kombûna pîşesaziyê bûn, lê gund cihê jiyana eşîrî û begîtiya feodal bûn û gundî bi nêçîrvanî, ajeldarî û cotyariyê re mijûl dibûn.⁹⁶ Ji ber van sedeman jî jiyana bajarî ji bo pêşketina şaristaniyê ji jiyana gundîtiyê guncawtir bû, ji ber vê jî dahênana şaristaniyetê bû para mirovê bajarî.

Îbnu Xeldûn, bajar û umrana ku di encama jiyana bajarî de çê dibû bi rehetî, refah û dewlemendiyê wesif dike. Li gorî wî lêkirina avahiyên û avakirina bajaran, ji

⁹² Muhammet Nurdoğan, “Divan Şiirinde Şehir Kültürü”, *Hece*, j. 150/151/152, Ankara, 2009, r. 291.

⁹³ Le Goff, g.n., r. 177-178.

⁹⁴ R. J. Holton, b.n., r. 22.

⁹⁵ R. J. Holton, h.b., r. 183.

⁹⁶ R. J. Holton, h.b., r. 44.

encama temayulên hedarî (nişteciûbûn) derdiket holê⁹⁷ û di encama vê de jî di mal, cil û amanên mirovan de ciwankarî û zerafet çê dibû.⁹⁸ Îbnu Xeldûn ji vê asta jiyana bajarî re dibêje “umran” ku tê wateya peyrewkirina hemû cure pêdawîstiyên jiyana bajarî. Ji ber vê jî şaristaniya bajarî; jiyana baş, zewq, zanîn, axaftina xweş, zerafet, rehetî, ciwanî, mîmarî, huner, edebiyat û şanaziyê dibexşîne mirov. Ji ber vê jî ruhê mirov herî baş di bajaran de diruv digire û bajar dibe tabloya estetîzma ruhê mirov. Loma jî şaristanî peyveke mê ye û ji hêz û desthilata mêrane zêdetir ciwanî, paqijî û zerafeta jinane tine bîra mirov. Ji ber vê çendê di berhemên edebî de jin weku hêmayê şaristaniya bajarî derdikevin pêş û bi hêza xwe ya ciwankariyê dibin bikerên girîng ên edebiyata bajarî.

⁹⁷ İbn Haldun, b.n., c. 2, r. 811.

⁹⁸ İbn Haldun, h.b., c. 2, r. 842.

4. LI BAJARAN PEYDABÛNA NIVÎSÊ Û DESTPÊKA EDEBÎYATA NIVÎSKÎ

Li ser dîroka peydabûna nivîsê bîr û boçûnên ciyawaz hebin jî li gorî piraniya lêkolanan, yekem car nivîs li ser destê sumerîyan hatiye dahênan. Bi dîtina Jean Louis Huot çar hezar sal berî zayînê li Mezopotamyayê nivîs dihat zanîn,⁹⁹ lê di hin çavkaniyên din de tê gotin ku, nivîsên pêşî sê hezar û du sed sal berî zayînê di nava koma avahiya Eannayê de li ser hin rêze kevalan hatiye vedîtin.¹⁰⁰ Helbet siberoj ev dîrok li gorî xebatên erkeolojîk dibe ku biguhêre, lê tiştê ku naguhêre ev rastî ye ku nivîs yekem car di wan bajarên pêşî de peyda bû û peywendiya nivîsê bi awayekî rasterast bi bajaran re heye. Lewra bi gotina Walter J. Ong nivîsê gotin bi cih ve girê daye¹⁰¹ û bajar jî bûye qada herî berfireh a cihê girêdana gotinê.

Bajar, dewlet, şaristanî û nivîs çar unsûrên yekgirtî ne ku her yek ji bo yê din sedem û encameke siruştî ye. Li gorî Îbnu Xeldûn dema li bajaran ji aliyê civat, umran û kemalê ve pêşketinê çê bibe di meseleya nivîsê de jî pêşketinê çê dibe.¹⁰² Ji xwe nivîsên ku di Eannayê de hatine vedîtinê ve peywendiyê bi awayekî aşkera berçav dikin. Lewra naveroka van kevalan nîşan dide ku nivîs ji bo pêdiviyên rêvebirina civata bajarî, ku teşeyê hiyerarşîk girtibû, hatiye dahênan. Loma jî ji sedî 85ê kevalan derbarê tomarên aborî yên rêvebirina perestgehan û derbarê veguheştin û belavkirina malên bazirganî de ne, ewên mayî jî derbarê qiral, serok, qanûn, bajar, yekîneyên leşkerî û derbarê berpîrsên gîsin û ce de ne.¹⁰³

Di destpêka avakirina bajaran û damûdezgehkirina dewletê de pêdivî bi avahiyên dewletê, rêxistina xebatê, pîşesaziya pispor, bazirganî û veguheştinê hebû û ji bo birêvebirina van karên girift, jimêryarî û nivîs di vê dema krîtîk de hatin dahênan.¹⁰⁴ Ji ber vê jî mirov dikare bibêje ku nivîs di destê desthilatdarên bajaran de weku amûreke rêxistina karên dewletê hat bikaranîn û ji ber pêwîstiyên îdarî derket holê. Ji ber vê jî li bajaran li derûdora dezgehên desthilatdariyê gelek mirovên xwendewar peyda bûn û ev kes ji ber vê taybetmendiya xwe gihîştin pileyên bilind. Ew dokumentên ku li bajarên sumerî hatine vedîtin, vê diyardeyê bi awayekî aşkera nîşan dide. Lewra ew kesên ku

⁹⁹ Huot, "Sümer Kenti Bir Kent-Devleti", b.n., r. 71.

¹⁰⁰ Ponting, b.n., r. 91.

¹⁰¹ Walter J. Ong, *Sözlü ve Yazılı Kültür*, Wergêr: Sema Postacıoğlu Banon, Metis Yayınları, Çapa Pêncem, İstanbul, 2010, r. 20.

¹⁰² İbn Haldun, b.n., c. 2, r. 967.

¹⁰³ Ponting, b.n., r. 91.

¹⁰⁴ Huot, "İlk Kentlerin Doğuşu" b.n., r. 39.

kargêr û karbidestên hukumetê bûn yan kesên ku bazirgan yan jî kahîn bûn û bi saya xwendewariyê dikarîn bigihîjin wan postan.¹⁰⁵

Di serdema Babîliyan de piştî qiralan, kahîn û katib weku mirovên maqûl û xwedî hêz dihatin qebûlkirin.¹⁰⁶ Ji ber vê çendê mirovê xwendewar hem di nava civatê de hem jî di nezera dewletê de xwedî rêz û paye bûn. Bo nimûne, padîşahên çînî mamoste di ser mirovên re'îyeta xwe de digirtin. Mamoste dema diçûn huzura wan weku mirovên jirêzê mecbûrî xwe xwarkirin û berepaşkî çûyîne nebûn, heqê wan hebû ku bi rehetî rûbirûyê padîşah bibin û piştî xwe bidinê.¹⁰⁷ Herwuha di Misira berê de dayîk û bavan hêvî dikir ku zarokên wan di şûna wan karên ku derfetên wan sînordar bû, hînî nivîsê bibin û di nava burokasiya împaratoriye de weku kesên “bestik sipî” karê katibiyê bikin.¹⁰⁸ Di vê çarçoveyê de ev şîroveyan ku li ser du papîrusên Misirê hatine nivîsîn balkêş in:

“Bibe katib. Dê te ji xebatê rizgar bike, dê te ji her cure karkeriyê biparêze. Bibe katib. Dê mil û ranên te rast, destên te nerm bin. Tu yê cilên sipî li xwe bikî û bigerî, tu yê bi silavên ehlên serayê bêyî rûmetkirin.”¹⁰⁹

Hem li Mezopotamyayê hem jî li cihên din yekemîn armanca bikaranîna nivîsê birêvebirina karûbarên dewletê bû. Di van serdemên pêşî de bêguman mebesta nivîsê nûnertiya zimanekî nebû, belku ji bo tomarkirina zanyariyê û veguhestina wê bû. Ji ber vê çendê edebiyata nivîskî demeke dirêj derneket holê û dahênanên edebî yên zarekî ji nifşekî bo nifşeke dîtir bi awayekî devkî hat veguhestin.¹¹⁰ Bo nimûne, di nava kevalên ku li “Jemdet Nasr”ê hatine vedîtin tu deqeke edebî nîne; beravajî piraniya wan derbarê kesan, mal û mulk û rêvebiriya giştî ya herêmên zeviyan de ye.¹¹¹

Bêguman edebiyata nivîskî piştî peydakirina nivîsê û avakirina xwendingehan derket holê. Sumeriyên ku dahênerê nivîsê ne, di heman demê de dahênerên xwendingehan in jî. Ji ber vê, bingeha edebiyata nivîskî jî bi destê wan hat danîn. Loma jî di serdema sumeriyên de, di xwendingehan de digel xwendina zanistan xwendina

¹⁰⁵ Hewramî, b.n., r. 22.

¹⁰⁶ Ayşen Şatıroğlu-Oya Okan, “Çarşı: Şehrin Toplumsal Merkezi”, *Hece*, j. 150/151/152, Ankara, 2009, r. 130-131.

¹⁰⁷ Hewramî, b.n., r. 127.

¹⁰⁸ Don Martindale, b.n., r. 40.

¹⁰⁹ Ponting, b.n., r. 93.

¹¹⁰ Ponting, h.b., r. 88.

¹¹¹ Maisels, b.n., r. 312-313.

edebiyatê jî hebû¹¹² û di dersên xwe de cih didan mijarên edebî. Di xwendingehên sumerî de ev mijarên edebî dihat xwendin:

1. Jiberkirina efsane û destanên ku behsa şikomendiya xwedawendan û pehlewaniya sumeriyan dikirin
2. Li ser bajarên ku bi destê dijminan hatibûn dagîrkin û kavilkin xwendin û jiberkirina berhemên şîn û zariyê.
3. Xwendin û jiberkirina pend, gotinên pêşyan, raz û niyazên dînî û çîrokên ajelan.¹¹³

Piştî sumeriyan mîrateya wan derbasî akadî, babîlî û asûriyan bû û berhemên nivîskî her ku çû zêdetir bûn. Pirtûkxaneya Asûr Banîpal a ku ji 25 hezar kevalên ku bi nivîsên mîxî hatibû nivîsîn nîşaneyê vê yekê ye. Herwuha nîşaneyê herî bihêz a nivîsê ew bû ku di serdema asûriyan de xwedawendê nivîsê hebû. Împaratorê Asûrî Asûr Banîpal bi hêviya ku ji xirabiyên bê parastin, pirtûkxaneyekê pêşkêşî xwedawendê nivîsê Nabû dike. Bi vê mebestê xeber dişeyine Babîlê û wan kevalên ku ji sumerî, akadî û asûriyên berê mane dide kopîkirin û tîne Nînovayê. Li ser vê daxwazê bi dehan katib dest bi kar dikin û bi nivîsên mîxî, serpêhatiyên jiyana berê, rêûresim, dua û lawijan li ser kevalên ku ji heriyê hatine çêkirin dinivîsin û bi vî awayî bermayên sumerî û akadiyan di nava koleksiyoneke dewlemend de bo xwedawendê nivîsê Nabû pêşkêş dikin.¹¹⁴

Di bajar û xwendingehên yunanî de jî her du destanên navdar ên Homeros; Îlyada û Odiyesa dihat xwendin û bi mebesta mijarên helbest, xwendina xweş û jiberkirinê di bernameyên wan ên xwendingehan de cih digirtin.¹¹⁵ Heta Îlyadaya Homeros jî aliyê Andronicus ve bo zimanê Latînî hatibû wergerandin û ev kitêb di xwendingehên Romain de jî ketibûn nava bernameya xwendinê.¹¹⁶ Herwuha li Misirê jî nivîs û edebiyat xwedî pêgeheke xurt bûn. Di serayên firewnên Misirî de helbestvan hebûn û van helbestvanên fermî ji bo Firewn qasîde pêşkêş dikirin, di rojên girîng de helbest dihûnandin û di rêûresmên dînî de lawij digotin. Ji ber vê jî helbestên berê yên Misirî bi pesindana firewnan dagirtîne.¹¹⁷

¹¹² Hewramî, b.n., r. 23.

¹¹³ Hewramî, h.b., r. 24.

¹¹⁴ Taşdelen, g.n., r. 30-31.

¹¹⁵ Hewramî, b.n., r. 220-221.

¹¹⁶ Hewramî, b.n., r. 214.

¹¹⁷ Bedir, g.n., r. 263.

Nivîs piştî ku ji bo mebestên edebî hat bikaranîn, bû amûra herî girîng a veguhestina berhemên edebî. Bi vî awayî; xanedanan bajar, bajaran jî dewlet, şaristanî û nivîsê anîn holê û edebiyat li ser van bingeheên bihêz derket û bû zimanhalê vê peywendiya pir alî.

Di nava vê peywendiyê de di serdema bajarên antîk de weku yekemîn cureya edebî destan peyda bûn. Bêguman destana herî kevin a li ser rûyê erdê jî Gilgamêş bû. Ev destan, hem ji aliyê dîrokî ve hem jî ji aliyê naveroka xwe ve nimûneya herî baş e ji bo diyarkirina peywendiya bajar, dewlet, şaristanî û nivîsê. Lewra destan derbarê jiyana şahê Urukê Gilgamêş de ye û ji aliyê pîrê perestgeha bajarê Urê, Sînlikî Onînî ve hatiye tomarkirin.¹¹⁸

Di navenda bûyerên destanê de Uruk heye. Uruk di destanê de bi sûrên xwe yên asê, bi perestgehên xwedawendan, bi bazar û bi bendera xwe tê pesinandin. Zanyarên ku bûne sedema çekirina sûrên Urukê serpehatiyên xwe li ser kevîran dineqîşîn û haya wan ji bûyerên beriya tofanê jî heye. Uruk cihê komkirina genim û xwedîkirina ajelan e. Di rêgehên Urukê de Gilgamêşê xwedî koşk digel Enkîdo bi paytonê digere, xelkên bajêr cilên rengîn li xwe dikin, rûnên bi bêhn di xwe de didin. Di destanê de tevî keçikên sazband, behsa pîşekar û çêkerên çekan jî tê kirin.

Di destanê de bi pesn û minet behsa heft zanyarên nivîsê tê kirin, lewra ev zanyar bûne sedema çekirina sûrên Urukê û perestgeha Iyanayê. Pesindana van kesan nîşaneyê bihêzbûna kesên xwendewar û zîlamên dînî ye.

(Ew e, yê ku) her tişt dît (heta tixûbên) cîhanê./ (Ew e, yê ku) (her tişt) nas kir û ji her tiştî (sûd girt)/ (...) bi hev re (...)/ (Seydayê) pendeyariyê ye. Di her tiştî de (zanyar bû)/ Razine nehîni dîtî û tiştine veşartî diyar kirin./ Ê nûçeyîn, ji berî dema Tofanê ji me re anîn./ Bi rêwîtiyeke dirêj çû; westiya û tengav bû./ Hemû (bûyer û serhatiyên) rêwîtiyên xwe, li ser ferşekî kevirî neqîşandin./ Beden ji Oraka asê re bilind kirin./ Ê perestgeha Iyana ya pak, gencîneya pîrozîyê (ava kir)¹¹⁹

Di destanê de Uruk xwedî sûrên bihtîşam e, têde perestgehên Iyana, Ano û Înanayê hene, warê Gilgamêşê hêzdar e û herî zêde bi bazara xwe tê salixdan. Bêguman

¹¹⁸ Dastana Gilgamêş, r. 8.

¹¹⁹ Dastana Gilgamêş, r. 34.

ev her çar unsûr, taybetiyên bajarekî antîk in. Lewra sûr û bazar sembolên bajarvaniyê, perestgeh sembola dîn û xwendewariyê, Gilgamêş jî sembola desthilat û dewletê ye.

Temaşe bike! Dîwarê wê yê derve mîna sifir dîtîye/ Temaşe bike! Dîwarê wê yê hindir, bê mînak e./ Derîzaneyên wê bipelîne, ji mêj/ Xwe nêzik bike. Iyana mala Îştare ye./ Piştî wê kes nikare mîna wê ava bike, ne şahek, ne mirovek./ Derkeve ser bedena Oroka, li ser bigere./ Bingeha wê bipelîne. Li çêkirina qirmîdên wê temaşe bike./ Gelo kelpîçên wê ne ji qirmîdine biraştî ne?/ Ma ne her heft pendîyaran bingeha wê daniye?/ Yek şar bo bajêr e û şarek bo baxçeyan e û yek jî bo mêrgan e û yê mayî qadeke neçandî ye, (yan jî, bo avakirina) perestgehekê, ji Îştare re. /... Were! Ez ê te bibim Oroka asê./ Perestgeha pîroz; cîwarê Ano û Înana./ Cihê Gilgamêşê hêzdar, /... Were, ez ê bi destê te bigirim,/ (Te bibim) Oroka bi bazar,/ Cihê perestgeha pîroz, mala Ano. /... Bo Gilgamêş, şahê Oroka bi bazar,

120

Weku nîşana bajarvaniyê di Urukê de çînen ciyawaz hene. Aroro, Ano, Îştare, Iyana, Înana, Şemş, Inlîl, Iya, Domozi xwedawendan temsîl dike; Gilgamêş çîna rêvebir û Ninsûn jî zîlamên dînî temsîl dike. Ji bilî vê, di bajêr de xwediyê kar û pişeyên ciyawaz hene û behsa pişekar û çêkerên çekan tê kirin. Di destanê de rêgehên ku payton tê re derbas dibin, firehbûn û asêbûna bajêr jî ji nîşaneyên din ên bajarvaniya Urukê ne.

Gilgamêş Pişekar kom kirin,/ Û çêkerên çekan tev (civandin)/... Bi ava Ferêt destên xwe suştin./ Paytona xwe li riyên Oroka ajotin. /...Bila kalemêrên Oroka fireh û asê li ser te bigirîn,¹²¹

Di destanê de behsa ciyawaziya bajarvanî û rewendiyê jî tê kirin. Lewra gelek zanyarên bajaran, bajarvaniyê bi riya çolteriyê pênase kirine û weku du awayên jiyanê ên dijber berçav kirine. Di Destana Gilgamêşê de jî ev ciyawazî hatiye nîşandan. “Keça keyfxweşiyê” yan jî “Rahîbeya evînkâr”, ku karmendekî perestgehê ye, bajarvanî û şaristaniyê, Enkîdo jî çolterî û rewendiyê temsîl dike. Xwedawend ji ber sitemkariya Gilgamêş û bi mebesta cezakirina wî keçeke cazîbedar a perestgehê dişeyînî ser Enkîdoyê ku di nava ajalên hov de dijî, da ku Enkîdo bîne û weku reqîb derxe pêşberî Gilgamêş. Bi riya vê bûyerê, fêd û davên bajariyan û safîdiliya rewendan jî tê

¹²⁰ h.b., r. 34,39,45,47.

¹²¹ h.b., r. 70,79.

nîşandan. Lewra bajarvanî bername û aqilê pêşketî, çolterî jî bêserûberî û hestên însîyaqî temsîl dikin. Ji ber vê jî, keçika evînkari ji bo Enkîdo bi xwe re bibe bajêr cilên xwe ji xwe dike û pê re radize, bi vî awayî Enkîdo bi xwe ve girê dide û wî ji giyaneweran vediqetîne.

(Nêçîrvan got): Keça kêfxweşiyê! Ha va ye ew. Memikên xwe diyar bike./ Sînga xwe tazî bike bila berê te hilçine./ Şerm neke, germiya wî rakişîne xwe./ Ku te bibîne ew ê xwe bavêje ser te./ Kirasê xwe dîne, bila bikeve ser te./ (Wî) mirovê hov fêrî şevnivîna jinê bike/ Hingê canewerên çolê, yên ku pê re xwedî bûne, dê jê birevin./ Jina perestgehê axivî û got:/ Înkîdo pendeyarî, mîna xwedayan î tu!/ Çima tu bi canewerên bejî re, li çolan diçêrî?/ Were! Ez ê te bibim Oroka asê./ Perestgeha pîroz; cîwarê Ano û Înana./ Cihê Gilgamêşê hêzdar,¹²²

Keça evînkari ji bo Enkîdo îqna bike, behsa cazîbeya jiyana bajêr dike. Ji van gotinên keçika evînkari derdikeve ku Uruk di wê demê de gihîştîye asta refaheke zêde. Lewra ew elametên ku Îbnu Xeldûn weku lutkeya umrana bajêr û sedemên têkçûna wê destnîşan dike di Urukê de tên dîtin. Her rojên Urukê mîna cejnê derbas dibin, xelkê bajêr xwe bi cilên cejnan dixemilînin, tevî keçên evînfiroz lawên nêremê jî li bajêr peyda dibin.

Înkîdo! Here Oroka asê./ Xelk (li wir) bi cilên cejnan berdewam xwe dixemilînin./ Û her rojek ji rojên wan cejn e./ Lawên nêremê dilgeş (lê) digerin/ Û keçên evînfiroz ên pîroz bi şeweyên dilrevînî dileyîzin./ Tijî xweşî û dilbijîn in. Bêxem in, dilodîn in./ Giregirên mirovan bi şevê dikişînin nivînên xwe./ (Erê) Înkîdo, dilgeşê jiyanê!/ Ez ê Gilgamêş, mêrê kêfxweşiyê şanî te bikim.¹²³

Di dawiyê de keçika evînkari bi ser dikeve û Enkîdoyê hov bi cazîbeya xwe kedî dike.

Înkîdo beranberî jinê rûniştî bû./ (Her duyan) kiryariya şevnivînê dikirin./ Înkîdo cihê ku lê çêbûbû ji bîr kir./ Şeş roj û heft şevan./ Înkîdo berê xwe dabû (jinê)/ Bi jinê re radiket./

¹²² h.b., r. 38-39.

¹²³ h.b., r. 40.

Rehbika evînê devê xwe vekir./ Û ji Înkîdo re got:/ Înkîdo! Ez li te dinêrim, weku xwedayekî ez te dibînim./ Çima tu bi caneweran re,/ Li çolan sergeşt digêrî?/ Were, ez ê bi destê te bigirim./ (Te bibim) Oroka bi bazar,/ Cihê perestgeha pîroz, mala Ano.¹²⁴

Keçika evînkîr Enkîdoyê hov hînî şaristaniya bajêr dike, wî hînî nanxwarin û meyvexwarinê dike, cil lê dike û rûnê bêhn xweş têde dide. Bi vî awayî Enkîdo dike şiklê mirovên bajarî.

Şîrê canewerên kûvî,/ Rahatibû ku bimije./ Nan li ber wî danî./ Kete hev, l ênêrî,/ Û lê (kûr) temaşe kir/ Înkîdo çi tişkî nizane,/ Derbarê xwarina nêr,/ Û vexwarina meya giran,/ Ew fêrî tişteki nebûye./ Rehbika evînê devê xwe vekir,/ Ji Înkîdo re got:/ Înkîdo! Nanî bixwe!/ Bingeha jiyanê ye,/ Û meya giran binoşe, ew rewîştî zayînê ye/ Înkîdo nan xwar,/ Ta ku têr bû,/ Û ji meya giran,/ Heft piyal vexwarin./ Canê wî mest û kêfxweş bû./ Dilê wî geş bû./ Û ruyê wî vebû,/ (...) don kir,/ Laşê xwe yê bi pirç./ Rûn di xwe da./ Bû mirovek./ (Jinê) kirasê xwe kir du parçe,/ Parçeyek lê kir,/ Û parçeyê dî,/ Li bejna xwe kir./ Bi destê wî girt,/ Û wekî dayîkekê bi xwe re bir,¹²⁵

Ji van nimûneyên nava Destana Gilgamêşê derdikeve ku edebiyata nivîskî berhemê şaristaniya bajaran e û di encama avabûna bajaran, xwe rêxistinkirina dewletê û geşbûna şaristaniyê de ketiye rojeva mirovan. Ji aliyê din ve Destana Gilgamêşê weku neynikeke ron hemû taybetmendiyên bajarên antîk berçav dike û ji bo selmendina şaristaniya wan demên tarî ji mirovên îro dibe dûrbîneke rasteqîne. Bi vî awayî berhemên edebiyata nivîskî hem berhemên bajaran in hem jî domdarê nav û deng û şaristaniya wan in. Ji lewra jî ku nivîs û edebiyata nivîskî nebûna me yê derheqê wan şaristaniyên berê de ev qas tişt nezaniya.

¹²⁴ h.b., r. 44.

¹²⁵ h.b., r. 45.

5. DI NAVA KURDAN DE BAJARVANÎ Û DESTPÊKA EDEBIYATA BAJARÎ

Welatê kurdan yan jî herêma ku îro kurd lê dijîn yek ji navendên girîng ên serîhildana şaristanî û pêşketinên mirovî ye. Lewra destpêka derketina mirov li Kurdistanê dora milyonek sal berê bûye.¹²⁶ Mirovên niyandertal ên ku li şikefta Şaneder a ser bi parêzgeha Hewlêrê hatine vedîtin û dîroka wan digihîje 35.000-100.000 sal berê, nîşaneya herî bihêz a vê rastiye ye. Herwuha cihê Berdebelk a nêzîkî Çemçemalê kevintirîn navçeya berdînî tê qebûlkirin. Li şikeftên Zirzî û Hezarmêrdê jî ku li ser parêzgeha Silêmaniyê ne, şûnewarên qonaxa duyem a çaxa berê ya berdînî hatiye vedîtin.¹²⁷ Herwuha bermayên bizin, mêşin, se û berazên ku cara pêşî hatine kedîkirin di sê deverên arkeolojîk ên Kurdistanê de hatine vedîtin. Ev bermayî, li Çayönüya Diyarbekirê û li Ganj Daraya Kirmanşahê digihîje heta 10.000 sal berê, li Jarmoya Silêmaniyê jî diçe heta 8000 sal berê.¹²⁸ Herwuha ew pêşhatên ku bûn sedema şoreşa cotyariyê jî li navenda welatê kurdan li Zagrosê rû dan. Lewra weku di destpêkê de jî hate gotin kevana çiyayên Zagrosan cihê kedîkirina ajal û tovên çandiniyê bû û ew sumeriyên ku danerên bajar, şaristanî û nivîsê bûn, ji vê heremê ber bi başûr ve çûn.

Li gorî Mehrdad Izady jî bingeha şaristaniyê li Kurdistanê hatiye avêtin, lewra li gorî wî gelek tiştên ku 5000 sal berî zayînê li deştên Mezopotamyayê li ser navê şaristaniyê hatin bidestxistin 7000 sal berî wî di sînorên çiya û geliyên Kurdistanê de dest pê kiriye. Gelek delîlên arkeolojîk, zeolojîk û botanîk ên ku rola serekî ya Kurdistanê di geşbûna şaristaniyê de nîşan didin hene.¹²⁹ Ji bo selmandina vê, Izady çend nimûne dide û dibêje li Çayönüyê aman û hacetên madenî yên 5000 sal berî zayînê hatine dîtin. Li Ganj Darayê 3500 sal berî zayînê amanên bicam derketine holê. Herwuha li Çayönüyê cil û qumaşên 9000 salî hatine dîtin.¹³⁰ Li gorî wî, bingeha civata bajarî jî cara pêşî li vê heremê hatiye avêtin. Herêmên mîna Çayönü, Oylum Höyük, Tîtrîş, Jarmo, Tapa Gewre, Ganj Dara û Giyanê digel Erîha û Yahudiyyeyê li ser rûyê dunyayê yekemîn civatên bajarî qebûl dike. Herçend ev bajar bi nifûsa xwe ya dora 1000-1500 kesî zêde mezin nebin jî li gorî wî, di vê serdemê de li deverên din ên

¹²⁶ Mehemed Mehmûd Mendelawî, *Mêjûy Şaristanîyetî Kurd*, Wergêr: Mehemed Wesman, Hewlêr, 2009, r. 90.

¹²⁷ Mendelawî, h.b., r. 92-93.

¹²⁸ Mehrdad R. Izady, *Kürtler*, Wergêr: Cemal Atila, Doz Yayınları, İstanbul, 2004, r. 64.

¹²⁹ Izady, h.b., r. 63.

¹³⁰ Izady, h.b., r. 64-65.

dunyayê jiyan di şikeftan de dewam dikir, loma jî nifûsa van bajaran kêr be jî li gorî dema xwe gelek pêşketî ne.

Ji ber ku bajarokên pêşî li vê herêmê derketin holê, 8000 sal berî zayînê têkiliyên civatê jî têkel dibe, bazirganî pêş dikeve û pêdivî bi tomarkirina karûbarên bazirganî çê dibe. Ev tomar li Kurdistanê pêşî bi sîkeyên gil ku her şêweyekê nûnertiya beşeke bazirganiyê dikir derdikeve holê û teqîben 7500 sal berê bi îşaretan hatibûn nexşekin. Bi vî awayî, şêweyê herî berayî yê nivîsê jî li Kurdistanê dest pê dike.¹³¹

Digel vê destpêka girîng jî, bajarên mezin, dewlet û şaristaniya ku şopên bihêztir li dû xwe hiştin li devereke cîran, li başûrê Mezopotamyayê serî hilda. Mehrdad Izady vê diyardeyê bi mercên coxrafyaya vê herêmê ve girê dide. Lewra li kevana çiyayên Zagrosan ji ber berhemdariya siruştî ya axê û hêsbûna parastina deverên çiyayî, pêwîstî bi pêşvebirina burokrasiyê û mezinkirina artêşê nedihat dîtin, loma jî rêvebiriyên xwecihî biçûk û berpirsiyariyên wan jî sînordar bûn. Li hemberî vê, li deştên leweyî yên Mezopotamyayê pêdiviya rêvebirina çavkaniyên sînordar û bergirîkirina herêma bêparastin, rê li ber rêxistina burokratîk a mezin û komkirina hêzeke leşkerî ya xurt vekir. Bi mezinbûna rêvebiriyên re, bajar jî mezin bûn. Bajarên sumerî û akadiyên mîna Erîdû, Nîppor, Ur û Urukê ên li Mezopotamyayê, teqîben deh car ji bajarên Kurdistanê qelebalixtir bûn. Ev bajar xwedî 10 000-15000 şêniyan bûn û sistemeke wan a bihêz a bergiriyê hebû.¹³² Ji ber vê çendê gelek lêkolanan bajarên pêşî yên cîhanê bajarên sumerî qebûl kirine.

Weku berê jî amaje pê hat kirin bajar, şaristanî û edebiyat li ser hebûna xanedan û dewletan derdiketin holê û geşedisendin. Herçend ji ber taybetmendiya herêma ku kurd lê dijîn di navbera wan de dabiran hebe jî, ji serdemên antîk heta dawîya serdema navîn gelek xanedan û dewletên kurdan derketine holê û di pêşvebirina şaristaniya vê herêmê de rola xwe dîtin. Mehmed Emîn Zekî Beg wan dewlet û qewmên ku li herêma Zagrosê jiyane weku kurd qebûl dike û dibêje peywendîya ereban bi akadî, ya tirkên bi hûnan re çî be peywendîya kurdan jî bi wan qewm û dewletan re tiştekî wuha ye¹³³ Piştî vê tespîtê, wan dewletan wuha rêz dike: 1. Dewleta Lullu, 2. Dewleta Gutî, 3. Dewleta Kasayî, 4. Dewleta Mîtanî, 5. Dewleta Subarî, 6. Dewleta Nayîrî, 7. Dewleta Medyayê. Li gorî Izady jî di serdema antîk de kurdan dewletên Hurî ku ji çendîn bajar dewletan

¹³¹ Izady, h.b., r. 65-66.

¹³² Izady, h.b., r. 66.

¹³³ Mehmed Emîn Zekî Beg, *Dîroka Kurd û Kurdistan*, Wergêr: Ziya Avci, Avesta, Çapa Yekem, Stenbol, 2002, r. 285.

pêk dihat, Împaratoriya Mîtanî û Împaratoriya Medî damezirandibû. Di serdema klasîk de jî kurd di nava Împaratoriya Axemeniya pers de xwedî qiraliyetên xweser bûn. Piştî Axemeniyan serdema partan de jî weku federasyon di nava vê dewleta Îranî de cih girtin, lê di serdema Sasaniyan de ev qiraltiyên kurdan ji nav çûn.¹³⁴

Mehmed Emîn Zekî Beg dewletên kurdan ên piştî îslamê jî wuha rêz dike: 1. Dewleta Salariyye li Azerbaycanê, 2. Dewleta Rewadî, 3. Dewleta Dostkî û Merwanî, 4. Dewleta Berzikan (Hesnewiyye), 5. Dewleta Eyyûbî. Dîsa Zekî Beg ji bilî van dewletan hin hukûmetên kurdî jî wuha rêz dike: 1. Hukûmeta Zend, 2. Hukûmeta Atabegên Lora Mezin (Fedlewî), 3. Hukûmeta Lora Biçûk, 4. Hukûmeta Benîerdelan, Hukûmet û Mîrektiya Biraxwoyî, 5. Hukûmeta Şeddadî, 6. Hukûmeta Melik Kurd. Piştî van hukûmetan Mehmed Emîn Zekî Beg navê 38 mîrektiyên kurd dijmêre: Mîrektiya Cizîrê, Mîrektiya Hîzanê, Mîrektiya Şêrwanê, Mîrektiya Bedlîsê, Mîrektiya Sasonê, Mîrektiya Siwêdî, Mîrektiya Pazûkî, Mîrektiya Mîrdesî, Mîrektiya Çemîşgezêkê, Mîrektiya Hesenkêfê, Mîrektiya Silêmaniyê, Mîrektiya Zerakî, Mîrektiya Mehmûdî, Mîrektiya Pinyanîş, Mîrektiya Dunbilî, Mîrektiya Biradostê, Mîrektiya Somayî, Mîrektiya Tergeverê, Mîrektiya Mukriyê, Mîrektiya Estunê, Mîrektiya Dasniyê, Mîrektiya Soran, Mîrektiya Paşayê Kor, Mîrektiya Baban, Mîrektiya Baneyê, Mîrektiya Gelbaxî, Mîrektiya Kelhûrê, Mîrektiya Bîn Ennanî ya Hîlwanê, Mîrektiya Dertengê, Mîrektiya Mahîdeştê, Mîrektiya Siyahmensûrê, Mîrektiya Çengiyê, Mîrektiya Zengene, Mîrektiya Şiwankarê, Mîrektiya Xoresanê.¹³⁵

Şerefxan Bedlîsî weku mîr û dîroknasekî kurd di Şerefnameya xwe ya ku di 1597an de nivîsiye xanedanên kurdan ên piştî hatina îslamê di çar sefheyên de destnîşan dike. Xanedanên sefheya yekem weku fermanrewayên serbixwe bi nav dike û vana di bin pênc beşan de diyar dike. Beşa yekem: Fermanrewayên Diyarbekir û Cezîrê, Beşa duyem: Fermanrewayên Dînewer û Şehrezorê (Hesnewiyye), Beşa sêyem: Fermanrewayên Lora Mezin (Fedlewî), Beşa çarem: Fermanrewayên Lora Biçûk, Beşa pêncem: Sultanên Misir û Şamê (Eyyûbî). Xanedanên sefheya duyem weku fermanrewayên nîv-serbixwe bi nav dike ku hinek ji wan li ser navê xwe sîke lêdane û xutbe dane xwendin. Ev jî pênc beş in. Beşa yekem: Fermanrewayên Erdelanê, Beşa duyem: Fermanrewayên Hekkariyê, Beşa sêyem: Fermanrewayên Îmadiyyeyê (Bahdînan), Beşa çarem: Fermanrewayên Cezîrê (Boxto), Beşa pêncem:

¹³⁴ Izady, b.n., r. 70-96.

¹³⁵ bnr.: Zekî Beg, b.n., c. 2.

Fermanrewayên Hesenkeyfê. Xanedanên sefheya sêyem weku mîr û beg bi nav dike û vana di bin navê qism, beş û şaxan de diyar dike ku bi tevahî 47 mîr û beg in. Di sefheya çarem de jî nivîskar tenê behsa Fermanrewayên Bedlîsê dike.¹³⁶

Li gorî Evliya Çelebî jî dewletên ku kurdan damezrandine ev in: Dewleta Xanedana Eyyûbiyan bîn Şadul Kurdî¹³⁷, Dewleta Ekradiyan li Misirê,¹³⁸ Dewleta Xanedana Eyyûbiyan, Dewleta Xanedana Merwan, Dewleta Xanedana Benî Mîrdas el Kîlabî, Dewleta Xanedana Benî Esed, Dewleta Xanedana Benî Hemedan,¹³⁹ Dewletên Xanedana Ebbasîyan ên Ekrad. Ev jî di nava xwe de duwazde beş in: Beşa pêşîn: Hakimê Cizîrê, Beşa duyem: Seyîd Xan, Beşa sêyem: Hakimê Soran, Beşa çarem: Hakimê Erdalanê, Beşa pêncem: Hakimê Herîrê, Beşa Şeşan: Hakimê Pinyanîşê, Beşa heftem: Hakimê Mehmûdî, Beşa heştem: Hakimê Hekariyê, Beşa nehem: Hakimê Hîzanê, Beşa dehem: Hakimê Bedlîsê, Beşa yanzdehem: Hakimê Hezzoyê, Beşa duwanzdehem: Hakimê Paloyê¹⁴⁰

Evliya Çelebî destpêka ziman û bajarvaniya kurdan jî vedigerîne serdema piştî Tofana Nûh pêxember û wuha dibêje:

Li gorî qewlê dirokna Miqdîsî piştî tofana Nûh, bajarê Cûdî hatiye avakirin, piştî wî jî Sîncar û Kelaha Meyafarqînê hatine avakirin. Xwediyê bajarê Cûdiyê ji umeta Hezretî Nûh Melîk Kurdîm e, şeşsed sal jiyaye û li welatê Kurdistanê geriyaye, paşê hatiye Meyafarqînê, ji ber ku ji av û hewayê vir hez kiriye li vir bi cih bûye. Zarok û nesla wî gelek zêde bûye û ji zimanê îbranî ciyatir zimanekî serbixwe peyda kiriye, ku ev ziman ne îbranî ye, ne erebî ye, ne farisî ye ne derî ye, ne jî pehlevî ye, jê re dibêjin zimanê kurdîm. Li vî welatê Meyafarqînê peyda bûye û hîna jî zimanê kurdî yê ku li Kurdistanê tê bikaranîn ji ummeta Hezretî Nûh Melîk Kurdîm maye.¹⁴¹

Herçend welatê kurdan ji mêj ve weku navenda damezirandina şaristaniyê xwedî roleke giring bû û bavûkalên kurdan gelek dewlet, hukumet û mîrektî ava kirin jî, weku li jor amaje pê hat kirin, ji ber taybetmendiya coxrafiya Kurdistanê civata vê herêmê derfeta derbasbûna qonaxê pêşketîtir a şaristaniyê bi dest nexist. Herwuha ji ber cihê

¹³⁶ Şerefxanê Bedlîsî, *Şerefname*, Wergêr: Ziya Avci, Avesta, Çapa Duyem, Stenbol, 2007 r. 93-97.

¹³⁷ Evliya Çelebi, *Seyahatname*, Amadekar: Robert Dankoff, Seyit Ali Kahraman, Yücel Dalı, Yapı Kredi Yayınları, c. 10, r. 31.

¹³⁸ Çelebi, h.b., c. 10, r. 32.

¹³⁹ Çelebi, h.b., c. 10, r. 33.

¹⁴⁰ Çelebi, h.b., c. 10, r. 37.

¹⁴¹ Çelebi, h.b., c. 4, r. 55.

stratejîk ê vê herêmê, Kurdistan hertim di nava dewletên mezin de bû qada şer û aloziyan. Di encama vê neseqamgîriyê de jî şaristaniya vira nekarî di nava asayîşê de pêş bikeve û civata nişteci ya kurdî gelek caran mecbûrî jiyana koçerî û eşîriyê bû.¹⁴² Ji ber vê jî gelek bajarên navendî yên kurdan di nava pêvajoya dîrokê de kavil bûn û şaristaniya kurdan hat talankirin. Bo nimûne, bajarên girîng ên mîna Şarezor, Sîsar, Hulwan, Dînewer, Suhrewerd û Ebher di encama van şer û dagîrkeriyan de ji nav çûn.¹⁴³ Ji ber vê çendê jî di dewletên Şeddadî, Hesenweyhî, Merwanî û Annazîdî¹⁴⁴ yên ku di navbera sedsalên dehemîn û duwazdehemîn de hatin damezirandin tu berhemeke kurdî negihîşt îro. Lewra di sedsala duwazdehemîn de êrişên tirkên bajarvaniya kurdan rawestand û piştî ku aboriya kurdî veguherî ser aboriyeke koçeriyê¹⁴⁵ kurd ji bajaran vekîşîyan û xwe li gund û zozanan girtin. Ji ber vê çendê jî Izady dibêje di navenda bajarên Kurdistana bakur û rojava de tirk û ermenî, li Kurdistana navîn ji Amediyê heta Hewlêrê, ji Kerkûkê heta Kifriyê û Pirdê tirkmen û asûrî, li Kurdistana başur û rojhilat jî fars û yahûdî li bajaran serdest bûn û kurd jî zêdetir li gundan nişteci bûn.¹⁴⁶ Ev diyardeya civakî jî bû sedema lawazbûna şaristaniya kurdan û derengmayîna edebiyata nivîskî ya kurdî.

Di vê çarçoveyê de cengên ku karesatên mezin bi xwe re anîn tevî berhemên ser rûyê erdê pergala civatê jî belawela kirin û bi vî awayî li vê herêmê rê li ber azmûneke temendirêj a mirovî û şaristanî hate girtin. Ji ber van astengan, rêvebiriyên kurdan yan piştî temenekî kurt hilweşîyan yan jî bi awayekî sînordar di bin sîbera rêvebiriyêke mezintir de bi çendîn qeyd û bendan girêdayî dirêje bi jiyana xwe dan. Loma jî mîrekên kurdan di destpêka şoreşa pîşesaziyê de û bi avakirina dewletên neteweyî di nava her du dewletên Osmanî û Îranê de mafê xwe rêvebirinê ji dest dan û ketin bin hukmên siyasî yên van dewletên neteweyî. Di vê serdemê de dema ku dewletên neteweyî bajarên mezin ava dikir û damûdezgehên rewşenbîriyê dadimezirand, bajarên kurdan ji ber bêxwedîtiyê vediguherîn qezayên biçûk, nifûsa wan kêm dibû û di warê aborî û xwendinê de jî ji berê qelstir û lawaztir dibûn. Digel vê yekê jî di serdema mîrekiyên kurdan de li bajarên ku navenda wan mîrekan bû, edebiyateke bajarî ya kurdan çêbû û

¹⁴² E. İ. Vasilyeva, “Osmanlı İmparatorluğunun ve İran’ın Yapısı İçinde Kürtler”, *Kürdistan Tarihi*, Avesta, Çapa Sêyem, İstanbul, 2010, r. 102.

¹⁴³ E. İ. Vasilyeva, “Arap ve Türk-Moğol Fetihleri Devrinde Kürdistan”, *Kürdistan Tarihi*, Avesta, Çapa Sêyem, İstanbul, 2010, r. 34-35.

¹⁴⁴ Amir Hassanpour, *Kürdistan’da Milliyetçilik ve Dil*, Avesta Yayınları, İstanbul, 1997, r. 122.

¹⁴⁵ Mehrdad R. Izady, *Kürtler*, Wergêr: Cemal Atila, Doz Yayınları, Çapa Sêyem, İstanbul, 2004, r. 231, 310.

¹⁴⁶ Izady, h.b., r. 232.

ev edebiyat di hinek berheman de gihîşte asteke baş. Lewra ew helbestvan û edîbên pêşî yên kurdî ji van bajaran derketin û ji aliyê van mîrekên kurdan ve hatin parastin.

Li gorî Maruf Xeznedar di edebiyata kurdî de Zembîlfiroş yekemîn berhema edebî ya bajarî ye. Bi dîtina wî, edebiyata bajarî di nava ereban de di sedsala dehan de, di edebiyata farisî de di sedsala yanzdehan de, li Ewropayê di sedsala sêzdehan de û di nava kurdan de jî bi Zembîlfiroşa Feqiyê Teyran di sedsala huvdehan de dest pê kiriye.¹⁴⁷ Lê divê em ji bîr nekin ku Zembîlfiroş çîrokeke evînî ya gelêrî bû û ev çîrok berî Feqiyê Teyran jî di nava kurdan de dihat zanîn, loma jî dîroka vê çîrokê vedigere serdemên kevintir.

Li gorî hin zanyariyên li ber dest in, wuha tê pêşbînîkirin ku çîroka Zembîlfiroşê di serdema Merwaniyan de li Farqînê derketiye holê. Lewra birca Zembîlfiroş a li Farqînê ku heta îro jî li ser piyan maye nîşaneyê herî bihêz a vê rastiye ye. Ji bilî vê li Farqînê “Mala Mîran” a ku ji binemaleya mîrên Merwaniyan tîn heta îro jî ji behsa çîroka Zembîlfiroşê dilgiran dibin û reftarên jina Mîr a ku di çîrokê de tê behskirin li hemberî namûsa xwe weku ziman dirêjî qebûl dikin. Ev jî nîşan dide ku bi awayekî devkî be jî edebiyata bajarî ya kurdî diçe heta sedsala deh û yanzdehan. Ji xwe Wesfî Hesên Ridênî jî xwe dispêre pirtûka *Ed Dewletul Dostekiyeya Ebdulreqîb Yusif* û dibêje serhatiya Zembîlfiroş di sala 994ê zayînî de di serdema Dewleta Merwanî de li Farqînê rû daye. Herwuha kela Zembîlfiroşê jî weku parçeyeke ji qesreke mezin ji aliyê mîrên Dewleta Merwaniyan ve hatiye avakirin.¹⁴⁸

Li gorî zanyariyên jorîn mirov dikare bibêje ku Farqîn yekemîn bajar e ku di edebiyata kurdî de ji bo çîrokeke edebî bûye cih û war. Helbet ev ji ber hin taybetmendiyên bajarî yên Farqînê bû ku edebiyateke bajarî li ser wan bingehan ava dibû. Lewra Farqîn paytexta dewleta Merwaniyan bû û di vê serdemê de ji aliyê bajarvaniyê ve gihîştibû lutkeyê. Li gorî Îbnul Ezraq, di serdema Merwaniyan de li Meyafarqînê di nava bajêr de coyên avê, kanî û kenîfe hatibû çêkirin.¹⁴⁹ Di serdema Nesruddewle de li bajêr nexweşxaneyek û¹⁵⁰ li nêzîkê navenda bajêr Nasiriye hatibûn avakirin ku di navê wê de koşk, çarşî, mal, hemam û baxçeyên xweş hebûn.¹⁵¹ Herwuha

¹⁴⁷ Maruf Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Dezgay Çap û Bellawkirawey Aras, Çapî Duwem, Hewlêr, 2010, c. 2, r. 229.

¹⁴⁸ Wesfî Hesên Ridênî, *Beyta Zembîlfiroş Dîrok-Wargeh-Çend Deq*, Çapxaney Hecî Haşim, Çapa Yekem, Hewlêr, 2008, r. 15-16.

¹⁴⁹ Îbnul Ezraq, *Mervani Kürtleri*, Wergêr: M. Emin Bozarslan, Koral Yayınları, İstanbul, 1990, r. 156.

¹⁵⁰ Îbnul Ezraq, h.b., r. 127.

¹⁵¹ Îbnul Ezraq, h.b., r. 141.

Nesruddewle li teniştê birca hukumdariyê serayekê ava dike, ji Kaniya Mezin avê dikêşe nava serayê û bi vê avê di nava serayê de hemam û hewz dide çêkirin.¹⁵² Refaha dewletê ew çend zêde dibe ku di bazarê de bihayê şitumekan dikeve û xelkê bajêr dibin xwedî serwet. Ji ber vê dewlemendiya bajêr û seraya Merwaniyan helbestvan, alim û zahid berê xwe didin seraya Nesruddewle û li dora seraya wî kom dibin.¹⁵³

Li gorî Îbnul Ezraq di seraya Nesrudewle de 360 cariyeyên bijarte, dengbêj, reqase û hunermendên curbicur ku di serayên sultanên din de nedihat dîtin hebûn.¹⁵⁴ Li gorî Îbnul Esîr jî di seraya Nesruddewle Ehmed Îbnu Merwan el Kurdî de cariyeyên dengbêj hebûn. Hinek ji wan bi pênc hezar dînarî, hinekên din jî bi pereyên zêdetir hatibûn kirîn. Qerwaş ne têde pênc sed cariyê û pênc sed xizmetkarên wî hebûn. Eşya û zînetên dîwana wî ji du sed hezar dînarî zêdetir bû. Bi hinek keçên hukumdarên re zewicîbû. Nesruddewle ji bo di seraya wî de xwarinên xweş bê çêkirin gelek pere xerc dikir û xwarinpêjan dişiyand Misirê. Refaha bajêr û serayê ew çend zêde dibe ku di zivistanê de ji bo çûk birçî nemînin Nesruddewle ferman dike ku ji embara zad genim û dexl bidin van çûçikan û ev adet heta dawiya jiyana wî jî wuha dewam dike.¹⁵⁵

Bajar ji aliyê heterojeniyê civakî ve jî gelek rengîn û pêşketî ye. Dewleta Merwanî digel ku dewleteke îslamî ye jî, Îbnu Şelîtayê ku mesîhî ye ji aliyê hukumdarê Merwaniyan ve weku serokê muteweliya waqîfan tê tayînkirin.¹⁵⁶ Bi van nimûneyan derdikeve holê ku Farqîn li gorî serdema xwe bajarekî pêşketî bû û ji bo derketina edebiyateke bajarî xwedî zemîneke guncaw bû. Lê ji ber ku di wan serdeman de zimanê nivîsê erebî bû, çîroka Zembîlfiroşê ji aliyê dengbêjan ve hat gotin û paşê di serdema mîrektiyên kurdan de ji aliyê Feqiyê Teyran, Melayê Bateyî û Muradxan Bayezîdî ve careke din hat hûnandin û gihîşt heta roja îro.

Zembîlfiroş weku berhemeke bajarî gelek taybetmendiyên bajarvaniyê di xwe de dihevine. Di serî de Zembîlfiroş bi pîşeyê xwe û Xatûna jina Mîr bi tevger û rewîştê xwe weku du lehengên bajarî tîne pêşkêşkirin. Jina Mîr li koşka mîrektiyê rûdine û li ber destên wê gelek xizmetkar û nedîme hene. Zembîlfiroş jî hostayê zembîlan e, mirovekî pîşekar û hejar e.

¹⁵² Îbnul Ezraq, h.b., r. 117-118.

¹⁵³ Îbnü'l Esir, *el Kamil fi't Tarih*, Wergêr: Heyet, Bahar Yayınları, c. 10/1 r. 13.

¹⁵⁴ Îbnü'l Esir, h.b., c. 10/1 r. 160.

¹⁵⁵ Îbnü'l Esir, h.b., c. 10/1 r. 13.

¹⁵⁶ Îbnul Ezraq, b.n., r. 164-165

Di çîroka helbestî ya Zembîlfiroşê de peywendiya jineke xanedan û pîşekarekî hejar yek ji taybetmendiyan herî girîng ên edebiyata bajarî ye, lewra bajar cihê kombûna çînen ciyawaz ên civakî ye û rathatina van her du kesan û hevdiatina wan li gundekî zêdetir li bajarekî mumkîn e. Ji bilî vê, weku unsûrên bajarî di çîrokê de behsa seray, bazar, kolan, hêşet, wereq (pere) û desthilatdariya Mîr jî tê kirin. Ev hemû, nîşaneyên wê yekê ne ku cihê qewimîna vê bûyerê bajar e, loma jî Zembîlfiroş weku berhemeke bajarî tê qebûlkirin.

Di çîrokê de bi pîşeyê Zembîlfiroş amaje bi jiyanêke bajarî tê kirin. Lewra weku huner çêkirina zembîlan û di bazarê de firotina wan diyardeyeke bajarî ye. Ji xwe bazar û pîşekarî jî mîj ve weku du unsûrên jiyanê bajarî derketine holê. Di çîrokê de Zembîlfiroş weku hostayê selik û tebeqan tê berçavkirin ku berhemên xwe di bazarê de di beramberî wereqan de difiroşe.

Ew qewî lawek feqîr bû
Daîma Xwedê di bîr bû
Di pîşê selkan jîr bû
Dest dîkir bi wê sin'etê

Şuxlê wî selk û tebeq bû
Daîma ew rast û heq bû
Qîmetê selkan wereq bû
Her bi destê meşxeletê

Kulfetî qîsmet li wî bû
Ji tişt û mal çî wî bû
Di pîşê selkan qewî bû
Her bi destê meşxeletê¹⁵⁷

Li gorî Maruf Xeznedar jî, zembîl weku tiştekî pêwîst peywendiya wî bi bajêr re heye. Lewra pîşesaziya zembîlan li rojhilat bi peydabûna bazarê derketiye holê û hebûna bazarê jî belgeya herî girîng a bajar e. Ji aliyekî din ve bazar şeweyê

¹⁵⁷ M. Xalid Sadînî, *Feqiyê Teyran*, Nûbihar, Çapa Duyem, Îstanbul, 2003, r. 356.

peywendiya aborî ya civakê diyar dike û cihê kombûna çînên ciyawaz ên civata bajarî ye. Zembîlfiroş jî weku hostayekî zembîlan nûnertiya çîna hejar a bajêr dike.¹⁵⁸ Ji ber vê jî di çîrokê de Zembîlfiroş weku kesekî hejar û kêmdahat tê nîşandan.

Her roj bi dest zembîl dibest
Dibirine bazaran biqest
Xwarin û nan dihat bi dest
Razî dibû bi qismetê¹⁵⁹

Di Zembîlfiroşê de Xatûna jina Mîr, nûnertiya çîna serdest û dewlemend dike. Zembîlfiroş weku mirovekî ji çîna hejar li pey rizqê xwe yê rojane digere, lê Xatûn weku jineke dewlemend û ji çîna serdest li pey tetmînkirina hewesên xwe yên cînsî ye. Bi vê taybetiya xwe Xatûn ji aliyekî ve jî dişibe keça keyfxweşiyê ya Destana Gilgamêşê, lewra ev her du jin jî bi cazîbe, hîle û ciwaniya xwe, nûnertiya çanda bajarî dikin û bi dek û dolab dixwazin bigihîjin mebesta xwe. Herwuha her du jin jî teklîfa pevşabûnê li mêran dikin û di vî warî de heta bibêjî curetkar in. Ji ber vê çendê, Xatûn rojekê Zembîlfiroşê ku di ber koşka mîrektiyê re derbas dibe dibîne û dil dibijîne. Piştî demekê vê daxwaza xwe ji cariyeyên xwe re aşkera dike û ji wan arîkariyê dixwaze. Ew jî bi hîleyekê Zembîlfiroş tînin nava serayê, da ku Xatûn bigihîje miradê xwe.

Muhbetê keç mubtela kir
Sir li cariya aşkera kir
Lawekî qelbim cûdakir
Min ji eşqan xew netê
...
Ew cariyê di xewfa Xwedê ne
Law bi vê hîle dibîne
Mîr ji te selkan dibîne
Lê dikitin hîletê
...

¹⁵⁸ Xeznedar, b.n., c. 2, r. 231.

¹⁵⁹ Sadînî, b.n., r. 357.

Selik birin bi jêr henarê
 Dît cariyek hate xarê
 Mîr jî tê divê dîdarê
 Dê bide te qîmetê¹⁶⁰

Maruf Xeznedar sedema curetkariya Xatûna jina Mîr bi jiyana serayê ve girê dide. Lewra li koşk û serayan, jinên xanedanan gelek caran zilaman dibînin û digel wan çavnas dibin. Çavê Mîr û giregirên bajaran jî gelek caran li der e û peywendiya wan bi gelek jinan re çê dibe. Her yekî ji wan çend jinên wan hene û ji bilî vê têkiliyên wan ên bi dizî jî hene. Ji ber vê jinên mîr û giregiran dikevin nava valahiyekê û ji bo tolhildanê ew jî bi zilamên biyanî re dikevin têkiliyê.¹⁶¹ Agahiyên ku Îbnul Ezreq û Îbnul Esîr didin vê tespîtê piştrast dikin. Lewra di seraya Nesrudewle de li Meyafarqînê 360 cariyeyên bijarte hebûn û Mîr her şeveke xwe bi yekê re derbas dikir. Ji bilî vê li Meyafarqînê çendîn serayên Nesrudewle hebûn û weku Îbnul Ezreq jî dibêje seraya Nasiriyeyê li derveyê bajar bû û seraya hukumdariyê jî di navenda bajêr de cih digirt. Eger em vê bûyerê bi Meyafarqîna wê demê re biguncînin mumkîn e dema ku Mîr di seraya Nasiriyeyê de bûye ev bûyer di seraya hukumdariyê de li navenda bajêr rû daye.

Jina Mîr bi tevgerên xwe yê wêrekane lehenga herî bihêz a bajarî ye loma jî bê tirs Zembîlfiroş vedixwîne serayê û li wir teklîfa pevşabûnê lê dike. Di vê têkiliyê de digel jinbûna Xatûnê çalakbûna wê ya li beramberî Zembîlfiroş di bajarên serdema navîn û îslamî de rola karîger a xanedanî û serayê nîşan dide, loma jî di çîrokê de Xatûn bikerekî çalak e, lê Zembîlfiroş berkarekî sist e.

Xatûn dibê çare tu nîne
 Şerm meke were nivîne
 Min bi te daye evîne
 Da bibînim ji te lezzetê

 Keç dibê bavêj xiyalan
 Were nêv doşek û balan

¹⁶⁰ Sadîî, h.b., r. 357-358.

¹⁶¹ Xeznedar, b.n., c. 2, r. 233.

Bên bike zilfan û xalan
Dûr e ji ya axretê
...
Keç dibê lawê rewal e
Ger te hacet zêr û mal e
Her çi te xwast min kir helal e
Bes bike vê hucetê¹⁶²

Li hemberî vê daxwaza Xatûnê Zembîlfiroş ji ber dîndarî, hejarî û otorîteya Mîr
vê daxwaza wê bi cih nayîne û ji tirsê xwe ji bircê davêje xwarê, dikeve nava hêşetê û
diçe.

Law dibê zulfê herîr e
Ma pîroz be ew li mîr e
Çi heddê lawê feqîr e
Dest bidet vê muhabbetê

Lawî rast e bi cebbar e
Dil yek e nabe dubare
Xwe ji burcê avête xar e
Zû hate nêva hêşetê¹⁶³

Bi van nimûneyan derdikeve holê ku çîroka Zembîlfiroşê di edebiyata kurdî de
yekemîn berhema edebî ya bajarî ye ku azmûna bajarvaniya kurdan radixe ber çavan û
rewiştên mirovên çîna dewlemend û çîna hejar berawird dike. Li aliyê din cihê derketina
vê çîrokê û naveroka wê amaje bi peywendiya xanedan, dewlet, bajar, şaristanî û
edebiyatê dike ku li gorî fikrê me ji xwe edebiyata nivîskî li ser van hîman derdikeve
holê.

¹⁶² Sadîî, b.n., r. 359-361

¹⁶³ Sadîî, h.b., r. 360-364.

BEŞA DUYEM

JI DESTPÊKÊ HETA DAWIYA MÎREKTIYA AZÎZAN DÎROKA CIZÎRA BOTAN

1. JI DESTPÊKÊ HETA HATINA ÎSLAMÊ WEKU BAJAREKÎ ANTÎK CIZÎR

Hemû çavkaniyên ku derheqê dîroka Cizîrê de hatine nivîsîn destpêka vî bajarî digihîjînin bûyera tofanê. Ji xwe şop û şûnewarên ku li Cizîrê û derûdora wê hatine vedîtin, vê îddîayê bi awayekî zelal destnîşan dikin. Ji ber vê çendê Cizîr yek ji wan bajarên herî dêrîn e ku piştî tofanê bûye wargeha bavê duyem ê mirovahiyê Nûh pêxember. Giambattista Vico di xebata xwe ya bi navê *Zanista Nû* de dîrokê bi tofanê dide destpêkirin,¹⁶⁴ eger em vê fikra Vico weku binema wergirin bajarê Cizîrê ji despêka dîrokê û vir ve weku wargeheke jiyanê derketiye holê. Evliya Çelebî jî dema behsa Cizîrê dike di serî de balê dikêşe ser dêrînbûna bajêr û wuha dibêje: “*Derbarê beyana Cezîreya Îbnu Umer, yanî bajarê pêşîyê pêşîyan, avahiya dêrîn û wargeha mezin, parêzgeha Cûde*”¹⁶⁵ Li gorî wî, ev bajarê mezin, cara pêşî piştî tofanê ji aliyê Hezretê Nûh ve weku welat hatiye hîlbijartin. Hezretê Nûh piştî tofanê bajarê Cûdiyê ava dike, lê ji ber ku zivistanan li wir gelek sar e, digere û tê cihê bajarê Cizîrê. Ji av û hewayê vir gelek hez dike û di peravê vê zemînê de cîwar dibe û gelek wext li vir dimîne.¹⁶⁶

Li Cûdiyê danîna keştiya Nûh pêxember di Qurana Pîroz de jî derbas dibe (...û (keştî) li ser Cûdiyê sekinî...)¹⁶⁷ û di Quranê de çiyayê Cûdî weku cihekî pîroz tê binavkirin. (Û bibêje: Perwerdekarê min! Tu min li qonaxeke pîroz peya bike...)¹⁶⁸ Ji ber ku ev bûyer di Quranê de bi awayekî vekirî hatiye vegotin hemû çavkaniyên îslamî li ser vê yekê hevray in ku duyemîn qonaxa destpêka mirovahiyê li vê herêmê dest pê kiriye. Evliya Çelebî di vê mijarê de wuha dibêje: “*Hezretê Nûh piştî tofanê vî bajarê Cûdiyê cara pêşî li ser rûyê erdê ava dike û hemû benîadem ji vî bajarê Cûdiyê li dunyayê belav dibin. Paşê Hezretê Nûh li ser çiyayê Cûdiyê mizgevtêkî lê dike ku hîna jî*

¹⁶⁴ Giambattista Vico, *Yeni Bilim*, Wergêr: Sema Önal, Doğubay Yayınları, Ankara, 2007, r. 151.

¹⁶⁵ Evliya Çelebi, *Seyahatname*, Amadekar: Robert Dankoff, Seyit Ali Kahraman, Yücel Dalı, Yapı Kredi Yayınları, c. 4, r. 311.

¹⁶⁶ Çelebi, h.b., c. 4, r. 312.

¹⁶⁷ *Qurana Pîroz*, Amadekar: Mele Muhammed Garsî Farqînî, Nûbihar, İstanbul, 2003, Hûd: 44, r. 226.

¹⁶⁸ *Qurana Pîroz*, Mumînûn: 29, r. 344.

gelê kurd jê re dibêje Mizgevt Sulepan ku tê wateya mizgevt kesên rizgarbûyî.”¹⁶⁹ Ji bilî vê mizgevtê li Cizîrê hinek şûnewarên din jî hene ku nîşaneyê dêrînbûna vî bajarî ne. Bo nimûne li çiyayê Cûdiyê ji cihê ku keştiya Nûh pêxember tevî heştê kesên lê daniye re bi erebî “Semanîn” bi kurdî jî “Heştiyan” tê gotin. Ji ber vê çendê li vî cihê gundê Semanîn (Heştiyan) hatiye avakirin. Ji çavkaniyên dîrokî wuha tê ragihandin ku li vir çil turbe hebûne û di wan her çil turbeyan de yek ji wan kesên ku ji keştiyê peya bûne, veşartîne. Loma jî ev cih hêjî ji bo gelê herêmê cihê serdanê ye.¹⁷⁰

Yek ji wan şûnewaran ku nîşaneyê dêrînbûna Cizîrê ye û peywendiya vî bajarî bi Hezretê Nûh re datîne Gora Hezretê Nûh e. Li ser vê gorê du fikrên ciyawaz hene. Bi dîtina Evliya Çelebî dema tofanê jina Hezretê Nûh ducanî dibe, ji ber rêwîtiya keştiyê zarok pêşwext ji diya xwe re dibe û navê wî datînin Tarh Îbnu Nûh. Lê ev zarok dimire û piştî tofanê termê wî li Cizîrê vedişêrin. Evliya Çelebî dibêje ew gora ku di dirêjahiya çil pê de ye, gora Tarh Îbnu Nûh e.¹⁷¹ Lê ev gor di nava Cizîriyan de weku gora Hezretê Nûh tê zanîn. Ji ber vê jî nivîskarê Cizîrî Abdullah Yaşin vê gorê weku gora Hezretê Nûh dizane û van delîlan rêz dike: “Çend ji wan delîlên ku diselmînin gora Nûh pêxember li Cizîrê ye ev in: Li Cizîrê hebûna Mizgevt Nûh, Hewraya Nûh, Dêra Derebûnayê ya Nûh, avakirina bedenên Cizîrê di şeklê keştiyê de, hebûna kevirê mîhraba qibleyê ya perestgeha Nûh, nivîsên tofanê yê Gutîyan, kitêbên Îbnu Batuta, Evliya Çelebî, Herewî û Katib Çelebî vêya tekez diselmînin.”¹⁷² Herçend Abdullah Yaşin Evliya Çelebî weku jêder nîşan dabe jî xuya ye li ser vê meseleyê fikrê wan hev nagire û du boçûnên wan ên ciyawaz hene. Lê kîjan fikir rast dibe bila bibe ev her du boçûn jî diselmînin ku ev gor ji serdema Nûh pêxember maye û Cizîr di wê serdemê de weku wargehekê hebûye.

Cizîra ku xwedî dîrokeke dûr û dirêj e di hin serdeman de bi navên ciya ciya hatiye binavkirin. Li gorî Abdullah Yaşin di serdema Gutîyan de navê Cizîrê yê pêşî Dîlmûn bûye, paşê bi navên Bakarda, Gerz û Bakarda, Kazartaya kurdan, Bajarê kurdan, Kardunya, Gazartaya Kardû hatiye nasîn, piştî vê jî navê Cizîrê guheriye bûye Bazîbda.¹⁷³ Dema ku Cizîr dikeve bin destê asûriyan demekê bi navê “Cezîretul Asûr” jî

¹⁶⁹ Çelebî, b.n., c. 4, r. 311.

¹⁷⁰ El Mes’udî, *Murucu’z Zeheb*, Daru’l Fîkr, Beyrut, 1973, c. 1, r. 41; Muhammed Yusuf Ğandur, *Ortaçağda Cizre Tarihi*, Wergêr: Dr. Fadıl Bedirhanoğlu, ?, Çapa Yekem, Ankara, 2008, r. 306-307.

¹⁷¹ Çelebî, b.n., c. 4, r. 312-313.

¹⁷² Abdullah Yaşin, *Tarih Kültür ve Cizre*, ?, Ankara, 2007, r. 11.

¹⁷³ Yaşin, b.n., r. 16.

tê binavkirin.¹⁷⁴ Lê dîsan jî bajarê Cizîrê heta serdemên pêşî yên îslamê jî bi navê Bazezda û Bakardayê tê zanîn û di çavkaniyên îslamî de jî ev nav derbas dibe. Bazabda û Bakarda li keviyê Dicleyê du wargehên rûbirûyê hev in¹⁷⁵ û weku du beşên bajarê Cizîrê hatine binavkirin. Ji ber vê çendê jî dîrokvanên ku behsa fethên îslamî kirine tevî bajarên navbera Dicle û Firatê misêwa behsa Bazezda û Bakardayê jî kirine.¹⁷⁶

Di dirêjahiya dîrokê de Cizîr ketiye bin desthilata gelek dewletan. Berî zayînê 4000 sal berê Cizîr di bin desthilata Împaratoriya Gutiyan de ye.¹⁷⁷ Piştî Gutiyan bi destê qiralê akadî Naramsîn berî zayînê 2350an de dikeve jêr desthilata akadiyan.¹⁷⁸ Piştî akadiyan berî zayînê 1395an de bajarê Cizîrê dikeve destê asûriyan û piştî wî di sala 614an de dikeve destê Împaratoriya Medyayê. Piştî ku med bi destê persan tên hilweşandin di sala 550yan de bajêr dikeve destê persan. Di serdema persan de Îskenderê Mezin ji bo tolhildanê êrîşî persan dike û di vê heyamê de Cizîr bi destê leşkerên Îskender tê kavilkirin. Piştî vê bûyerê selefî bajêr digirin.¹⁷⁹ Berî zayînê di sala 130yan de Cizîr ji destê selefkiyan derdikeve û dikeve destê eşkaniyan. Piştî vê di 226ê zayînê de Erdeşîr Babekanê padîşahê Sasaniyan Cizîrê ji destê Partan derdixe û tevî welatê xwe dike.¹⁸⁰ Di sala 627an de jî şerekî mezin di navbera Heraqliyê qeyserê Bîzansî û Perwîzê şahê Sasanî de rû dide û piştî vî şerî Cizîr dikeve destê Bîzansiyan. Bi vî awayî Cizîr heta ku 639an di serdema Hezretî Umer de ji aliyê Îyad Bîn Xenem ve bê fetihkirin di bin destê Bîzansiyan de dimîne.¹⁸¹

¹⁷⁴ Îbn Şeddad, *el Alaqu'l Xetîre fî Zikrî Umera-îş Şam wel Cezîre*, Tehqîq: Yahya Ebbara, Wezaretu'l Seqafe wel Îrşadî'l Qewmî, Dimişq, 1978, c. 3, r. 4.

¹⁷⁵ Ğandur, b.n., r. 44.

¹⁷⁶ Ğandur, h.b., r. 42.

¹⁷⁷ Yaşın, b.n., r. 18.

¹⁷⁸ Kemal Burkay, *Geçmişten Bugüne Kürtler ve Kürdistan*, c. 1; (vgz.: Yaşın, b.n., r. 19.)

¹⁷⁹ Şemseddin Samî, "Cezîre", *Tarihteki İlk Türkçe Ansiklopedide Kürdistan ve Kürdler*, Wergera ji Osmani: M. Emin Bozarıslan, Deng Yayınları, Çapa Yekem, İstanbul, 2001, r. 77.

¹⁸⁰ Yaşın, b.n., r. 21-29.

¹⁸¹ Derwêş Yusif Hesên Hirurî, *Welatê Hekarê*, Wergêr: Musedeq Tovî, Çapxana Xanî, Duhok, 2010, r. 29.

2. JI DESTPÊKA ÎSLAMÊ HETA MÎREKTIYA AZÎZAN CIZÎR

Li gorî çavkaniyên dîrokî Cizîr di 639ê zayînî de di serdema xelîfetiya Hezretî Umer de ji aliyê Îyad îbnu Xenem ve hatiye fetihkirin.¹⁸² Cizîra ku bi navê Bazezda û Bakardayê dihat nasîn ji ber ku ji mêj ve di şiklê hîlalê de ji aliyê Rûbarê Dîceleyê ve hatibû dorpêçkirin, di zimanê erebî de di wateya giravê de jê re “Cezîre” hat gotin, lê ji ber ku di serdema waliyê Ebbasiyan Hesen Îbnu Umer et Texlîbî de, di bajar de avadaniyeke mezin çê dibe, navê Îbnu Umer li Cizîrê tê zêdekirin¹⁸³ û bi vî awayî bajar weku “Cezîretu Îbnu Umer” tê binavkirin.

Bajarê Cizîrê di vê serdemê de piştî rêvebiriya xelîfeyên raşîd, dikeve bin rêvebiriya Emewiyan. Di dewra Emewiyan de ji ber şerê navxweyî, herêm gelek zirar dibîne. Bi serhildanên Xarîciyan re derûdora Cizîrê dibe qada şer û aloziyan.¹⁸⁴ Ji ber van serhildanan li Cizîrê û li Mezopotamyayê ji aliyekî ve serweriya Emewiyan diheje û ji aliyê din ve jî li herêma Mezopotamyayê gelek bajar tûşî nehametiyên dibin.¹⁸⁵

Piştî hilweşîna desthilata Emewiyan, Cizîr dikeve bin rêvebiriya Ebbasiyan. Di destpêkê de bajar bi destê waliyên Ebbasiyan tê birevebirin, lê piştî demekê, di bin sîbera Ebbasiyan de di navbera salên 906 û 983yan de waliyên Hemdanî bajar bi rê ve dibin. Di serdema Hemdaniyan de herçend di hinek deman de ewlehî û seqamgîrî çêbibe jî, Hemdanî bi giştî bi polîtîkayên xwe yên aborî li ser gelên herêmê gelek acizî û tengasî çê dikin. Ji bilî baca malên diyarîkirî, dest datînin ser erzaq û mulkên xelkê û bi hin rê û rêbazên din xelkê dişêlînin. Ev polîtîkayên aborî tevî hin sedemên din, rê li ber têkçûna welat, wêranbûna bajar û gundan vedikin.¹⁸⁶ Ji bilî polîtîkayên xirab ên Hemdaniyan di vê dewrê de ji ber kêşeyên ser sînor, Cizîr carina dibe armanca êrîşên Bîzansiyan jî. Di encama van mîlmilaneyan de dema di navbera Ebbasî û Bîzansiyan de şerekî rû dide Cizîr weku navendeke lojîstîk tê bikaranîn û ev jî dibe sedema têkçûna aboriya bajêr.¹⁸⁷

Piştî ku Hemdanî bi destên Buveyhiyan tên ji nav birin, demeke kurt bajar di bin destê Buveyhiyan de dimîne, lê paşê dikeve bin destê Merwaniyan. Baz el Kurdî yê

¹⁸² Zekî Beg, b.n., r. 96, Bedlîsî, b.n., r. 210.

¹⁸³ Yaqut el Hemewî, “Cezîretu İbn Umer”, *Mucemu'l Buldan*, Daru İhya-ı't Turasî'l Arabî, Beyrût, bd. c.2, r. 138; Yaşın, b.n., r. 15.

¹⁸⁴ İsmail Yiğit, “Kuruluşundan Mervaniler Dönemine Kadar Cizre”, *Hız. Nuh'tan Günümüze Cizre Sempozyumu*, İstanbul, 1999, r. 56.

¹⁸⁵ Gandur, b.n., r. 47.

¹⁸⁶ Gandur, h.b., r. 85-86.

¹⁸⁷ Gandur, h.b., r. 93.

yekemîn fermanrewayê Merwaniyan, di navbera salên 983 û 984an de ji Diyarbekirê heta Mûsilê herêmeke berfireh dike bin destê xwe.¹⁸⁸ Piştî vekişîna demkî ya Baz di sala 993yan de Cizîr bi temamî dikeve destê Merwaniyan û bi vî awayî Cizîr heta 1096an di bin hukmê Merwaniyan de dimîne. Di dema Nesrudewle de (1011-1061) li hemû beşên Cizîrê seqamgîrî çê dibe, li ser sînoran ewlehî, di hundir de huzur û yekîti tê dabînkirin, Cizîr pêş dikeve û bajar dibe ziyaretgeha alim û helbestvanan.¹⁸⁹ Li gorî Îbnu Xeldûn jî, bajarê Cizîrê di dema Nesrudewle de pêş dikeve û digihîje qonaxeke ronîdar. Rewşa avadanîyê baş dibe, dahat zêde dibin, deyn namînîn, bajar ji bo helbestvan û aliman dibe navenda cazîbeyê.¹⁹⁰

Di dawîya vê serdema zêrîn de hêdî hêdî hin bûyerên nebaş rû didin. Di navbera salên 1055-1056an de Mîrê Cizîrê Ebû Herb bîn Suleyman bîn Nesrudewle bi destê kurdên Botî tê kuştin û li ser vê rûdanê bi arîkariya kurdên Botî û Beşnevî hakimê Mûsilê Qureyş ber bi Cizîrê dikeve tevgerê, lê Nesrudewle di bin femandariya kurê xwe Nesr de artêşekê bi ser wan de dişeyîne û Qureyş û hevpeymanên wî ji nav dibe. Lê piştî maweyekê, metirsiya mezin ji aliyê tirkmenên Selçuqî ve bi ser Cizîrê de tê. Begê tirkmen Mensûr ji aliyê Azerbaycanê ve ber bi welatê Merwaniyan tê û Cizîr jî di navê de di gelek cihan de dest bi talan û kuştinê dike. Piştî demekê di navbera waliyê Cizîrê Suleyman bîn Nesrudewle û Mensûr de lihevhatin çê dibe, lê dema waliyê Cizîrê Suleyman bîn Nesrudewle keysê dike destê xwe, Mensûr digire û wî zindanî dike. Li ser vê, careke din di navbera tirkmenên Oguz û Merwaniyan de şer diqewime. Di encama van şeran de Nesrudewleyê serokê Merwaniyan, Mensûr ji kurê xwe distîne û tevî hin diyariyan wî teslîmî tirkmenan dike û di nava wan de lihevhatin çê dibe. Oguz li ser peymana xwe nasekinin û careke din dest bi talan û kuştinê dikan.¹⁹¹ Piştî demekê jî Cizîr ji aliyê Fexrudewle Muhammed îbnu Cahîr ê wezîrê Sultan Melîkşahê Selçuqîyên Mezin ve di 1085an de tê girtin û Merwanî serbixwebûna xwe ji dest didin. Herçend heta 1096an jî Cizîr di bin destê waliyê Merwanî de bimîne jî, piştî vê dîrokê êdî hukum ji destê wan derdikeve û dikeve destê Selçuqîyan.

¹⁸⁸ Îbnü'l Esir, *el Kamil fi't Tarih*, Wergêr: Heyet, Bahar Yayınları, c. 9/1. r.26.

¹⁸⁹ Yiğit, b.n., r. 61.

¹⁹⁰ İbnu Haldun, *Tarihu İbnu Haldun*, Daru'l Kuttabi'l Lubnanî, 1967-1978, c. 4, r. 683; (vgz.: Ğandur, b.n., r. 117.)

¹⁹¹ İbnül Esir, b.n., c. 9/2, r. 90.

Di serdema Selçuqiyan de li ser navê wan Artuqî bajêr bi rê ve dibin.¹⁹² Piştî Merwaniyan heta 1127an Cizîr ji aliyê Cegermîş ve tê birêvebirin û bajar bi Mîrektîya Musilê ve girêdayî dimîne.¹⁹³ Ji sala 1127an pê de bajar dikeve bin hukmê Atabegên Zengî. Atabegên Zengî jî di 1183yan de dikevin bin hukmê Eyyûbiyan û li ser navê wan weku mîrektiyeke Eyyûbî heta salên 1251an bajêr bi rê ve dibin. Di vê serdemê de Selahedîn Eyyûbî Cizîrê ji Musulê vediqetîne û dike mîrektiyeke serbixwe. Bi giştî di serdema Zengiyan de li Cizîrê pêşketin û avadaniyeke baş çê dibe, lê di hin deman de bi destê mîrên Zengî jî zulm û tehdâ li xelkê tê kirin. Bo nimûne di serdema Sencerşah, Mehmûd û Mewdûd de gelek tehdâ li xelkê bajêr tê kirin û tevlihevî û alozî rû didin.¹⁹⁴ Li ser giliya xelkê Cizîrê di 1251an de el Melîkun Nesrê Eyyûbî, piştî mirina Nûreddîn Arslanşah digel hakimê Musilê Emîr Bedreddîn Lu'lu Cizîrê dagîr dîkin û dawî li fermanrewatiya Atabegên Musilê tînin. Bi vî awayî Cizîr dikeve bin nufuza Eyyûbiyan û Bedreddîn Lu'lu. Piştî hakîmiyeteke demkî ya Bedreddîn bajar di sala 1261an de ji aliyê moxolan ve tê dagîr kirin û moxol jî waliyekî xirîstîyan datînin ser hukum, piştî demekê jî Hulagu, Emîr Tûdan weku rêvebir dişeyîne Cizîrê.¹⁹⁵ Moxol herçend bê şer û berxwedan Cizîrê digirin jî, ji ber ku di welatên rojhilat de bi wêrankirin, xirabkirin, wehşet, sirgûnkirin û bi kuştinê navdar bûn¹⁹⁶ li Cizîrê jî heman karî kirin.

¹⁹² Metin Tuncel, "Adını Kuruluş Yerinden Alan Şehirlere Örnek Cizre", *Hz. Nuh'tan Günümüze Cizre Sempozyumu*, İstanbul, 1999, r. 49.

¹⁹³ İbnu Şeddad, b.n., c. 3, r. 554-555; Ğandur, b.n., r. 121.

¹⁹⁴ İbnül Esir, b.n., c. 12/2, r. 61.

¹⁹⁵ *İslam Ansiklopedisi*, "Cizre", Türkiye Diyanet Vakfı, İstanbul, 1993, c. 8, r. 38.

¹⁹⁶ Ğandur, b.n., r. 174.

3. DI SERDEMA MÎREKTIYA AZÎZAN DE CIZÎR

Di serdema Mîrektiya Azîzan de bajar di hin çavkaniyan de weku Cezîretul Ekrad bê tomarkirin jî¹⁹⁷ ji ber desthilata eşîreta Botî, di nava kurdan de bajar weku Cizîra Botan tê binavkirin. Şerefxanê Bedlîsî, bingeha Mîrên Azîzan ku demeke dirêj serweriya Cizîra Botan kirine digihîjîne Xalidê kurê Welîd û yekemîn fermanrewayê vê xanedanê jî Suleymanê kurê Xalid dizane,¹⁹⁸ lê bi dîtina Ebdullah Varlî “Xalta” yan jî “Xalda” navê deverê e ku ji Xerzan heta Rûbarê Zapê, ji Wanê heta Bismilê fireh dibe û ew kesên ku dawa dikin ji nîşxa Xalidê kurê Welîd in, di eslê xwe de binecihên resen ên vê deverê ne û navê xwe ji navê vê herêmê wergirtine. Ji xwe li gorî ragihandina dîrokzanên jî nîşxa Xalidê kurê Welîd li ser rûyê cîhanê qeliyaye û nemaye.¹⁹⁹ Ji aliyê din ve Şerefxanê ku li gorî ragihandinan dibêje xanedana Azîzan digihîje Xalidê kurê Welîd, di heman demê de îddîa dike ku ev xanedan di destpêkê de li ser rêça dînê êzîdîtiyê bûye û paşê mezhebê ehlê sunet qebûl kirine.²⁰⁰ Di vir de nakokiyê zeq heye, lewra êzîdîtiya weku baweriyeke heterodoks di wê serdemê de tenê di nava kurdan de hebû û ji aliyê îslama ortodoks ve jî meqbûl nedihat dîtin. Ji ber vê çendê, nabe ku di wê serdemê de malbateke musluman a bi nîjad ereb dev ji dînê îslamê berde û biçe ser baweriya êzîdîtiyê. Loma jî îddîaya duyem a Şerefxan, îddîaya wî ya pêşî pûç dike. Bi vî awayî derdikeve holê ku eslê vê xanedanê, kurd e û paşê hatine ser mezhebê ehlê sunet. Ji xwe hin lêkoler jî vê îddîaya pêşî ya Şerefxan bi guman pêşwazî dikin û dibêjin nîsbetkirina vê xanedanê bi Xalidê kurê Welîd ji bo wesîleya şerefê ye.²⁰¹ Li gorî hin çavkaniyan jî yekemîn mîrê Azîzan, ne Suleymanê kurê Xalid e, belku Îzzeddîn el Buhtî ye,²⁰² loma jî Şerefxan herçend yekemîn fermanrewayê vê malbatê Suleymanê kurê Xalid destnîşan bike jî sîlsîleya fermanrewayên Cizîrê bi Mîr Ebdulezîz dide destpêkirin. Ji ber hindê jî navê Azîzan dibe ku ji navê Îzzeddîn yan jî Ebulezîz mabe û peywendiya xwe bi vî mîrê hebe.

Xanedana Azîzan a Botî, piştî wêrankariya moxolan û jinavbirina desthilata Îlxaniyan, herêma Cizîra Botan bi tevahî dikin bin kontrola xwe û dibin fermanrewayên Mîrektiya Cizîra Botan. Bî vî awayî bajar di serdema fermanrewatiya Xanedana Azîzan

¹⁹⁷ Yusuf Baluken, “Kuruluşundan Osmanlı Hakimiyetine Kadar Cizre Buhti Beyliği”, *Uluslar arası Şırnak ve Çevresi Sempozyumu*, Ankara, 2010, r. 116.

¹⁹⁸ Bedlîsî, b.n., r. 209.

¹⁹⁹ Ebdullah M. Varlî, *Dîwan û Jinewarî ya Ahmedê Xanî*, Çapxaneya Erkam, Stenbol, 2004, r. 142-147.

²⁰⁰ Bedlîsî, b.n., r. 209.

²⁰¹ Nazmî Sevgen, *Doğu ve Güneydoğu Anadolu’da Türk Beylikleri*, Amadekar: Şükrü Kaya Seferoğlu, Halil Kemal Türközü, Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü, Ankara, 1982, r. 52.

²⁰² Baluken, g.n., r. 116.

de careke din weku mîrektiyeke serbixwe derdikeve holê. Ev mîrektî li ser bingeha civata eşîrî tê rêkxistin ku navenda wê de eşîreta Botî heye, lewra eşîreta Botî li gorî ragihandina Şerefxan “*di nav eşîretên Kurdistanê de, bi netirsî, mêranî û merdiya xwe bi nav û deng bûn. Di meydana şer de ji hemû eşîretên Kurdistanê serkevtîtir bûn. Li hemberî dijminên xwe yekdem û bi ittîfaq bûn û di rojên giran de hemûyan piştê hev digirt. Ji ber van taybetmendiyan xwe jî di Kurdistanê de ji hemû eşîretên hevtayê xwe paye bilindtir û serkevtîtir bûn.*”²⁰³ Ji ber vê jî mîrektiyeke bihêz damezirandin û demeke dirêj li Cizîra Botan hukum kirin.

Mîrên Azîzan berî ku tevahiya Mîrektiya Cizîrê bigirin, ji xwe li Finikê xwedî desthilat bûn, lê piştî zordarî û kavilkariyariyeke zêde ya Îlxaniyan û lawazketina wan, fermanrewayê Finikê Mîr Ebdulezîz di sala 1314an de Cizîrê ji destê waliyê Îlxaniyan ê bi navê Beklemîş rizgar kir û li seranserî herêma îdarî ya Cizîrê bû tekane fermanrewayê serbixwe.²⁰⁴ Ji ber ku Îlxanî bi destê Memlûkiyan hatin şikandin, li gorî hin çavkaniyan Mîrên Cizîra Botan heta demekê jî di bin sîbera Memlûkiyan de hukumranî kirin. Lewra li gorî ragihandina dîroknas Qelqêşandî di sala 1363yan de fermanrewayê Cizîrê Ehmed îbnu Seyfuddîn ji sultanê Memlûkî re nameyekê dişeyîne û pê radigihîne ku bavê wî miriye û di şûna wî de ew bûye Mîrê Cizîra Botan.²⁰⁵

Mîrên Azîzan piştî rizgarkirina Cizîrê heta 1400an bêkêşe mîrektiya xwe bi rê ve dibin, lê di vê navberê de Tîmûrê Kurganî ji Anadolê heta Bexdadê dest bi dagîrkariyê û wêrankariyê dike. Ji ber vê çendê di 1401an de dema Tîmûr li herêma Mêrdînê ye, Îzzeddînê Yekemê Mîrê Cizîrê diçe ba wî û îtaeta xwe pê radigihîne. Bi şerta ku bacê bidin, Tîmûr têkilî Mîrektiya Cizîrê nabe.²⁰⁶ Li gorî ku Şerefxan radigihîne ji ber ku Mîr Îzzeddîn li ser peymanê xwe nasekine, Tîmûr artêşekê dişeyîne ser Cizîrê û bajêr serûbin dike,²⁰⁷ lê Mehmed Emîn Zekî Beg sedema şikandina peymanê bi zulma rayedarên Tîmûr ve girê dide û berevajî Şerefxan di vê meseleyê de berpirsiyariyê dixê hustuyê Tîmûr.²⁰⁸ Piştî dagîrkirina Cizîrê ji aliyê artêşa Tîmûrê Kurganî ve bajar di nava aloziyekê de dimîne. Di vê navê de Tîmûr vê herêmê careke din dispêre sultanên

²⁰³ Bedlîsî, b.n., r. 209-210.

²⁰⁴ Ebdullah Memê Mehmed (Hoko) Xanî Varlî, *Dîroka Dugelên Kurdan*, Hoşka Weşan û Lêkolîna Sîpan, Îstanbul, 1997, c. 1, r. 341; Baluken, b.n., r. 117.

²⁰⁵ el Kalkaşandî, *Subhul A'ş'a fi Sinaati'l İnşa*, Daru'l Kutubi'l Hudyuviyye el Emiriy, Vezaretu's Sekafe ve'l Irşadi'l Kavmi, Kahire, c. 4, r. 274,322; (vgz.: Ğandur, b.n., r. 189.)

²⁰⁶ Şerefxanê Bedlîsî, *Şerefname*, Wergêr: Ziya Avcı, Avesta, Çapa Duyem, Stenbol, 2007, r. 215; Sevgen, b.n., r. 53.

²⁰⁷ Bedlîsî, h.b., r. 216.

²⁰⁸ Mehmed Emîn Zekî Beg, *Dîroka Kurd û Kurdistan*, Wergêr: Ziya Avcı, Avesta, Çapa Yekem, Stenbol, 2002, r. 118.

Memlûkiyan, lê ew jî bi awayekî berdewam nikarin bi Cizîrê re mijûl bibin. Ji ber vê jî kurên Îzzeddîn derdikevin holê, bermayên Tîmûr ji holê radikin û di encama vê serkeftinê de Mîr Ebdalê Duyem di şûna bavê xwe de dibe fermarewayê Cizîra Botan.²⁰⁹

Piştî derkirina bermayên Tîmûrê Kurganî, di sala 1470yan de di serdema ku Kek Mihemedê kurê Mîr Îbrahîm mîrê Cizîrê ye, bajar dikeve ber êrîşa tirkmenên Aqqoyînî û ji aliyê Hesên Begê Dirêj ê Aqqoyînî ve tê dagîrkirin. Welatê Cizîrê ji aliyê tirkmenên Aqqoyînî ve tê kavilkirin û piraniya giregir û mezinên Botan tîk kuştin. Tirkmen, Kek Mihemmed digel biraziyên wî Mîr Mihemmed û Şah Elî Beg digirin û bi xwe re dibin Îraqê. Bi vî awayî seranserî welatê wan dikeve destê tirkmenan.²¹⁰ Aqqoyînî bi giştî li dijî hemû kurdan û bi taybetî li dijî malbatên mezin ên kurdan bi awayekî tund serederî dikin û hewla jinavbirana wan didin.²¹¹ Di vê navê de Hesênê Dirêj rêvebirîya hukumeta Cizîrê dispêre mirovekî xwe yê bi navê Çelebî Beg.²¹² Çelebî Beg li Cizîrê rêvebirîyeke dirindane cî bi cî dike. Ji ber vê, M. Yusuf Xendûr, Aqqoyîniyên tirkmen weku şagirdên Tîmûr li qelem dide û sedema tûndûtûjiya wan vedigerîne ser perwerdeya Tîmûr a zordarane.²¹³

Di serdema dagîrkeriya Aqqoyîniyan de mîrekên Azîzan û mirovên bijarte yên Botî sî sal li sirgûniyê dimînin, lê dema ku keys dikeve destê wan Xan Şeref êrîş dibe ser Cizîrê û di 1498an de welatê bavûkalên xwe careke din rizgar dike.²¹⁴ Piştî ku Xan Şeref Aqqoyîniyan li Cizîrê dişkîne di 1502yan de jî Şah Îsmâîl li Îranê serî hildide û hemû ew herêmên ku destê Aqqoyîniyan de ne zêft dike. Herçend hewla dagîrkirina Cizîrê dide jî her cara ku êrîş dike leşkerê wî şikest dixwin. Heta di şerekî de bi gotina Şerefxan hezar û heft sed leşkerê Şah bi destê leşkerê Xan Şeref tîk kuştin û artêşa wî bi şerpezeyî vedikişe. Şah Îsmâîl li ser van têkçûnan gelek sû dibe û ji bo cara sêyem leşkerekî giran ji serbazên bijarte di bin femandariya Tekelî Yaxan Beg de dişeyîne ser Mîrektiya Cizîrê, lêbelê digel jimareya wan a gelek zêde, dîsa li hemberî artêşa Xan Şeref têk dişkin.²¹⁵ Li ser vê têkçûna dawî Şah Îsmâîl, êdî hêviya xwe ji serkeftinê dibire û heta Xan Şeref li ser hukum e, careke din wê hêzê di xwe de nabîne ku êrîşê Cizîrê bike.

²⁰⁹ Sevgen, b.n., r. 54.

²¹⁰ Bedlîsî, b.n., 217.

²¹¹ Sevgen, b.n., r. 24.

²¹² Bedlîsî, b.n., r. 218.

²¹³ Ğandur, b.n., r. 196.

²¹⁴ Yaşın, b.n., r. 53.

²¹⁵ Bedlîsî, b.n., r. 219-220.

Di vê navê de Şah Îsmâîl her ku diçe bihêztir dibe û dor li mîrên Kurdistanê teng dike. Ji ber vê jî, mîr û giregirên kurdan li ser îtaetkirina Şah Îsmâîl li hev dikin û diçin ba wî. Di nava duwazde mîrên ku diçin nik Şah Îsmâîl de Şah Elî Begê mîrê Cizîrê jî heye. Şerefhan li ser vê bêferasetiya Şah Elî Beg dibêje herçend wî êrîşên Şah Îsmâîl ên serdema Xan Şeref ji bîr kiribe jî, Şah Îsmâîl şikestên ku ji destê Mîrekiya Cizîrê xwariye ji bîr nekiriye, loma jî Şah Îsmâîl demildest Şah Elî Beg digel mîrên din zindanî dike. Dema Şah Elî di destê Şah Îsmâîl de girtî ye, Cizîr ji aliyê leşkerê Şah ve tê dagîrkirin û ji bo rêvebiriya bajêr Ulaş Begê birayê Xan Mihemed Ustaclû yê waliyê Diyarbekirê tê tayînkirin. Lê piştî ku Şah Elî Beg ji destê Şah Îsmâîl rizgar dibe, bi arîkariya eşîreta Botî Ulaş Beg derdike û careke din Cizîrê rizgar dike.²¹⁶

Ji ber ku serederiya Şah Îsmâîl li hemberî kurdan mîna serederiya Aqqoyîniyan gelek zalimane ye, kurdên sunî tu car bawerî pê neanîne. M. Emîn Zekî Beg li ser vê mijarê dibêje baweriya kurdan bi tirkmenan tunebû, lewra rafizî û mufrîd bûn.²¹⁷ Ji ber wê jî, mîrên kurdan di serî de jî Şah Elî Begê Mîrê Cizîrê û Şerefhanê Mîrê Bedlîsê li dijî Şah Îsmâîl û Eceman dixwazin bi Sultan Selîmê Osmanî re peymanê girê bidin. Ji bo vê armancê bi navberkariya Mewlana Îdrîsê Bedlîsî digel Sultan Selîmê Osmanî têkilî datînin û di encama van gotûbêjan de mîrên kurd di şerê Çaldiranê de li dijî Şah Îsmâîl tevî artêşa Sultan Selîm şerê dikin û Eceman têk dişkînin. Di vî şerî de Şah Elî Begê Mîrê Cizîrê tevî bîst hezar leşkerên bijarte di nava artêşa Osmanî de cih digire û ji ber qehremaniya Mîr û leşkerên wî Sultan Selîm weku rêzgirtin taca serê xwe dide serê wî û lîbaçeya xwe davêje ser milên wî.²¹⁸

Li ser vê helwesta mîrên Kurdistanê, bi riya Îdrîsê Bedlîsî di 1514an de di nava sî mîrekên Kurdistanê û Osmaniyan de peymana Amasyayê ya yekgirtina bi Osmaniyan re tê pêkanîn. Li gorî vê peymanê Osmanî mîr û begên Kurdistanê bi sê rêvebiriyên ciyawaz bi dewletê ve girê didin: 1. Mîrên xweser (Hukumet), 2. Mîrên nîv xweser (Sancaq) 3. Sancaqên Osmanî.²¹⁹ Cizîr di nava wîlayeta Diyarbekirê de weku hukumetekê ji wan mîrekên xweser e ku dewlet nikare destê xwe bike nava kar û barên wan û mîr li gorî rêbaza berê ji aliyê hozên wê mîrekiyê ve ji nava xanedana rêvebir tê hilbijartin. Padîşah jî mîrê ku bê hilbijartin qebûl dike û mafê wî nîne ku mîrê hilbijartî biguherîne. Bi vî awayî Mîrekên Cizîrê û ên wekî wan bi serê xwe, kar û barên welat bi

²¹⁶ Bedlîsî, h.b., r. 221.

²¹⁷ Zekî Beg, b.n., r. 120.

²¹⁸ Çelebi, b.n., c. 4, r. 314.

²¹⁹ Çelebi, h.b., c. 1, r. 83, c. 10, r. 37-38.

rê ve dibin û bacê nadin hukumeta navendî. Tenê di dema şer de li gorî şiyana xwe bi jimareyeke leşker beşdarî artêşa hukumeta navendî dibin²²⁰ û eger pêwîst bike bac didin. Ev peyman di serdema Sultan Suleyman de jî bi heman şêweyî tê peyrewkirin. Piştî girtina Bexdadê û seferên Îranê, ji ber arîkariya mezin a mîrên kurdan, Sultan Suleyman careke din vê peymanê dupat dike û di beyannameyeke xwe de îmtiyazên mîrên kurdan wuha rêz dike:

“Begên kurdan ên ku di serdema bavê Qanûnî Sultan Suleyman Yavuz Sultan Selîm de li dijî Qizilbaşan cephe girtine û gelek xizmetên baş û bixêr kirine niha jî di bin femandariya Sereskerê Sultan Îbrahîm Paşa de tevî sefera Îranê bûne û di têkbirina qizilbaşan de sûdewer bûne. Li hemberî vê dilsozî û dilaweriya begên kurdan û digel daxwaz û serîlêdanên wan, ew eyalet û kelehên ku ji mêj ve ye weku war û welat di destên wan de ne digel wan cihên ku bi berateyên ciya ciya bi wan hatiye bexşkirin, hemû ew eyalet, keleh, bajar, gund û mezrayên di bin rêvebirîya wan de ne tevî hemû dahatên wan ve bi mercê ku ji bav derbasî kur bibe bi wan hatiye îhsankirin. Bi vê boneyê, divê tu car di navbera wan de nakokî çênebe û ji derve êrîş û mudaxeleyî wan neyê kirin. Divê ev fermana mezin bê cîbicîkirin, bi tu awayî li ser neyê leyîstin û tu cihê wê neyê guherandin. Dema beg bimire divê eyaleta wî neyê rakirin tevî hemû hidudê wê ve li gorî Mulnameya Humayûn eger kurê wî yek be ji wî re dimîne, eger zêde bin li gorî daxwaza xwe divê wan keleh û cihên din di navbera xwe de parve bikin. Eger li hev neyên, begên Kurdistanê çawa guncaw bibînin bila wuha bikin û bi riya mulkiyetê heta hetayê dê weku muteserrif bimînin. Eger beg, bêwêris û bêkesûkar miribe, wê demê dê eyaleta wî ji derve de bi kesekî din neyê dayîn, divê digel begên Kurdistanê muşawere bê kirin û bi tifaqa wan ew kîjan beg û begzadeyan guncaw bibînin dê bi wan bête dayîn. Ez li ser yekîtiya Cenabê Heq sond dixwim û vê peymana xwe ya humayûn û fermana xwe ya mezin dubare dikim û mor dikim.”²²¹

Piştî serdema Sultan Suleyman di hin deman de rayedarên Osmanî bi hinceta îxtîlafên navxwe yên Mîrekiya Cizîrê destê xwe dikin nava kar û barê rêvebirîya mîrekiyê û dixwazin di kêşeyên navxweyî yên Cizîrê de xwedan rol bin. Bo nimûne, Mîr Ezîz bi arîkariya Ferhad Paşayê wezîrê Osmanî mîrekiya Cizîrê bi dest dixe. Piştî salek û çar mehan bi navê Osman Paşa wezîrekî din ê Osmanî wî ji ser kar hildide û fermanrewatiya Cizîrê dide Mîr Mihemmedê kurê Xan Ebdal. Piştî mirina Osman Paşa,

²²⁰ Ahmet Özer, *Beş Büyük Tarihi Kavşakta Kürtler ve Türkler*, Hemen Kitap, Çapa Duyem, İstanbul, 2010, r. 174; Ahmet Kardam, *Cizre-Botan Beyi Bedirhan Direniş ve İsyan Yılları*, Dipnot Yayınları, Ankara, 2011, r. 55-56.

²²¹ Topkapı Sarayı Müzesi Arşivi, E.11969; vgz.: Sevgen, b.n., r. 42.

Ferhad Paşa li beramberî dahata 30 gundên xirîstîyan ên ser bi mîrektiya Cizîrê, careke din Mîr Ezîz dike mîrê Cizîrê. Li hemberî vê destêwerdanê, Mîr Şerefê kurê Xan Ebdal serî hildide û bi derkirina Mîr Ezîz ji nava axa Cizîrê, dibe mîrê Cizîrê. Herçend rayedarên Osmanî li dijî Mîr Şeref bizav bikin jî Mîr Şeref tu carî paşekişe nake. Rayedarên Osmanî jî neçar dimînin û mîrektiya wî qebûl dikin.²²² Bi vî awayî Mîr Şeref li dijî destêwerdana Osmaniyan radiweste û li gorî peymanê digel Osmaniyan mîrektiya xwe bi wan dide qebûlîkirin.

Evliya Çelebî di navbera 1655 û 1656an de dema li Kurdistanê digere, diçe Cizîrê û behsa xweseriya Mîrektiya Cizîrê dike û dibêje mîrên Cizîrê “ezl û nesb”ê qebûl nakin. Berevajî Evliya Çelebî, Nazmî Sevgen radigihîne ku di 1627an de padîşahê Osmanî Muradê Çarem, Mîr Mehmedê Çarem ê Mîrê Cizîrê ji mîrtîyê dûr dixê û dawî li îdareya mîran tîne.²²³ Li gorî ragihandina Abdullah Yaşın jî piştî 1629an ezl û nesba mîrekên Cizîrê dikeve destê padîşahên Osmanî.²²⁴ Herwuha weku delîleke lawazbûna mîrên Cizîrê di 1706an de mîrê wê demê yê Cizîrê Mîr Bedirxan ji Sultan Ehmedê Sêyem re daxwaznameyekê dişeyîne û di vê daxwaznameyê de ji sultan dixwaze weku berê hukumeta Cizîrê bo wî bihête dayîn.²²⁵ Ev jî nîşan dide ku dewleta Osmanî gelek caran destê xwe kiriye nava kar û barên Mîrektiya Cizîrê û dest daye ser bac û rêvebiriya wê.

Dema mirov van zanyariyên dîrokî li berçav digire, mirov nikare bibêje ku peywendiya Mîrên Cizîrê digel Osmaniyan ji serî heta dawî li gorî peymanê yekgirtinê bi rê ve çûye. Lewra dema nakokiyên navxweyî li ser diyarkirina mîr rû dane, waliyên wîlayetan bi erêkirina padîşahên Osmanî destê xwe kirine nava kar û barên mîrektiyê û yekî li hemberî yê din bi kar anîne. Lê dema ku serê dewleta Osmanî di gêjaniyê de bûye vê carê mîran desthilata xwe zêdetir kirine û guh nedane rayedarên dewleta navendî. Bo nimûne, dema padîşahê Osmanî Mehmûdê Duyem tê ser hukum mîrekên kurdan li hemberî dewleta navendî gelek bihêz dibin. Di nava sînorê xwe de weku hukumetên serbixwe tevdigerin û bi hêza xwe karîgerî li ser Anadolê jî çê dikin.²²⁶

Li gorî Martîn Van Bruinessen mîrê mîran anku walî mafê wî hebû ku mudaxeleyî sancaqan bike. Dema ku di nava sancaqekê de kêşeyek çêbibûya û bi

²²² Bedlîsî, b.n., r. 233-235.

²²³ Sevgen, b.n., r. 60; İslam Ansiklopedisi, c. 8, r. 39.

²²⁴ Yaşın, b.n., r. 62.

²²⁵ BOA O89, 9M.1118; Kardam, b.n., r. 61.

²²⁶ Martin Van Bruinessen, *Ağa, Şeyh, Devlet*, İletişim Yayınları, Çapa Duyem, İstanbul, 2003, r. 269.

taybetî dema di navbera endamên xanedana rêvebir de li ser diyarkirina mîr nakokî peyda bibûya dewletê bi riya mîrê mîran li gorî berjewendiya xwe yekî hildibijart û ê din ji nav dibir.²²⁷ Lê bi giştî mîr ji aliyê hozên serdest ên Botan ve dihat diyarkirin û dewletê jî mîrîtiya van kesan qebûl dikir. Dema dewletê mudaxele jî bikira dîsa mîr ji malbata rêvebir dihat hildibijartin û mafê wan tunebû kesekî din bikin fermanrewayê Cizîra Botan.

Bêguman di maweya dirêj a rêvebiriya Mîrekiya Azîzan de gelek mîr ji vê xanedanê dibin fermanrawayên Cizîra Botan. Şerefxan ji destpêkê heta sala 1597an navê bîst û yek mîrên Cizîrê dijmêre: 1. Mîr Ebdulezîz, 2. Mîr Seyfeddînê kurê Ebdulezîz, 3. Mîr Mecdeddînê kurê Ebdulezîz, 4. Mîr Îsayê kurê Mecdeddîn, 5. Mîr Bedreddînê kurê Mîr Îsa, 6. Mîr Ebdalê kurê Mîr Bedreddîn, 7. Mîr Izeddînê kurê Mîr Ebdal, 8. Mîr Ebdalê kurê Mîr Izeddîn, 9. Mîr Îbrahîmê kurê Mîr Ebdal, 10. Mîr Şerefê kurê Mîr Îbrahîm, 11. Mîr Bedirê kurê Mîr Îbrahîm, 12. Kek Mihemmedê kurê Mîr Îbrahîm, 13. Mîr Şerefê kurê Mîr Bedir, 14. Şah Elî Begê kurê Mîr Bedir, 15. Mîr Bedir Begê kurê Şah Elî Beg, 16. Mîr Mihemmedê kurê Bedir Beg, 17. Sultan Mihemmedê kurê Mîr Mihemmed, 18. Nasir Begê kurê Şah Elî Beg, 19. Mîr Ezîzê kurê Kek Mihemmed, 20. Mîr Mihemmedê Kurê Xan Ebdal, 21. Mîr Şerefê kurê Xan Ebdal.²²⁸ Piştî 1597an çavkaniyeke ku navê mîrên Cizîrê bi rêzê bide nayê dîtin, lê weku di jor de jî derbas bû di 1627an em dizanin ku Mîrê Cizîrî Mîr Mehemedê Çarem e û di 1706an de jî Mîr Bedirxan li ser hukum e. Herwuha Ehmed Ramizê ku bi nasnavê Lûtfî jiyanameya Mîr Bedirxan nivîsiye bavûkalên Mîr Bedirxan heta Mîr Şeref wuha dijmêre: Mîr Bedirxan kurê Edulah Xan, Ebdulah Xan kurê Mustefa Xan, Mustefa Xan kurê Îsmâîl Xan, Îsmâîl Xan kurê Mensûr Xan, Mensûr Xan kurê Mîr Şerefê Duyem, Mîr Şerefê Duyem kurê Mîr Muhamed Xan, Mîr Muhemed Xan jî kurê Mîr Şeref Xan e.²²⁹ Lê di navbera bavê Mîr Bedirxan û bavê wî Ebdulah Xan de Mîr Seyfedîn û Mîr Salih jî demekê rêvebiriya Cizîra Botan kirine.²³⁰

Mîrekiya Cizîrê heta destpêka sedsala nozdehan jî weku hukumeteke li ser wîlayeta Diyarbekirê dewam dike, lê di destpêka sedsala nozdehan de dewleta Osmanî li hemberî dewletên nûjen ên Ewropayê gelek lawaz dikeve û li gorî pêdawîstiyên demê mecbûr dibe hin çaksaziyên siyasî û îdarî bike. Rayedarên Osmanî, ji bo xurtkirina

²²⁷ Bruinessen, b.n., r. 240.

²²⁸ Bedlîsî, b.n., r. 212-239.

²²⁹ Lûtfî (Ahmed Ramiz), *Emir Bedirhan*, bgst Yayınları, Çapa Yekem, İstanbul, 2007, r. 72-73.

²³⁰ Lûtfî, h.b., r. 73.

dewletê, dabînkirina asayîşê û pêşîgirtina serhildanên neteweyî yên nava sînorên dewleta Osmanî, biryara merkezîkirina dewletê û sistemeke nû ya îdarî didin. Hem serhildanên serkevtî yên miletên herêma Balqan, hem jî di 1833yan de serhildana bihêz a Mehmet Elî Paşayê waliyê Misirê rêvebiriya Osmanî dixe nava metirsiyeke mezin. Ji bo li beşên din ên welat bûyerên wuha rû nedin û bi taybetî piştî rûdana serhildana Mîr Muhemmedê Rewandizî bi fermana rêvebiriya Osmanî, Reşîd Mehmet Paşa di 1835an de dest bi sefera Kurdistanê dike. Di encama vê seferê de di serî de mîrektiya Rewandizê, mîrektiyên din ên Kurdistanê statuya xwe ya berê ji dest didin, navendên van mîrektiyan weku navendên rêvebiriye ji holê radibin û di statuya qezayan de bi awayekî resmî bi navendên wîlayetên Osmanî ve tên girêdan. Di nava vê konseptê de Reşîd Mehmet Paşa di 1836an de êrîşî Cizîrê jî dike. Herçend Mîr Sêvdîn demekê bergirî bike jî di dawiyê de vedikişe û xwe davêje bextê waliyê Bexdadê Elî Riza Paşa. Bi vî awayî Mîrektiya Cizîrê jî weku mîrektiyên din ên Kurdistanê statuya xwe ya berê ji dest dide û weku qezayekê careke din bi wîlayeta Diyarbekirê ve tê girêdan. Piştî maweyekê, Bedirxan Beg weku mutesellîmê qezaya Cizîrê ji aliyê Hafîz Mehmet Paşa ve tê tayînkirin²³¹ û bi vî awayî Mîrektiya Cizîrê xweseriya xwe ya bi hevraz û nişûv a ku heta wê rojê dewam kiriye bi temamî ji dest dide û Mîr Bedirxan jî weku karmendekî, li ser navê dewletê kar û barên Cizîra Botan bi rê ve dibe.

Di nava vê guhertina îdarî de Mehmet Elî Paşayê Misrî di 1839an de careke din êrîşî dewleta Osmanî dike û di şerê Nîzîbê de artêşa Osmanî têk dişkîne. Vî şerê ku Mîr Bedirxan û hêzên kurdan jî tê de beşdarî dikin, artêşa Osmanî jî taqetê dixe û careke din keys dikeve destê mîrên kurdan, da ku xwe li hemberî Osmaniyan bihêz bikin û eger mumkîn be weku Mehmet Elî Paşa bikarin serî hildin. Herçend di resmîyetê de statuya Bedirxan Beg ji mîrîtiyê bo mutesellîmiyê ketibe jî, di encama şerê Nîzîbê de ji bo xwerêxistinkirinê, derfeteke baş dikeve destê wî. Di demeke kurt de bi riya îttîfaqên digel mîrên din ên Kurdistanê bi awayekî fîlî dibe hakimê Kurdistanê. Mîr Bedirxan ji bo bihêzkirina hukmê xwe, li Cizîrê kargeheke çekan dadimezrîne û ji bo hilberîna çek û cebilxaneyê hin kesên xwendewar dişeyîne Ewropayê. Ji ber ku Mîr girîngî dide pirçekkirina yekîneyên leşkerî, bi arîkariya kesên ku bi taybetî tên vexwendin; barût, tifîng, demançe û top hildiberîne. Xortên kurd bi mebesta ku di hunerê şer de şareza bibin, bo Ewropayê tên şandin. Li ser Gola Wanê bi keştiyan veguheştina ser avê tê

²³¹ Kardam, b.n., r. 81-82.

kirin.²³² Bi vî awayî Cizîra ku di 1836an de bi destê Reşîd Mehmet Paşa hatibû kavilkirin di demeke kurt de ji aliyê Mîr Bedirxan ve careke din tê avadankirin û asayîş û ewlehî têde berqerar dibe. Mîr Bedirxan li gorî raporeke waliyê Mûsilê Mehmet Tayyar Paşa li Cizîra Botan ji bilî “aşara şer‘îye” ji welatiyan tu bac wernedigirt û zevî li ser xelkê de belav dikir, ji ber wê jî xelkên wîlayeta Mûsilê û deverên din direvîn û diçûn Cizîrê.

Ji ber vê ewlehî, pêşketina aborî û hevkarîya civakî di demeke kurt de Cizîr dibe navenda cazîbeyê û taybetiyên dewletbûnê qezenc dike. Ji xwe li ser vê bingeha ewlehî, aborî û leşkerî, Mîr Bedirxan herçend di resmîyetê de mutesellimê Cizîrê û karmendekî dewleta Osmanî be jî li welatê xwe li ser navê xwe xutbe dide xwendin û sîkke çap dike. Cizîrê weku paytexta dewleta xwe îlan dike û alaya kurdî hildide.²³³ Herwuha Mîr Bedirxan ji bo birêvebirina kar û barên welat; Şêx Ebdulquddusî bo Şeyxulîslamiyê, Tahir Axa bo kar û barên leşkeriyê, Hemîd Axa bo femandariya siwariyan, Efendî Axa bo wezareta darayî û navxweyî tayîn dike²³⁴ û bi vî awayî fiilen serxwebûna xwe îlan dike.

Di vê navê de Mîr Bedirxan bi awayekî jîrane nava xwe û rayedarên dewletê jî xweş digire û naxwaze bala dewleta Osmanî bikêşe ser xwe. Bi vê mebestê li dijî begê Keleha Gurdêlê Seîd Beg digel artêşa Osmanî tevdigere û piştî vê seferê rutbeya “mîralayî”yê bi dest dixe. Li ser daxwaza dewletê êrîşî Xan Mehmûdê mîrê Muksê dike û di 1839an de di şerê Nîzîbê de li dijî artêşa Misrê tevlî artêşa Osmanî dibe. Piştî ku dilsoziya xwe bi dewleta Osmanî dide selmandin bi Xan Mehmûdê Mîrê Muksê, Nurullah Begê Mîrê Hekariyê, Qaymeqamê Mûşê Şerîf Beg û Kor Huseyîn Beg re hevpeymaniyekê çêdike û sînorê desthilata xwe berfirehtir dike.²³⁵ Li gorî belgeyên rayedarên Osmanî, mebesta Mîr Bedirxan û hevpeymanên wî damezrandina dewleteke serbixwe ye. Bo nimûne, muşîrê artêşa Anadolê di rapora ku 1847an de bo sadrazamê Osmanî Mustefa Reşîd Paşa şandiye balê dikêşe ser vê xususiyetê: “Li gorî zanyariyên min ên derbarê vira, rîya xirab a ku Bedirxan daye ber xwe nayê salixdan.

²³² M. S. Lazarev, “19. Yüzyılda Kürdistan”, *Kürdistan Tarihi*, Çapa Sêyem, Avesta, İstanbul, 2010, r. 129.

²³³ Lazarev, “19. Yüzyılda Kürdistan” b.n., r. 130; Kardam, b.n., r. 267-274.

²³⁴ Lütfî, b.n., r. 75.

²³⁵ BOA 118, 17R. 1262; Kardam, b.n., r. 224.

Damezirandina hukumeteke serbixwe li aliyekî, (...) di hişê wan kesên ku ketine nava fesadê de hin xeyalên vala û lenetî hene.”²³⁶

Di vê navê de li ser daxwaza Mehmet Paşayê waliyê Mûsilê di 1841an de rêvebiriya Osmanî, Cizîrê ji aliyê îdarî ve ji Diyarbekirê qut dike û dide ser wîlayeta Mûsilê. Ev bûyer dibe destpêka têkçûna peywendiyên Mîr Bedirxan û dewleta Osmanî. Mehmet Paşa ji ber kîna xwe ya li hemberî Mîr Bedirxan bi pêdagirî dixwaze Cizîrê ji wîlayeta Diyarbekirê veqetîne û bixe nava sînorê Mûsilê. Piştî vê yekê, bi provakasyonên Îngîlîz û Fransiyan Nesturî li dijî Mîr Bedirxan serî hildidin û di encama vê de, Mîr Bedirxan êrîş dibe ser Nesturiyan û wan ji nav dibe. Li ser vê bûyerê balyozxaneyên Îngîlîz û Fransiyan fişar dixin ser rêvebiriya Osmanî, da ku Mîr Bedirxan bidin sekinandin û wî ceza bikin. Di vê navê de xelkê bajarê Wanê jî bi piştgiyariya Mîr Bedirxan û hevpeymanên wî ji ber sîstema îdarî ya Tanzîmatê serî hildidin û rêvebiriya bajar dixin destên xwe. Ji ber van hemû sedeman dewleta Osmanî di 1846an de biryara jinavbirina Mîr Bedirxan dide û di bin femandariya Osman Paşa de artêşeke mezin dişeyîne ser Cizîrê. Bi îxaneta Êzdînşêr hêza bergiriya Mîr Bedirxan dişke û li gorî ragihandina Lutfî bi karîgeriya hin telkînên dînî Mîr Bedirxan bi şertê ku xelk û malbata wî bê parastin, xwe radestî Osmaniyan dike.²³⁷ Piştî radestbûna Mîr Bedirxan sîstema xweser a mîrekiyê bi awayekî fîlî ji Kurdistanê tê rakirin û herêma dikeve bin îdareya navendî ya Dewleta Osmanî. Ji ber vê boneyê jî Dewleta Osmanî madalyaya fetha Kurdistanê li ser beşdarên vî şerî belav dike, ku li ser rûyekî vê madalyayê navê Kurdistanê hatiye nivîsîn, li ser rûyê din jî Keleha Ewrexê hatiye nexşkirin.²³⁸

²³⁶ BOA 004, 29. 1263; Kardam, b.n., r. 110.

²³⁷ Lutfî, b.n., r. 82-83.

²³⁸ Lutfî, h.b., r. 82.

BEŞA SÊYEM

LI CIZÎRA BOTAN DI PEYDABÛNA EDEBIYATA KURDÎ DE KARÎGERIYA TAYBETMENDIYÊN BAJARVANIYÊ Û SEQAMGÎRIYA SIYASÎ

Cizîr yek ji wan bajaran e ku ji mêj ve têde çandê bajarvaniyê peyda bûye. Di vî bajarî de her dem mîna hev nebe jî cure rêvebirîyek, bingeheke bihêz a cotyariyê, bazirganiyê û pîşesaziya destî; heterojeniya civakî, neteweyî û dînî; herwuha avahîsazî, perestgehên dînî û navendên xwendin û rewşenbîriyê weku unsûrên bajarvaniyê derketine holê û li ser vê bingehe dem bi dem şaristanî, zanist û edebiyat geş bûye. Cizîr bi sûr û perestgehên xwe weku bajarekî antîk, bi seray û koşk û kelehên xwe weku navendeke îdarî, bi cotyarî, bazirganî û pîşesaziya xwe ya sivik weku bajarekî serdema navîn, bi mizgevt, medrese, tekya, xan, hemam, bazar û pirên xwe weku bajarekî îslamî, bi netewe, ziman, dîn û mezhebên xwe yê ciyawaz weku bajarekî kozmopolît xwedî nasnameyeke rengîn a bajarvaniyê ye. Cizîra ku bi vê dewlemendiya dîrokî, fîzîkî, mirovî û şaristanî nasnameya xwe ya bajarbûnê îspatkiriye ji aliyê xelkê Cizîrê ve weku “bajêr” hatiye binavkirin û bajarbûna wê weku nav pê ve zeliqiye. Lewra ew bajarên ku xwedî çand û kevneşopîyeke bajarvaniyê ne ji navê xwe zêdetir bi bajarbûna xwe hatine nasîn. Bêguman gelek aliyên bajarvaniya Cizîrê hene û hemû jî beşek in ji nasname û şaristaniya vî bajarê dêrîn, lê em ê ji van taybetmendiyên bajarvaniya Cizîrê behsa bingeha aborî û bazirganî, avadanî, heterojeniya civakî, rêvebirî û dezgehên xwendin û edebiyatê bikin. Piştî van taybetmendiyên bajarvaniya Cizîra Botan, em ê rola seqamgîriya siyasî û karîgeriya wê ya li ser geşbûna edebiyatê lêbikolin.

1. BINGEHA ABORÎ Û BAZIRGANIYA CIZÎRÊ

Bihêzbûna bingeha aborî û pêşketina bazirganiyê, yek ji taybetmendiyên girîng ên bajarên serdema navîn bû. Cizîr jî weku bajarekî serdema navîn û îslamî ji ber cihê xwe yê coxrafi, xwedan bingeheke xurt a aborî û bazirganî bû. Lewra cihê coxrafi yê Cizîrê hem rê dida bazirganiya erdî hem jî rê dida bazirganiya ser avê. Ji ber vê taybetiya bajêr, çalakiyên bazirganiyê li Cizîrê gelek zêde bû.²³⁹ Bi taybetî bazirganiya ku li ser Rûbarê Dîcleyê dihat kirin sêdeke mezin digihand bajêr, lewra bazirganiya ser avê ji bazirganiya erdî gelek erzantir û hêsantir bû. Biryarnameya maksîmum a ku ji aliyê Împaratorê Romainê Diocletianus ve hatiye derxistin, vê taybetmendiya bazirganî ya ser avê piştrast dike. Li gorî vê biryarnamê di wê serdemê de veguhestina erdî ji veguhestina rûbaran 5-10 car buhatir bûye, veguhestina rûbaran jî ji ya deryayan 5 car buhatir bûye. Bi vî awayî derdikeve ku bajarên bi bender li gorî bajarên erdî xwedî avantajên mezintir ên bazirganiyê bûne.²⁴⁰

Cizîra ku li ser Rûbarê Dîcleyê bû di heman demê de bendereke girîng a bazirganiyê bû, lewra Rûbarê Dîcleyê navendên girîng ên mîna Diyarbekir, Hesênkeyf, Cizîr, Mûsil û Bexdadê bi hev ve girê dida û di nava van bajar û hînterlanda wan de dibû xetêke bazirganî û geştyariyê. Li ser rûbarê Dîcleyê malên bazirganiyê bi riya kelekan dihat veguhestin û kelekên ku ji meşkan dihatin çêkirin bi tonan mal radigirtin.²⁴¹

Li gorî Îbnu Şeddad Cizîr di hêrama xwe de bendera herî girîng bû. Bajar ji bo malên bazirganiyê yê ku ji Ermenistan û welatê Rumê dihatin kendaveke barkirinê bû, herwuha ji bo welatên Ermenistan, Rum; bajarên Meyafarqîn, Erzen û cihên hawîrdorê bendereke navendî bû.²⁴² Di serdema Mîrektiya Azîzan de jî Cizîr êwirgeheke bazirganî bû. Karwanên bazirganî milekî ji Musilê dihatin Mêrdînê û li ser Dîyarbekirê re diçûn Derya Reş, milekî din bi riya Urfayê diçûn Helebê.²⁴³

Cizîr tenê xala veguhestina malên bazirganî nebû di heman demê de bajarekî hilberîner bû. Li Cizîrê penîr, kew, varik û mêweyên hişkirî dihat hilberandin û ev mal ji bo Mûsilê û bajarên din dihatin firotin. Herwuha li nêzîkê Cizîrê komira êzingan,

²³⁹ Muhammed Yusuf Ğandur, *Ortaçağda Cizre Tarihi*, Wergêr: Dr. Fadıl Bedirhanoğlu, ?, Çapa Yekem, Ankara, 2008, r. 212.

²⁴⁰ Mehmet Ali Kılıçbay, *Şehirler ve Kentler*, İmge Kitabevi, Çapa Duyem, Ankara, 2000, r. 147.

²⁴¹ Abdullah Yaşın, *Tarih Kültür ve Cizre*, ?, Ankara, 2007, r. 219.

²⁴² İbnu Şeddad, *el Alaqu'l Xetîre fî Zikri Umera-iş Şam wel Cezîre*, Tehqîq: Yahya Ebbara, Wezaretu'l Seqafe wel İrşadi'l Qewmî, Dimişq, 1978, c. 3, r. 44.

²⁴³ İslam Ansiklopedisi, c. 8, r. 39.

mewij, mêweyên teze, tovê kenevîrê jî dihatin hilberandin.²⁴⁴ Bi vî awayî Cizîrê bi gûz, behîv, fistiş, mewij, gezo, rûnê nivîşk, to, hingiv, qelî, hirî, hevrişm, zad, sebze û mêweyên xwe Mûsil, Bexdad û Samarayê xwedî dikir.²⁴⁵

Li Cizîrê tevî bazirganiyê, cotyarî û ajeldarî jî pêşketî bû. Bajar ji ber taybetiyên xwe yên ciyawaz û bi derfetên xwe yên boş di nava bajarên dewlemend de cih digirt.²⁴⁶ Lewra rûbar, deşt û çiyayên Cizîrê hem ji bo bazirganiyê, hem jî ji bo hîlberîna berhemên cotyarî û ajeldariyê derfeteke baş pêşkêşî xelkê Cizîrê dikir. Ji ber vê çendê gelê Cizîrê bi kedeke mezin coyên avê çê dikir û bi riya van coyan zewiyên xwe av didan û îslah dikirin. Berhemên van zewiyan jî, hem ji bo pêdawîstiyên navxwe hem jî ji bo hinartina derve dihat bikaranîn. Ji ber vê jî, li Cizîrê hem bazirganiya navxwe hem jî ya derve dihat kirin. Loma jî di serdema Hemdanî, Merwanî û Zengiyan de ji bo vê mebestê li bajêr çarşiyên taybet û giştî tên çêkirin.²⁴⁷ Herwuha Evliya Çelebî radigihîne ku li Cizîrê çendîn bazar û çarşiyên bezzazistan ên esnafan hebûn û ev bazarên xweşik ên sergirtî ku li gorî tertîbekê li ser dirêjahiyê hatibûn avakirin di navenda bajêr de cih digirt. Ji ber dewlemendiya bajêr jî di sûka sultanî ya bajêr de li bal her esnafî gelek qumaşên giran biha peyda dibûn.²⁴⁸ Îbnu Hewqel jî radigihîne ku ji ber keşîfanî, turîzm û hin tiştên din, di bajêr de bazirganiyeke zindî û berdewam hebû.²⁴⁹ Bi vî awayî derdikeve ku Cizîr bi bazirganî, cotyarî û derfetên xwe yên ajeldariyê hem xwedan taybetmendiyan bajarekî hîlberîner bû hem jî xwedan taybetmendiyan bajarekî bazirganî bû.

Cizîr herçend ji aliyê aborî û bazirganiyê ve xwedan bingeheke xurt bû jî, ji ber neseqamgîriya siyasî û rêvebiriyên xirab, gelek caran tûşî nehametî û nexweşiyên dibû û dewlemendiya bajêr bi destê artêş û rêvebiran dihat berhewakirin. Digel vê yekê jî, vê bingeha bihêz a aborî û bazirganî hertim ji nû ve bajêr radikir ser pêyan û ev diyarde ji bo berdewamiya çanda bajarvaniyê û xwedîderketina li helbestvan û zanyaran dibû xaleke girîng a bajarvaniya Cizîra Botan.

²⁴⁴ Ğandur, b.n., r. 214.

²⁴⁵ İslam Ansiklopedisi, “Cezîre”, c. 7. r. 510.

²⁴⁶ Ğandur, b.n., r. 184.

²⁴⁷ Ğandur, h.b., r. 213.

²⁴⁸ Evliya Çelebi, *Seyahatname*, Amadekar: Robert Dankoff, Seyit Ali Kahraman, Yücel Dalı, Yapı Kredi Yayınları, c. 4, r. 316.

²⁴⁹ İbn Hewqel, *Kîtabu Suretil Erd*, Daru Mektebeti'l Heyat, Beyrût, 1992, r. 202.

2. AVADANIYA CIZÎRÊ

Di dirêjahiya dîroka xwe de bajarê Cizîrê gelek caran tê kavilkirin û gelek caran jî tê avakirin. Li gorî çavkaniyan, piştî hatina îslamê yekemîn helmata avadaniyê di serdema rêvebiriya waliyê Ebbasiyan Hesên Îbnu Ûmer et Texlîbî de tê kirin. Bi destê vî kesî li bajar pir, mizgevt, karwanseray, avero û hemam tîr çêkîrin. Di serdema Merwanî, Zengî û Eyyûbiyan de bajar ji aliyê avadaniyê ve digihîje lutkeyê. Di serdema Mîrektiya Azîzan de jî gelek medrese û serayên berkevtî tîr avakirin. Bi taybetî di serdema Bedir Begê kurê Şah Elî Beg de li her cihê welat avadanî geş dibe û bi gotina Şerefxan welat dibe cihekî bi pîr û bereket.²⁵⁰

Li gorî Îbnu Hewqel Cizîr bi avahiyên xwe yêr xweşik ji hemû bajarên din ên herêma xwe ciyawaztir e.²⁵¹ Îbnu Şeddad dibêje dora bajar bi sûran girtiye û sê deriyên sûrên bajêr hene. Di nava sûran de du mizgevtên mezin, heştê mizgevtê biçûk, çar medrese, du xaneqa, yek nexweşxane û çardeh hemam hene.²⁵² Li gorî Wolker jî li Mezopotamyayê derbxane cara pêşî li Cizîrê hatiye damezirandin. Ji ber vê çendê, ji serdema Merwaniyan gelek pere û sîkke heta roja îro jî mane.²⁵³

Evliya Çelebî behsa çendîn serayên bilind ên Cizîrê û xaniyên xweşik ên ‘ayan, eşraf û kîbaran dike. Seraya şahane ya Mîr di nava kelehê de ye û tîde du sed jûr, eywanên fireh û hemam hene. Seray bi ciwanî û narîniya xwe dişibe qesra Xawernaqê. Li bajar şeş medreseyên mezin, çendîn tekya, çar hemam, çarşiyên sergirtî, gelek xanên bazirganan û jûrên ezaban hene. Di nava van avahiyan de piştî seraya Mîr, Hemama Beg jî bala Evliya Çelebî dikêşe û li hemberî mîmariya vê hemamê sersurman dibe. Lewra ava hemamê ji çiyayên bilind û di bin rûbar re bi riya qenalan heta nava hemama hundirê kelehê hatiye kişandin. Ji bilî her çar hemamên Qazî, Meydan, Nasîrî û Beg nêzîkî sed û pêncî hemamên serayan jî hene.²⁵⁴ Ev jimareya zêde ya hemamên serayan nîşaneyê zêdebûna serayên Cizîrê ye jî. Avahiyên Cizîrê ji aliyê mîmariya xwe ve jî bala gerokên serdema navîn kêşaye û ragihandine ku Cizîr ji aliyê mîmariyê ve bajarê herî xweşik ê herêma ye.²⁵⁵ Ji xwe ew fîgur û dekorasyonên ku li ser bermayên dîrokî yêr Cizîrê hatine nexşîkirin nîşaneyên berçav ên pêşketina mîmariya vî bajarî ne. Hemû

²⁵⁰ Şerefxanê Bedlîsî, *Şerefname*, Wergêr: Ziya Avcî, Avesta, Çapa Duyem, Stenbol, 2007, r. 222.

²⁵¹ Îbn Hewqel, b.n., r. 203.

²⁵² Îbn Şeddad, b.n., c. 3, r. 214-215.

²⁵³ Gandur, b.n., r. 328-329.

²⁵⁴ Çelebî, b.n., c. 4, r. 316.

²⁵⁵ Gandur, b.n., r. 207.

ev berhemên mîmariyên Cizîrê diselmînin ku bajar bûye cihê dahênana hunerî û zemîna afirîneriya berhemên edebî.

3. HETEROJENIYA CIVAKÎ YA CIZÎRÊ

Ji destpêka bajarên pêşî û vir ve li bajaran peydabûna çînen ciyawaz yek ji diyardeyên girîng ên heterojeniyaya civakî ya bajaran bû. Bi taybetî ew bajarên ku xwedî sistemeke rêvebiriye bûn û di wan de hilberîn û bazirganî geşesendibû, cihê peydabûna çînen ciyawaz ên civakî bûn. Cizîra Botan jî bi rêvebiriya xwe ya taybet, bi cotyarî û bazirganiya xwe ya ser erdê û ser avê, xwedî çînen ciyawaz ên civakî bû. Bêguman di hiyerarşiya çînen civata Cizîrê de weku rêvebirên welat, di serî de Mîr û malbata wî dihat. Malbata Azîzan tekane malbata rêvebir bû û hemû hoz û çînen civakî, neteweyî, dînî yê Cizîra Botan mafê rêvebirina Malbata Azîzan qebûl dikir. Li dû mala mîr, serokhoz û axayên binemaleyên girîng dihatin. Ev çîna girîng jî di keleh û navçeyên Cizîrê de rûdinişt û di karê rêvebirina welat de xwedî hêz û gotin bûn. Di rêza sisiyan de karmend û pîledarên seraya mîr ên weku qazî, muftî, zana û katib dihatin. Di rêza çaran de pîşesaz û bazirgan dihatin. Lewra li Cizîrê her cure bazirgan, dikandar, esnaf, hirîvan, berhemhênerên hevrîshmê û keştîvan peyda dibûn. Ji bilî vana seyîd û şerîfên esîlzade, melayên medreseyan, şêx û derwêşên tekyeyan jî weku çînen civata bajarî di nava xelkê de xwedî rêz û dîlovaniyê bûn. Herî dawî mirov dikare behsa cotyar û koçeran bike ku li gund û zozanên derûdora Cizîrê berhemên cotyarî û ajeldariyê hildiberandin û bi saya berhemên wan, pêdawîstiyên welat dihat dabînkirin û aborî û bazirganiya welat xurt dibû. Bi giştî Mîr û malbata xwe di seraya Cizîrê de, serokhoz û axa di keleh û navçeyên Cizîrê de weku çînen rêvebir; karmendên serayê, zana, mela û şêx weku çîna xwendewar a bajarî; pîşekar, esnaf û bazirganên bajêr, cotyar û koçerên gund û zozanan jî weku çînen hilberîner, sê çînen sereke yê civata Cizîra Botan pêk dianîn. Ji bilî vana gelek bazirganên biyanî jî li navenda bajêr peyda dibûn û demên ku asayîş û ewlehî dihat dabînkirin bajar dibû navenda hevdîtinan, cihê kombûna mirovên ji dîn û nijadên ciyawaz û navenda bazirganên welatên ciya ciya.²⁵⁶

Ji aliyê din ve Cizîr jî ber dîroka xwe ya dêrîn, cihê xwe yê coxraffî û bingeha xwe ya aborî û bazirganiyê ji mêj ve meydana pêkgihîştina şaristanî, bawerî û zimanên ciya ciya bû. Ji xwe li Cizîrê şopên Tofanê, bermayên gutî, asûrî û sasaniyan nîşaneyên

²⁵⁶ Ğandur, h.b., r. 267.

vê yekê ne. Piştî hakîmiyeta musulmanan herçend bajar nasnameyeke îslamî wergirt jî şop û mîrata rabirdûya xwe parast û gihîşt lutkeya heterojeniya xwe ya bajarî. Ji ber vê çendê, di serdema navîn de li Cizîrê çawa ku cejnên Remezan û Qurbanê yên musulmanan dihat pîrozkirin, Noel û Salîba xirîstiyanan, çendîn cejnên êzîdiyan û li gorî *Mem û Zîna* Xanî Newroza cejna neteweyî ya kurdan dihat pîrozkirin. Ji xwe cejna Sefîneyê ya ku li çiyayê Cûdiyê ji bo şahiya danîna keştiya Nûh pêxember dihat gêran²⁵⁷ hemû diyanet û qewmên ciyawaz dianî ba hev û dibû cejneke hevbeş a hemû Cizîriyan.

Cizîr ne tenê ji aliyê dînî ve ji aliyê neteweyî ve jî gelek rengîn û heterojen bû. Herçend li Cizîrê gelê herî dêrîn û serdest kurd be jî, di dirêjahiya dîrokê de gelek gel û milletên din ên mîna asûrî, ermen, yahûdî, ereb, tirk, teter jî li bajêr bi cih dibin. Bo nimûne asûriyên herêmê di serdema hakîmiyeta asûriyan de, erebên hoza Mudar jî demeke kurt berî hatina îslamê û bi taybetî piştî fethên îslamê li herêmê bi cih dibin. Ji sedsala XIan heta sedsala XVan dem bi dem qewmên tirk, teter û tirkmen jî li herêmê bi cih dibin. Di serdema Mîrektiya Azîzan de herçend kurd serdest û zêde bin jî dîsa di nava sînorê bajêr de gelek kêmnîetewe peyda dibin. Bo nimûne, dema Şerefxan keleh û navçeyên Cizîrê dijimêre dibêje di Nahiya Heytemê û Nahiya Şaxê de ermenên xirîstiyani hene, di Kela Dêrdeyê de jî ereb û ermen hene.

Li Cizîrê tevî musulmanan, xirîstiyani, yahûdî, yezîdî û şebek jî dijiyan. Herwuha di serdema Hemdanî û Bedreddîn Lu'lu de demekê şîa jî li bajêr peyda dibin.²⁵⁸ Ji xwe mizgevt û medreseyên musulmanan, manastirên xirîstiyanan û hewrayên yahûdiyan nîşaneyên rengîniya baweriyên Cizîrê ne. Bo nimûne, li gorî ragihandina çavkaniyên serdema navîn, li Cizîrê, Manastira Mar Uhha el Mîrsî, Manastira Yuhanna el Mîrsî, Manastira Kamul, Manastira Marşelita, Manastira Mar Eday, Manastira Mar Yarîs, Manastira Abdun, Manastira Îshaq en Nînewî, Manastira Mar Hebîb yan jî Mar Besîme, Manastira Sefînetu Nûh, Manastira Yuhanna ed Dalyatî, Manastira Mar Cîrcîs bi tevahî duwazdeh manastir hebûn.²⁵⁹ Ev diyarde bi xwe ciyawaziya xelkê Cizîrê radixe ber çavan û asta heterojeniya bajêr nîşan dide.²⁶⁰ Ji ber vê jî Cizîr li gorî çavkaniyên dîrokî

²⁵⁷ Ğandur, h.b., r. 270.

²⁵⁸ Ğandur, h.b., r. 236-245.

²⁵⁹ Ğandur, h.b., r. 254-259.

²⁶⁰ Ğandur, h.b., r. 269.

ji ber sosyalîte, dewlemendî û ewlehiya xwe ya civakî xwedî nifûseke gelek qelbalix bû.²⁶¹

Bêguman Cizîra Botan ji ber vê ciyawaziya dînî, neteweyî û fikrî û ji ber vê têkeliya civakî, ji bo afirîneriya hunerî, edebî û fikrî jîngeheke libar a bajarî pêk dianî û ji bo dahênana edebiyatê, bingeheke bihêz saz dikir. Ji ber vê jî rê li ber pêgihîştina edîb û helbestvanên xwedan şîyan vedikir û dibû qada îlhambexşîna wan. Lewra ew bajarên ku cihê kombûna şaristanî û felsefeyên ciyawaz bûn di heman demê de cihê peydabûna mejîyên gnostîk ên îrfanî bûn²⁶² û ev eqlê pêşketî yê mucered jî yek ji hokarê afirîneriya edebî bû. Ji ber vê jî di nava pêvajoya dîrokî de li Cizîrê gelek zanyar û edîbên hêja peyda bûn û Cizîr bû navendeke girîng a zanist û edebiyatê.

²⁶¹ İslam Ansiklopedisi, “Cezîre”, c. 7, r. 510; Ğandur, b.n., r. 76.

²⁶² Ferheng Cihanbahş, “Veysel Karanî ve Üveysilere Nörolojik ve Genetik Yeni Bir Bakış”, *Uluslararası Veysel Karenî ve Manevî Kültür Mirasımız Sempozyumu*, Başbakanlık Vakıflar Genel Müdürlüğü, Ankara, 2012, r. 33-35.

4. LI CIZÎRÊ RÊVEBIRÎ

Rêvebirî û desthilat ji destpêka bajarên sumerî heta dawiya serdema navîn yek ji hokarên girîng ên peydabûna edebiyatekê bûn. Bi gotina George Makdîsî, bextê edebiyatê bi bextê hukumetan ve girêdayî bû û bi bilindbûn û daketina xanedanan edebiyat jî bilind dibû û dadiket.²⁶³ Ji ber vê jî hebûna xanedanan çawa ku yek ji hokarên derketina bajaran tê qebûlkirin di heman demê de yek ji hokarên bingeîn ên peydabûna edebiyatê jî tê jimartin. Lewra desthilat weku nîzameke îdarî ji bo rêvebirina kar û barên dewletê pêwistî bi dezgehên hukmî yên ku ji hin kesên xwendewar pêk dihat hebû û vê jî rê li ber paratina kesên xwedî zanîn û edebî vedikir. Bo nimûne di bajarên kurdî yên ku navenda îdarî bûn dîwan hebûn ev dîwan nimûneyên biçûk ên dîwanên paytexta xelîfeyê bûn. Di van dîwanan de ji kesên zana, rewşenbîr û edîb rayedar hebûn û van rayedaran digel peywendiyên derve yên mîrekiyê hesabê darayî yê mîrekiyê jî digirt.²⁶⁴ Ji ber vê rola wan a girîng jî ev kesayet weku unsûrên jênerê rêveberiyê dihatin qebûlkirin û ji ber vê pêdiviya îdarî ji aliyê hukumdarên ve dihatin parastin. Di encama vê parastinê de jî li ser destê van kesan berhemên îlmî û edebî derdiketin holê û seray û bajarên parêzvanên wan dibûn navendên peydabûna berhemên edebî.

Ji aliyê din kuttab, medrese û xaneqayên ku bingeha xwendin û edebiyatê bûn di bin sîbera ewlehî û dewlemendiya desthilatdarên bajarî yên xwedî hêz de geş dibûn û gelek caran bi arîkarî û weqfîyeyên wan dikarîbûn li ser piyan bimînin. Ji ber vê çendê hêz û parastin li ku hebûya zanyar û edîban berê xwe didan wir. Bo nimûne endamên akademyên yunanî yên ku Atîna navenda wan a herî girîng bû, piştî ku parastina Împaratoriya Romayê ji dest dan di nava sînorên împaratoriye de pêşî xwe li Kilîseya Nestûrî ya li Urfa û Nisêbînê girtin paşê jî di sedsala şeşan de berê xwe dan cihekî bihêztir û li bajarê Gundî Şapurê ketin bin parastina hukumdarên Împaratoriya Sasanî. Bi têkçûna Sasaniyan û bi serkevtina musulmanan ev car xwendîgeh ji ber hêz û parastina xelîfeyên îslamî derbasî Bexdada Ebbasiyan bû.²⁶⁵ Ev jî nîşan dide ku hem li rojava hem jî li rojhilat edebiyat û zanist demeke dirêj di bin parastin û ewlehiya xanedanan û navendên wan ên rêveberiyê de geş bûn.

²⁶³ George, Makdîsî, *İslam'ın Klasik Çağında ve Hristiyan Batı'da Beşeri İlimler*, Wergêr: Hasan Tuncay Başoğlu, Çapa Yekem, Klasik Yayınları, İstanbul, 2009, r. 284.

²⁶⁴ Ferhad Hacî Ebûş, *El Medîne Kurdiye*, Spîrêz, Çapa Yekem, Erbil, 2004, r. 89.

²⁶⁵ Ira M. Lapidus, *İslam Toplamları Tarihi*, İletişim Yayınları, Wergêr: Yasin Aktay, Çapa Sêyem, İstanbul, 2005, c. 1, r. 148-149.

Ji aliyê xanedanan ve yek ji sedemên xwedî derketinla li edebiyatê jî bi kesayetiya hukumdaran ve girêdayî bû. Mîna ku Lapidus jî dibêje hukumdaran huner û edebiyat weku neynika erêkirina xanedaniya xwe ya narsîstî bi kar dianî û bi riya helbestvanan, seraya xwe weku bihişt, hukmê xwe cîhanî û kesayetiya xwe weku sîbera Xwedayî didan zanîn.²⁶⁶ Li gorî ku Ahmet Yaşar Ocak ji Cahen radigihîne Fexreddîn Behramşah ji aliyê sultanen ve sedema xelatkirina helbestvanan wuha derdibirîne: *“Eger helbest serkevtî be ez ê xezîne û defîneyan bibexşînim. Lewra bi vê pirtûka menzûm dê navê min di vê cîhana fanî de hertim bimîne. Di vê cîhana fanî û demkî de jibîrnebûn û mayîna navê mirov îtibareke mezin û serkevtineke hêja ye.”*²⁶⁷ Bi vî awayî çî ji ber pêwîstiyên îdarî, çî ji ber ewlehî û seqamgîriya bajêr, çî jî ji ber kesayetiya hukumdaran be, xanedanan û navendên wan ên rêvebiriyê di derketina edebiyata nivîskî de roleke berçav û diyar dîtin. Ji ber vê jî li Cizîra Botan peydabûna rêvebiriya Mîrektiya Azîzan li vî bajarî ji bo derketina edebiyata kurdî bû hokareke sereke.

Cizîra Botan piştî îslamê heta dawîya Mîrektiya Azîzan herçend ji aliyê îdarî ve statuya wê gelek caran guherî be jî tu carî ev taybetmendiya xwe ji dest nedaye. Helbet navendên îdarî hemû di yek astî de nebûn û li gorî hêz û desthilata xwe xwedî statuyên ciyawaz bûn. Di vê çarçoveyê de di dewletên îslamî de bi giştî sê cure navendên îdarî hebûn: Paytext, Wîlayet û Sancaq. Cizîr di serdema Emewî û Ebbasiyan de bi giştî weku sancaqekî li ser Mûsilê bû. Di serdema Merwaniyan de bû wîlayeteke vê dewletê. Di serdema Zengiyan de careke din bû sancaqa Mûsilê. Di serdema Eyyûbiyan de bû navenda mîrektiyeke serbixwe. Ji destpêka Mîrektiya Azîzan heta 1514an jî bû paytexta vê mîrektiya serbixwe. Piştî ku Mîrektiya Cizîrê digel mîrektiyên din ên Kurdistanê bi lihevhatinê ketin nava sînorên dewleta Osmanî, Mîrektiya Cizîrê weku hukûmet û Cizîr weku sancaqek bi wîlayeta Diyarbekirê ve hat girêdan. Di 1835an de dema Reşîd Mehmet Paşayê Osmanî êrîş bir ser Mîrektiya Cizîrê, statuya bajêr ji sancaqtiyê ket û Cizîr bû qeza. Di 1841an de qezaya “Cizîr û Botan”ê ji wîlayeta Diyarbekirê hat veqetandin û bi wîlayeta Mûsilê ve hat girêdan. Di dawiyê de di 1847an de piştî ku artêşa Osmanî êrîşî Mîr Bedirxan kir, bi awayekî fiilî Mîrektiya Cizîrê ji nav çû û Cizîra ku bi salan navenda hukûmraniya kurdan bû, veguherî qezayeke jirêzê.

²⁶⁶ Lapidus, h.b., c. 1, r. 136.

²⁶⁷ Ahmet Yaşar, Ocak, *Ortaçağlar Anadolu'sunda İslam'ın Ayak İzleri Selçuklu Dönemi*, Kitap Yayınevi, Çapa Duyem, İstanbul, 2011, r. 306.

Bêguman dema em behsa Cizîra Botan dikin, em tenê behsa bajarekî nakin. Cizîr digel hînterlanda xwe ya îdarî weku yekeyekî yekgirtî bû û dişîbiya bajar-dewletekê. Lewra sînore hukumraniya Mîrektiya Cizîrê gelek berfireh bû û ji bo parastina sînoren îdarî û avadankirina welat li dora Cizîrê gelek keleh û navçe hatibûn avakirin. Îbnu Şeddad hînterlanda îdarî ya Cizîrê bi heşt kelehan temam dike: Keleha Cerahiyyê, Keleha Ferahê, Keleha Berxo, Keleha Finikê, Keleha Nû, Keleha Serayê, Keleha Ewrexê, Keleha Kenkorê.²⁶⁸ Tevî van Kelehan coxrafiyanas Yaqut el Hemewî Hekariyê jî di nava sînore Cizîrê de qebûl dike.²⁶⁹ Di serdema Mîrektiya Azîzan de hînterlanda îdarî ya Cizîra Botan berfirehtir dibe. Şerefxanê Bedlîsî ji nava gelek keleh û navçeyên der û dora Cizîrê tenê navê 14 keleh û navçeyên girîng radigihîne: 1. Nahiyeya Gurgîlê, 2. Keleh û nahiyeya Berekeyê, 3. Keleh û nahiyeya Arûxê (Erûx), 4. Keleh û nahiyeya Pîrûzê, 5. Keleh û nahiyeya Badanê, 6. Nahiyeya Tenzê, 7. Keleh û nahiyeya Finikê, 8. Nahiyeya Torê, 9. Nahiyeya Heytemê, 10. Keleh û nahiyeya Şaxê, 11. Keleha Neş Etelê, 12. Keleha Ermişatê, 13. Keleha Kîwerê, 14. Keleha Dêrdeyê.²⁷⁰ Ebdullah Varlî jimareya kelehan zêdetir dizane û navê bîst kelehên Cizîrê dijmêre: 1. Gurgîl, 2. Badan, 3. Pîroz, 4. Tinzê, 5. Dihê, 6. Bereket, 7. Erwex, 8. Eroş, 9. Finik, 10. Fafan, 11. Deyranî, 12. Heysemê Cilkanî, 13. Şaxa Şildiyar, 14. Şaxa Ermeniyar, 15. Şax, 16. Neşat, 17. Qîver, 18. Qirmiza Kirşiyar, 19. Ermişat, 20. Hitîm.²⁷¹

Ji van keleh û navçeyan her keleh û navçeyek yekeyeke îdarî bû û bi paytexta mîrektiyê ve girêdayî bû. Mîrê Cizîra Botan jî di keleha Cizîrê de rûdinişt û berpirsiyarê hemû kar û barên mîrektiyê bû. Mîr bi riya werasetê û bi pejirandina hozên Cizîra Botan dihat ser hukum û heta dawiya jiyana xwe li ser kar dima. Di destpêkê de ji ber ku ezl û nesba Mîrên Cizîrê li gorî lihevhatina Amasyayê bi destê padîşahên Osmanî nebû, mîrê ku ji aliyê hozên Botan ve bihata pesendkirin ji aliyê padîşahên Osmanî ve jî dihat qebûlkirin û mafê dewleta Osmanî nebû ku destê xwe bike nava kar û barên Mîrektiya Cizîra Botan. Bi vî awayî Mîrên Cizîra Botan weku rêvebirên hukumeteke xweser di nava sînoren xwe yên îdarî de bi awayekî serbixwe kar û barên xwe bi rê ve dibirin.

Mîrên Cizîra Botan, mîna hukumet û dewletên din ên îslamî yên wê demê, li ser zemîna rewşa ya huquqa îslamê hukum dikir û xwedî hêzeke leşkerî bû. Ji ber vê jî li gorî Martîn Van Bruinessen Cizîr di eyaleta Diyarbekirê de hukumeta tekane bû ku

²⁶⁸ Îbnu Şeddad, b.n., c. 3, r. 215.

²⁶⁹ Yaqut el Hemewî, "el Hekkariyye", *Mucemu'l Buldan*, c. 5, r. 408.

²⁷⁰ Bedlîsî, b.n., r. 211-212.

²⁷¹ Ebdullah Memê Mehmed (Hoko) Xanî Varlî, *Dîroka Dugelên Kurdan*, c. 1, r. 338.

muftiyê wê hebû.²⁷² Evliya Çelebî jî dibêje ji bo her mezhebî muftîyek bi tevahî çar muftî û neqîbûl eşrafê Cizîrê hebû.²⁷³ Herwuha li gorî ragihandina Evliya Çelebî Mîrê Cizîrê xwediyê 20 hezar leşkerî bû û dema pêwîst bikira li ser daxwaza dewleta navendî beşdarî şer û seferan dibû. Ji ber vê çendê padîşahên Osmanî di name û fermanên xwe de ji bo Mîrên Cizîrê û mîrên din ên Kurdistanê “Cenabê îzzet me‘ab” digot û rêz û bilindiya wan bi vî awayî nîşan dida.²⁷⁴

Cizîr çawa ku paytexta Mîrektiya Azîzan bû, seraya Mîr jî di nava keleha Cizîrê de navenda rêvebirîya mîrektiye bû. Di serayê de tevî rawêjkar û karmendên Mîr, serokhoz yan jî nûnerên hozên Cizîra Botan jî cih digirtin. Mîr di rêvebirina kar û barên welat de bi van kesan re rawêj dikir û raya wan werdigirt, lê dîsa jî biryara dawî Mîr dida. Li aliyê din di seraya Mîr de hebûna serokhoz û nûnerên hozên welat li hemberî Mîr û desthilata wî nîşaneyane îtaet û rêzgirtina wan hozan bû. Mîr jî bi rawêjkirina digel van kesayetên taybetiyeke meclisê dida dîwanxaneyê xwe û bi hêsanî li ser navê hemû xelkê welat biryar dida. Bi dîtina Martin Van Bruinessen, weku seraya Safewîyan di serayên mîrên kurdan de jî hebûna serokhozan ji bo kontrolkirina hozên welat bû. Lewra dema van hozan li dijî desthilata Mîr serî hilda, Mîr van kesan weku êsîr li dijî wan hozan bi kar dianî.²⁷⁵ Di vê çarçoveyê de seraya Mîr hem navenda rêvebirina welat, hem cihê kombûna ‘ayan, zana û helbestvanan, hem jî sembola herî bihêz a bajarvaniya Cizîra Botan bû.

²⁷² Martin Van Bruinessen, Hendrik Boeschoten, *Evliya Çelebi Diyarbekir’de*, İletişim Yayınları, İstanbul, 2003, r. 59.

²⁷³ Çelebi, b.n., c. 4, r. 315.

²⁷⁴ Çelebi, h.b., c. 10, r. 37.

²⁷⁵ Martin Van Bruinessen, *Ağa, Şeyh, Devlet*, İletişim Yayınları, Çapa Duyem, İstanbul, 2003, r. 251.

5. LI CIZÎRÊ DEZGEHÊN XWENDIN Û EDEBIYATÊ

Di welatên îslamî de navendên xwendin, perwerde, rewşenbîrî û edebiyatê; mizgevt, kuttab, medrese û tekya bûn. Herçend di destpêka îslamê de mizgevt weku cihê îbadetkirin û kombûna muslumanan derkevin holê jî di serdema Emewîyan de bi handana waliyê Besrayê, zanayekî bi navê Ebul Eswed bi mebesta ku xwendina Quranê bi hêsanî bête fêrkirin, xalbendî ji Quranê re datîne û mizgevtan dike bingeha xwendin û perwerdeyê. Ji wê rojê vir ve jî hucreyên mizgevtan dibin cihên fêrkirina xwendina Quranê û xwendingehên seretayî. Lê di sala 1065an de Nîzamul Mulk yekem car li Bexdadê medreseyeke bi navê Medreseya Nîzamiyeyê dadimezirîne û bi vî awayî yekemîn xwendingehên îslamî yê rêkûpêk derdikevin holê.²⁷⁶ Piştî vekirina Medreseya Nîzamiyeyê li gelek bajarên din ên îslamî jî medreseyên bi vî awayî vedibin û medrese dibin bingeheke herî bihêz ên xwendin, zanist û edebiyatê.

Di medreseyan de li teniştê zanistên îslamî ders û madeyên ku peywendîya wan bi ziman û edebiyatê re jî hebû dihatin xwendin. Bo nimûne, di nava mufredata medreseyên îslamî de weku ders û madeyên kitêban serf, nehiw, luxet, meanî, belaxat, beyan, erûz û helbesta cahiliyeyê dihat xwendin û ji vana re zanista edebî dihat gotin.²⁷⁷ Ji ber vê mufredata xwendinê jî di nava gelek medreseyên îslamî de pirtûkxane dihat çêkirin û di van pirtûkxaneyan de derbarê edebiyatê de pirtûk peyda dibûn. Bi saya vê perwerde û derfetê jî di nava şagirdên medreseyan de çandeke edebî peyda dibû û hinekan ji wan berê xwe didan edebiyatê û berhemên edebî dinivîsîn.

Di medreseyên îslamî de ji ber ku îlmên dînî û edebiyat pêkve dihat xwendin, hinek beşên mîna dîrok û wazê jî parçeyek ji edebiyatê dihat qebûlkirin²⁷⁸ û edebiyat digel zanistên beşerî û dînî têkel bû. Ji ber vê jî di nava hel û mercên taybet ên şaristaniya îslamê de bi saya medreseyên îslamî li ser çandeke hevbeş a xwendin û zanistê edebiyateke îslamî derket û di nava hemû gelên musluman de rengvedana vê edebiyatê çêbû. Ev jî vê gotina Terry Eagleton tîne bîra mirov ku dibêje tu carî yek pênasîya edebiyatê nebûye û li gorî serdeman û pêwîstiya desthilat û civatê di çarçove û naveroka wê de guhertin çê bûye.²⁷⁹

²⁷⁶ Hewramî, b.n., r. 240-270.

²⁷⁷ Corcî Zeydan, *Îslam Uygarlıkları Tarihi*, Wergêr: Nejdî Gök, İletişim Yayınları, Çapa Duyem, İstanbul, 2009, c. 1, r. 685.

²⁷⁸ Makdisî, b.n., r. 108.

²⁷⁹ Terry Eagleton, *Edebiyat Kuramı*, Wergêr: Tuncay Birkan, Çapa Sêyem, Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2011, r. 15-30.

Di çavkaniyan de ji bilî mizgevt û medreseyan weku dezgehên xwendin û edebiyatê behsa kuttaban jî tê kirin. Kuttab weku xwendîngehên seretayî cihê hînkirina Quran, rêziman û nivîsê bûn, herwuha cihê xwendin û hînkirina zanista edebê jî bû. Lê hinek ji vana bi taybetî ji bo hînkirina zanista edebê bûn. Ji ber vê jî di hinek çavkaniyan de kuttab weku bîngehên zanista edebê hatine destnîşan kirin.²⁸⁰ Piştî mizgevt, medrese û kuttaban di tekya û xaneqayan de jî di perwerdeya sofîgeriyê de helbest dihat bikaranîn û xwendin û danana helbestê bûbû beşek ji perwerdeya manewî ya tekya û xaneqayan. Bi vî awayî mizgevt, medrese, kuttab û tekya li tenîştî armancên xwe yê giştî bûn navend û jêderên peydabûna edebiyatê û ji ber vê bîngeha bihêz a edebiyatê jî di hin deman de di nava edîban de hişmendiya çîneke serbixwe peyda bû.²⁸¹

Li Cizîrê berî îslamê manastîrên xirîstîyanan û perestgehên zerduştîyan navendên ilm û xwendinê bûn, piştî hatina îslamê jî di nava musulmanên bajêr de bi riya mizgevtan navendên îbadet û fêrkirinê hatin damezirandin. Li gorî çavkaniyên dîrokî cara pêşî di serdema Merwaniyan de medreseyeke mezin a Nîzamiyeyê li Cizîrê tê damezirandin.²⁸² Ev jî nîşan dide ku medreseyên Cizîrê hevtayê medreseyên bajarên mezin ên îslamî di destpêka damezirandina medreseyan de dest bi kar kirine. Bi vî awayî di serdema Merwanî, Atabegî û Eyyûbiyan de di demeke kurt de li Cizîrê gelek zanyar pêdîgihîjin û bajar di vî warî de digihîje lutkeyê. Bi taybetî di serdema Eyyûbî û Atabegên Zengî de bajar dibe navenda pêkgihîştina zanyaran.²⁸³ Ji ber hindê jî, di serdema Zengî û Eyyûbiyan de li Cizîrê medrese zêde dibin. Li gorî ragihandina Îbnu Şeddad di sedsala XIIIan de li Cizîrê du mizgevtên mezin û heştê mescîd hebûn herwuha Îbnu Şeddad behsa pênc medreseyan dike û dibêje ji van medreseyan çar jê, di nava bajêr de bûn, yek jî li derveyê bajêr bû. Medreseya Îbnul Bizrî, Medreseya Zahîruddîn Kaymazê Atabegî, Medreseya Radîviye û Medreseya Qazî Cemaluddîn Ebdurrehîm li nava bajêr bûn, lê Medreseya Şemsuddîn Sûrtekîn li derveyê bajêr bû. Ji bilî van medreseyan di nava bajêr de Tekyaya Selaheddînê el Erec û Tekyaya Zahîriyeyê (Zuhriye) hebû. Li derveyê bajêr jî du tekya hebûn ku yek jê navê wê Tekya Batnayê bû.²⁸⁴

²⁸⁰ Makdisî, b.n., r. 57.

²⁸¹ Makdisî, h.b., r. 112.

²⁸² Ebû Same el-Makdisî, *er-Ravzateyn fi Ahbari'd-Devleteyn*, Beyrut, 2002, c. 1, r. 142 ; Yusuf Baluken, *Mervaniler Devrinde Dini Gruplar Arasındaki Münasebetler*, Yüksek Lisans Tezi, t.ç., Van, 2010, r. 39.

²⁸³ Gandur, b.n., r. 274-275.

²⁸⁴ İbn Şeddad, b.n., c. 3, r. 214-215.

Evliya Çelebiyê ku di serdema Mîrektiya Azîzan de çûye Cizîrê, behsa şeş medreseyên mezin û çendîn tekyayan dike. Ji van medreseyan navê Medreseya Sor a Mîr Ebdal, Medreseya Suleyman Beg, Medreseya Meydanê dide û dibêje du medrese jî di bin kelehê de hebûn. Ji tekyayan jî navê tekyaya Şêx Muhammedul Xews dide û li gorî zanyariyên wî ev tekyaya Neqşebendî di nava goristanê de bû û Şêx Muhammedê ku navê xwe daye vê tekyayê jî gihîştibû pileya qutbiyetê. Li gorî ragihandina Evliya Çelebî, ji bilî medreseyên mezin di nava her mizgevtê bajêr de medreseyeke biçûk hebû û di hucreyên wan de ders dihat xwendin, ji ber vê jî di nava bajarê Cizîrê de gelek zanyarên kurd peyda bûbûn. Evliya ji van zanyaran navê Mela Muhyîddîn, Mela Seyyîd Efendî û Seyyîd Ebdurrehman Efendî dide.²⁸⁵

Li gorî Şerefexan di serdema Mîrekên Azîzan de li Cizîrê gelek mizgevt û medrese hatine avakirin û ji bo van dezgehan gelek gund û zevî hatine weqifkirin. Şerefexan di nava Mîrekên Azîzan de bi taybetî balê dikêşe ser serdema Bedir Begê kurê Şah Elî Beg. Lewra di serdema Bedir Beg de bajar dibe navenda zana û fazilan. Li gorî wî di tu dewr û zemanekî de li Cizîrê ew çend zana nehatine dîtin. Ji van zanayan jî navê Mewlana Mihemmedê Berqelî, Mewlana Ebûbekir, Mewlana Hesên Surçî, Mewlana Zeyneddîn Bebî û Mewlana Seyîd Elî dide û dibêje ev kes di warê zanistên zahîrî û batîni de hîm û çavkaniya zanayên dema xwe bûn û berhemên wan di nava xwendewaran de li ser destan digeriya.²⁸⁶

Bêguman di serdema Mîrektiya Azîzan de giringiyeke mezin bi medreseyan û bi xwendinê hatiye dayîn. Ji xwe jimareya wan medreseyên ku bi destê Mîrên Cizîrê hatine damezirandin vê rastiyê bi awayekî aşkera nîşan dide. Bo nimûne, Mîr Seyfeddîn di kelehê Cizîrê de Medreseya Seyfîyeyê, Mîr Ebdal Medreseya Ebdaliyê û Medreseya Sor, Mîr Mecduddîn li Cizîrê û li Şaxê medreseyên bi navê Medreseya Mecdiyeyê, Mîr Muhamed Medreseya Silêman Beg, Mîr Bedreddîn Medreseya Re'sulmeydanê, Mîr Nasir jî li Tanzehê Medreseya Nasiriyeyê, dide çêkirin.²⁸⁷

Ji ber vê bingeha bihêz a xwendin û zanînê li Cizîrê gelek zanayên navdar derketine ku navê wan li tevahiya cîhana îslamê belav bûye. Li gorî Şemseddîn Samî û M. Yusuf Xendûr di çavkaniyên berê de navê gelek zanayan bi nîsbeya “el Cezerî” derbas dibin²⁸⁸ û ev hemû jî ji Cizîrê ne. Ev kes weku alim, feqîh, muhaddîs, qurra,

²⁸⁵ Çelebi, b.n., c. 4, r. 316-317.

²⁸⁶ Bedlîsî, b.n., r. 224.

²⁸⁷ Yaşın, b.n., r. 46.

²⁸⁸ Samî, “Cezîretuîbnîömer”, b.n., r. 79.

xetîb, nivîskar, helbestvan, dîrokvan, qazî, wezîr hem li Cizîrê hem jî li Îraq, Mezopotamya, Şam û Misirê yan ji bo dersgirtinê yan ji bo dersdayînê yan jî ji bo erkekî din geriyane û şopên xwe li wan deran hiştine. Xendûr ji van zanayên Cizîrê ku bi nasnavê “el Cezerî” hatine nasîn navê çil kesan tomar dike. Bêguman ji bilî van kesan gelek zanyarên din ên Cizîrê jî hebûn. Bo nimûne, Îbnulesîr Mecdûddîn Ebussadet el Mubarek bîn Muhammed el Cezerî, Îbnulesîr Îzzeddîn Ebul Hesên Elî bîn Muhammed el Cezerî, Îbnulesîr Zîyaeddîn Ebulfeth Neşrellah bîn Muhammed el Cezerî, Ebul Xeyr Şemseddîn Muhammed bîn Muhammed bîn Elî bîn Yusuf el Cezerî ji van zanyarên Cizîrê ne ku di nava cîhana îslamê de nav û dengê wan belav bûne. Lê di nava van zanyaran de zanyarê herî balkêş, Îsmâîl Ebul Îz El Cezerî bû. Lewra Ebûl Îz el Cezerî danerê zanista kûmputuran, dahênerê robot, saet, makîneyên avê, kilîlên bi şîfre, qaseyên bi şîfre, termos, pêleyîstokên otomatîk bû û di heman demê de yekemîn zanayê sîbernîtîkê jî bû.²⁸⁹ Hemû ev zanyarên hêja û berhemên wan ên balkêş nîşaneyên bihêzbûna medreseyên Cizîrê bû û bi gotina Sadiq Behaedîn Amêdî Cizîra Botan ji ber van xwendîngeh û medreseyên xwe di nava mîrgehên Kurdistanê de mezintirîn navenda rewşenbîriyê bû.²⁹⁰

²⁸⁹ Yaşın, b.n., r. 376.

²⁹⁰ Sadiq Behaedîn Amêdî, *Hozanvanê Kurd*, Wergera ji Tîpên Erebi: Zeynelabidîn Zinar, Pencînar, Stockholm, 1998, r. 29.

6. LI CIZÎRA BOTAN DI PEYDABÛNA EDEBIYATA KURDÎ DE ROLA SEQAMGÎRIYA SIYASÎ

Peydabûna edebiyata nivîskî û navendbûna bajarekî ji bo dahênana berhemên edebî, di encama pêvajoyên şoreşa cotyariyê, nişteciybûn, avakirina bajaran, sazkirina dewletê, çêbûna refaha civakî û çanda bajarvaniyê mumkîn bûye. Bêguman derbasbûna ji van pêvajoyan û gihîştina asteke pêşketîtir, bi saya seqamgîriya siyasî, ewlehî û darayî çêbûye. Di vê maneyê de seqamgîrî ji bo berdewamiya van pêvajoyên navborî û geşbûna edebiyatekê, merceke serekî û zerûrî ye, lewra seqamgîriyê berdewamî, berdewamiyê jî pêşketin û geşbûnê bi xwe re aniyê. Ji ber vê jî, ew welat û neteweyên ku ji van pêvajoyan derbas nebûne û seqamgîriya xwe ya siyasî dabîn nekirine, nekarîne edebiyateke xurt a nivîskî binin holê. Ew neteweyên ku xwedî bajar û edebiyatên bihêz bûne jî, piştî ku asayîş û seqamgîriya xwe ya siyasî ji dest dane hêdî hêdî ber bi lawazbûnê ve çûne û ji aliyê şaristanî û edebiyatên din ve hatine daqurtandin. Bo nimûne, herçend edebiyata yunanî ji edebiyata latînî kevintir û xurtir bû jî, piştî ku Împaratoriya Romayê seqamgîriya siyasî ya bajar-dewletên yunanî têk birin û ew xistin bin hukmê xwe, pêşketina edebiyata yunanî rawesta û Romayîyan li ser bingeha edebiyata yûnanî, bi saya hêz, dewlemendî û dirêjbûna temenê dewleta xwe, edebiyateke bihêz a latînî anîn holê. Bajarê efsaneyî yê Romayê û edebiyata şikomend a latînî jî di bin vê sîbera seqamgîriya siyasî ya dewleta Romayê de geşesend û bû bingeha edebiyatên nûjen ên neteweyên Ewropayî.

Ji hemû azmûnên neteweyên berê û yên niha derdikeve holê ku dema desthilateke siyasî û civateke rêkxistî demeke dirêj di nava seqamgîrî, aramî û refahê de jiyaye û jîngeheke bajarî pêk aniye di heman demê de edebiyateke bihêz jî li dû xwe hiştiye, lê ew neteweyên ku dahênerên şaristanî û edebiyateke xurt bûne, piştî ku desthilata xwe ya siyasî û civakî ji dest dane, nekarîne li hemberî çand û edebiyatên serdest li ber xwe bidin û ji ber vê jî, yan bi tevahî ji nav çûne yan jî bûne dûajoyê çand û edebiyatên serdest. Bo nimûne, asûriyên ku di serdema Împaratoriya Asûrî de xwedî hêzeke siyasî û civakî bûn di warê zanist û edebiyatê de jî yek ji pêşengên herêma xwe bûn, lê piştî ku demeke dirêj desthilata xwe ya siyasî û civakî ji dest dan, îro ne tenê ziman û edebiyata wan hebûna wan jî ketiye ber metirsiyê.

Bajarê Cizîrê jî, di dirêjahiya dîrokê de ji ber ku gelek caran bûye qada şer û aloziyan û ketiye bin destê dewlet û rêvebiriyên ciya ciya, têde berdewamiya şaristanî û edebiyatê çênebûye û berhem û sermîyanê çandî yê vî bajarî bi destê desthilatdarên

dagîrker gelek caran hatiye talankirin. Lewra herêma Cizîrê ji mêj ve di navbera dewletên rojava û rojhilat, bakur û başûr de bûye meydana şer. Bi ragihandina Muhammed Yusuf Xendûr, ew şerên ku bûn sedema damezirandina împaratoriye cihanî li vê herêmê qewimîn û ji ber vê çendê jî ev herêm demeke dirêj di navbera êrîşên rojava û rojhilat de bû qada şerên desthilatê.²⁹¹ Bi rastî jî Cizîr di serdema antîk de di navbera şerên gutî, babîl, asûr, med, Îskender, Roma û sasanîyan de gelek caran tê kavilkirin. Berî hatina îslamê ji sedsala IIIan heta sedsala VIan jî herêm di navbera dewletên Sasanî û Bîzansî de bûye qada milmilaneyê. Di dawiya desthilatdariya Sasanî û Bîzansiyan de jî herêm vê carê dikeve ber pêla talanên hozên erebî. Bi taybetî her sê hozên Rabîa, Mudar û Bekir ên ku ji Hîcaz û Yemenê tî, herêmê di nava xwe de dikin meydana şer û pevçûnên talankariyê.²⁹²

Piştî fethên îslamî herçend demekê seqamgîrî peyda dibe jî ev dirêj nakêşe. Di serdema Emewîyan de herêm di navbera Sûrî û Îraqîyan de dibe qada têkoşînê. Bi taybetî di navbera hozên Qeysî û Texlîbî de şerên tund diqewimin. Di encama van şeran de herêm dibe navenda serhildanên Xarîciyan. Serhildanên ku di serdema Heccac de dest pê dikin di dawiya serdema Emewîyan de digihîjin asteke metirsîdar. Piştî tepeserkirineke demkî di serdema Xelîfeyê Ebbasî Mehdî de serhildanên Xarîciyan careke din dest pê dikin.²⁹³ Bi taybetî serdemên Xelîfeyên Ebbasî; Mensûr, Harun Reşîd, Me'mûn, û Mutesim de serhildanên tund rû didin. Ji ber van serhildanên berdewam, seqamgîriya siyasiya herêmê xirab dibe, anarşî û tundûtûjî belav dibe û di encama vê de jî gelê herêmê tûşî gelek tengasiyan dibin.²⁹⁴ Lewra Xarîciyan tenê li dijî hêzên dewletê şer nedikir, di heman demê de êrîşî bajaran dikir û mal û milkên xelkê jî talan dikirin.

Piştî dawîlêhatina Dewleta Merwanî ji sedsala XIan heta sedsala XIVan welatên îslamî bi giştî û bajarê Cizîrê jî bi taybetî dikeve ber êrîşên tirk û moxolan. Di vê serdemê de, destpêka serdema Zengî û Eyyûbiyan ne têde, bajar ji ber van êrîş û talanên berdewam, seqamgîrî û ewlehiya xwe ji dest dide, hoz û binemaleyên kurd ên vê herêmê ji neçarî ji cihên xwe koç dikin û ber bi herêmên din ve diçin.²⁹⁵ Piştî êrîşa Selçuqîyan bêguman êrîşa herî dijwar û wêranker êrîşa moxolan bû. Moxolan çawa ku

²⁹¹ Ğandur, b.n., r.32.

²⁹² Ğandur, h.b., r. 49.

²⁹³ İslam Ansiklopedisi, "Cezîre", c. 7, r. 509-510.

²⁹⁴ İsmail Yiğit, "Kuruluşundan Mervaniler Dönemine Kadar Cizre", *Hz. Nuh'tan Günümüze Cizre Sempozyumu*, İstanbul, 1999, r. 56.

²⁹⁵ Bruinessen, *Ağa, Şeyh, Develet*, r. 204.

bajarên din ên îslamî talan û wêran kirin heman tişt anîn serê Cizîrê jî. Ji ber vê çendê ew pêşketinên ku di serdema Zengî û Eyyûbiyan de li bajêr rû dabûn, piştî êrîşa moxolan yekser rawesta û Cizîr paş ve çû. Ev paşketin li gorî Xendûr ji ber polîtîkayên hukumranên biyanî yên mîna moxol, tirkmen û farsan bû. Lewra di bernamêya van hukumranan de ji bilî xurtkirina nifûza xwe û berhevkirina dahata welat tiştekî din tunebû.²⁹⁶ Di encama vê talan û berdanberdanê de jî weku gelek waran di warê xwendin û medreseyan de jî paşketinên mezin çê bûn û medrese veguherîn tewleyên heywanan.²⁹⁷ Ji ber vê, Îbnu Batûtayê ku di sedsala XIVan de diçe Cizîrê diyar dike ku piraniya bajêr kaviş bûbû. Herwuha El Muqrîzî jî dibêje Cizîr di vê serdemê de ji aliyê xelkê wê ve hatibû valakirin.²⁹⁸

Di serdema Mîrektiya Azîzan de carina di navbera Mîrektiya Azîzan û Mîrektiya Hesênkeyfê ya Eyyûbiyan de şer û aloziyên demkî derbikevin jî piştî moxolan êrîşa herî mezin a li ser Cizîrê ji aliyê Tîmûr ve hat kirin. Mîr Îzzeddîn herçend ji bo parastina bajêr coya rûbarê Dîcleyê biguhere û bajar mîna giravekê bi rûbarê Dîcleyê dorpêç bike jî²⁹⁹ Tîmûr şevêkê hemû leşkerên xwe ji Rûbarê Dîcleyê derbas dike, di nava saetekê de tevahiya bajêr dagîr dike û di seranserî welatê mîrîtiyê de dest bi talan, kuştin û wêrankariyê dike.³⁰⁰ Ji ber vê wêrankariyê li gorî ragihandina Evliya Çelebî xelkê Botî li kelekana siwar dibin û bi awayekî perîşan û şerpeze ji ber zordariya Tîmûr bajar vala dikan.³⁰¹ Piştî vekişîna Tîmûr, 70 sal paşê Mîrektiya Cizîrê vê carê dikeve ber êrîşên tirkmenan. Ji sala 1470yan heta sala 1500an bajêr 30 sal di bin dagîrkariya Aqqoyîniyan de dimîne. Rêvebirên Aqqoyînî bajêr bi sistemeke zordar bi rê ve dibin û fişareke mezin dixin ser xelkê Cizîrê. Piştî rizgarkirina Cizîrê ji aliyê Xan Şerefê Mîrê Cizîrê ve Sefewî êrîşê Cizîrê bikin jî bi ser nakevin, lê dîsa jî bi sefer û tacîzên xwe yên berdewam di Kurdistanê de dibin sedema alozî û tevlîheviyên siyasî. Loma jî piraniya mîrên Kurdistanê li hemberî Sefewiyan bi Osmaniyan re peyman girê didin û êrîşên Sefewiyan bi yekcarî didin rawestandin.

Di sedsala XVian de piştî têkçûna Sefewiyan û hevpeymaniya mîrên Kurdistanê digel Osmaniyan, li tevahiya Kurdistanê û bi taybetî li Cizîrê seqamgîriyeke baş peyda dibe. Bi vî awayî, hem êrîşên derve hem jî aloziyên di navbera mîr û hozên Kurdistanê

²⁹⁶ Ğandur, b.n., r. 276.

²⁹⁷ Ğandur, h.b., r. 301.

²⁹⁸ Ğandur, h.b., r. 77.

²⁹⁹ Çelebi, b.n., c. 4, r. 314.

³⁰⁰ Bedlîsî, b.n., r. 216.

³⁰¹ Çelebi, b.n., c. 4, r. 314.

heta radeyeke baş radiwestin. Di nava vê ewlehî û aramiyê de bi taybetî di serdema Mîr Bedirê kurê Şah Elî Beg de li Cizîrê avadanî û geşepêdan çê dibe, medrese tên avakirin û bajar dibe navenda zanist û xwendinê. Ji ber van hemû sedeman jî di vê sedsalê de yekemîn berhemên edebiyata kurdî bi zaravayê Kurmancî tên nivîsîn û Cizîr dibe yek ji wan navendên herî girîng ên edebiyata kurdî.

BEŞA ÇAREM

DI SERDEMA MÎREKTIYA AZÎZAN DE EDEBIYATA KURDÎ

Herweku di beşên berê de jî hat diyarkirin peywendiya desthilat bajar û edebiyatê peywendiyê rasterast e û peydabûn û geşbûna edebiyatê bi hebûn û arîkariya desthilat û çanda bajarvaniyê ve girêdayî ye. Ji ber vê çendê dema li Cizîra Botan di sedsala XIVan de Mîrektiya Azîzan hat ser hukum yekemîn pêngava peydabûna edebiyata kurdî hat avêtin. Piştî vê yekê hemû ew taybetmendiyan bajarvaniya Cizîra Botan di bin rêvebiriya mîrên Azîzan de ji bo derketina edebiyata kurdî bûn palpiştên dahênana edebî. Li ser vê bingehe di sedsala XVian de piştî ku Mîrektiya Azîzan li hemberî êrîşên berdewam ên Sefewiyan digel Osmaniyan hevpeymanî girê dan, li welatê Cizîra Botan seqamgîriyê nîsbî peyda bû û bi vî awayî ji bo peydabûna edebiyata kurdî mercên pêwîst hatin dabînkirin.

Di navbera sedsalên XVian û XVIIan de di çarçoveya peymanê Amasyayê de ji ber ku mîrên Azîzan welatê Cizîra Botan bi awayekî xweser bi rê ve birin û weku hukumetê di nava sînorê mîrektiya xwe de azadane hukum kirin, di vê serdemê de helbestvanekî mezin ê mîna Melayê Cizîrî derket û Cizîr bû navendeke girîng a edebiyata kurdî. Di vê çarçoveyê de medreseyan Cizîrê yên ku ji aliyê Mîrên Azîzan ve dihatin fiyans kirin bûn bingehe perwerdekirina zanyar û edîban û cihê kombûna zanyar û helbestvanên derveyê Cizîrê. Ji xwe ji ber vê cazîbeya Cizîrê bû ku Feqiyê Teyran û Ehmedê Xaniyê ku ne ji Cizîrê bûn hatin vî bajarî. Feqî digel Melayê Cizîrî danberheveke helbestî danî û Xanî jî li ser çîrok û efsaneyên Cizîra Botan berhema xwe ya navdar *Mem û Zînê* nivîsî.

Digel ku Mîrektiya Cizîra Botan heta sedsala XIXan jî dewam kir li gorî agahiyên li ber destan piştî sedsala XVIIan em rastî tu helbestvanekî Cizîrî nayên. Ev rewş jî weku me di beşa duyem de jî diyar kir ji ber lawazketina Mîrektiya Azîzan û destêwerdana rayedarên Osmanî bû. Lewra li gorî Şerefxan, rayedarên dewleta Osmanî hêja di serdema Mîr Şerefê Sêyem de destê xwe dîkin nava kar û barên mîrektiye³⁰² û di naverasta sedsala XVIIan de ev destêwerdan li gorî hin kesan tê radewa jinavbirina rêvebiriya mîran³⁰³. Lê weku me berê jî behs kir ji sedsala XVIIan şûnde peywendiyên dewleta Osmanî û Mîrektiya Cizîra Botan diguhere û piştî vê dîrokê dewleta Osmanî

³⁰² Şerefxanê Bedlîsî, *Şerefname*, Wergêr: Ziya Avcı, Avesta, Çapa Duyem, Stenbol, 2007, r. 233-235.

³⁰³ Nazmi Sevgen, *Doğu ve Güneydoğu Anadolu'da Türk Beylikleri*, Amadekar: Şükrü Kaya Seferoğlu, Halil Kemal Türközü, Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü, Ankara, 1982, r. 60.

gelek caran dest datîne ser rêvebirî û baca mîrekiyê û xweseriya Mîrekiya Cizîra Botan qels dixe. Ji ber vê çendê jî bi dîtina me di nava welatê Cizîra Botan de gelek caran alozî peyda dibe û ji ber ku çavkaniyên darayî yên mîrekiyê bi destê rayedarên dewleta Osmanî tîne talankirin êdî mîrên Azîzan nikarin li helbestvan û edîban xwedî derkevin. Ji ber vê jî di vê maweyê de tu helbestvanekî Cizîrî dernakeve û bêdengiyeke mezin çê dibe. Loma jî di navbera sedsalên XVI û XVIIan de tenê du helbestvanên Cizîrê derdikevin û du helbestvanên navdar ên kurd jî diçin Cizîrê û şahidiya bajarvaniya Cizîra Botan dikin.

1. DI SERDEMA MÎREKTIYA AZÎZAN DE HELBESTVANÊN CIZÎRÎ

1.2. MELAYÊ CIZÎRÎ

Derbarê jiyân û jidayîkbûna Melayê Cizîrî de herweku helbestvanên din ên kurd di çavkaniyan de ragihandinên ciya ciya hene, lewra di serdema wan de derbarê jiyana helbestvanên kurd de tu tezkîreyek nehatiye nivîsîn yan jî xebateke bi vî şêweyî nehatiye kirin. Ji ber vê çendê, her kesê ku xwestiye dîroka jidayîkbûna Mela bizane, yan xwe sipartiye ragihandinan yan jî daye pey şop û îşaretên hesabê ebcedê. Bo nimûne, Qanatê Kurdo di *Tarîxa Edebiyata Kurdî* de cih dide van ragihandinên ciyawaz û dibêje, li gorî Aleksandir Jaba, Mela di sala 1145/1146an de ji dayîk bûye. Eladîn Secadî di pirtûka xwe ya *Mêjûy Edebî Kurdî* de radigihîne ku Mela di sala 1407an de ji dayîk bûye û 1481an de miriye.³⁰⁴ Îngîlîzê kurdnas D. N. MacKenzie jî dibêje Mela di navbera salên 1570-1640î de jiyaye.³⁰⁵ Herweku van kesan Feqî Huseyn Sağniç jî bêtî ku çavkaniyekê nîşan bide dîroka jidayîkbûna Mela weku 1589 destnîşan dike.³⁰⁶ Zeynel Abidîn Zinar xwe dispêre vê risteya dîwana Melayê Cizîrî ya “*Ji herfan mah û salê ma, nehat der şiklê xalî ma*” û dibêje herçend di hinek nusxeyên dîwanê de gotinên “şiklê xalî” weku “şiklê falê” hatibe nivîsîn jî di çapa dîwanê ya Bexdadê de, ev gotin bi “şiklê xalî” hatiye nivîsîn, loma jî bi dîtina Zeynel Abidîn Zinar bi hesabê ebcedê ev rêz dike 980yê koçî ku bi zayînî dike 1570.³⁰⁷ Lê di serî de Mela Ehmedê Zivingî gelek lêkoleran weku di piraniya destnivîsên dîwanê de jî derbas dibe risteya navborî bi awayê “falê ma” xwendine, ku ev riste bi hesabê ebcedê dike 975ê koçî û 1567ê zayînî.³⁰⁸ Herwuha Tehsîn Îbrahîm Doskî xwe dispêre malika Feqiyê Teyran a “*Heft eyn ku lam jê bû cuda/Şîn û girî dîsa tê da*” û ji vê malikê dîroka mirina Melayê Cizîrî weku 1050yê koçî û 1640ê zayînî destnîşan dike.³⁰⁹ Meruf Xeznedar jî xwe dispêre agahiyên Mela Ehmedê Zivingî û dibêje Melayê Cizîrî di navbera salên 1567 û 1640î de jiyaye.³¹⁰

Herçend di nava van ragihandinan de ciyawazî hebin jî li gorî naveroka dîwana Mela mirov dikare bibêje ku Mela li nîveya duyem a sedsala XVIan ji dayîk bûye.

³⁰⁴ Eladîn Secadî, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Çapxaney Mearîf, Bexda, 1952, c. 1. r. 155.

³⁰⁵ Qanatê Kurdo, *Tarîxa Edebiyata Kurdî*, Lîs, İstanbul, 2010, r. 117.

³⁰⁶ Feqî Huseyn Sağniç, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Çapa Yekem, İstanbul, 2002, r. 375.

³⁰⁷ Zeynel Abidîn Zinar, *Pêşgotina Dîwana Melayê Cizîrî*, Fîrat Yayınları, İstanbul, ?, r. 12.

³⁰⁸ Melayê Cizîrî, *Dîwan*, Berhevkirin û Vebijartin: Tehsîn Îbrahîm Doskî, Nûbihar, Çapa Yekem, İstanbul, 2012, r. 18-19.

³⁰⁹ Melayê Cizîrî, *Dîwan*, Berhevkirin û Vebijartin: Tehsîn Îbrahîm Doskî, r. 23-24.

³¹⁰ Molla Muhamed Zivingî, “Muqeddîme”, *Mînel Iqdî’l Cewherî fî Şerhî Dîwanî Şeyxî’l Cezerî*, Qamişli b.d., r. (nûn); Xeznedar, b.n., c. 2, r. 289.

Lewra mîna ku M. Emîn Narozi li ser şopa Mela Ehmedê Zivingî amaje pê kiriye Mela di dîwana xwe de behsa hinek kesayetiyên kiriye ku serdema jiyana van kesan ji bo serdema Mela rênîşander in. Ji van kesayetiyên ku navê wan di dîwana Mela de derbas dibin Cengîz Xan di navbera 1162-1227an de, Sadiyê Şîrazî di navbera 1213-1293an de, Hafîz di navbera 1325-1389an de, Tîmûr di navbera 1336-1405an de û Mela Camî di navbera salên 1414-1492an de jiyaye. Ji bilî van kesayetên Mela di helbesteke xwe de cih dide malikeke Ehmed Paşayê Osmanî ku di sala 1497an de miriye.³¹¹ Herwuha em pê dizanin ku Xan Şerefê ku navê wî di dîwanê de derbas dibe di 1500î de Cizîr ji Aqqoyîniyan stendiye. Ev jî nîşan dide ku Mela piştî van kesayetên jiyaye. Herwuha eger berî 1597an navê Melayê Cizîrî belav bibûya dê Şerefîxanê Bedlîsî jî behsa wî bikira, lê Şerefîxan dema behsa alimên navdar ên Cizîrê dike amaje bi Melayê Cizîrî nake.³¹² Lewra li gorî Zeynel Abidîn Zinar, Mela dîwana xwe di 1631ê zayînî de temam kiriye³¹³ û ev jî piştî tememkirina Şerefnameyê ye.

Navê rast ê Melayê Cizîrî Ehmed e, lê ji ber ku di dîwana xwe de digel navê Ehmed û Nîşanî zêdetir nasnavê Mela bikaraniye û li Cizîrê jidayîkbûye, bi navê Melayê Cizîrî deng daye. Li gorî Ebdulqadirê Amêdî, ku di 1820an de nusxeyek ji dîwana Melayê Cizîrî nivîsiye, navê bavê Melayê Cizîrî Şêx Mihemed e.³¹⁴ Lêbelê derheqê malbata Melayê Cizîrî de ragihandinên ciyawaz hene. Li gorî Wezîrê Nadir Mela ji hoza Heseniyan e, Eladîn Secadî li ser destnivîsa Ebdulqadirê Amêdî dibêje ji hoza Boxtiyan e³¹⁵ û Meruf Xeznedar jî dibêje ji malbata Ensariyan e. Ji van ragihandinan, ragihandina Wezîrê Nadir ji rastiye dûr e, lewra li gorî çavkaniyên dîrokî Heseniyan wê serdemê li ser baweriya êzîdîtiyê ne, ji bo vê jî nabe ku Mela ji vê hozê be. Di nava her du ragihandinên din de jî ragihandina herî maqul a Meruf Xeznedar e, lewra destnivîsa dîwana Melayê Cizîrî ya ku di sala 1930yan de ji aliyê Ebdurehmanê Westanî ve hatiye nivîsîn û destnivîsa ku di sala 1937an de ji aliyê Umerê kurê Esad ve hatiye nivîsîn diyar dikin ku Mela ji malbata Ensariyan e.³¹⁶

³¹¹ Zivingî h.b., r. (yê); bnr.: Yrd. Doç. Dr. M. Nesim Doru, *Melayê Cizîrî Felsefî ve Tasavvufî Görüşleri*, Nûbihar, Çapa Yekem, İstanbul, 2012, r. 17-18.

³¹² bnr.: Abdurrahman Adak, "Melayê Cizîrî û Cihê Wî di Edebiyata Kurdî de", g.c., Panel Komeleya Nûbiharê, Batman 30.10.2011.

³¹³ Zinar, b.n., r. 13.

³¹⁴ Zivingî, b.n., r. (zê).

³¹⁵ Secadî, b.n., r. 162.

³¹⁶ Melayê Cizîrî, *Dîwan*, Berhevîkirin û Vebijartin: Tehsîn Îbrahîm Doskî, r. 18.

Li gorî piraniya çavkaniyan Mela cara pêşî li cem bavê xwe dest bi xwendinê kiriye, herwuha Sadiq Behaedîn Amêdî jî dibêje Mela li cem zana û şarezayên mezin ên Cizîrê xwendiyê.³¹⁷ Bi dîtina Eladîn Secadî, Mela di pêvajoya xwendina xwe ya feqîtiyê de ne tenê li Cizîrê, li Amêdî, Hekarî û Diyarbekirê jî maye.³¹⁸ Li gorî Herekol Azîzan (Celadet Elî Bedirxan) Mela bi armanca xwendinê çûye Îraq, Sûriye, Misir û Ecemistanê jî.³¹⁹ Ji çavkaniyên berdest diyar dibe ku Mela di xelesa dawî ya feqîtiya xwe de li gundê Sitrabasa nêzîkê Diyarbekirê maye û li vê derê îcazeta melatiyê ji Mela Teha wergirtiye. Piştî îcazet wergirtinê di gundê Sirbayê ya ser bi Diyarbekirê dest bi melatiyê kiriye, paşê berê xwe daye Hesênkeyfê û li wir melatî kiriye. Li wir dersên îlmên îslamî û zimanê erebî daye û îcazeta melatiyê daye feqîyên xwe. Demeke şûnde vegeriya welatê xwe û heta dawiya jiyana xwe li Cizîrê maye.³²⁰ Li gorî Feqî Huseyn, Melayê Cizîrê ji aliyê Mîrê Cizîrê ve hatiye dawet kirin û Mela li ser daxwaza Mîr heta dawiya umrê xwe di medreseya herî mezin a Cizîrê, Medreseya Sor de, muderisî kiriye.³²¹ Herekol Azîzan, Mela weku berdevkê mîrê Cizîra Botan dide nasîn û li gorî wî sedema çûyîna Mela bo Diyarbekirê xeyîdîna ji Mîr e. Her li gorî ragihandina wî, Mela li Cizîrê çûye rehmetê û li Taxa Torê di Medreseya Sor de hatiye veşartin.³²²

Li Cizîrê di nava gel de derbarê jiyan û taybetmendiyan Melayê Cizîrî de gelek çîrok û menqîbe tên ragihandin û ji ber vê jî Mela li ser zar û zimanê gelê Cizîrî teşeyeke efsanewî û efsûnî wergirtiye. Di vê çarçoveyê de kêma helbestvanên mîna Melayê Cizîrî hene ku piştî mirina xwe di nava gel û bajarê xwe de ev çend zindî mabin û bûbin beşek ji nasname û dîroka bajarên xwe. Loma jî çawa ku Cizîr li ser zimanê Melayê Cizîrî gihîştîye lutkeya navdariya xwe Mela jî li ser zimanê Cizîriyan hertim ji nû ve hatiye vejandin. Ji ber vê jî mirov nizane gelo ew Melayê ku Cizîrî behsa wî dikin çend Melayekî rasteqîn e û çend Melayekî xiyalî ye. Melayê ku Cizîrî behsa wî dikin herçend di nava rastî û efsaneyan de heyberekî nû yê dariştî be jî peywendiya wî bi Melayê rastîn ve heye. Loma jî mirov dikare di nava van ragihandinên devkî û dîwana Melayê Cizîrî de hinek şop û rengên hevbeş bibîne. Ji xwe dema mirov bala xwe dide ser dîwana Melayê Cizîrî û naveroka hinek helbestên wî, derheqê van ragihandinan de

³¹⁷ Amêdî, b.n., r. 73.

³¹⁸ Secadî, b.n., r. 162.

³¹⁹ Herekol Azîzan, "Melayê Cizîrî", *Hawar*, j. 6, 1932, r. 3.

³²⁰ Maruf Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Dezgay Çap û Bellawkirawey Aras, Çapî Duwem, Hewlêr, 2010, c. 2, r. 290.

³²¹ Sağnıç, b.n., r. 379.

³²² Azîzan, g.n., r. 3; Zivingî, b.n., r. (mîm).

hinek delîl li ber destên mirov dikevin û mirov dikare heta radeyekê girîngî bide van ragihandinan.

Mela herî zêde bi evîn û kerametên xwe di nava Cizîriyan de tê bi bîr anîn. Ji ber vê, li ser evîna Mela di nava Cizîriyan de gelek ragihandin hene. Li gorî qewlekî, Mela aşîqê Xatûna Biskesk a mîrzade dibe û ev gotin diçe guhê Mîrê Cizîra Botan. Li ser vê ji bo sihêtiyê Mîr bangî Mela dike û bi sipartina karekî, wî çend rojan di jûreke serayê de mêvan dike. Piştî ku Mela çend roj bi tena serê xwe dimîne, Mîr Xatûna Biskesk dişeyîne jûra Mela û bêyî ku haya Mela jê hebe temaşeyî wan dike. Gava Xatûn dikeve hundir, Mela bi rêzdarî ji ber Xatûnê radibe û piştî destûra Xatûnê li cihê xwe rûdine. Xatûn ji ber ku bi evîna Mela dizane dawa xwendina helbestekê lê dike û Mela li ser daxwaza Xatûnê, hestên xwe yên li hemberî wê bi vê helbestê derdibire û bi vî awayî evîna Mela ya ji bo Xatûna Biskesk bo Mîr diyar dibe.³²³

Sebahulkeyrî xanê min şehê şîrînzabanê min
Tu wî ruh û rewanê min bibit qurban te canê min

Te'alallah çi zat î tu çi wê şîrîn sîfatî tu
Ne wek qend û nebatî tu yeqîn rûh û heyatî tu³²⁴

Ji ber evîna Xatûna Biskesk Mela her roj diçe nava goristana pêşberî pencereya seraya Xatûna Biskesk, piştî xwe dide kêla gorekê û helbestên xwe dixwîne. Ji ber vê evîn û kelecana Mela, kêla ku piştî xwe didiyê weku tenûra sincirandî tîn dide û pîrikeke belengaz piştî ku Mela radibe her roj hevîrê xwe dibe li wê kêla sincirandî dixê û bêyî ku zehmetî bikêşe nanê xwe dipêje.³²⁵ Ji bo piştrastkirina vê ragihandinê jî ev malikên Mela weku delîl tîn nîşandan:

Îro ji nû purateş im dîsa ji remza dilberê
Mecrûhê qewsê purweş im tîr dane nêva cegerê

³²³ Sağnıç, b.n., r. 383.

³²⁴ Melayê Cizîrî, *Dîwan*, Amadekar: Selman Dilovan, Nûbihar, Çapa Yekem, Stenbol, 2010, r. 254.

³²⁵ Sağnıç, b.n., r. 382.

Ji ber ahên me dinê agir û dûd bit ne ‘eceb
Me di dil da heye narek ku disojit seqerê³²⁶

Li gorî ragihandineke din Melayê Cizîrî dema li Cizîrî di medreseya enderûnê ya xanedana Mîrektiya Azîzan de ders dide zarokên Mîrê Cizîra Botan, Mîr ji hin helbestên wî yên ku li ser wesifdana jin û mîrzadeyan e, aciz dibe û ji ber vê, pêşî biryara îdama wî dide û paşê ji vê biryarê poşman dibe û wî sirgûnî Diyarbekirê dike. Di nava gel de tê gotin ku ew heft salên ku Mela li Dîyarbekirê bi mişextî dimîne li Cizîrê çilkek jî baran nabare. Piştî vê maweyê ji Dîyarbekirê Mela rojekê nameyekê dike nava qamişê û di çemê Dicleyê de ber dide û dixwaze rewşê ji bo Mîr diyar bike. Ev qamiş di nava Rezemîran de li nêzîkê Birca Belek ji aliyê xizmetkarên Mîr ve tê dîtin û bi Mîr tê dayîn. Bi wî awayî gihîştina nameyê, piştî çûyîna wî nebarîna baranê û qesîdeya namayê karîgerî li Mîr dike û Mîr têdigihîje ku xeta kiriye. Li ser vê bûyerê Mîr dişeyîne dû Mela û wî dawetî Cizîrê dike. Mela dema digihîje cihekî bi navê Milamişîkê baran dest bi barîna dike. Mîr gelek dikeve bin karîgeriya vê bûyerê û careke din wî vedigerîne ser karê wî yê berê.³²⁷ Eger em di navbera vê ragihandinê û dîwana Melayê Cizîrî de peywendiyekê deynin, em dibînin ku hinek helbestên Mela hene ku vê ragihandinê pişt rast dikin. Mela di van helbestan de behsa fîraq û dûrbûna yarê û xedr û esareta Mîr dike. Herçend peywendiya fîraqa Mela bi evîna tesewufî ve jî hebe dîsa jî rê li ber qebûlkirina vê ragihandinê jî vedike û bivê nevê mirov di navbera van helbestan û vê ragihandinê de peywendiyekê datîne.

Xema îşqê perêhtim ez hebîba xemrevîn kanê
Seranser têk behêtim ez ji derdê ferq û hicranê

Fîraqa dilbera rend e behêtim her wekî find e
Musilmanik di rê min de xeber bit balê sultanê

Xeber bit bal şekerxayê şepal û xûb û zîbayê
Ku mîr e belkî bîr nayê esîrik wê di zindanê³²⁸

³²⁶ Cizîrî, b.n., r. 238-239.

³²⁷ Abdullah Yaşın, *Tarih Kültür ve Cizre*, ?, Ankara, 2007, r. 341-342.

³²⁸ Cizîrî, b.n., r. 229.

Ey nesîmê sibehê ma di mecala seherê
Sed selaman bigehînî ji me wê lebşekerê

Ez bi wê qamet û bejnê li te sondê dixurim
Bes ke ey padişeha min li esîran xederê ³²⁹

Vê firqetê ebter kirîn feryad ji destê firqetê
Jar û zeîf û zer kirîn feryad ji destê firqetê ³³⁰

Li gorî ragihandina Eladîn Secadî dema ku Mela li Hesenkeyfê dersdarî dike, yek ji feqiyên wî îcazet werdigire û bi vê boneya, Mela digel feqiyên govend digire. Di vê navê de Selmaya keça Melîk Kamilê mîrê Hesenkeyfê ji koşka mîrektiyê temaşeyî govenda feqiyên dike û çavê Mela pê dikeve. Piştî vê çavpêketinê Mela dibe giriftarê evîneke bêwêne û gelek helbestên evîndariyê li ser Selmayê dibêje.

Şox û şengê, zuhre rengê, dil ji min bir dil ji min
Awirên heybet pilingê, dil ji min bir dil ji min

Ma bi le'lên canfeza navê me bînit carekê
Bi'ddua bellix tehiyyatî li Selma ya berîd ³³¹

Herweku evîna Mela û Xatûna Biskesk derbarê evîna Mela û Selmaya keça mîrê Hesenkeyfê jî gelek efsane hatine ragihandin. Evîna Mela ji bo Selmayê ev çend di nava bajarê Hesenkeyfê de belav dibe ku ev galegal diçe guhê Mîr jî. Li ser vê hinek nehez diçin cem Mîr û jê re dibêjin nabe ku Melayekî kesnezan bi vî awayî navê te û keça te lekadar bike. Li ser vê Mîr Mela digire û zindanî dike. Evîna Mela di zindanê de her zêdetir dibe. Piştî vê ji Mîr re dibêjin evîna Mela beramberî Selmayê evîneke rasteqîn e, wî bîne û biceribîne, eger rast bû tiştek nabe, lê eger wuha nebû wî bikuje. Li ser vê gotinê Mîr Selmayê dişeyîne bal Mela û bi dizîka çavdêriya wan dike. Dema çavê Mela

³²⁹ Cizîrî, b.n., r. 237-238.

³³⁰ Cizîrî, h.b., r. 246.

³³¹ Secadî, b.n., r. 163-164.

bi Selmayê dikeve dest bi girînê dike û helbest dixwîne. Selma diçe teniştê wî û ew jî hertim xwe jê dûr dike. Selma jê re dibêje Mela çend sal e tu li ser min dîn bûyî, vaye ez li teniştê te me! Mela jê re dibêje ew kes tu nînî û Selma li wê derê dimire.³³²

Li ser dizîna helbestên Mela ji aliyê Mela Dawudê Finikî³³³ ve tê ragihandin ku Melayê Cizîrî, di hinek rojan de, diçû nava dehlê, li cihekî berteng li ser kevirekî rûdinişt û bi deng helbestên xwe dixwend. Gava Melayê Cizîrî helbestên xwe dixwend, Mela Dawid xwe di nava dehlê de li cihekî vedişart û helbestên Mela dinivîsand. Mela Dawid piştî ku helbestên Melayê Cizîrî tomar dikir diçû di nava civatan de digot min ev helbest nivîsîne û bi vî awayî helbestên Melayê Cizîrî li ser navê xwe belav dikir. Ev ragihandin jî xwe dispêre vê helbesta daşorînî ya Mela ku hûrdekariyên wê ji aliyê Mela ve hatiye behskirin.

Ey mela namê te ye xemset‘eşer
Tu bi şî’ra ne te gotî xwe dikî qend û şeker

...

Ev çi şî’r û xezel û medh û senayê xwe dikî
Di civatan we dibêjî me bi te’n û bi xeber

...

Ev çi teqlîd û şîtat in çi bitat in tu dikî
Serî vê ra dihejînî bi dused ah û keser

...

Ehmed im sînesîper pêşberê tîra felekê
De’wedare te me îro tu ji dehlê were der³³⁴

Li ser mirina Melayê Cizîrî jî tê gotin ku Mela di payîzekê de li ser Dicleyê firîngiyeke zer dibîne û piştî xwarina wê firîngiyê wefat dike.³³⁵ Bi vî awayî li Cizîra Botan li ser Melayê Cizîrî gelek ragihandin hene. Ev ragihandin weku me di serî de jî amaje pê kir di nava rastî û efsaneyan de li cihekî bin jî di rastiyê de karîgeriya mezin a

³³² Secadî, b.n., r. 165.

³³³ Hin lêkolera ji gotina “xemset‘eşer” bi hesabê ebcedê navê “Dawud” derxistine herwuha di navê “Mela Dawudê Finikî” de jî panzdeh herf hene ku “xemset‘eşer” tê wateya jimareya panzdehî. Bnr. Cizîrî, b.n., Vebijartin: Tehsîn Îbrahîm Doskî, r. 164; Sağın, b.n., r. 384.

³³⁴ Cizîrî, b.n., r. 300.

³³⁵ Yaşın, b.n., r. 344.

Melayê Cizîrî ya li ser gel û bajarê Cizîrê nîşan didin. Loma jî ev ragihandin bi tevahî efsane bin jî bi awayek ji awayan mezinahiya Mela û hêza wî ya li ser civata bajarî nîşan didin ku ji bo me ev, ji rastiya wan ragihandinan girîngtir e.

Melayê Cizîrî herçend yekemîn helbestvanê edebiyata kurdî nebe jî damezirînerê edebiyata klasîk a kurdî ya bi zaravayê kurmançî ye. Lewra Melayê Cizîrî yekemîn helbestvanê kurd e ku kêşa erûzê û yekîtiya qafiyeya helbesta klasîk a erebî aniye nava edebiyata kurdî û kêşên mîna remel, hezec, recez, besît, serî', muzarî' û xefîf bi kar aniye.³³⁶ Herwuha yekemîn dîwana a murettab a kurdî dîsa ji aliyê Melayê Cizîrî ve hatiye nivîsîn. Herçend edebiyata klasîk a kurdî bi zaravayê kurmançî li gorî edebiyatên milletên cîran dereng destpêkiribe jî Melayê Cizîrî bi edebiyata xwe ya şikomend û bilind di demeke kurt de zimanê kurdî gihîştandiye asta zimanên erebî, farisî û tirkî û bi dîwana xwe ya nûwaze pêvajoya dûredirêj a avakirina zimanê edebî yê klasîk yekser biriye û bi huner û edebiyata xwe ya kêr wêne bi helbestvanê mezin ê fars Hafîz re ketiye pêşbirkê. Ji aliyê din ve bi gotina Îzedîn Mustefa Resûl Melayê Cizîrî yekemîn helbestvanê kurd e ku bi helbestên xwe zimanê kurdî ji qalibên zimanekî folklorîk derxistiye û zimanekî edebî û nivîskî aniye holê. Mela bi dengê xwe yê mîstîk û bihuzn zimanê kurdî gihandiye nîfşa xwe û nîfşên paşerojê. Bi vî awayî qonaxeke nû li pêşiya zimanê kurdî vekiriye û zimanê kurdî di edebiyatê de kiriye hevpişkê zimanên din ên rojhilatî.³³⁷ Helbet di peydabûna dahênerekî mîna Melayê Cizîrî de ji bilî behreya wî ya şexsî hin hokarên derekî hebûn. Bi dîtina me divê mirov van hokarên derekî di jîngeha ku Mela têde jiyaye yanî di bajarê Cizîrê de û helûmercên wê yên siyasî û civakî de bigere. Ji ber vê jî em ê behsa hin hokarên ku li ser kesayetiya edebî ya Mela kartêker bûne û bi giştî peywendiya Mela digel bajarê Cizîrî bikin û em ê bi vî awayî tîrêjen ronahiyê bixin ser paşxaneyê edebî ya Melayê Cizîrî.

³³⁶ Xeznedar, b.n., c. 2, r. 294.

³³⁷ Îzeddin Mustafa Resûl, *Ehmedê Xanî ve Mem û Zîn*, Wergêr: Kadri Yıldırım, Avesta Yayınları, 2007, İstanbul, r. 93.

1.1.1. Peywendiya Melayê Cizîrî Digel Seraya Cizîra Botan

Ji destpêka avakirina bajaran heta dawiya serdema navîn navenda herî bihêz a bajaran seray, di nava serayê de jî hukumdar bûn. Hukumdar di lutkeya pîramîda hiyerarşiya bajêr de cih digirt û bi hêzeke mutleq weku rojê li ser her tişt û her kesî hukum dikir. Weku di Destana Gilgamêşê de jî derbas dibe hêja di serdema bajarên sumerî de hukumdar li hemberî xwedawendên perestgehê têdikoşin û hêza wan a li ser bajaran lawaz dikin. Bi vî awayî li ser bajaran dibin tekane hêz û otorîteya rêvebiriyê û her tiştî dikin bin kontrola xwe. Piştî vê serkevtinê hemû ew pîroziyên xwedawendan derbasî hukumdarên dibin û her hukumdarek mîna xwedawendekî xwe bihêz û xwedî keramet dizane. Ji ber vê çendê hukumdarên pêşî di kesayetîya xwe de hemû beşên jiyane, welat û hemwelatîyan temsîl dikirin³³⁸ û bi vî awayî li ser mirovan otorîteya xwe ya mutleq disepandin.

Ji ber van hokaran jî di avakirina bajarên pêşî de bikerên sereke hukumdar bûn. Di geşkirina bajaran de hukumdarên di navenda bajêr de cih girt û mîna miqnatisekê her tiştî û hemû hêzên şaristanîyetê li dora seraya xwe dicivandin.³³⁹ Lewra hemû hêz, îhsan û ciwankarî di bin destê hukumdarên de bû û herkes mîna seyareyan li dora roja hukumdariyê digeriya. Ji ber vê çendê jî di bajarên pêşî yê Mezopotamya û Misirê de li serayên hukumdarên helbestvan û edîbên serayan peyda bûn û bi vî awayî demeke dirêj edebiyat û bi taybetî helbesta bajarî ya serayê li dor pesindana kesayetîya hukumdarên û hez û daxwazên jiyana serayê hat hunandin.

Di cîhana îslamê de jî piştî damezirandina dewletên Emewî û Ebbasî edebiyateke xurt a serayê derket holê û gelek helbestvan û edîb li dora serayê civiyan. Di vê serdemê de edebiyat heta radeyekê karê çîneke diyarîkirî ya mîna rêvebir û karmendên resmî bû ku van kesayetên xwe dispartin otorîteya xelîfe. Lê di nava demê de ji bilî van kesayetên hinek zanyarên medreseyan jî bi mebesta teltîf û tewecuha hukumdarên û civakê di nava van edîbên serayê de cihên xwe girtin.³⁴⁰ Lewra di nava sîstema monarşîk a dewletên berê de tekane riya xwe gihandina pile û payeyên bilind ên civakî û dabînkirina jiyanekê baş, bidestxistina îltîfat û îhsana hukumdarên û çîna serdest bû. Ji ber vê çendê, helbestvan û edîb bi armanca gihîştina parastina hukumdarên xwedî mulk û bidestveanîna rizamendiya rêvebirên bihêz, berê xwe dan

³³⁸ Lewis Mumford, *Tarih Boyunca Kent*, Wergêr: Gürol Koca, Tamer Tosun, Ayrıntı Yayınları, Çapa Yekem, İstanbul, 2007, r. 54.

³³⁹ Mumford, h.b., r. 51-52.

³⁴⁰ M.G.S. Hodgson, *İslam'ın Serüveni*, İz Yayıncılık, İstanbul, 1993, c. 1, r. 426.

serayê. Lê divê mirov vê jî bizane ku di peywendiya edîb û serayê de patronaj û parastin ji hewcedariyeke du-alî pêk dihat. Lewra çawa ku helbestvan û edîb bi saya parastina hukumdar û serayê dibûn xwedî şan, şeref û pere; wusa jî hukumdar bi riya van edîb û zanyaran nav û nîşanên xwe mezin dikirin.³⁴¹ Ji ber vê çendê jî piraniya helbestvan û edîbên baş di bin hîmayeya hukumdarekî de bûn û bi saya vê berjewendiya du-alî, edîban berhemên hêja li dû xwe dihiştin.

Sedsala XVIan hem li rojhilat hem jî li rojava serdema serayan bû û her seray li gorî hêza hukumdarê xwe dibû navenda dahênana edebî û ciwankariyê. Di vê çarçoveyê de seraya Mîrektiya Cizîra Botan di nava serayên mîrekên Kurdistanê de seraya herî bihêz bû û di derketina helbestvanekî mîna Melayê Cizîrê de rola vê serayê gelek zêde bû. Di dîwana Melayê Cizîrî de çendîn helbest hene ku peywendiya Melayê Cizîrî digel seraya Cizîra Botan nîşan didin. Di serî de her du qesîdeyên Melayê Cizîrî ku ji bo pesindana Mîrê Cizîra Botan hatine nivîsîn, nîşaneyên herî bihêz ên vê peywendiyê ne. Lewra qesîdeyên pesindanê di eslê xwe de cure helbestên serayê bûn û ji bo bidestxistina îltîfata hukumdarên dihatin nivîsîn. Weku Xelîl Înalçik jî dibêje di edebiyata rojhilat de lêgerîna hîmaye û arîkariyê bi riya pêşkêşkirina qesîdeyan xwe nîşan dida³⁴² û nivîsîna qesîdeyan jî zêdetir karê helbestvanên serayê bû. Loma jî ev her du qesîdeyên Melayê Cizîrî nîşan didin ku Mela helbestvanekî serayê ye û xwe sipartiyê hîmayeya Mîrê Cizîra Botan.

Ji van her du qesîdeyên Melayê Cizîrê yek jê bi malika “*Xanê xanan lami‘ê necma te her purnûrî bî/ Keştiya bextê te ez bayê muxalîf dûrî bî*” dest pê dike. Herçend Melayê Cizîrî di qesîdeya xwe de navê Mîrê Cizîra Botan aşkera nekiribe jî cih daye navê paytexta Mîr û Cizîrê weku “paytexta heft îqlîman” raber kiriye. Ji ber vê çendê jî tu guman têde namîne ku ev qesîde ji bo pesindana Mîrê Cizîra Botan hatiye gotin. Li aliyê din Mela bi vê malikê peywendiya xurt a bajêr û serayê jî nîşan daye. Lewra Cizîr bi saya seraya xwe dibe navenda hemû cîhanê û mijara qesîdeya Melayê Cizîrî.

Ma Cizîrê şubhê darê textê heft iqlîmî bit

Hem bi hukm û seltenet Eskender û Fexfûrî bî³⁴³

³⁴¹ Halil İnalçık, *Şair ve Patron*, Doğu Batı Yayınları, Çapa Sêyem, Ankara, 2010, r. 13.

³⁴² İnalçık, b.n., r. 23.

³⁴³ Cizîrî, b.n., r. 224.

Melayê Cizîrê bi vê qesîdeya xwe dawa hîmayekirinê li Mîr kiriye û xwestiye bikeve bin xizmet û parastina Mîrê Cizîra Botan. Ji ber vê jî Mîr dişibîne rojê, asîtana dergehê wî weku cihê bidestxistina dewletê destnîşan dike û bi vî awayî hukumdar weku çavkaniya hêz û îhsanê û xwe jî bende û muhtacê wê hêz û îhsanê raber dike.

Lew ziyaret asîtanê tete şemsa dewletê
Da sehergahan ji dîdarê şerîf purnûri bi³⁴⁴

Di vê malikê de xuya dibe ku seray; navend û çavkaniya ronahî, feyz û îhsanê ye û bi îradeya hukumdar ve girêdayî ye, helbestvan jî abid û daxwazkarê vê feyz û ronahiyê ye. Eger helbestvan bi dîdara Mîr şad û şerîf bibe wê demê ne tenê seher, dê helbestvan jî purnûr bibe. Bi vî awayî Mela, weku çavnêr û hewcedarê lutfa Mîr, bi vê malikê rasterast daxwaza parastinê lê dike. Li aliyê din bi hêmayeke hevbeş a helbesta klasîk Mîr dişibîne rojê. Weku Ehmed Hemdî Tanpınar jî dibêje di nava xeyalên helbestî yên serdema navîn de hukumdar hertim roj bû û mîna rojê rastî kê bihata ew ronî dikir.³⁴⁵ Ev jî nîşan dide ku Mela jî mîna helbestvanên din ên rojhilatî ji ber ku Mîr weku şah û padîşahên din, navenda hêz û îhsanê zaniye bi heman awa û edayî dawa parastinê lê kiriye.

Melayê Cizîrî ji bo dabînkirina parastina Mîr, di dirêjahiya qesîdeya xwe de bi sîtayîş wesfên Mîr dide û ji bo pesnên xwe bihêz bike Mîr dişibîne hin hukumdarên mezin û efsanewî. Di qesîdeyê de hatiye ku Mîr bi dadperweriya xwe mîna Nûşîrewan, bi comerdiya xwe mîna Hatem, bi hukm û desthilata xwe mîna Eskender û Fexfûr, bi bezm û kamiraniya xwe mîna Cem, bi bereketa xwe ya manewî mîna Rûhilqudus, bi temendirêjiya xwe mîna Xizir û Nûh, bi zêdebûn û firehiya mulkê xwe mîna Zulqerneyn û bi karîgeriya desthilata xwe ya efsanewî mîna Suleyman pêxember e. Herwuha Mîr wusa bihêz û dilêr e ku Xusro û Şapûr ne bendê wî ne, belku bendê kurê wî ne.

Bêguman mezinkirina hukumdarên armanca sereke ya qesîdeyan bû û şibandina wan bi şah û padîşahên berê yek ji taybetmendiyên giştî yên edebiyata klasîk a îslamî bû. Lewra şibandina hukumdarekî bi hukumdarên berê vedigere serdema Emewîyan û li gorî ragihandina Teberî cara pêşî xelîfeyê Emewî Yezîd xwe bi padîşahên berê

³⁴⁴ Cizîrî, h.b., r. 224.

³⁴⁵ Ahmet Hamdi Tanpınar, *XIX. Asır Türk Edebiyatı Tarihi*, Yapı Kredi Yayınları, Çapa Heştem, İstanbul, 2010, r. 23.

şibandiye û gotiye: “*Ez kurê Merwan û Xusrev im. Kalê min Qeyserê Bîzansê ye, Xaqanê tirk bapîrê min e.*”³⁴⁶ Mela jî li ser vê rêbazê wuha salixê Mîrê xwe daye:

Paşê Newşîrwan dibê m dê hakimê ‘adil tu yî
Mislê Hatim dê bi danê der cîhan meşhûrî bî

Ma Cizîrê şubhê darê textê heft iqlîmî bit
Hem bi hukm û seltenet Eskender û Fexfûrî bî

Mislê Cem cama zerîn xalî nebî te j’ badeyê
Da ji xemra şadimanî daîma mexmûrî bî

...

Çendekî şîrînpuser derbendê dîwana te bin
Bendê şapûrê te bin ta Xusro û Şapûrî bî

...

Şubhetê Rûhilqudus ‘erdê tu pê lê dayinî
Sebze û reyhan û nesrîn û gulê menqûrî bî

...

Ma te ‘umrê Xedr û Nûh û mulkê Zulqerneyn bitin
Gunbeda çerxê melemme’ her bi te me’ mûrî bî

...

Ger çi der dîwanê hedret pur heqîr in şubhê mûr
Çeşmê te çeşmê Suleymanî bi halê mûrî bî³⁴⁷

“Dîwan” di serayê de hola hevdîtî û cihê qebûlê ye. Ji malika jorîn wuha derdikeve ku Mîrê Cizîra Botan, Mela kiriye bin hîmayeya xwe û ew li huzura xwe li dîwanê qebûl kiriye. Mela jî li hemberî vê îltîfatê, di meqamê sipasiyê de xwe di huzura Mîr de weku mûrekî dihesibîne û Mîr jî weku Suleyman pêxember dizane. Piştî ku Mela bi xizmeta Mîr şa dibe, dibêje ew kesê mîna teyrê goyîn nekeve bin xizmeta Mîr dê şerpeze bibe û têk biçe. Aşkera ye ku Mela helbestvanan dişibîne teyrê goyîn. Lewra

³⁴⁶ Tanpînar, b.n., r. 25.

³⁴⁷ Cizîrî, b.n., r. 225-226.

helbestvan jî mîna teyrê goyîn bi helbestên xwe di huzura Mîr de dinalin û dermanê nalîna wan jî tenê parastin û tewecuha Mîr e.

Ê ne wek goy bê ser û pa bê di benda xizmetê
Ma di çewgana te her perkende û meqhûrî bî³⁴⁸

Ji ber vê Mela hêvî dike ku her di xizmeta Mîr de be, sînga xwe jê re bike deryaya gotinên mirarî û pê pesnê wî bide. Loma jî amadehiya xwe nîşan dide ku tu carî li ber dergehê dewleta Mîr winda nebe û her di bin fermana wî de bi “*me’mûrî*” bimîne.

Her di medhê te’w senayê sîne û qelbê Melê
Bê tafawut qulzema purlu’luwê mensûrî bî

J’asitanê dewletê xaib nebî carek Mela
Da ji fermanê mukerrem dem bi dem me’mûrî bî³⁴⁹

Qesîdeya duyem a Melayê Cizîrî bi malika “*Ey şehinşahê mu‘ezzem Heq nigehtdarê te bî/ Sûreê “İnna Fetehna” dor û madarê te bî*” dest pê dike. Li ser muxatebê vê qesîdeya Mela di nava lêkolerên edebiyata kurdî de fikrên ciyawaz peyda bûne. Lewra ev kes, bêyî ku tevahiya qesîdeyê û rastiyên dîrokî li berçav bigirin, ji hin malikên ku ji bo pesindanê hatine gotin, encamên xelet derxistinine. Bo nimûne:

Ney tinê Tebrîz û Kurdistan li ber hukmê te bin
Sed wekî şahê Xurasanê di ferwarê te bî³⁵⁰

Li ser vê malikê û ji ber ragihandike Hejar ku dibêje di destnivîseke dîwana Melayê Cizîrî de hatiye nivîsîn ku Melayê Cizîrî hevdemê Fatîh Sultan Mehemedê

³⁴⁸ Cizîrî, h.b., r. 226.

³⁴⁹ Cizîrî, h.b., r. 226.

³⁵⁰ Cizîrî, h.b., r. 222.

Osmanî ye³⁵¹ hinek kesan guman kiriye ku muxatebê qesîdeya Mela Fatîh Sultan Mehemed e. Eladîn Secadî jî di *Mêjûy Edîbî Kurdîya* xwe de muxatebên van her du qesîdeyên Melayê Cizîrî ji Sultan Huseyn Baykarayê Teymûrî yê hukumdarê Îranê û Sultan Fatîh û Bayezîdê Duyemê Osmanî yekî dizane.³⁵² Herwuha ji ber ku di serdema Sultan Selîm de di şerê Çaldîranê de Sefewî tîrî şikandin û Tebrîz jî aliyê hêzên Osmanî ve tê dagîr kirin ev malik Sultan Selîmê Osmanî û ji ber ku di serdema Sultan Suleyman de li dijî Eceman sefer tîrî lidarxistin û dewleta Sefewî bi destê Sultan Suleyman tê şikandin heman malik Sultan Suleyman bi bîr bîne jî, ev boçûn û îhtîmal jî rastiye dîr in. Lewra Fatîh Sultan Mehemed di 1512an de, Sultan Selîm di 1520î de Sultan Suleyman jî di 1566an de dimire. Ji ber vê çendê di serdema Fatîh Sultan Mehemed û Sultan Selîm de hêja Melayê Cizîrî nehatiye dinê û di sala mirina Sultan Suleyman de jî Melayê Cizîrî jî dayîk bûye. Ji ber vê jî dîroka hukumraniya van sultanên û jiyana Melayê Cizîrî hev nagirin. Li aliyê din eger Melayê Cizîrî helbesta xwe ji bo Sultanê Osmanî binivîsanda divê yan bi osmanî yan bi farisî yan jî bi erebî binivîsanda, lewra zimanên carî yên wê serdemê ev ziman bûn û bi kurdî heta wê demê ew çend berhemên edebî nehatibû nivîsîn. Ji ber vê çendê em bi rehetî dikarin bibêjin ku ev qesîde jî mîna qesîdeya pêşî ji bo Mîrê Cizîra Botan hatiye nivîsîn. Lewra ev malika jêrîn cihê hukmê kesê ku tê pesinandin bi aşkerayî nîşan dide.

Ger çî der îqlîmê rabi' hate textê seltenet

Padişahê heftî îqlîman selamkarê te bî³⁵³

Ji vê malikê derdikeve ku kesê tê pesinandin paytexta wî di îqlîma çarem de ye. Li gorî zanista coğrafyaya berê mîna ku Îbnû Xeldûn jî dibêje Cizîr dikeve îqlîma çaran beşa şeşan.³⁵⁴ Lê Stenbola ku paytexta dewleta Osmanî bû di îqlîma pêncan beşa çaran de bû.³⁵⁵ Ev agahî jî piştrast dike ku muxatebê vê qesîdeyê ne Sultanê Osmanî ye, Mîrê Cizîra Botan e.

³⁵¹ Hejar, *Dîwanî Rebbanî Şeyx Ehmedî Cizîrî*, Çapa Yekem, Siruş, Tehran, 1361, r. 15.

³⁵² Secadî, b.n., r. 159-160.

³⁵³ Cizîrî, b.n., r. 222.

³⁵⁴ İbn Haldun, *Mukaddime*, Amadekar: Süleyman Uludağ, Dergâh Yayınları, Çapa Duyem, İstanbul, 1991, c. 1, r. 313.

³⁵⁵ İbn Haldun, h.b., c. 1, r. 319.

Dîsa her ji ber vê peyva “Tebrîz”ê ya ku di malika navborî de derbas dibe bi veguhestina Hejar, Mehemed Emîn Zekî Beg muxatebê vê qesîdeyê Îmaduddîn Zengî zaniye ku di wê serdemê de Tebrîz di bin hukmê wî de bûye. Lê bi boçûna helbestvanê navdar û şîrovekerê dîwana Melayê Cizîrî Hejar, navê Tebrîzê tu carî nabe delîl ku muxatebê vê qesîdeyê fermanrewayê Tebrîzê be. Lewra Mela ji Xweda xwestiye ku ew mîrê kurd ê Cizîrê ku rewacê daye îslamê û feqî û melayên wî gelek hene û dersên Quran û hedîsan dibêjin, Xweda wî baladestir bike û wî bike xwediye heft îqlîman. Ji ber vê jî ji Xwedê hêvî kiriye ku ne tenê mulkê Kurdistanê Tebrîz jî bê ser hukumeta wî û xwediye mulkê Xorasanê xwe bide ber daldaye wî.³⁵⁶ Mela Ehmedê Zivingî jî bikaranîna peyva “Tebrîz”ê bi mubalexeya helbestê ve girêdaye û muxatebê qesîdeyê Mîrê Cizîra Botan zaniye.³⁵⁷ Ji xwe qafiyeya vê qesîdeyê ku bi peyva “bî”yê hatiye çêkirin di seranserê qesîdeyê de bi wateya hêvî û niyazê hatiye bikaranîn û ji halê mewcud zêdetir daxwaza Mela nîşan dide.

Mela Ehmedê Zivingî³⁵⁸, Sadiq Behaedîn Amêdî³⁵⁹ û Abdullah Yaşın radigihînin ku ev qesîde ji bo Xan Şerefê Mîrê Cizîra Botan hatiye nivîsîn. Lewra Xan Şeref, di nava mîrên Cizîra Botan de navdartirîn mîr e û di dîroka vê mîrekiyê de xwedî cihekî taybet e. Weku di beşa duyem de jî hat diyarkirin Xan Şeref piştî sî sal dagîrkariya Aqqoyîniyan li dijî wan şerê rizgariyê dike û Cizîrê ji bin destê Aqqoyîniyan rizgar dike. Herwuha piştî vê bi berxwedaneke merdane li hemberî Sefewiyan şerê xweparastinê dike û ev şer dibe sembola têkoşîna serxwebûna Mîrekiya Cizîrê. Ji ber vê çendê bi dîtina Nazmî Sevgen li Cizîrê menqîbeyên rêvebiriya dadperwer a Mîr Şeref heta îro jî li ser zimanan digerin. Li hemberî pêkanîna mafekî gelê Cizîrê hêjî serdema Mîr Şeref bi rêz û pesin bi bîr tînin û rêvebiriya wê demê bi çîrok û serpêhatîyan ji hev re qal dikin.³⁶⁰ Ji ber van mûlahezeyan jî Abdullah Yaşınê ku lêkolerekî Cizîrê ye li ser şopa Mela Ehmedê Zivingî û Sadiq Behaedîn Amêdî, Xan Şeref hêjayî vê qesîdeyê dibîne û bêyî ku ji dîrokê sûd wergire ji bo îspatkirina fikrên xwe tenê van malikên qesîdeyê nimûne tîne:

³⁵⁶ Hejar, b.n., r. 16-21.

³⁵⁷ Zivingî, b.n., r. (yê).

³⁵⁸ Zivingî, h.b., r. (lam).

³⁵⁹ Sadiq Behaedîn Amêdî, *Hozanvanê Kurd*, Wergera ji Tîpên Erebi: Zeynelabidîn Zinar, Pencînar, Stockholm, 1998, r. 36.

³⁶⁰ Sevgen, b.n., r. 54.

Ey şehinşahê mu‘ezzem Heq nighedarê te bî
Sûreê “Înna Fetehna” dor û madarê te bî

Daîma menzilgeha sûra te bit burca şeref
Tali‘ê ferxende û bextê se‘îd yarê te bî³⁶¹

Li gorî Abdullah Yaşin rêza duyem a malika pêşî, yanî “*Sûreê înna fetehna dor û madarê te bî*” îşaret bi sûrên Cizîrê dike ku li ser sûrên Cizîrê di serdema Umer et Texlîbî de sûreya “*înna fetehna*” hatiye nivîsîn. Herwuha bi gotina burca Şeref jî hem navê mîr bi bîr tîne hem jî mezinahî, rûmet û şerefa wî teşbîhê burcekî dike.³⁶² Herçend Abdullah Yaşin wusa bibêje jî Şerefê Duyem ku bi nasnavê Xan Şeref tê nasîn berî şerê Çaldiranê, di sala 1509an de dimire³⁶³ û 57 sal berî jidayîkbûna Mela diçe ser heqiya xwe. Ji xwe li gorî Şerefexan di 1597an de li ser textê Mîrektiya Cizîra Botan Mîr Şerefê Sêyem rûniştiye. Ji ber vê çendê jî, ew delîlên ku Mela Ehmedê Zivingî û Abdullah Yaşin ji bo Xan Şeref tînin di heman demê de ji bo Mîr Şerefê Sêyem jî derbas dibin û rasterast ji Xan Şeref re nabin delîl.

Li aliyê din ji bo îspatkirina îddîaya xwe Abdullah Yaşin bi riya Medresaya Sor peywendiya Xan Şeref û Melayê Cizîrî datîne. Bi dîtina wî, Xan Şeref berî ku êrîşê Aqqoyîniyan bike û wan ji Cizîrê derxe, ji Xwedê lava dike û dibêje: “*Ya Rebî, eger tu girtina Cizîrê bikî nesîbê min, ez ê ji bo te mizgevtêkê çê bikim*” û li ser vê ehda xwe piştî ku Cizîrê digire Medreseya Sor dide avakirin.³⁶⁴ Ji ber ku Melayê Cizîrî di Medreseya Sor de muderisî kiriye û gora wî di turbeya vê medreseyê de tê zanîn, Abdullah Yaşin muxatebê qesîdeya Melayê Cizîrî Xan Şeref dizane. Lê bi dîtina me bingeha vê şîroveyê jî nîne. Lewra tu belgeyekê li ser dîroka avakirina medreseyê nîne û li ser dîroka avakirina medreseyê jî boçûnên ciyawaz hene. Bo nimûne, li gorî Orhan Cezmî Tuncer Medreseya Sor destpêka sedsala XIVan de hatiye avakirin.³⁶⁵ Ji xwe Evliya Çelebî jî dema navên medreseyên Cizîrê tomar dike, Medreseya Sor bi Mîr

³⁶¹ Cizîrî, b.n., r. 221.

³⁶² Yaşin, b.n., r. 344.

³⁶³ Ebdullah Memê Mehmed (Hoko) Xanî Varlî, *Dîroka Dugelên Kurdistan*, c. 1, r. 345.

³⁶⁴ Yaşin, b.n., r. 136.

³⁶⁵ Orhan Cezmî Tuncer, “Mardin-Cizre Kırmızı Medrese”, *Vakıflar Dergisi*, X, Ogun Kardeşler Matbaası, Ankara, 1973, r. 434; M. Zahid Ertekin, *Cizre’deki Mimari Eserler*, 100. Yıl Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, t.ç., Van, 2005, r. 26.

Ebdal ve nîsbet dike. Ev jî nîşan dide ku Medreseya Sor berî Xan Şeref hatiye avakirin û dîroka ku Orhan Cezmî Tuncer texmîn kiriye nêzîktirê rastiyê ye.

Bi dîtina me ji bo diyarkirina muxatebên qesîdeyên Melayê Cizîrî du tişt girîng in, ew jî serdema jiyana Mela û diyarkirina Mîrên wê serdemê. Weku me di destpêka vê beşê de jî diyar kir herçend derbarê serdema jiyana Mela de fikrên ciyawaz hebin jî fikra herî maqul û rast ew e ku Melayê Cizîrî di navbera salên 1566/1567 û 1640î de jiyaye. Li aliyê din li gorî ragihandina Şerefxan ku berhema xwe di 1597an de tamam kiriye mîrê Cizîra Botan ê wê demê Mîr Şerefê Sêyem e. Loma jî bi dîtina me yek ji muxatebên muhtemel ên van her du qesîdeyên Mela, ev mîr e. Lewra dema mirov salixdanên Şerefxan ên ku derheqê Mîr Şerefê Sêyem de ne dinêre ev qenaet li cem mirov bihêztir dibe.

“Emîr Şeref, ji mîrên hîlbijartî û tekmêr ên xanedana mezin a Fermanrewayê Cezîrê yê herî mezin e. Çunkî di meydana merdî, mêrxasî û alîkariyê de ji emsal û dijminên xwe yên di vî warî de serdesttir e. Di meydana merdan de bi kaşoyê mêraniyê gog ajotiye û sebebên rêz û payeyiyê hemî ji xwe re girtiye. Qehra zendên wî yên bivirî û şûrê wî yê tûj û birekî, tev delîl û îsbatên hêjayetî û serdestiyên mîr û mêrxasiyên wî yên ketina ceng û şeran in. Wekî şair gotiye:

Di dema merdîtî, Xatem tama ye, çiloz e, bê mecal

Di ceng û şer de, henekan dike bi Rustemê Zal

A herî rast ew e ku, re'aya û esker ji dadwerî û qencyên wî razî ne û ji fikir û xebatên wî spasdar û minnetdar in ji kirinên wî yên mirovane dilxweş û şad in. Ji ber vê jî ji aliyê giregir û mezinan, kesên di rêzê de, kesên nêzîk û dûr her kesî ve tê hezkirin. Hemî ev kesên han her wext ji Xwedê hêvî û lava dîkin ku vî mîrê jîr û jêhatî ji wan re biparêz e.”³⁶⁶

Ji van salixdanên Şerefxan mirov têdigihîje ku Mîr Şerefê Sêyem ji aliyê Cizîriyan ve gelek hatiye hezkirin û ji ber ku serdema hukumraniya wî rastî salên kemalê yê Melayê Cizîrî tê, maqultir e ku mirov bibêje Mela qesîdeyên xwe pêşkêşî vî mîrî kirine. Lewra malika dawî ya vê qesîdeyê jî nîşan dide ku ew Mîrê ku qesîde ji bo wî hatine pêşkêşkirin sax e û Mela hêvî dike hertim di xizmeta wî de be.

³⁶⁶ Bedlîsî, b.n., r. 239.

Qest û daxwaza Melê daîm ji can û dil ev e
Her di benda xizmetê pêşdestê dîdarê te bî³⁶⁷

Bi pêşkêşkirina van qesîdeyan Melayê Cizîrî dikeve bin parastina Mîrê Cizîra Botan û bi îhtîmaleke mezin piştî vê yekê, Mela weku muderisê Medresaya Sor tê destnîşankirin. Lewra bi gotina Xelîl Înalcik dema helbestvanekî qesîdeyek pêşkêşî hukumdarekî bikira, arîkariya hukumdar xwe bi awayên ciya ciya nîşan dida. Hukumdar li gorî pîşeyê wî helbestvanî eger munşî bûya ew dianî katibiyê, eger ji ulemayan bûya yan ew weku muderis yan jî weku qazî tayîn dikir.³⁶⁸ Wusa xuya ye ku Mîrê Cizîra Botan jî li hemberî van qesîdeyên wî, Mela bi muderisiya medreseya herî mezin a Cizîrê ku Medreseya Sor bûye padaşt kiriye.

Helbesta sêyem a ku peywendiya Melayê Cizîrî digel seraya Cizîra Botan datîne jî danberheva “Mîr û Mela” ye. Ev helbesta gotûbêjî ji aliyê Mîr Umadeddîn û Melayê Cizîrî ve hatiye danîn. Lê herweku muxatebên qesîdeyên Mela li ser Mîr Umadeddîn jî di çavkaniyan de îddîayên ciyawaz hene. Meruf Xeznedar ji ber ku derbarê Mîr Umadeddîn de agahiyên dîrokî bi dest naxe her du beşên vê helbestê jî aîdê Mela dizane û Mîr Umadeddîn kesekî xiyalî dihesibîne. Bi dîtina wî, ne tenê di edebiyata kurdî de nimûneyên wuha hene, di nava edebiyatên rojhilat û rojava de jî ev cure helbest peyda dibin.³⁶⁹ Lê nebûna agahiyên Xeznedar ji nebûna Mîr Umadeddîn re nabe delîl. Li aliyê din Meruf Xeznedarê ku Mîr Umadeddîn weku kesekî xiyalî bi nav dike, danberheva Mîr û Feqî di navbera du helbestvanan de qebûl dike û nabêje ku ev diyardeyeke edîbî ye û her du beş jî ji aliyê Mela ve yan jî aliyê Feqî ve hatine nivîsîn. Loma jî îddîaya Meruf Xeznedar bi dîtina me di cihê xwe de nîne.

Abdullah Yaşin, ji ber ku gora Melayê Cizîrî li Medreseya Sor di nava goristana taybet a malbata mîr de digel gorên Mîr Şerefê Duyem û Mîr Umadeddîn dizane îddîa dike ku Mîr Umadeddîn kurê Mîr Şerefê Duyem e û heval û şagirdê Melayê Cizîrî ye.³⁷⁰ Lê ev gotinên Abdullah Yaşin îddîaya wî îspat nakin, lewra di nava goristana Medreseya Sor de heft gor hene û ji van goran tenê li ser çar kêlan nav hene. Ji nivîsên li ser van kêlan derdikeve ku Mîr Umadeddînê kurê Şerefê Botî di 914ê koçî de, Mîr Şemseddîn (...), Mîr Hecî Muhemmed kurê Mîr Şemseddîn Kîrîktilî di 924ê koçî de,

³⁶⁷ Cizîrî, b.n., r. 223.

³⁶⁸ Înalcik, b.n., r. 28.

³⁶⁹ Xeznedar, b.n., c. 2, r. 346-347.

³⁷⁰ Yaşin, b.n., r. 53-54.

Naz Sosin a keça Hecî Muhemmed Kîrîktîlî jî di 936ê koçî de mirine. Ji bilî vana sê gorên din hene ku li ser wan tu nivîs nînin.³⁷¹ Ev agahî nîşan dide ku Mîr Umadeddîn di 914ê koçî ku dike 1508/1509ê zayînî de miriye û ev jî beriya jidayîkbûna Melayê Cizîrî ye. Ji ber vê, ev Mîr Umadeddînê ku Abdullah Yaşin behsa wî dike ji ber ku beriya jidayîkbûna Mela, miriye nabe ku digel Melayê Cizîrî helbest gotibe. Loma jî bi dîtina me ev ragihandina Abdullah Yaşin rast nîne.

Li gorî Tehsîn Îbrahîm Doskî jî Mîr Umadeddînê ku Mela digel wî helbest gotiye mîrekî ji mîrên Hekariyê ye. Bi dîtina wî, Mîr Umadeddîn ji Hekariyê çûye Cizîrê û li vir li ber destê Melayê Cizîrî xwendiyê. Ev helbest jî li Cizîrê di navbera wî û Mela de hatiye gotin. Dîsa li gorî Doskî, Mîr Umadeddîn heta 1650yan jî li jiyanê bûye û di vê demê de êrîş biriye ser Mîrekiya Behdînan.³⁷² Taha Ebabekir jî di destnivîsa xwe ya dîwana Melayê Cizîrî de di sernavê danberheva Mîr û Mela de dibêje: “*Selamê Şeyx Ehmed-ul Cizîrî ber Emîr Emadeddîn el ‘Ebbasî-yîl Hekkarî quddîse sirruhum*”³⁷³ û Hekarîbûna Mîr Umadeddîn destnîşan dike. Li ser van ragihandinan em dikarin bibêjin ku di nava mîrên Cizîra Botan de mîrekî bi navê Mîr Umadeddîn ku hatibe ser textê mîrekiya Cizîra Botan ji aliyê çavkaniyên dîrokî ve nehatiye tomarkirin, lê weku me di beşa rêvebiriya Cizîra Botan de jî diyar kir Cizîr jî ber ku paytexta Mîrekiya Cizîra Botan bû gelek mîrên li ser xanedanên ciya ciya weku mêvan û şêwirmend di seraya Cizîra Botan de diman, loma jî dibe ku Mîr Umadeddîn jî yek ji van mîran be. Di vê çarçoveyê de ragihandina Tehsîn Îbrahîm Doskî û Taha Ebabekir nêzîktirê rastiyê xuya dikin.

Di nava sîstema patronajê de bêguman ji bo helbestvanekî îltîfata herî mezin hogiriya (musahibî) hukumdaran û rêvebiran bû. Musahibî dihat wateya şêwirmendiya hukumdar û hevaltiya razên wî yên şexsî û hevrêtiya wî ya jiyanê.³⁷⁴ Di vê maneyê de danberheva “Mîr û Mela” vê nîşan dide ku Mela di kariyera xwe ya edebî de gihîştîye pileya dawî ku ew jî hevaltiya digel mîran e. Li aliyê din danberheva Mîr û Mela nîşaneyê herî bihêz a peywendiya Melayê Cizîrî ye digel serayê. Ev peywendî ew çend bihêz û xurt e ku dema Mela wefat jî dike ev peywendiya xurt xwe nîşan dide û Mela di nava goristana taybet a malbata Mîr de tê veşartin û Mela weku endamekî malbata Mîr dibe mezherê îltîfateke taybet.

³⁷¹ Ertekin, b.n., r. 32-34.

³⁷² Hemdi Abdulmecîd Selefî, Tehsîn Îbrahîm Doskî, *Mu'cemu'ş-Şu'eraî'l-Kurd*, Spîrêz, Duhok 2008, r. 76.

³⁷³ Amêdî, b.n., r. 53.

³⁷⁴ Înalcık, b.n., r. 24.

Danberheva Mîr û Mela bi gotin û silava Mela dest pê dike. Lewra Mîr ji ber hêz û otorîteya xwe muqîm e û her kes û her tişt li dora wî digerin. Mela jî weku piraniya helbestvanên serdema xwe hewcedar û daxwazkarê îhsana Mîr e û ji bo xwe bigihîne xizmeta Mîr û ji aliyê wî ve bê qebûlîkirin divê cara pêşî ew li Mîr silav bike.

Mela:

Selama min senaxwanî sehergeh gewher'efşan bit
Bi sûret emrê Subhanî ser elqabê zer'efşan bit
Bi xizmet 'erdê sultanî 'ebîr û 'enber'efşanî

Mîr:

Selama sani'ê Qadir Mela da pê mu'etter bî
Muferreh bit me lê xatir peyapey lê mukerrer bî
Ji cama xatirê 'atir me jê ayîne enwer bî³⁷⁵

Herçend Mîr bi vê danberhevê Mela muxateb qebûl kiriye û qedrê wî girtiye jî, hiyerarşiya di navbera Mîr û Mela di seranserî danberhevê de bi awayekî aşkera xwe nîşan dide. Di dirêjahiya vê gotûbêjê de digel pesindana Mela, Mîr bi xwe jî pesnê xwe dide. Mîr wesf û taybetmendiyên xwe yê hukumdariyê di warê îrfan û eşqê de jî bi bîr tîne û bi vî awayî bi şanazî behsa hêza xwe ya madî û manewî dike.

Mîr:

Ji neş'a badeya kasê bi zat ez xerqê 'urfan im
Bi wê camê bi wê tasê sifetkisra we xaqan im
Ji berqa xemzeelmasê li textê dil Suleyman im³⁷⁶

Mîr:

Di perwazê humadeng in me ser da tacê îqbalê
Şehê Keyxusro û Zeng in serefraz in di vî halê
Werîn saqî meya rengîn me dil maye di vê qalê³⁷⁷

³⁷⁵ Cizîrî, b.n., r. 302.

³⁷⁶ Cizîrî, b.n., r. 304.

Mela li beramberî mezinahî û şanaziya Mîr gelek dilnizim e û xwe li ber dergehê wî axa bin lingan dizane. Mela dibêje eger ez biçim ser felakan jî dîsa di benda Mîr de mîna nêçîrekî me û Mîr kengê bixwaze dikare min nêçîr bike. Çawa Mîr xwe di hukumranî û eşqê de xwedan hêz û desthilat dizane, Mela jî bi heman şêwe wesfên wî yê desthilatê di warê gotin û edebiyatê de jî bi bîr tîne û bi van gotinên xwe şanaziya Mîr dupat dike.

Mela:

Di rê da xakê dergah im belê ewwel jî vê xakê
Bila bê paye û cah im me pê çû ferqê eflakê
Şigarek derxurê şah im di wî bendê di fitrakê

Mela:

Di îqlîmê suxen xaqan rewanbexş û şekerrêz î
Nehin wek te di afaqan bi can ra ‘enber’amêz î
Ji sîmînsa‘id û saqan bi sehharî guherrêz î³⁷⁸

Mîr weku meqamê pesendkirin û qebûlê, Mela di huner û edebiyatê de melevan û sihêrbazê deryaya gotinên mirarî û ji Misirê heta Qezwînê weku xwedî helbestên şekerbar wesif dike ku dikare di carekê de sed helbestî li hev bîne. Herwuha Mîr di dawiya vê danberhevê de jî ber hunera bilind a Mela wî weku ustad qebûl dike. Ev pesindan jî nîşan didin ku cih û pileya Mela di nezera Mîr de gelek bilind e û Mela helbestvanê herî mezin ê seraya Cizîra Botan e.

Mîr:

Bi xewwasî bi sehharî te dur anîn ji behreynê
Ji nezma te şekerbarî ji Misrê ta bi Qezwînê

³⁷⁷ Cizîrî, b.n., r. 308.

³⁷⁸ Cizîrî, b.n., r. 308-309.

Bi diqqet bîn sed eş‘arî dibêjî terfetil‘eynê

...

Mîr:

Di baxê lefz û me‘nayê su xen min serwî azad e

Ji îmla û ji însayê me lewhê dil numa sade

Ji husnê rewneqek dayê ku Şeyx Ehmed me ustad e³⁷⁹

Mela di dawiya danberhevê de rasterast diyar dike ku di bin xizmeta Mîr Umadîn de ye û di qulzuma wî ya nîmetan de gewheran berhev dike. Yanî bi saya wî dikare van gotinên mîna dur û mircanan li hev bîne. Ev jî bi awayekî aşkera nîşan dide ku Mela helbestvanekî serayê ye û di bin sîbera seraya mîran de kariye hunera xwe bîne holê.

Mela:

Ji behra qulzuma mîran bi xewwasî guherçîn im

Di behsa ‘ilm û tefsîran tu deryayan we nabînim

Ji mîr û begler û çîran xulamê mîr Umadîn im³⁸⁰

Melayê Cizîrî ji ber vê peywendiya bihêz a digel mîrên seraya Cizîra Botan û weku helbestvanê vê serayê dema di helbestên xwe de şanazî bi hunera xwe dike di heman demê de xurara seraya Cizîra Botan jî temsîl dike. Bo nimûne dema ji ber dizîna helbestên xwe rexne li Mela Dawid digire, Finika navçeya Mîrektiya Cizîra Botan jî li hemberî Cizîrê biçûk dixê. Ev malika Melayê Cizîrî tenê reqabeta di navbera du helbestvanan destnîşan nake, di heman demê de milmilaneya di navbera paytext û navçeyan jî nîşan dide. Weku me di beşa yekemîn de jî amaje pê kiribû di serdema navîn de di nava sîstemên rêvebiriyên monarşîk de tu carî navendê nedihîşt bajarên biçûk ên derûdor li hemberî paytext bihêz bibin û hêza reqabetê di xwe de bibînin. Ji ber vê jî Melayê Cizîrî li ser navê seraya Cizîrê di şexsê Mela Dawid de Finika navçeya herî bihêz a Mîrektiya Cizîra Botan biçûk dixê û bi vî awayî hêza paytextê nîşan dide.

³⁷⁹ Cizîrî, h.b., r. 310.

³⁸⁰ Cizîrî, h.b., r. 310.

Tu dizanî Finika te ne mekanê xezelan e
Çi buha tîne meta‘ê te eya bê ser û ber³⁸¹

Di serdema navîn de ji ber ku desthilatdarên îslamî tevî berpirsiyariyên dunyewî berpirsiyariyên uxrewî jî hebûn û hem dîn û hem dunyayê temsîl dikirin, karîgeriya îdeolojiya dînî li ser wan gelek bû. Ji ber vê çendê hukumdarên bi qasî helbestên pesindana desthilata xwe ji helbestên dînî û tesewufî jî hez dikirin. Loma jî Melayê Cizîrî dema xwe di îşqê de weku arifekî bêwêne dide nîşandan hem dixwaze karîgeriya xwe li ser serayê û rêvebiran zêde bike hem jî ji hêla manewî ve dixwaze seray û paytexta Mîrê xwe bihêz nîşan bide. Mela xwe weku “arifê zeman û muftiyê eşqê” dibîne. Çawa ku sed mela û musteîdên li derûdora wî nikarin muemmayê eşqê hel bikin û ew çend îlmên wan nîne, Me’rufê Kerxî jî hewcedarê îlmê Mela ye. Loma jî Mer’ruf divê ji Kerxê bê Cizîrê û li ber destê Mela tadrîs bibîne. Lewra Mela xwe li ser çiyayê Qendîlê weku filê eşqê dibîne, di nava baxê Botan de gula herî bijarte ew e, ne tenê li Botan li seranserî Kurdistanê şebçiraxa wî tarîtiyan ronî dike.

Kerixîn em di qiyamê me ji dil perde dirand
‘Arifê weqt im û Me’rûfî bila bête ji Kerx³⁸²

Tu j’Mela her bipirs esrarê ‘îşqê hel dikit
Vê mu‘emmayê çi zanin sed mela û muste‘îd³⁸³

‘Aşîqê mes’elewxahî were em muftiyê ‘îşq î
Destekî sunnet e tê da di yekî nessê kîtab e³⁸⁴

Tu narê firqetê zanî dikarim ez tehemmul kim
Diyarê kohê Qendîl im meger fil im di ‘îşqê da³⁸⁵

³⁸¹ Cizîrî, h.b., r. 300.

³⁸² Cizîrî, h.b., r. 84.

³⁸³ Cizîrî, h.b., r. 88.

³⁸⁴ Cizîrî, h.b., r. 181.

³⁸⁵ Cizîrî, h.b., r. 28.

Gulê baxê Îremê Bohtan im
 Şebçiraxê şebê Kurdistan im
 Çi tebî‘etbeşer û insan im
 Lillahîlhemd çi ‘alîşan im
 Di riya yar li rêza san im
 Lew di iqlîmê suxen xaqan im³⁸⁶

Mela çawa ku xwe di eşqê û îlmên manewî de arif dizane di heman demê de xwe di hunera helbestê de jî pêşeng û cîhangîr dizane. Lewra helbesta wî di rewaniyê de mîna avê diherike, gotinên wî mîna lu’luan in, eda û awayê helbesta wî di nava husneke tamam de xwedî sihr û efsûn e. Ji ber vê çendê jî xwe di warê gotin û edebê de mîrekî cîhangîr û serdarê helbestvanan dide zanîn, Ferrûxê Sîstanî li ber xwe ferxê helbestê dibîne û helbesta xwe ji ya Hafîzê Şîrazî çêtir dizane û îddîa dike ku helbestên wî pêdivî bi helbestên Şîrazî nehiştine.

Husnê edaya te Mela her kî dî
 Sehne lehu enneke ‘eynu’l-fisah^{387*}

Abê rewan min diye şî’ra Mela
 Yunkiru li’l-mai li sûi’l-mizac^{388*}

Şî’ra te Mela sihrê şekerrêz e bi mu’ciz
 Zanim ji lebê le’lî te ev lefz û eda girt³⁸⁹

Pîrê şe‘ar e di şî’rê we Melê şalîfiroş
 Tu nîşan min mede Ferxî ku li nik min bûye ferx³⁹⁰

Ger lu’lu’ê mensûrî ji nezmê tu dixwazî
 Wer şî’rê Melê bîn te bi Şîrazî çi hacet³⁹¹

³⁸⁶ Cizîrî, h.b., r. 273.

³⁸⁷ Cizîrî, h.b., r. 72. *(Ev riste erebî ye, kurdiya wê wuha ye: Dê jê re diyar bibe ku tu serdarê edîban î)

³⁸⁸ Cizîrî, h.b., r. 68. *(Ev riste erebî ye, kurdiya wê wuha ye: Kesê xûyxirab naxwaze ava zelal vexwe)

³⁸⁹ Cizîrî, h.b., r. 49.

³⁹⁰ Cizîrî, h.b., r. 84.

Di iqlîmê suxen mîr im di şî'rê de cehangîr im
We ye'lû mewkibe'l-'uşşaqî e'lamî we rayatî^{392*}

Bi van mînakan derdikeve ku Melayê Cizîrî helbestvanekî bihêz ê seraya Cizîra Botan e û di nezera mîrên vê serayê de xwedî cihekî girîng e. Loma jî bi her du qesîdeyên xwe pesnê Mîrê Cizîrê dide û bi pesindana hunera xwe jî hem mezinahî û giringiya xwe ya di nava vê serayê de diyar dike hem jî li hemberî serayên din xurûra desthilatdarên seraya Cizîra Botan nîşan dide. Ev diyarde jî Melayê Cizîrî weku helbestvanekî bajarî derdixe pêş ku di serdema wî de pesindana hukumdaran yek ji taybetmendiyên berçav ên edebiyata bajarî bû.

1.1.2. Di Tesewira Evîna Melayê Cizîrî de Karîgeriya Seray û Bajarvaniyê

Di dîwana Melayê Cizîrî de mijara sereke evîn e. Dema mirov bala xwe dide helbestên Mela yên evîndariyê, sê aliyê evîna Mela derdikeve pêşberî mirov û helbestên wî berê xwe didin sê bikerên evînê ku ew jî jin, mîr û Xweda ne. Bi gotina Walter G. Andrews di mijara evînê de helbestvan hem bendeyê hestên xwe ye, hem bendeyê desthilata dunyawî ye, hem jî bendeyê Xweda ye.³⁹³ Bêguman di pîralîtiya têgihîştina evînî ya Mela de rola bajar û jiyana bajarvaniyê diyar û berçav e, lewra bajar cihê lêkdana fikrên nû, pêkve jiyana kom û baweriyên ciyawaz û warê dahênan û sentezkirina şaristanî û felsefeyên nû ye. Di vê çarçoveyê de helbet helbestvanê bajarî jî nesîbê xwe ji vê çanda bajarî werdigire û bi bergeheke berfireh û giştîgîr li diyardayan temaşe dike. Ji ber vê jî, weku helbestvanekî bajarî û serayê nabe ku em evîna Melayê Cizîrî yek alî û berteng şîrove bikin û pîralîtiya evîna wî li berçav negirin, loma jî dema mirov di helbestên Mela de li ser mijara evînê raweste divê mirov bi sê bergehî evîna Mela bixêrê.

Jin weku yar û dilber yek ji muxatebên evîna Melayê Cizîrî ye. Ji xwe di hin çavkaniyên ku li ser jiyana Melayê Cizîrî hatine nivîsîn de tê ragihandin ku Melayê

³⁹¹ Cizîrî, h.b., r. 51.

³⁹² Cizîrî, h.b., r. 234.* (Ev riste erebî ye, kurdiya wê wuha ye: Koma şairan wê alî û nîşanên min bilind bikin)

³⁹³ Walter G. Andrews, *Şiirin Sesi Toplumun Şarkısı*, İletişim Yayınları, Wergêr: Tansel Güney, Çapa Şeşem, İstanbul, 2009, r. 152.

Cizîrî demekê evîndarê keça mîr bûye. Li ser vê meseleyê ragihandina pêşî ew e ku Mela dema li Hesênkeyfê dimîne li vir aşîqê Selmaya keça Melîk Kamîlê Eyyûbî yê mîrê Hesênkeyfê dibe. Ji ber eşqa Selmayê dest bi nivîsîna helbestan dike û di helbestên xwe de behsa Selmayê dike. Li gorî ragihandineke din jî Mela dil berdide Sitiya Biskesk a keça Mîrê Cizîrê. Mela ji bo dîtina Sitiyê her roj diçe bal goristaneke pêşberî qesra Mîr, piştî xwe dide kêla gorekê û li ser evîna Sitiyê helbest dixwîne.³⁹⁴ Ev ragihandinên ku ji nava gel hatine wergirtin çend rast in nayê zanîn, lê di helbestên Melayê Cizîrî de weku dilber wesfên jinê aşkera ye. Qebûlkirina vê yekê li dijî evîna tesewufî ya Mela nîne, lewra li gorî Muhyîddînê Erebbî yê ku karîgeriyeke mezin li ser Melayê Cizîrî çê kiriye Xweda kakil û rastiya mirov e û mirov parçeyeke aşkerabûyî yê Xweda ye, jin jî parçeyeke din e ku ji zîlam derketiye holê. Ji ber vê jî zîlam, Xweda di jinê de tam û bêkêmasî dibîne. Lewra Xweda di jinê de hem çalak û biker e hem jî berkar û veşartî ye. Xweda bi zatê xwe di alemê de bi tu tiştekî naşibe, lê eger li ser made jî tecelî neke tu carî nayê dîtîn. Dîtina wî tenê bi made mumkîn e. Ji ber vê jî nîşandana Xweda di jinê de weku şuhûdî dîtina herî mukemel û bêkêmasî ye.³⁹⁵ Ji ber vê çendê, wesifdana jinê çî ji ber evîneke rasteqîn a Mela be çî jî ji ber vê nêrîna tesewufî ya Muhyîddînê Erebbî be weku rastiyeke derdikeve holê ku di tesewira evîna Mela de jin cihekî girîng dadigire. Di van malikên jêrîn de Mela bi peyvên “Selma, xanim, xatûn, dilber, şox, şepal, zerî, neyşeker, dînber, sûrperî û horî” rasterast xîtabî jinekê dike û wesfên wê dixê ber çavan.

Ma bi le'lên canfeza navê me bînit carekê
Bi'ddua bellix tehiyyatî li Selma ya berîd^{396*}

Min dilberek wek dur heye mehbûbê şîrînsur heye
Husn û cemalek pur heye Belqîssifet mesken Seba

Şox û şepala meyperest ew zalima hişyar û mest
Vê nameyê xef dê vi dest fî teyyiha neşru'n-neba³⁹⁷

³⁹⁴ M. Emîn Narozi, *Pêşgotina Dîwana Melayê Cizîrî*, Weşanên Roja nû, Stockholm, 1987, r. 17.

³⁹⁵ Muhyiddîn-i Arabî, *Fusûsu'l Hikem*, İnsan Yayınları, Amadekar: Hamza Kılıç, Çapa Duyem, İstanbul, 2009, r. 316,320.

³⁹⁶ Cizîrî, b.n., r. 88.* (Ev riste erebbî ye, kurdiya wê wuha ye: Ey qasid, silavên min digel duayan bigihîne Selmayê)

³⁹⁷ Cizîrî, h.b., r. 21.

Di benda zulfê çewkan im sebahulxeyri ya xanim
Were bînahiya çehvan bibînîm bejn û balayê³⁹⁸

Veke carek xet û xalan li ser wan mesned û palan
Bixwûne lê me ‘ebdalan bibînînin ‘îd û sersalan³⁹⁹

Awirên eswed‘uyûnan ‘aqilan sewda dîkin
Gezmeya ‘aşîq vi dîl keftî ji çehvên şehle bû⁴⁰⁰

Dînberê horîmîsalê zeriye
Nazikê neyşekerê surperiyê⁴⁰¹

Dergehê lutfî te xanim ma li mehrûman vebî
Înne kelben basiten dehren zira’ en bi’l-wesîd⁴⁰²

Bête eywanê ji xelwê horiya qudsîsirişt
Sed hezaran horîqudsî tîn lîqayê rast û çep⁴⁰³

Ger bipursit carekê xatûn li halê suxteyî
Qufl û zincîr dê vebîn bê ism û dest û mifte ye⁴⁰⁴

Sond bi wê zulfa siyah ez ‘abîdê husna te me
Xef dînoşim vê şerabê xweş şerab û qehwe ye⁴⁰⁵

Îro şekerxendê birîn destê sipîzendê birîn
Dîsa bi govendê birîn derdê Melê derman e reqs⁴⁰⁶

³⁹⁸ Cizîrî, h.b., r. 254.

³⁹⁹ Cizîrî, h.b., r. 256.

⁴⁰⁰ Cizîrî, h.b., r. 211.

⁴⁰¹ Cizîrî, h.b., r. 272.

⁴⁰² Cizîrî, h.b., r. 87.

⁴⁰³ Cizîrî, h.b., r. 42.

⁴⁰⁴ Cizîrî, h.b., r. 175.

⁴⁰⁵ Cizîrî, h.b., r. 177.

⁴⁰⁶ Cizîrî, h.b., r. 115.

Cebhet û dêm û gerdenê perde dema ji ber bîret
Ferz e Mela li haciyan se'y û tewaf û 'umre ferz⁴⁰⁷

Jina ku Mela wesfên wê dide ji her alî ve jineke bajarî ye û rûniştvanê qesr û serayan e. Lewra dilbera ku Mela behsa wê dike di qesreke bilind a mîna burcê de rûdine, dema ku ji deriyê kelehê derdikeve mîna ku roj hilbibe şemal dide, biskên wê bi gulavê hatine şuştin, dêmên wê mîna duran in, gerdana wê ji sipîbûnê şemal dide, birûyên wê mîna qewsê hîlalan in, zulfên wê yên enberîn şekirî ne, kofîya li serê wê bi mirariyan neqîşandî ye, li piştê wê kemera zêrîn heye, carina bi cilên xwe yên kok û bedew li ber deriyê qesrê dimeşe, carina ji pencereya qesrê temaşa dike, carina jî di nava bax û rezên qesrê de mîna sorgulekê seyrana dike. Dilbera Mela bi her hal û awayî nêgîzeke Botan e, bi nazikî, şîrînî û şengiya xwe delaliya qesr û serayan e.

Biskên ji herîrê tu ji nû mawerê lê ke
Zulfên ji 'ebîrê şe ke bavê xem û tabê

Qîştên di xwe çîn çîn bide ber misk û zûbadê
Tayên di 'îsabê bireşînîn bi gulabê

Heryek bi hezar rengî li bejna te sema tîn
Xemrî û lef û şîtrî û tayên di 'îsabê⁴⁰⁸

Wê şepalê miskixalê dêmduurrê gerdenşemalê
Cebheta bîskan sema lê dil ji min bir dil ji min⁴⁰⁹

Tu bimeş kok bi ser derê qesrê
Bi xwe kokê li şah û qeyser ke

Were wek roj bi ser derê kelhê
'Alemê tîkda munewwer ke⁴¹⁰

⁴⁰⁷ Cizîrî, h.b., r. 117.

⁴⁰⁸ Cizîrî, h.b., r. 218.

⁴⁰⁹ Cizîrî, h.b., r. 170.

Ez çûme serayê ku şîrînged di semayê
Go ev ne Melayê me ye bê perde bila bê⁴¹¹

Xelqo li min kin şîretê ew dilbera zerrînkemer
Min dî di halê xefletê hat der ji burcê wek qemer

Hat der ji burc û penceran dil girt û da ber xenceran
Ev reng e halê dilberan lew ‘aşiqan xûn bûn ceger⁴¹²

Nazidar e ew li textê dilberê
Dilruba ye canfeza ye rûhşîfa

Horî‘eyn e ez nizamî ya perî
Ya gulik re’na ji gulzarê wefa

Ya Reb ew guldesteê Baxê Îrem
Dûr nebit jê her seher badê seba

Sorgulik min dî di gulzarê bi meş
Lale û reyhan li ser têne sema⁴¹³

Bi qedê nêrgîza Bohtan î
Nazîkek şeng î şubê reyhan î⁴¹⁴

Çawa ku jin ji ber rindî û ciwaniya xwe dibe tecelîgaha evîna Xwedayî, mîr jî ji ber hêz û îhsana xwe dibe unwanê dilbera hêzdar û hukumferma. Di vê maneyê de hêmayê dilber-hukumdar ji bo diyarkirina objeya evînê rola normekê dibîne.⁴¹⁵ Lewra di helbesta klasîk a rojhilat de dilber hertim bilind e, dildar nizim e, dilber biker e dildar

⁴¹⁰ Cizîrî, h.b., r. 198.

⁴¹¹ Cizîrî, h.b., r. 220.

⁴¹² Cizîrî, h.b., r. 94.

⁴¹³ Cizîrî, h.b., r. 299.

⁴¹⁴ Cizîrî, h.b., r. 277.

⁴¹⁵ Andrews, b.n., r. 118.

berkar e. Loma jî, dilber hertim weku hukumdarekî sitemkar zulmê li dildar dike û dildar jî weku bendeyekî hewcedar di nava cewr û cefayê de jî çavnêrî lutf û merhemeta dilbera hukumdar e. Di helbesta klasîk a rojhilat de helbestvanekî dixwazî bila helbestên xwe di nava tevna dînî û tesewûfî binivîse, dixwazî bila bi vî awayî nenivîse, di nava kevneşopiya klasîk de tevna dînî-tesewûfî û tevna desthilatê dema li tenîştê hev bin her du alî jî watedar dibin. Ji xwe helbestvanê ku di nava tevna dînî-tesewûfî de dinivîse ji gelek aliyan ve îlhama xwe ji desthilata dunyewî werdigire.⁴¹⁶ Di vê çarçoveyê de herçend piraniya helbestên Mela di nava tevna tesewufî de jî hatibin nivîsîn, ji ber ku Mela di heman demê de helbestvanekî serayê ye, ji bo derbirîna evîna xwe gelek caran hêmaya dilber-hukumdar bi kar anîye û peywendiya dilber û dildar di nava peywendiya mîr û xulam de berçav kiriye. Di nava vê hêmaya helbestî de dilber hertim mîna mîr û sultanekî mexrûr e û ji her tişt û her kesî mustexnî ye, lê helbestvanê dildar mîna tûleyekî li ber asîtana dergehê mîr li benda dilovanî û îhsana dilberê ye. Di dîwana Melayê Cizîrî de bi dehan malik hene ku vê îmajê helbestî radixin ber çavan.

Bi tûlên asîtanî ra vexwendim mîr bi dergahî
Bi vî çavî hebîb dîtîm şukur ev şefqe Mewlê da

Bi teşrîfa xwe ez xwendim ji lutfê bende nîşan kir
Xelat û şefqe û dildan şukurxwaz in ku Baxwoy da

Mi hadir secdeya şukrê li wî ‘erdê muqeddes bir
Bi mujganên xwe dur suftin enî malî li erdê da⁴¹⁷

Ku tûlê asîtanî dûr nekî êdî ji dergahê
Ji Baxwoy vê rucû nakîn di babê lutf û rehmê da

‘Îd e û mîrê me îro dergehê lutfê vekir
Go Mela hingî bixwazî dê bidim bes tu bixwaz⁴¹⁸

⁴¹⁶ Andrews, h.b., r. 136.

⁴¹⁷ Cizîrî, b.n., r. 27.

⁴¹⁸ Cizîrî, h.b., r. 102.

Çi bi kuştin çi bi hiştin tu ku ferman bikirî
Ez bi hukmê te xweş im Ehmedu ‘ebdun we reqîq

Kir şefqe mîr anîme bîr berdan mi tîr kirme esîr
Negha feqîr zulfa herîr avêhte şîr da pê meheq⁴¹⁹

Da ziyaret kim nîşanê ber Zuhel bêtin qiranê
Tûle yim ser l’asitanê çehvenêrê mûçe ye

Ma bi zehrê şekerînî mûçe dî da xef bixwînî
Da reqîb mel’ûn nebînî pur ‘eleyhille’ne ye⁴²⁰

Weku di van malikên jorîn de jî hatiye diyarkirin dilbera hukumdar li serayê rûdine û Mela jî li ber dergehê serayê li benda dîtin û qebûla wê ye. Ew rojên ku deriyê lutfê vedibin Mela cejn û şahî dike, li ber deriyê mîr eniya xwe datîne ser axa pîroz û diçe secdeya şukrê. Bi destûra qebûlê Mela bi dîdar û muçeyê dilber-hukumdarê şad dibe û digihîje miradê xwe. Lê gelek caran jî Mela nakeve bîra dilbera hukumdar, wê demê ji ber hesreta dûrbûnê dax û birîn lê peyda dibin, dunyaya fireh û berîn lê dibe zindan, weku esîran şerpeze dibe û ji dilbera hukumdar lava dike ku hema carekê jî be guh bide gilî û dadên wî. Ji ber ku dîtina dilbera hukumdar dermanê birînên Mela ye, ev dîdar ji bo wî ji mal û gencîneyên dunyayê hêjatir û binirxtir e.

Xeşmê li feqîran meke zû padişehê min
Pursê bike carek li xeta û gunehê min

Ez nizamîn sebebê yarê çira dûri kirim
Şahê şîrîndehenan em ji xwe mehcûri kirîn⁴²¹

Dilberê serdarê xûban ez nizam agah heye
D’hebs û zindanê esîr û girtiyê dermande ye

⁴¹⁹ Cizîrî, h.b., r. 132-133.

⁴²⁰ Cizîrî, h.b., r. 195.

⁴²¹ Cizîrî, h.b., r. 160-161.

Mihnet halê esîran kî li mîran ‘erze kit
Dibitin pursê li min lew pur bi rehm û şefqe ye

Min divê ser l’asitanê her wekî tûlan nihim
Belkî carek keyl bipursit ev çi mehrûmtûle ye

Ger bi navê tûleyan carek vexûnit bendeyî
Bi Melê xweştir ji mal û gewher û gencîne ye⁴²²

Lazim e l’sultan û mîran purskirin l’halê esîran
Em kirîn amancê tîran suxteyên dermande ye

Hêj nizanim mîr di bîr in zanit em sî sal esîr in
Çehvenêr pursek emîr in lew bi rehm û şefqe ye

Pur dibêm şefqe li bal e ‘arif e’w sahibkema e
Carinan bîne xiyale pirs bikit çi lê heye

Şefqe kit car car nihînî tûleê astan vexûnî
Da vekim daxan bibînî nar û pêt û şu’le ye⁴²³

Er nekî rehmê tu mîro dê çi bit halê me îro
Qet nebê carek esîro girtiyê sîsale ye

Guh bide ber gilh û dadan hakimê şehr û bîladan
Dê tu daxwaz û muradan dî kesê bêçare ye⁴²⁴

Xakê payên te di rêza sek û tûlan xwe dinasîn
Me ne sûc û ne gunah û ne xeta ev çi ‘îtab e’⁴²⁵

⁴²² Cizîrî, h.b., r. 178.

⁴²³ Cizîrî, h.b., r. 191.

⁴²⁴ Cizîrî, h.b., r. 194-195.

⁴²⁵ Cizîrî, h.b., r. 180.

Ez bi wê qamet û bejnê li te sondê dixurim
Bes ke ey padişeha min li esîran xederê⁴²⁶

Bi hêmaya dilber-hukumdar Melayê Cizîrî rasterast wesfên Mîrê Cizîra Botan dide û dilbera hukumdar weku şahê Kurdistanê bi nav dike. Ji ber ku Mela helbestvanê wê serayê ye ji bilî dergeha mîr tu dergehekî din ji xwe re nake armanc, loma jî mîr wî qebûl jî bike red jî bike sond dixwe ku heta di jiyanê de be, ew ê bendeyê ber dergehê mîr be.

Latê husnê we şehê xûban î bi xwe hem xan î we hem xaqan î
Yûsufê sanî tu îro xanim ku bi husna xwe nedêrê sanî

Bi sur û heybet û sehmê xwe perî bi te şên li butan sultan î
Bi tebilxaneê şahî were text ku tu îro şehê Kurdistan î⁴²⁷

Ey şehê ‘alîcenab pur ‘aciz û perkende em
Ah ji dest cewra evînê çi bkirim min bende em
Sebr û taqet min neman lê bêkes û dermande em
Ger bixwanî wer beranî bende em ta zinde em
Wacibun lî imtîsalu’l-emrî maza e’murîn^{428*}

Armanca dawî û bingeîn a evîna Melayê Cizîrî gihîştina hebûna mutleq a Xweda ye. Ji xwe evîna jinê yan jî hêmaya dilbera hukumdar jî ji bo berçavkirina evîna mucered a Xweda ye. Lewra li gorî Muhyîddînê Erebi gihîştina evîna Xweda û nasîna wî bi du rîyan çê dibe ew jî bi tenzîh û teşbîhê ye. Tenzîh ew e ku mirov Xweda ji heyberan ciya bigire, teşbîh jî ew e ku mirov Xweda bişibîne heyberan. Ew kesê ku tenzîh û teşbîhê bike yek, di rîya nasîn û evîna Xweda de baştirîn rê peyrew dike.⁴²⁹ Ji xwe Xweda jî ji bo çawaniya xwe vebêje hem rîya tenzîhê hem jî rîya teşbîhê

⁴²⁶ Cizîrî, h.b., r. 238.

⁴²⁷ Cizîrî, h.b., r. 244.

⁴²⁸ Cizîrî, h.b., r. 157.* (Ev riste erebî ye, kurdiya wê wuha ye: Li ser min ferz e ku bi ya te bikim, fermo tu çi dibêji)

⁴²⁹ Arabî, b.n., r. 48.

hilibijartiye. Di tenzîhê de teşbîhê dide xiyalkirin, di teşbîhê de jî tenzîhê dide eqilkirin. Bi vî awayî her duyan bi hev ve girê dide, êdî ne tenzîh ji teşbîhê ne jî teşbîh ji tenzîhê nayên ciyakirin.⁴³⁰ Di vê çarçoveyê de Melayê Cizîrî weku me li jor amaje pê kir pirî caran bi riya dilbera jin û dilbera hukumdar evîna mucered teşbîh dike, lê carina jî perdeyê li ser rastiya evînê hiltîne û rasterast armanca xwe ya dawî derdibirîne. Jinê weku but û latê cemala mutleq dide zanîn û li hemberî serçaviya husna heqîqî, wê weku mecaz bi nav dike. Herwuha li beramberî zereyek ji înayeta Xweda, hukmê dilbera hukumdar tîne asta mûyekê û di riya dilbera heqîqî de hemû sebebên ji holê radike.

Ev hûr û perîçehre but û latê cemaîlê
Der sûretê tehqîqî Mela ‘eynê mecaz in⁴³¹

Mîrî û padişahî mûyek li nik Melayî
Nadim bi mulkê ‘alem yek zerreyek ‘înayet⁴³²

Ji van malikan jî diyar dibe ku Melayê Cizîrî di mijara evînê de dilbera jin û dilbera hukumdar ji bo dilbera heqîqî dike kiras û perde û di bin van kirasên de evîna mucered a Xwedayî berçav dike. Bêguman ev zimanê mecazî û sembolîk beriya Melayê Cizîrî jî di nava helbestvanên mutesewuf de zal bû. Lewra hêja di sedsala dehemîn de Niffarî (m.985) sembolên ku di dema azmûnên mîstîk de pêk dihat bi kar anî û zimanekî wuha pêşxist ku azmûna mirovî digel armanc û wateyên berz li hev anî.⁴³³ Helbestvanên mutesewif ên mîna Melayê Cizîrî bi van sembolan, bîyî ku ji armancên xwe yê berz tawîz bidin, nêzîkbûna xwe ya digel Xweda bi awayekî ku mirov karibin têbigihîjin berçav dikirin û bi vî awayî zimanê sembolîk ê helbestê dikirin sembola yekbûna digel hebûna Xweda û li hev anîna rastiyeke duniyewî û uxrewî.

Ev cure peywendî dişibe diyalektîka Walter Benjamîn ku dema behsa peywendiya madegeriya dîrokî û dîn dike nimûneya bûkoleyekê tîne ku di nava kirasê vê bûkoleyê de hacûcekî heye û ev hacûc ji ber ku hosteyê kişîkê ye her kesî dikare têk bibe. Di vê mînakê de hacûc di şûna dîn de û bûkole jî di şûna madegeriya dîrokî de

⁴³⁰ Arabî, h.b., r. 270.

⁴³¹ Cizîrî, b.n., r. 155.

⁴³² Cizîrî, h.b., r. 55.

⁴³³ Lapidus, b.n., r. 174.

hatiye bikaranîn. Li ser vê peywendiyê Walter Benjamîn dibêje eger madegeriya dîrokî weku kirasekî derve, dîn bike bin xizmeta xwe ew ê li hemberî her kesî bi ser keve.⁴³⁴ Michaël Löwy jî dema vê teza Benjamîn dinirxîne dibêje di vê mînakê de di navbera dîn û madegeriya dîrokî de diyalektîkeke temamker heye û dîn û madegeriya dîrokî carina mîr in carina jî xulam in, hem mîrê hev in hem jî xizmetkarên hev in û pêdiviya wan bi hev heye.⁴³⁵ Ev cure şîkarî weku tenzîh û teşbîha Muhyîdînê Erebi ye ku Melayê Cizîrî di diyarkirina evîna xwe de bi kar tîne û di berçavkirina çemk û heyberên mucered de rêbazeke serkevtî ye. Ji xwe Melayê Cizîrî di evîna Xweda de dawîya dawî digihîje “wehdeta mutleq” û ciyawaziya di navbera sûret û esil de radike. Bi vî awayî diyalektîka made û manayê namîne û heqîqeta evîna wî derdikeve holê.

Husn û hub zatê qedîm in lê cuda bûn ew ji yek
Lê niha ismê hudûsê hikmet û tefsîl we bû

‘Aşiq û me’şûqi elheq herdu mir‘atê yek in
Lew di eslê cem‘ê da eslê qedîm ayîne bû⁴³⁶

Husnê zatê but û latan ji cemala Samed e
Ji mîsala senemî weku tecella ye Samed⁴³⁷

Wehdetê mutleq Mela nûr e di qelban cela
Zorê di vê mes‘elê ehlê dilan şubhe ma⁴³⁸

Wehdetê sirf e me meşreb te çi iksîrê wucud
Em lebaleb çi lebaleb bi xwe hem came lebaleb⁴³⁹

Weku di van nimûneyan de jî hat dîtin di sê bergehên evîna Melayê Cizîrî de jî karîgeriyeke aşkera ya bajarvaniyê diyar dibe. Lewra dilbera jin a ku guncawtirîn

⁴³⁴ Michaël Löwy, *Walter Benjamin: Yangın Alarmı*, Versus Kitap, Wergêr: U. Uraz Aydın, İstanbul, 2007, r. 31.

⁴³⁵ Löwy, b.n., r. 35.

⁴³⁶ Cizîrî, b.n., r. 210.

⁴³⁷ Cizîrî, h.b., r. 85.

⁴³⁸ Cizîrî, h.b., r. 20.

⁴³⁹ Cizîrî, h.b., r. 33.

objeya evîna Mela ye bi wesfên xwe yên bajarî derdikeve pêşberî çavan û ji şayesandinên helbestî yên Mela diyar dibe ku ew dilbera jin a ku Mela behsa wê dike şêniyeke serayê ye û bi taybetiyên xwe yên bajarî balê dikêşe ser xwe. Hêmaya dilbera hukumdar jî ku unwanê hêz û karîgeriya evîna Mela ye rasterast di bin bandora seraya Cizîra Botan de hatiye dahênan û ev jî encama unsûreke girîng a bajarvaniyê ye. Di dawiyê de têgihîştina evîna Mela ya kûr ku di çarçoveya wehdeta mutleq de xwe nîşan daye berhemê medrese, tekya û fezaya zanistî ya bajarê Cizîrê ye ku Melayê Cizîrî jî di bin vê fezaya berhemhêner de kariye şakareke edebî bîne holê.

1.1.3. Di Dîwana Melayê Cizîrî de Rengvedana Dîrok û Heterojeniya Civakî ya Bajarê Cizîrê

Melayê Cizîrî weku helbestvanekî klasîk ê serdema navîn herçend di çarçoveya helbesta klasîk de mijarên helbestên xwe hîlbijartibin jî dîwana wî ji aliyê bikaranîna keresteyên hunerî ve neynikeke rasteqîn a dîrok û civata rengîn a bajarê Cizîrê ye. Melayê Cizîrî yê ku zêdetir li ser mijara evînê helbestên xwe hunandine pirî caran di pênasekirin û şayesandina evîn û dilbera xwe de ji keresteyên dîrokî û şaristanî yên Cizîra Botan jî sûd wergirtine û bi nîşandana vê kûrahiya çand, şaristanî û dîroka Cizîrê, dîwana xwe kiriye beşeke girîng ji nasnameya şaristanî ya Cizîra Botan. Di vê maneyê de çawa ku bajarê Cizîrê di derketin û pêgihandina helbestvanekî mîna Melayê Cizîrî de bûye malzaroka edebiyata kurdî, Melayê Cizîrî jî weku berhemê vî bajarî di nasandin û belavkirina navûdengê Cizîrê de bûye awazekî sermedî yê Cizîra Botan û navdariyeke nemir bi Cizîrê bexşandiye. Melayê ku xwe “gula baxê îremê Botan û şebçiraxê şevên Kurdistanê” dizane xuya ye ku vê rola xwe gelek zû fêr kiriye û bûye zimanhalê dîrok û şaristaniya bajarê xwe. Ji ber vê jî bi mebestên ciya ciya hertim xwe bi Cizîra Botan, Dicle û Feratê daye nasîn.

Gulê baxê Îremê Bohtan im
Şebçiraxê şebê Kurdistan im⁴⁴⁰

Feyza me şubhê Nîl e em Dicle û Furat in
Ger şeyx û wer îmam e vê ra ye min keşakeş⁴⁴¹

⁴⁴⁰ Cizîrî, h.b., r. 273.

Cizîra Botan di dirêjahiya dîroka xwe de hertim bûye cihê pêkve jiyana dîn û baweriyên ciyawaz û ji bûyera tofanê vir ve weku navendeke girîng a dînî, mêvandariya gelek dîn û baweriyên ciyawaz kiriye. Bi taybetî zerduştî, êzîdîtî, yahûdîtî, xirîstiyânî û herî dawî îslamê di avakirina nasnameya dînî û şaristanî ya Cizîrê de roleke berçav dîtine û hemû ev dîn û bawerî di nava hevahengiyê de li teniştê hev nasnameya dînî ya bajêr pêk anîne. Ji ber vê çendê di dîwana Melayê Cizîrî de tê dîtin ku ji bo diyarkirina evîn û wesfên dilberê, hêma û remzên van bawerîyan di nava yek konseptê de û di xizmeta yek armancî de hatine bikaranîn. Lewra Melayê Cizîrî di nava vê jîngeha afirîner a bajarî de pêgihîştibû û xwedî mejiyekî gnostîk ê tewhîdî bû. Ji ber vê jî bêtir ku ji kufr û şîrkê bitirse bi naveroka hemû van mezheb û dînen Cizîrê secde biriye ber dilbera xwe ya şîrîndev û bi hêmayên van hemû baweriyên Cizîrê dilbera xwe ya sermedî terîf kiriye. Di dîwanê de tevî gelek remz û hêmayên îslamê, Ehremen û atêşperest weku remzên zerduştîyê; Laleş û tawus weku remzên êzîdîtiyê; kenîşt, tûr û Mûsa weku remzên yahûdîtiyê; dêr, zunnar û çelîpa weku remzên xirîstiyaniyê hatine bikaranîn ku ev hemû kereste karîgeriya berçav a heterojenîya dînî ya Cizîrê nîşan didin li ser huner û edebiyata Melayê Cizîrî.

Ehremen te'limî dabû Ebyedî dest tê hebû
Pur bi vê te'lim û rayê hatibû çûbû xîtab⁴⁴²

Toqê gerden helqeê zunnarê zulfa yarê min
Dê kilîta kelbê 'îşqê helqeya zunnari bit⁴⁴³

Tûr im û bi dil peyrewê Mûsa yim ez
Ateşperes û Tûrê tecella yim ez⁴⁴⁴

Terh û terzê bûne zunnar û çelîpa yek bi yek
Lew mi zunnar û çelîpa yek tinê yek carî bes

⁴⁴¹ Cizîrî, h.b., r. 111.

⁴⁴² Cizîrî, h.b., r. 39.

⁴⁴³ Cizîrî, h.b., r. 44.

⁴⁴⁴ Cizîrî, h.b., r. 98.

Hin ji nik dêrê ve tên qesta kenîştê hin dikin
Ney ji van im ney ji wan im min derê xemmari bes⁴⁴⁵

Dil geşt e min ji dêrê naçim kenîşteê qet
Mihra bi wê bi min ra wer da biçîne Laleş⁴⁴⁶

Dibên xawerperest î tu nizanim min di keşfê da
Numayîn min di şerqê nazika gerdenşemal ebrû⁴⁴⁷

Cewrê Hindî dê kişînit her kesê Tawus divêt
Gewher û durra yetîm bê terkê ser têtin teleb⁴⁴⁸

Dil bi xwe kemerbestê 'îşq e me xwe zunnariperest î
Mey û me'şûq e du'ayê me û seccade qibab e⁴⁴⁹

Bi zunnarê di dêrê da li hindava çilîpayê
Bi mihabê me bir secde belê emma xiyal ebrû⁴⁵⁰

Ey horîsiriştê li me xweş meywe te ber kir
Cennat e di wesla te we atesperes î tu⁴⁵¹

Secde bin ber te rewa ye di hemî mezheb û dînan
Kî dibit muşrik û kafîr ji wê şîrînifemê⁴⁵²

Cizîra ku dîroka bajarvaniya wê vedigere serdemên antîk ji destpêka avabûna xwe heta dawîya Mîrektiya Azîzan ji aliyê gelek dewletan ve hatiye dagîrkirin û di encama van dagîrkariyan de gelek neteweyên ciyawaz li bajar hukum kirine. Di nava van pêlên dagîrkariyê de ji sedsala XIan heta serdema Melayê Cizîrî bajarê Cizîrê gelek

⁴⁴⁵ Cizîrî, h.b., r. 108.

⁴⁴⁶ Cizîrî, h.b., r. 110.

⁴⁴⁷ Cizîrî, h.b., r. 203.

⁴⁴⁸ Cizîrî, h.b., r. 36.

⁴⁴⁹ Cizîrî, h.b., r. 179.

⁴⁵⁰ Cizîrî, h.b., r. 204.

⁴⁵¹ Cizîrî, h.b., r. 214.

⁴⁵² Cizîrî, h.b., r. 228.

caran dikeve ber pêlên dagîrkariya tirk û moxolan. Ji ber vê çendê di dîwana Melayê Cizîrî de tirk û moxol hertim ji bo wesfên bêrehm ên dilberê weku rengdêr û hêmayên helbestî hatine bikaranîn û piraniya peyvên tirkî yên ku di dîwana Melayê Cizîrî de hatine bikaranîn derbarê şer û talanê de ne û ji bo wateyên neyînî hatine gotin. Bo nimûne “sewaş, yexma, yexmaker, doguş, yox, îlan (yılan), çix (çık), qizil (ji bo rengê xwînê)” ji van peyvên in ku hinek ji vana di dîwanê de gelek caran hatine dubarekirin.

Turkîxûnrêz û xumarê me bi yek xemzeyekê
Zuhdê çil sal e li min zêr û zeber kir ji esas⁴⁵³

Geh dil û geh can dibin Turkên te tîn
Nakirin yexma û talanê xelet

Meşrebê Turkan Firat û Nîlî kir
Teşneleb çû terfê ‘ummanê xelet⁴⁵⁴

Li ber çewkan û kaşoyan ji derba Turk û Hindoyan
Dibazim her wekî goyan dema ew tîne meydanê⁴⁵⁵

Min li dil tîrik Moxil dî tîk ji ber xûnê qizil dî
Lê dibêm derdê ku dil dî hêj ji çehvên şehle ye⁴⁵⁶

Bêguman ji ber van êrîş û dagîrkariyan û kavilkirina cîhana îslamê, peyvên moxol, teter û tirk ne tenê di helbestên Melayê Cizîrî de di gelek çavkaniyên erebî û farisî de jî di wateyên neyînî de dihatin bikaranîn û pirî caran ev peyv di şûna kuştin, talan û wêrankariyê de dihatin gotin. Ji xwe li gorî Hodgson, tirk û moxol ji aliyê nîjadî ve digihîştin hev, artêşa moxolan piranî ji hozên tirkî pêk dihatin û navê teter bi awayekî berbelav ji bo moxolan yan jî paşmayiyên wan re dihat gotin.⁴⁵⁷ Herwuha li gorî ragihandina er Ruhawî, teteran xwe ji aliyê nîjadî ve tirk dizanî, di zimanê sûryanî

⁴⁵³ Cizîrî, h.b., r. 107.

⁴⁵⁴ Cizîrî, h.b., r. 125.

⁴⁵⁵ Cizîrî, h.b., r. 230.

⁴⁵⁶ Cizîrî, h.b., r. 196.

⁴⁵⁷ Hodgson, b.n., c. 2, r. 431.

de jî ji vana re hun dihat gotin û ew kesên ku welatê farsan tunekirin ev putperestên qatîl bûn kû bi şerkirinê gihîştin heta Diyarbekirê.⁴⁵⁸ Ji ber vê çendê peyvên moxol, tirk û teter hem weku hêmayên kuştin û talanê yên helbesta klasîk hem jî weku rastiya dîrokî ya Cizîra Botan di dîwana Melayê Cizîrî de reng vedane.

Ji destpêkê heta serdema Melayê Cizîrî bajarê Cizîrê ji ber ku gelek caran dikeve ber êrîşên dagîrkeran û Cizîr gelek caran dibe meydana şer û qirênan, di dîwana Melayê Cizîrî de hêmayên şer û peyvên sebarek cengê gelek hatine bikaranîn. Bêguman ev hêmaya şer di helbestên Mela de li ser hejarî û mezlûmiya dildar, sitemkarî û dilhişkiya dilbera hukumdar û fitne û fesada reqîbê neyar hatiye avakirin. Lêbelê Mela ji bo vî şerê ku di kûrahiya dil û hinavan de diqewime diyar bike ji şerê rum, ecem, tirk, moxol, hindî, ereb, zengî û kurdan ên ku li ser Cizîra Botan hatine kirin sûd wergirtiye û bi vî awayî hem êş û azara şerê nava dilê xwe hem jî paşxaneya şer û talankariyên bajarê Cizîrê derbiriye. Mela ji bo çêkirina hêmaya vî şerî zêdetir peyvên mîna “ceng, şer, sewaş, leşker, lîwa, tox, ala, kemendar, oxilme, yexma, talan, yexmaker, talançî, kuştin, qetil, hane (hawar), fîryad, efxan, dijmin, reqîb, fêris, şêr, rimbaz, hol, kemîn, çeper, sef, tîp, xedeng, keyber, peykan, tîr, teber, gezme, yengî, nûbar, faq (dûvika tîrê), perweş (tîra ku bask jê dipekin), lami’ (tîrên ku dibiriqin, tîrên nû) sertîr, rad (dûvika tîrê), qews, kevan, şîr, xencer, misrî, rim, mizraq, top, zincîr, şakissilah (kesê ku sîlehan tûj dike yan jî tamîr dike), hemail (ben û qarişên ku çek pê tîr hilgirtin), xişt (bisteke ku weku rîman tê avêtin)” bi kar anîye û bêyî ku rasterast behsa şerekî rasteqîn û dîrokî bike hemû ew dîroka tijî xwîn a Cizîra Botan bi awayekî îmayî xistiye pêş çavan. Bi taybetî her du helbestên Mela yên ku bi qafiyeyên “rast û çep” û “çep û rast” diqedin rasterast li ser hêmaya şerên meydanî hatine saz kirin ku ji aliyê deng û ahenga peyvan ve jî hesta şerekî rastîn li cem mirov peyda dîkin.

Zengiyan cewşen vebestin pêşberê cûqa Hebeş

Daberistin yek bi yek çûn ber lîwayê rast û çep

Çing çinga bişkowan awaz û dengê zergowan

Sed melayîk guh didin ber wê newayê rast û çep⁴⁵⁹

⁴⁵⁸ Ğandur, b.n., r. 176-177.

⁴⁵⁹ Cizîrî, h.b., r. 42.

Tox û ‘ala ku xwuya bûn ji ‘Ecem
‘Ereban tîpî şikestin çep û rast

Ber vi şerqê di seher westayîn
Hinduwên rojiperest in çep û rast

Qeyserê Romê li serheddê Firing
Top û zincîrî vebestin çep û rast ⁴⁶⁰

Şah bi qesta kuştina min rim hejandin bê sebeb
Dame çeşmê qehr û xeşmê rim li dil da ku edeb

Leşkerê qehr û xeman wê çûn hisara dil bikin
Ke’be û Beytulheram e lê bi nûr bêtin Receb ⁴⁶¹

Tîrî sed têne ceger sîne li ber maye çeper
Ji dil û cergê kul û sîneê kerker meke behs ⁴⁶²

Ew şepala şox û şeng e kafîra Rom û Fireng e
Dame ber cotek xedeng e zalimê kuştin bi dox ⁴⁶³

Kî dizanî min ji rimbazan dema oxilme tîn
Têne dil sed rim ji wan û sîne têne sed cerîd

Neyşekera gerden ji ‘ac dîsa ji reştûzên Samed
Qewsên li bala ferq û tac keyber reşandin bê‘eded

Keyber reşandin bê hîsab misrî ku dan sîqal û tab
Sed Rustem û Efrasiyab kuştin li wan ker kir cesed ⁴⁶⁴

⁴⁶⁰ Cizîrî, h.b., r. 43.

⁴⁶¹ Cizîrî, h.b., r. 35-36.

⁴⁶² Cizîrî, h.b., r. 60.

⁴⁶³ Cizîrî, h.b., r. 82.

⁴⁶⁴ Cizîrî, h.b., r. 88-89.

Birhên ji qewsê qudret nîşane kir Nîşanî
Lami' ji ber dibarin çi yengiyek we perweş

Cengê hindî dikirin fêris û rimbazê 'Ereb
Tox û 'ala di Firingî ne kemendarê Hebeş

Tu binê Rûm û 'Ecem kuştine Zengî di kemîn
Hane her tête peyapey ji teref Rûm xweş û xweş ⁴⁶⁵

Rûm û 'Ecem ji her teref ceng û suwaş e wan bi xef
Hindî û Zengî sef bi sef hatine ber lîwayê zulf ⁴⁶⁶

Tîrek ji qewsê malzirav tê dil qewî tavêje nav
Xûn tê purî teşbîhê av fîryad û efxan sed esef ⁴⁶⁷

Ez im amancê wan tîran ji peykanan û sertîran
Bûyîm polad li ber Şîran seraser têkî mam ber de ⁴⁶⁸

Sef bi sef Turk û Muxul doguş û Hindî di kemîn
Bi 'eceb hatine cengê Hebeş û Rûm û Fireng

Mîr û Kirmanc li holan qederek westane
Lê di nêvê bi sef û tîpê 'Ereb hatine ceng ⁴⁶⁹

Di çarçoveya vê hêmaya şer de Melayê Cizîrî behsa hin kesayetên dîrokî ku peywendiya wan bi Cizîra Botan heye dike. Ji van kesayetan Cengîz û Teymûrê Leng du dagîrkerên Cizîra Botan in û Xan Şeref jî parêzvan û mîrê Cizîra Botan e. Bikaranîna navê van kesan bi xwe jî nîşan dide ku helbestên Melayê Cizîrî bi awayek ji awayan bûne neynika dîroka Cizîra Botan. Bêguman Cengîz weku serokê moxolan û Tîmûr weku serokê dewleteke tirkî ne tenê bi dagîrkirina Cizîra Botan di hemû sefer û şerên

⁴⁶⁵ Cizîrî, h.b., r. 111-112-113.

⁴⁶⁶ Cizîrî, h.b., r. 128.

⁴⁶⁷ Cizîrî, h.b., r. 130.

⁴⁶⁸ Cizîrî, h.b., r. 173.

⁴⁶⁹ Cizîrî, h.b., r. 142.

xwe de bi zordestî û xwînêjiyê dihatin nasîn. Li beramberî Tîmûr û Cengîz çavkaniyên dîrokî Xan Şeref weku qehreman û rizgarkerê Cizîra Botan didin nasîn. Bo nimûne, Şerefxan li ser rizgarkirina Cizîrê ji bin destên Aqqoyîniyan û sebarek dilêriya Xan Şeref wuha dibêje:

“Piştî 30 salên bêhêvîtiyê, dest li ber rû û şînî, fîrset ket dest û roja wan hilat ku meydana mêran germ bike. Mîrê camêr û şêr, ji şikefta tarî serê xwe derxist û berê xwe da dijmin. Bi xencera zikdir û bi şûrê serbir ket ser ruhê dijmin, êrîş bir ser wan, ew rapêçan û dan li ber xwe maliştin. Lekeya şermî, rûreşî û dilîtiyê bi xwîna dagirkeran malişt û li ser textê fermanrewatiya Cezîrê rûnişt.”⁴⁷⁰

Ji ber vê jî mirov dikare bibêje ku Cengîz û Tîmûr weku du karakterên neyînî di yek rêzê de Xan Şeref jî weku tîmsala şanaziya Cizîra Botan di rêzeke din a malika Melayê Cizîrî de hatiye bikaranîn.

Ji re’na nêrgizên te’y mest û xûnrîz
Zeman bû ‘ehdê cengengîzê Cengîz⁴⁷¹

Sef sef mi dîn hindî û zeng Cengîzi hat Teymûrileng
Xef wan reşandin dil xedeng teşbîhê tîrên Xan Şeref⁴⁷²

Ji bilî van kesayetên navdar navê hin kesayetên din jî di dîwana Cizîrî de derbas dibin ku rastiya wan di nava dîrok û çanda Cizîrî de bi riya ragihandinên devkî gihîştîye heta roja îro. Bo nimûne, di vê malika jêrîn a Melayê Cizîrî de behsa mirovekî bi navê Hemmadê Erebiyê kirin:

Dest û payan ji berê zêde bikî dê te bikim
Mislê Hemmadê Erebiyê her wekî Şêx anî bi ser⁴⁷³

⁴⁷⁰ Bedlîsî, b.n., r. 218-219.

⁴⁷¹ Cizîrî, b.n., r. 103.

⁴⁷² Cizîrî, h.b., r. 130.

⁴⁷³ Cizîrî, h.b., r. 300.

Li ser navê Hemmadê Erebi ku wateya vê malikê şerh dike di nava Cizîriyan de ragihandineke wuha heye. Şêx Ebdurehmanê Welî li Cizîrê şêxekî navdar bûye û li dora wî gelek murîd hebûne. Şêx piştî ku diçe hecê, sihêrbazekî bi navê Hemmadê Erebi tê Cizîrê û bi sihêrên xwe murîdên Şêx dixapîne. Piştî Şêx ji hecê vedigere ji bilî çend murîdên wî kes naçe cem. Şêx ji wan murîdên xwe sedema nehatina murîdên din dipirse û ew jî dibêjin: “Ezbenî kesekî bi navê Hemmadê Erebi hatiye Cizîrê, li ser avê secadeya xwe radixe û nimêj dike, ji destekî xwe xwîn, ji yê din avê derdixe. Ji ber vê herkes çûye bal wî. Em ji ber ku ji te gelek hez dikin hatin vira. Li ser vê, Şêx Ebdurehmanê Welî dixeyîde û diçe cihekî bakurê Cizîrê ku jê re dibêjin Newala Îsa Axa. Li wir çil roj dikeve nava tefekurê paşê rojekê du rekate nimêj dike û dema diçe secdeyê keşfîyata wî vedibe û hîn dibe ku ev zîlam sihêrbaz e. Ew murîdên wî yê mayî jî her rojê nê diçin serdana wî. Rojekê dibînin ku çil heb kuzik li pey Şêx rêz bûne û li pey nimêj dikin. Murîd vê bûyerê radigîhin Mîrê Cizîrê û Mîr jî Şêx û Hemmadê Erebi gazî huzura xwe dike û bi riya delalan bangî hemû Cizîriyan dike. Şêx dibêje bila pêşî Hemmadê Erebi hunerê xwe nîşan bide. Hemmad ji destekî xwe xwîn ji yê din avê derdixe paşê li ser avê nimêj dike. Li ser vêya Şêx dixwaze ku cilên wî jê bên derxistin. Dema kirasê wî jê dikin dibînin ku di bin çengekî wî de rodiyê ku ji avê hatiye tije kirin di bin çengê din de jî rodiyê ku ji xwînê hatiye dagirtin heye. Li ser vê Şêx dibêje bila derpê jî jê bikin. Dema derpê jî jê dikin dibînin ku di navrana wî de nivîştên bi sihêr hene. Şêx Ebdurehman piştî vê, “Bismîlah” dikişîne û pê dide ser ava Dîcleyê diçe aliyê din. Li ser vê Mîr Hemmadê Erebi îdam dike.⁴⁷⁴ Ev ragihandin weku unsûreke dîrokî û folklorîk dide nîşandan ku Melayê Cizîrî ji gelek aliyan ve ji dîrok, şaristanî û folklorê Cizîrê sîd wergirtiye û di helbestên xwe de cih daye van anekdotên dîrokî.

⁴⁷⁴ Yaşın, b.n., r. 179-180.

1.2. REMEZANÊ CIZÎRÎ

Remezanê Cizîrî yek ji wan helbestvanên Cizîra Botan e ku demeke dirêj şopa wî hatiye windakirin û di nava rûpelên tarî yên dîrokê de navê wî û berhemên wî veşartî mane. Navê Remezanê Cizîrî bi saya dîwana Melayê Cizîrî gihîştîye roja îro, lewra helbestvan li ser xezela (*Ey nesîmê sibehê ma di mecala seherê*) ya Melayê Cizîrî helbesteke şeşristeyî nivîsiye û ev helbest jî di nava destnivîsên dîwana Melayê Cizîrî de hatiye tomarkirin.⁴⁷⁵ Ji destnivîsên ku hatine dîtin derbarê jiyana wî de tu agahî aşkera nebûye, lê tê pêşbînîkirin ku Remezanê Cizîrî di serdema Melayê Cizîrî de yan çend sal piştî wî jiyabe. Lewra derbarê destnivîsa dîwana Melayê Cizîrî ya ku helbesteke Remezanê Cizîrî têde bûye û ji aliyê Mehemed Elî Qeredaxî ve hatiye vedîtin tê îddîakirin ku ev destnivîs 300 sal berê hatiye nivîsîn.⁴⁷⁶ Ji ber vê jî hin lêkolanan îddîa kirine ku Remezanê Cizîrî şagirdê Melayê Cizîrî ye, loma jî li ser xezela wî, helbesta xwe ya şeşristeyî nivîsiye û ev helbest di nava dîwana Melayê Cizîrî de cih girtiye. Ji ber ku navê Remezanê Cizîrî di destnivîsa Mehemed Elî Qeredaxî ya ku tê gotin 300 sal berê hatiye nivîsîn de derbas dibe, mirov dikare bibêje ku Remezanê Cizîrî helbestvanekî kevin e û peywendiya wî digel Melayê Cizîrî heye.

Navê helbestvan di destnivîsên ciyawaz ên dîwana Melayê Cizîrî de bi yek awayî nehatiye tomarkirin. Bo nimûne di destnivîsa Mehemed Teyar Paşa de weku “Remezanê Cizîrî”, di destnivîsa Şuşî de weku “Remezan Axayê Cizîrî”, di destnivîsa Taha Ebîbekirê Erwasî û destnivîsa Mehemed Elî Qeredaxî de jî weku “Remezan Axa” û di çapa Şefîq Arwasî de jî weku “Remezan”⁴⁷⁷ hatiye nivîsîn. Ji bilî van destnivîsan di listeya helbestvanên kurd a Şêx Memduhê Birîfkanî de navê helbestvan weku “Remezan Axayê Cizîrî”, di şerha dîwana Melayê Cizîrî ya Zivingî de weku “Şêx Remezan”, di pirtûka Sadiq Beheddîn Amêdî ya dîwana Melayê Cizîrî de weku “Remezanê Botî” û di pirtûka wî ya bi navê *Hozanvanê Kurd* de jî weku “Remezanê Cizîrî” hatiye nivîsîn.⁴⁷⁸

Dema em berê xwe didin helbestên berdest ên Remezanê Cizîrî em dibînin ku helbestvan ji nava şeş helbestên xwe, di çar helbestan de nasnavê “Remezan”, di

⁴⁷⁵ Şeyx Ehmed el Cizîrî, *Dîwanuş Şeyx Ehmed el Cizîrî*, Weşangêr: n-Muhammed Şefîq Arwasî, Îstanbul, 1919, r. 80.

⁴⁷⁶ Îsmail Badî, *Remezanê Cizîrî -Di duyvûn û Tuyjandineka Dîtir da Qeftek ji Helbestên Wî*, Senterê Vekolînê Kurdî û Parastina Belgenaman-Fakeltiya Zanistên Mirovayeti- Sikola Adabê / Zankoya Duhok, Duhok, 2011, r. 12.

⁴⁷⁷ el Cizîrî, b.n., r. 80.

⁴⁷⁸ Badî, b.n., r. 29-30; Amêdî, b.n., r. 98.

helbestekî de nasnavê “Remezanê Cizerî”, di helbesteke din de jî nasnavê “Îbnu Dewdan” bi kar aniye. Ji van helbestan jî diyar dibe ku navê helbestvan Remezan e û welatê wî jî Cizîr e. Ji ber vê jî bikaranîna navê Remezanê Cizîrî ji bo helbestvan guncawtir e, lewra bi vî awayî hem navê wî hem jî welatê wî tê diyarkirin.

Ji bilî vê, li ser nasnavê Îbnu Dewdan, Îsmâîl Badî radigihîne ku di ferhenga kurdî ya Cegerxwîn de peyva “dewda” weku navê gundekî li rojhilatê Amûdê hatiye tomarkirin. Ji ber vê jî Îsmâîl Badî, Remezanê Cizîrî nîsbetî vî gundî dike û dibêje Remezanê Cizîrî li gundê Dewda ya rojhilatê Amûdê ji dayîk bûye.⁴⁷⁹ Eger em vê şîroveya Îsmâîl Badî rast qebûl bikin jî dîsa helbestvan li ser Cizîrê hesab dibe, lewra ev dever jî di nava sînorê Cizîra Botan de ye û bajarê Cizîrê navend û paytexta hemû deverên Mîrektiya Cizîra Botan e.

Ji helbestên Remezanê Cizîrî, tevî şeşriteyiya wî ya li ser xezela Melayê Cizîrî hatiye nivîsîn bi tevahî şeş helbestên wî ghiştime ber destên me. Ji van helbestan pênc helbestên wî cara pêşî ji aliyê Ebdurehman Mizûrî ve di sala 1984an de di Kovara “Rewşenbîrî Nwê” ya jimareya 102yan de hatine weşandin.⁴⁸⁰ Mizûrî jî ev helbest ji destnivîsa dîwana Melayê Cizîrî ya Mehemed Teyar Paşa wergirtiye û di kovara navborî de weşandiye. Helbesteke Remezanê Cizîrî ya din jî di destnivîsa Taha Ebîbekirê Erwasî de hatiye tomarkirin⁴⁸¹ û Îsmâîl Badî vê helbestê û her pênc helbestên pêşî tevî jiyanameya Remezanê Cizîrî di 2011an de li Duhokê weku pirtûk daye çapkirin. Herçend ji bilî van helbestan tu helbesteke wî ya din nehatibe dîtin jî, helbestvan di helbesta xwe ya şeşristeyî de diyar dike ku derd û elemên dilên xwe bi riya helbestan, di kitêban de bi cih kiriye ku tevahiya van kitêban dike çil û çar cild. Eger helbestvan di vê gotinê de mubalexe jî kiribe diyar dibe ku Remezanê Cizîrî gelek helbest nivîsîne, loma jî bi awayekî ji xwe bawer behsa zêdebûna berhemên xwe dike. Ev jî nîşan dide ku ev her şeş helbest beşeke biçûk in ji dîwana Remezanê Cizîrî û helbestên wî yên din neghiştine roja îro yan jî bi awayekî ji nav çûne.

Şerhê derd û eleman min qederek kirne kitêb

Min nivîsîne bi tertîb hemî têkdane bi ‘êb

Hazir in cumle li nik min çil û çar cild bi hesêb

⁴⁷⁹ Badî, h.b., r. 24-26.

⁴⁸⁰ Badî, h.b., r. 34.

⁴⁸¹ Badî, h.b., r. 50.

Bê fit û sond dixurim ez ji te ra qet ne bi lêb

Herçend her şeş helbestên wî yên berdest derbarê helbestvaniya wî de wêneyeke giştîgîr û rasteqîntir nexine ber çavan jî Remezanê Cizîrî bi van her şeş helbestên xwe asta bilind a helbestvaniya xwe kariye nîşan bide. Lewra Remezanê Cizîrî hem bi zimanê xwe yê lîrîk û lihevhatî, hem jî bi awayekî serkevtiyane bikaranîna hêmayên edebiyata klasîk û derbirîna mijarên serdema xwe, hakimiyeta xwe ya li ser edebiyata klasîk selmandiye. Ji aliyê din ve Remezanê Cizîrî bi awa û edayê helbestên xwe nîşan dide ku li ser rêça Melayê Cizîrî ye û şopgêrekî wî yê xwedan şîyan e. Weku Îsmâîl Badî jî dibêje Remezanê Cizîrî weku helbestvanekî serkevtî, li dîwanxaneyê Melayê Cizîrî semayê dike û bizav kiriye ku bi wî re perwaz bike. Lewra ew reqs û semaya ku Melayê Cizîrî di eşqa dilberê de kiriye Remezanê Cizîrî careke din dubare kiriye. Eger em berê xwe bidin berhemên wî yên kêr, em dê bibînin ku ji aliyê kêş û vehunandinê ve jî gelek ji wî kêmtir nebûye.⁴⁸² Ji xwe şeşristeyiya wî ya li ser xezela Mela, vê karîgeriya Mela ya li ser wî bi awayekî aşkera nîşan dide. Ji bilî vê şeşristeyê Remezanê Cizîrî helbesteke xwe ya din jî li ser nezîreya xezeleke Melayê Cizîrî nivîsiye ku bi redîfa “xered”ê diqede. Ji bo karîgeriya Mela ya li ser Remezanê Cizîrî em ê ji vê helbestê û ji helbesta navborî ya Mela malikekê nimûne nîşan bidin û vê karîgeriyê rasterast berçav bikin.

Malika Melayê Cizîrî:

Xalên mudewwer fulfulîn mawer ji biskan lê werîn
Zulfên perîşan têne mest bihna biha wan e xered⁴⁸³

Malika Remezan Cizîrî:

Xalên mudewwer filfilîn, madde ji misk û ‘enber e
Lew zulf bi ser da têne xwar, wan sir û nîşan e xered

Ji vê nimûneyê jî diyar dibe ku Remezanê Cizîrî weku şagirdêkî xwendingeha edebî ya Melayê Cizîrî, li ber têhna helbestên Mela xwe pêgihandiye û bi helbestên xwe

⁴⁸² Badî, h.b., r. 7.

⁴⁸³ Cizîrî, b.n., r. 301.

yên lîrîk û evînî bûye nimûneyeke ciwan a şaristaniya Cizîra Botan. Lewra herçend em bi van helbestên kêr ên berdest peywendîya wî digel Cizîra Botan nekarin rasterast çê bikin jî, şêwaz û edaya wî ya edebî nîşan dide ku Remezanê Cizîrî berhemê şaristaniyeke bilind a bajarê Cizîrî ye û ji helbestvanekî çiyayî û kenarî zêdetir pêjna helbestvanekî bajarî û serayî pê ve diyar e.

2. DI SERDEMA MÎREKTIYA AZÎZAN DE HELBESTVANÊN BI CIZÎRA BOTAN RE PEYWENDÎDAR

2.1. EHMEDE XANÎ

Ehmedê Xanî, yek ji helbestvanên herî mezin ê edebiyata klasîk a kurdî ye. Li gorî malikeke berhema wî ya navdar *Mem û Zînê* (*Lewra ku dema ji xeybê fek bû / Tarîx hezar û şêst û yek bû*) di 1061ê koçî de ku dike 1650/1651 zayînî li bajarê Bazîdê ji dayîk bûye.⁴⁸⁴ Xanî kurê Îlyas û Gulnîgarê ye. Nasnavê xwe ji gundê Xana ser bi navçeya Çelê ya bajarê Hekariyê û ji hoza Xaniyan wergirtiye. Li gorî ragihandina Ebdullah Varlî malbata Xanî li ser fermana serwerên Mîrektiya Hekariyê di navbera salên 1460-1465an de çûne devera Daroing, Bazîd û Narîn Qeleyê.⁴⁸⁵

Li gorî Meruf Xeznedar, Ehmedê Xanî cara pêşî li hucureya mizgefta Muradiyeya Bazîdê dest bi xwendinê dike û xwendina xwe ya seretayî û navendî li vir temam dike. Paşê li bajarê Urfa, Exlat û Bedlîsê dirêje bi xwendina xwe dide û demeke şûnde careke din vedigere Bazîdê. Piştî navberekê diçe bajarê Cizîrê, li vir xwendina xwe temam dike û îcazeta melatiyê werdigire. Piştî wergirtina îcazetê, vedigere Bazîdê û li vir mamostetî dike.⁴⁸⁶ Berevajî Meruf Xeznedar bi dîtina Abdullah Varlî, Xanî cara pêşî li cem bavê xwe dest bi xwendinê kiriye û piştî mirina bavê xwe di xwendingeha “Gewhernîgar”ê de li bal birayê xwe Mela Qasim xwendina xwe ya seretayî temam kiriye, paşê jî çûye Xoşabê û di Medreseya Etaiyeyê de dawî li xwendina xwe aniyê.⁴⁸⁷

Ji amadekirina *Nûbihara Biçûkan* jî tê fêmkirin ku Xanî piştî temamkirina xwendina xwe di medreseyan de mamostetî kiriye û girîngiyeke mezin daye perwerdekirina zarokên kurdan. Ji xwe bi dîtina Ebdullah Varlî piştî ku Xanî ji hecê vedigere, bi erêkirina serwerên Bazîdê, medreseya malbata wan a bi navê “Gewhernîgar”ê bi navê “Gulgûnîl Îlm”ê diguherîne û di vê medreyê de bernameyeke nû ya xwendinê cî bi cî dike. Xanî di medreyê de tevî îlmên şer‘î îlmên hîkmet, hendese, cebir û felekiyatê jî dide xwendin û ya herî girîng piştî xwendina Quranê, pirtûkên kurdî yên mîna Mewlûd, Nûbahar, Eqîdeya Îmanê, Tesrîf, Zuruf û Terkîbê jî

⁴⁸⁴ Kadri Yıldırım, *Ehmedê Xanî'nin Fikir Dünyası*, Ağrı Kültür Yardımlaşma Derneği, Berdan Matbaası, Ağrı, 2011, r. 23.

⁴⁸⁵ Varlî, b.n., r. 118-119.

⁴⁸⁶ Xeznedar, b.n., c. 2, r. 367-368.

⁴⁸⁷ Ebdullah Varlî, *Tevahiya Jinewariya Ehmedê Xanî*, Sempozyuma Ehmedê Xanî ya Navneteweyî, Weşanên Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê, Diyarbekir, 2008, r. 21.

dide xwendin⁴⁸⁸ û bi vî awayî li ser şopa Elî Teremaxî xwendina kurdî dike beşek ji bernameya medreseyan.

Ji bilî mamostetiya medreseyê Xanî di seraya mîrên Bazîdê de karê munşîtiyê jî kiriye. Li ser malika Xanî ya (*Ji saz qelem giriftar bûn, bûna sera munşîdar bûn / Ewan karan ji bab mabûn, lew dîwan da munşî hildan*) Ebdullah Varlî dibêje Xanî jî mîna bavê xwe di sala 1671an de di serdema Mîr Muhammed Purbelalî de weku munşiyê serayê hatiye tayînkirin û di jiyana xwe ya karmendiya serayê de digel Mîr Muhammed Purbelalî, Mîr Ebdî, Mîr Xelîl, Mîr Îbrahîm, Mîr Mîrza û Mîr Muhammedê Duyem munşîtiya serayê kiriye. Di sala 1700î de jî di destpêka mîrîtiya Mîr Muhammedê Duyem de dev ji munşîtiyê ber daye û di serdema Mîr Ebdulfetah de koça dawî kiriye.⁴⁸⁹ Li ser dîroka mirina Xanî hinek boçûnên ciyawaz hebin jî ji hevoka ku di destnivîsekê de hatiye dîtin “*Tare Xanî îla rebbihî*” (*Xanî fîriya ba Xwedayê xwe*) bi hesabê ebcedê hatiye derxistin ku Xanî di 1119ê koçî ku dike 1707ê zayînî koça dawî kiriye.⁴⁹⁰

Bêguman weku ji jiyanameya wî jî xuya dibe Xanî helbestvanekî bajarê Bazîdê ye, lê ji ber ku bûyera berhema wî ya navdar *Mem û Zînê* li bajarê Cizîrê diqewime û Cizîra Botan di *Mem û Zîna* Xanî de weku tabloyeke ciwan a edebî derdikeve pêş, Xanî û *Mem û Zîna* wî dibin mijara lokolîna me. Loma jî berî ku em derbasî *Mem û Zînê* bibin em ê derbarê peywendiya Ehmedê Xanî ya digel Cizîra Botan hin agahî berçav bikin. Weku me di jiyanameya wî de jî amaje pê kir, malbata Xanî binecihên devera Hekariyê ya nêzîkê Cizîra Botan in û li gorî helbesteke Xanî eslê wî Xalîdî ye.

Lewra ku Ahmedê Xanî ye, emma esil Xalîdî ye

Ew neslekî tahirîye, kanê Muhammed Mustefa⁴⁹¹

Li gorî ragihandina Ebdullah Varlî tîreya Xaniyan ser bi hoza Hemîdiyeyê ye û hoza Xalîdî jî yek ji şaxên hoza Hemîdiyê ye.⁴⁹² Bi vî awayî derdikeve ku ji aliyê nesebê ve Ehmedê Xanî digihîje xanedana Mîrên Azîzan. Li aliyê din herçend Ebdullah

⁴⁸⁸ Varlî, h.b., r. 25.

⁴⁸⁹ Varlî, *Dîwan û Jinewarîya Ehmedê Xanî*, r. 219-221.

⁴⁹⁰ Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, Şîrove û Kurdiya îro: Jan Dost, Avesta, Stenbol, 2010, r. 18.

⁴⁹¹ Varlî, *Dîwan û Jinewarîya Ehmedê Xanî*, r. 142.

⁴⁹² Varlî, h.b., r. 87.

Varlî, ji ber nebûna çavkaniyên pêbawer red jî bike, gelek lêkolerên edebiyata kurdî diyar kirine ku Ehmedê Xanî demekê li Cizîrê maye. Li gorî Sadiq Behadîn Amêdî, Xanî dema çûye Cizîrê di dîwana Mîrê Cizîra Botan de maye û Mîr gelek qedrê wî girtiye. Îzedîn Mustefa Resûl jî ji ber ku Xanî di *Mem û Zînê* de bi awayekî mukemmel şayesandina devera Cizîrê kiriye, bi awayekî rast behsa dîmena şetê Cizîrê kiriye û navên hin dever û seyrangêhên Cizîrê yên mîna “Westanî, Nêrgizî, Seqlan, Derwaze, Omerî û Meydan”ê dane, di wê baweriyê de ye ku Xanî demeke dirêj li Cizîrê maye, ji av û hewa û siruşt vî bajarî gelek hez kiriye û li ser çîrokên devera Botan bingeha *Mem û Zînê* xwe li vir daniye.⁴⁹³ Ji xwe jî van malikên jêrîn ên *Mem û Zînê* bi awayekî aşkera derdikeve ku Xanî peywendiyê rasterast digel bajarê Cizîrê daniye:

Hindek ji fesaneê di Bohtan

Hindek di behane, hin di buhtan⁴⁹⁴

Dîwane me, min perî bi der da

Ez Dicle me, zenberî me berda

Westanî û Nêrgizî û Seqlan

Derwaze û Omerî û Meydan

Van seyregehan tu lê dikî geşt

Ez mame, ji bo mi ra der û deşt⁴⁹⁵

Bi dîtina Abdullah Yaşin jî Ehmedê Xanî du sal û nîv li Cizîrê dersdarî kiriye, çîroka *Mem û Zînê* li Cizîrê tomar kiriye û 1690î de dest bi nivîsîna mesnewiya *Mem û Zînê* kiriye. Paşê careke din hatiye Cizîrê û heft mehê din li vî bajarî maye.⁴⁹⁶ Bi vî awayî derdikeve ku Ehmedê Xanî hem ji aliyê nesebê xwe ve digihîje Mîrên Cizîra Botan, hem di maweya jiyana xwe de rasterast peywendî digel bajarê Cizîrê daniye, hem

⁴⁹³ Resûl, b.n., r. 43-44-422.

⁴⁹⁴ Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, Weşanên Deng, Wergêra Tîpên Latînî û Kurdiya xwerû: M. Emîn Bozarslan, Çapa Duyem, İstanbul, 2005, r. 614.

⁴⁹⁵ Xanî, b.n., r. 388.

⁴⁹⁶ Yaşin, b.n., r. 52.

jî bi *Mem û Zîna* xwe bûye parçeyek ji çand û şaristaniya Cizîra Botan. Loma jî Xanî her weku Bazîdê bi Cizîra Botan jî hatiye nasîn û bûye yek ji sembolên vî bajarê dêrîn.

2.1.1. Weku Hêmayeke Edebiyata Bajarî di Mem û Zînê de Pesindana Mîrê Cizîra Botan

Ehmedê Xanî di *Mem û Zîna* xwe de hukumdar û serayê weku navenda bajêr û sedema peydabûna edebiyatê nîşan dide. Ji ber vê jî piştî pêşekiyên klasîk ên mesnewiyê bi pesnê Mîrê Cizîra Botan ê bi navê Mîr Zeyneddînê kurê Mîr Ebdal dest bi çîroka xwe dike. Bi vî awayî hem Melayê Cizîrî hem jî Ehmedê Xanî weku du helbestvanên serayên hukumdarên kurdan bi pesindana mîrên Cizîra Botan, ji bo peydabûna edebiyateke xurt hebûna hukumdarên bihêz û karîger weku zerûretek destnîşan dikin. Ehmedê Xanî vê rastiyê bi awayekî rasterast dixe rû. Ji ber ku Mîrê Bazîdî yê bi navê Mîrza ew çend girîngî nade edebiyatê û edîban, Xanî giliyên xwe li felekê dike û dibêje eger weku rom û eceman, kurdan jî padîshahekî desthilatdar hebûya, dê rewaca helbestvanên mîna wî jî hebûya û eger qedrê hunera wî bihata girtin, dê li ser nav û hîsabê edebiyata kurdî alaya kelimê mewzûn li ser banê gerdûnê biçikanda.⁴⁹⁷ Bi vî awayî Xanî digel armancên siyasî û serweriya neteweyî, bi temeniya derketina padîshahekî kurd peywendiya rasterast a desthilat û edebiyatê diyar dike û bi vî awayî merca sereke ya peydabûna edebiyata serdema xwe derdibire.

Di serdema navîn de û bi taybetî di rojhilat de hukumdar û seray ji ber ku beşeke danebirî ya edebiyatê bûn, di *Mem û Zînê* de jî seraya Cizîra Botan û mîrê wê di navenda bûyeran di cih digirin. Lewra Cizîra Botan, weku paytexta mîrektiyê û seraya mîr, weku navenda rêvebiriyê bi hêz û cazîbeya xwe ya siyasî, aborî û leşkerî her cure mirovî li dora xwe dicivand û ji bo peydabûna rûdanên diramatîk, zemîneke libar dianî holê, loma jî ji bo rûdana mesnewiya *Mem û Zînê* cihê herî guncaw ev der bû. Di vê çarçoveyê de Xanî di *Mem û Zînê* de di destpêka çîrokê de pêşî pesnê Mîrê Cizîra Botan dide û bi vî awayî di berçavkirina bajarê Cizîrê de mîr û seraya wî dike xala bingeîn a bajêr û bûyerên mesnewiya *Mem û Zînê*.

Berî ku em derbasî şayesandina mîr bibin, pêwîst e em derbarê kesayetiya Mîr Zeyneddîn de hin agahî bidin. Ji ber ku navê Mîr Zeyneddînê kurê Mîr Ebdal ê ku Xanî salixên wî dide di çavkaniyên dîrokî de derbas nabe, li ser nasnameya wî ya dîrokî hin

⁴⁹⁷ Xanî, b.n., r. 172.

tevlîhevî hene. Herçend di berhemên edebî de bûyer û lehengên van bûyeran piranî fiktîf bin jî bi dîtina me Mîr Zeyneddîn kesayetiyekî fiktîf nîne. Lewra li gorî ragihandina Şerefîxanê Bedlîsî piştî Mîr Ebdalê mîrê Cizîra Botan kurê wî Mîr Îzzeddîn tê ser hukum⁴⁹⁸ û bi dîtina me navê rastîn ê Mîr Zeyneddîn, Mîr Îzzeddîn e. Weku Roger Lescot jî di pêşgotina Destana Memê Alan de radigihîne navê Îzzeddîn li ser zimanê xelkê di nava demê de weku Ezzeddîn, Ezîn, Zengîn, Zeydîn û Zeyneddîn guheriye⁴⁹⁹ û di çîrok û stranên dengbêjan de weku forma Zeyneddîn derketiye holê. Ji ber ku Xanî çîroka *Mem û Zînê* weku ew jî diyar dike ji efsaneyên Botan wergirtiye, navê mîr jî ji van çîrokan seh kiriye û bi vî awayî nivîsiye. Li aliyê din Xanî, Mîr Zeyneddîn ji aliyê nesla xwe ve Xalidî dizane û bi vî awayî derdikeve holê ku Mîr Zeyneddîn ne kesekî fiktîf e, ji xanedana mîrên Cizîra Botan mîrekî rastîn e.

Di *Mem û Zînê* de Mîr Zeyneddîn padîşah û mîrê kurdan e, lê gelek mîletên din heta rom û ereb jî di bin hukmê wî de ne. Paytexta wî, Cizîr, dişibe “meqamê mehmûd”. Ne tenê Rustem, stêrka merîxê jî li asîman jê fikaran dike û mîna ku şûrê Xweda di destê wî de be kes nikare xwe li hemberî wî ragire, şopên hêza wî ji heyvê heta masiyên bin avê li ser herkes û her tiştî tîn dîtin. Bi vî hêz û cazîbeya xwe, dinyayê li dora xwe digêrîne û mîrîtiya wî mîna sembola xweşbextiya axîretê ye. Di karê hukumetê de bi eqil, huner, rêkûpêkî û dadmendî serederî dike, li beramberî dijminên xwe serdarekî wêrek û ji bo gelê xwe parêzvanekî bihêz e. Çawa ku bi hêz û dilêriya xwe bêwêne ye, ji aliyê dewlemendî û ciwamêriyê jî bêhevta ye. Xezîneyên wî ji gewheran dagirtî ne û her tiştên ku li dinyayê peyda dibin li bal wî mewcud in. Ji ber hebûn û comerdiya wî mirovên mîna Hatem jî muhtacê hîmeta wî ne. Bi vî awayî Xanî Mîr Zeyneddînê mîrê Cizîra Botan weku çavkaniya hêz, rêvebiriya dadperwer û dewlemendiya boş destnîşan dike.

Go: Padîşahek zemanê sabîq

Rabû, di hukumeta xwe faîq

Ecnasê mîlêl mutî' û munqad

Nesla wî Erebb, emîrê Ekrad

⁴⁹⁸ Bedlîsî, b.n., r. 215.

⁴⁹⁹ Roger Lescot, *Memê Alan*, Weşanên Avesta, Îstanbul, 1997, r. 7.

Textê wî Cizîr û bextî mes‘ud
Tali’ qewî û meqamî mehmûd

Rom û Ereb û Ecem di ferman
Meşhûrî bi navê Mîrê Botan

Abaê izam û cedd û walid
Mensûb û muselselêd Xalid

Cebbarê felek ji wî hezerkar
Meslûlî ji sellê Seyfê Cebbar

Zîbendeê milk û zeynê dîn bû
Navê wî Emîrî Zeyneddîn bû

Mîrî ji wî ra bi zîn muwessef
Zînet ji wî ra bi dîn muerref

Asarê şecaeta wî şahî
Dagirtî ji mahî ta bi mahî

Mahîyetê wî medarê dinya
Şahîyyetê wî şairê uqba

Muhtacê sexaweta wî Hatem
Mexlûbê şecaeta wî Ristem

Hatem ji kemalê hîmmeta wey
Tomarê sexaweta xwe kir tey

Eq’l û huner û sexa û meydan
Zebt û neseq û nîzam û dîwan

Dadarî û dewlet û dîyanet
Serdarî û sewlet û siyanet

Meşhûn e ji her yekê xezînek
Meknûn e ji her yekê defînek

Bê usri ji bo wî ra muyesser
Bê xusri ji bo wî ra muqedder

Enwaê newadir û cewahir
Elwanê nefais û zewahir

Mecmûeê mumkinatê meqsûd
Wacib, kiribûn li nik wî mewcûd⁵⁰⁰

Mîr Zeyneddîn ji ber ku di navenda hêz û rêvebiriye de cih digire di *Mem û Zînê* de ji her kesî zêdetir behsa taybetmendiyên wî hatiye kirin. Di nava bûyerên *Mem û Zînê* de dema mirov diçin pêşberî mîr pêşî bi pesindana wî dest bi gotinên xwe dikin. Bo nimûne dema xwazgînê ji bo Tacdîn diçin Sitfîyê ji mîr dixwazin, mîr weku sîbera lutfa Xweda tewsîf dikin û hemû qencî û xweşîyan bi îrade û daxwaza wî ve girê didin û piştî pesindana wî daxwazên xwe jê re beyan dikin. Xanî di beşeke din de jî weku Melayê Cizîrî cihê desthilata Mîr di “îqlîma çarem” de dest nîşan dike û amaje bi cihê coxrafiyê Cizîra Botan dike. Ew mîrê ku cihê desthilata wî di herêma çarem a dunyayê de ye weku fermandarê hêzên peyade û siwarî serkêşiya stêrkên asîman jî dike.

Tu sayeyê lutfê Girdigar î
Îro li me şah û xundekar î

Şah î, nezera te kîmiya ye
Mah î, esera te pir ziya ye

⁵⁰⁰ Xanî, b.n., r. 194-198.

Her çî te vexundî, ew ezîz e
Her çî te nexundî, bêtemîz e⁵⁰¹

salarê mewakibê kewakib
serdarê tewalî' û xewarib

sultanê serîrê çerxê rabi'
weqtê we ku bû ji şerqê tali' ⁵⁰²

Xanî di *Mem û Zînê* de di kesayetiya Mîr Zeyneddînê mîrê Cizîra Botan de bi awayekî realist şîkariya taybetmendiyên hukumdarên serdema navîn dike û aliyê wan ê cebir û xezebê jî nîşan dide. Lewra eger aliyekî rûyê hukumdarên cemal be aliyê din celal e, hêleke wan lutf be hêla din qehr e. Mîrê Cizîra Botan jî ji vê adetê veder nîne. Ji ber vê çendê mîr di karê rêvebiriyê de hem pêwîstî bi mirovên qenc ên mîna Tacdîn, hem jî pêwîstî bi mirovên xirab ên mîna Bekir dibîne. Ji ber vê çendê dema Tacdîn li ser fitnekariya Bekir digel Mîr diaxife Mîr hebûna mirovên mîna Bekir ji bo rêvebiriya xwe pêwîst dizane û daxwaza qewirandina Bekir red dike. Mîr karê xwe yê edlê bi mirovên mîna Tacdîn dike û karê nebaş jî bi destên kesên mîna Bekir encam dide. Xanî ji bo berçavkirina xezeb û otorîteya dijwar a hukumdarên wan dişibîne agir û şahê maran.

Hindî bi hukumetê dikîn dewr
Geh edl e ji bo me kar û geh cewr⁵⁰³

Hukkami bi batin û bi zahir
Bê şubhe muşabih in bi agir

Rehmê ku dikin, ji rengê roj in
Qehrê ku dikin, cîhan disojin⁵⁰⁴

⁵⁰¹ Xanî, h.b., r. 296.

⁵⁰² Xanî, h.b., r. 466.

⁵⁰³ Xanî, h.b., r. 352.

⁵⁰⁴ Xanî, h.b., r. 360.

Hukkami ji cinsê şahê mar in
Eshabê sumûm û muhredar in

Muhran ku didin, bizan ku zehr e
Mihre ku didin, bizan ku qehr e ⁵⁰⁵

Ehmedê Xanî, bi van nimûneyan Mîr Zeyneddînê Mîrê Cizîra Botan her weku hukumdarên bihêz ên wê serdemê nîşan daye û li ser şopa berhemên edebiyata bajarî yê beriya xwe Mîr Zeyneddîn ji ber hêz û karîgeriya wî di navenda bûyerên çîroka *Mem û Zînê* de berçav kiriye. Bi vê hêmayê edebiyata bajarî jî Xanî taybetiyeke edebiyata bajarî daye berhema xwe û *Mem û Zînê* kiriye berhemeke edebiyata bajarî.

2.1.2. Di *Mem û Zînê* de Taybetmendiyên Seraya Cizîra Botan

Di *Mem û Zînê* de lehengên esasî yê çîrokê bi tevahî ji çîna bilind in û şênîyên serayê ne. Zîn û Sitî xwişkên Mîr Zeyneddîn in û bi letafet û rindiya xwe xatûnên serayê ne. Her du xwişk weku du şehzadeyan di serayê de di nava naz û nîmetan de dijîn û li ber destê Zînê du sed perestarên mîna periyên hertim ji bo xizmetê amade ne. Her du hezkiriyên wan Tacdîn û Mem jî ji çîna serdest in. Tacdîn kurê wezîrê dîwanê ye û Mem jî kurê debîrê dîwanê ye. Xanî ne tenê van kesên navborî belku hemû rûniştvanên resen ên Cizîrê weku mirovên kubar û “kurdemîr” bi nav dike û ji bo Cizîrê ji mirovên nepak tenzîh bike, mirovekî xirab ê mîna Bekir bi eslê xwe Cizîrî qebûl nake û wî nîsbetî Mergeverê dike. Bi vî awayî Xanî Cizîra Botan weku cihê çanda bilind a bajarî û esîlzadeyan destnîşan dike û asta pêşketina bajarvaniya Cizîrê bi vî awayî nîşan dide.

Şehzade ye, şehnişîn mekan e
Enqa ye, bilindeaşîyan e ⁵⁰⁶

Zîna ku du sed perî perestar
Hora ku Memo ji bo girîftar ⁵⁰⁷

⁵⁰⁵ Xanî, h.b., r. 464.

⁵⁰⁶ Xanî, h.b., r. 474.

⁵⁰⁷ Xanî, h.b., r. 432.

Tacdîn weledê wezîrê Dîwan
Mem jî xelefê debîrê Dîwan⁵⁰⁸

Begzade ye yek, ji neslê mîran
Yek jî bi neseb kurê debîran

Şêxê, tu dizanî ev Cizîr e
Têkda kubera û Kurdemîr e⁵⁰⁹

Emma bi neseb ne merdê Bohtan
Belkî mutewellidê ji Bohtan

Eslê wî, dibên ji Mergever bû
Mehza wî beşer bişor û şer bû⁵¹⁰

Di edebiyata klasîk a bajar û serayê de yek ji cihên ku di berhemên edebî de tê raberkirin meclis e. Meclis ji bo xwarin, vexwarin, stirîn, şahî, helbestxwendin û guhdarîkirinê dicive. Di nava meclisê de dilber, saqî, dost û muzîsyen jî cihên xwe digirin.⁵¹¹ Ev ziyafet û şahî carina sê roj û sê şev carina jî hefteyekê dirêj dikêşin. Di van meclisan de darên nexlê tînan danîn di nava bêhnên xweş de dema sazband lê didin saqiyên perî rû jî şerabê li mêvanan belav dikin. Herkes serxweş dibe, çîrokên serkeftinê tînan guhdarîkirin, helbestvan helbestên xwe yê herî xweş dixwînin û dikevin nava muşa'ereyê.⁵¹²

Di *Mem û Zînê* de meclis piştî ku Mîr Zeyneddîn zewaca Tacdîn û Sîtiyê erê dike tê girêdan. Meclisa Mîr ji aliyê naveroka xwe ve hemû taybetmendiyên meclisên adetî yê rojhilat di nava xwe de dihevine. Xwarinên curbicur li ser lengeriyên zêr û zîvîn di nava tepsî û kaseyên fexfûrî yê birqok de digerin, li ser sifreyan tepsî û kaseyên mezin bi goştên karikan, goştê berxan, buryan, kebab û şîraniyan dagirtî ne,

⁵⁰⁸ Xanî, h.b., r. 216.

⁵⁰⁹ Xanî, h.b., r. 272-274.

⁵¹⁰ Xanî, h.b., r. 348-350.

⁵¹¹ Andrews, b.n., r. 178.

⁵¹² İnalçık, b.n., r. 26.

sifreyên raxistî ji rengîniya xorak û amanên xwe yên nayab dişibin asîmanê rengîn û berîn. Di meşrebe û qedehên çînî de vexwarinên mîna narinc, turunc, henar û leymûnê tîr gerandin. Ji her derî bêhnên xweş ên mîna gulav, zebad, misk û enberê difûrin. Sazbend û stranbêjên xweşdeng bi cilên xwe yên giran û xweşreng rêz dibin û bi ûd, tenbûr, saz, muxnî, kemançe, çeng, def, sûrena û sentûran di meqamên uşşaq, newa, îraqî û ewcê de stranên xweş û nûwaze dibêjin. Li ber vê mûsîqaya mu'cîznuma saqî mey belav dîkin û tevî bajarî, bedewî, mirovên azad û bendeyan; mutrib, qewwal, muxennî û xezelxwan jî mest û sekran dibin û bi vî awayî hemû endamên meclisê di nava vê îşretê de seranser ji xwe diçin.

Kêşa wî bi meclisa xwe xwanek
Goya kire ferşî asîmanek

Qursê meh û mîhrê asîmanî
Înan te digo bi cayê nanî

Ev lengerîyê di zîv û zêrîn
Şubhet felekê di jor û jêrîn

Her sehne mezin mîsalê bircek
Serpoşê li ser rengê durcek

Her tepsî û kaseyê di fexfûr
Yek exterê pirrziya yê pîrmûr

Cedî û hemelê di asîmanî
Biryan û kebabê mîhemanî

Her kase û tepsîyek, yek enbar
Serşari şebîhê nefisê emmar

Enwaê teamê çerp û şîrîn
Elwanê xida û nuqlê rengîn

Van meşrebe û eyaxê Çînî
Dewran dikirin bi nazenînî

Seyyare sîfet bi geşt û seyran
Herçî ku didî, dimayî heyran

Narinc û turunc û nar û leymû
Newbawê şaxîsarê mînû

Fanîz û nebat û qend û şeker
Mawerd û zebad û misk û enber

Hindan dikirin meîde, xaze
Hindan dikirin dîmaxî taze

Mecmer gerîyan bi ûd û enber
Bûn cumle meşamê can muetter

Ramişger û xweşxanewa û xweşdeng
Şayeste û xweşqumaş û xweşreng

Hevdengi hinek bi sewtê sazan
Hevsengi hinek bi fexr û nazan

Muxnî û kemançe, ûd û tenbûr
Çeng û def û sûrena û sentûr

Uşşaq û newa, îraqî û ewc
Vêkra dikirin bi rasitî zewc

Awazeyê şu'be û meqamat
Bê perde bi mu'ciz û keramat

Zahir ku dibûn ji nayê gerdan
Xaretkerê aq'î û dîn û îman

Saqî şewişîn bi abê engûr
Mutrib herişîn bi seytê sentûr

Qewwal û muxennî û xezelxwan
Mexmûr û sîyah û mest û sekran

Alem hemî bûye îşretabad
Şehrî, bedewî, ebîd û azad ⁵¹³

Bêguman ev meclisên şahî û şadiyê di nava xasbaxçeyên serayan de dihatin girêdan. Lewra xasbaxçe yan jî gulzar hem cihê geşt û seyrana dilberê, hem cihê bêhnvedana hukumdar, hem jî nimûneya herî balkêş a bajarê serdema navîn bû. Ji ber vê çendê weku hêmayeke klasîk di hemû berhemên edebiyatên klasîk ên rojhilat de meclisên şadiyê di mehên biharê de, li xasbaxçeyên serayan û gulzaran dihatin lidarxistin. Di vê çarçoveyê de di *Mem û Zîna* Xanî de jî bi hûrdekarî behsa baxçeyê seraya mîrê Cizîra Botan tê kirin. Lê baxçeyê seraya mîrê Cizîra Botan tevî ku hêmayeke helbesta klasîk a rojhilat e, di heman demê de rastiyeke bajarvaniya Cizîra Botan e jî. Lewra ji mêj ve bi xêra çavkaniyên boş ên avê, li der û dora Cizîrê gelek bax û rezên xweş hatine danîn. Li gorî ragihandina Îbnu Şeddad di bin sûrên Cizîrê de sî bostan hebûn.⁵¹⁴ Di sedsala XVIIan de jî Evliya Çelebiyê ku çûye Cizîrê dibêje li rojavayê bajêr bax û baxçe ew çend pir bûn ku di rojekê de mirov bi zorê dikarî li dora wan bigere.⁵¹⁵ Ji ber vê ciwaniya siruştî ya Cizîrê, bajar di serdema Ebbasiyan de jî dibe havîngeha rêvebirên Ebbasî. Di serdema Xelîfe Mehdî de kurê wî Harun Reşîd weku waliyê wê herêmê li Bakarda û Bazeddayê ji bo xwe koşkekê dide çêkirin⁵¹⁶ û helbestvanekî wê demê jî li hemberî Bexdadê pesnê av û hewayê Cizîrê dide.

⁵¹³ Xanî, h.b., r. 302-308.

⁵¹⁴ Îbn Şeddad, *el Alaqu'l Xetîre fî Zikrî Umera-iş Şam wel Cezîre*, Tehqîq: Yahya Ebbara, Wezaretu'l Seqafe wel Îrşadi'l Qewmî, Dimişq, 1978, c. 3, r. 215.

⁵¹⁵ Çelebi, b.n., c. 4 r. 316.

⁵¹⁶ İbnü'l Esir, *el Kamil fi't Tarih*, Wergêr: Heyet, Bahar Yayınları, c. 6/1, r. 65.

Bakarda û Bazebda havîn û biharî ye
Mîna Selsebîlê ye, tim şîrîn û hênîk e.
Bexda, Bexda çi ye? Ku em bîn ser axa wê
Çavkaniya tayê ye, serma wê jî xedar e.⁵¹⁷

Li gorî Abdullah Yaşin baxçeyê seraya mîrên Cizîra Botan ku jê re “Rezê Mîran” dihat gotin li bakurê Kela Cizîrê, di navbera Rûbarê Dîcleyê û kelehê de bû. Bi dîtina wî ev baxçe heta 1857an jî bi darên mêweyên curbicur tijî bû û têde gelek ajelên kedî û kûvî jî hatine xwedîkirin.⁵¹⁸

Ehmedê Xanî jî li ser vê taybetmendiya bajarê Cizîrê beşek ji mesnewiya xwe di bin sernavê “*Dastanê bostanê cennetnîşan ê Mîran/ Ku bûye mecme’ul behreyna işqa her du dîlfikaran/ Metleê neyyîr ê şewqa husna her du gul’îzaran*” de bi hûrdekarî şayesa baxçeyê navborî dike. Baxçeyê Mîr Zeyneddîn ji aliyê ciwaniyê ve dişibe baxê Îremê, têde darên bilind ên mîna serw, tezerwek, senewber, er’er, şimşad û çinarê hene, herwuha ji darên mêweyan têde narinc, turunc, henar, xurme û sêv peyda dibin, ji ajelên kûvî û kedî; têde xezal, keroşk, ahû, qaz, quling, kew, teyhû û gur hene, kaniyên nava baxçe mîna kewsera bihiştê ne, her aliyên wî bi mêrg, çîmen, gul, sinbil, reyhan û binefşan xemilandiye, di nava rêkûpêkî û endazeyeke temam de hin cihên wî newal, hin cihên wî gir, hin cihên wî jî raste ne û bi vî awayî her goşeyekî wî mîna goşeyek ji bihiştê ye. Ev baxçeyê ku Xanî wuha salixên wî dide hem cihê hevdîtina *Mem û Zînê*, hem jî cihê civîna meclisa Mîr e. Mîr dema tevî bajariyan diçe nêçîrê *Mem û Zîn* di nava vî baxçeyî de tên ba hev û di şehnişîna serayeke ciwan de agirê hesreta dilan vedikujin. Di wê kêliyê de Mîr jî tevî ‘ayan û eşrafan tên heman serayê û dîwan girê didin, fînd tên vexistin û saqî li civatê mey belav dike.

Baxek we hebû Emîrê Zeydîn
Baxê Îremê diçû di mizgîn

Her dewhe ji wî, û her tuyûrek
Yek qesri ji cennetê, û hûrek

⁵¹⁷ Ğandur, b.n., r. 233.

⁵¹⁸ Yaşin, b.n., r. 105-106.

Bo şuştinê dest û pê û çavan
Kewser kiribû sebîli Ridwan

Hemser bi Meqamê Sîdre, serwek
Manendê firîşte, her tezerwek

Teşbîhê Memê, dilê senewber
Sed pare ji îşqê, qeddê er‘er

Narinc û turunci, şubhê Zînê
Zer bûyî ji îlleta evînê

Sêv û ruteb û enarê bustan
Lêv û zeqen û enarê pustan

Şimşad û çinari hemqedem bûn
Xweş sayewer û elîhîmem bûn

Zêrînqedehêdi mesti lebrîz
Reyhan û binefşe cumle newrîz

Mecmûeê xudrewat û ezhar
Şîrazeê Selsebîl û enhar

Sehna rezî, mucmelen kîtabek
Her qit‘e û fesli, fesi û babek

Goya bi edeb, edîbê tencîm
Sersefheê baxî şubhê teqwîm

Cedwel kiribû bi helê sîmab
Şingerfî sîfet gulêdi sîrab

Etrafî ji sinbil û reyahîn
Elwan ji xutûtê sebz û mişkîn

Her yek dikirin beyanê ehkam
Bextê sîyeh û sefîdi î'lam ⁵¹⁹

Her yek ji newal û kûh û deştan
Reh şubhetê goşeyêd bihiştan

Her gul, ji mîsalê ateşê Tûr
Yek meş'elê bêqusûr ê pirrnûr

Her murxê seher, bi xwe Kelîmek
Her tutî û qumrîyek, nedîmek

Xergûş û xezal û gur û ahû
Ev qaz û quling û kebk û teybû

Ker ker diçerîn li kûh û deştan
Ref ref difirîn di nêv bihiştan ⁵²⁰

...

Her du di wî halî da eyanî
Bêperde, sera û bênuwanî

Wan dîtî di baxî de serayek
Ayîneê Cem, cîhannumayek

Rabûn û meşîne şehnişînan
Rûniştin û her du nazenînan ⁵²¹

...

⁵¹⁹ Xanî, b.n., r. 416-418.

⁵²⁰ Xanî, h.b., r. 408-410.

⁵²¹ Xanî, h.b., r. 436.

Î'razi kirin ji wî kalamî
E'yan hemî vêkktin temamî

Saqî û şerab û şem'î xwestin
Dîwaneke hakîmane betsin ⁵²²

Rabe tu here heremserayê
Da ez biçim agir û nîdayê ⁵²³

Di nava vê baxçeyê ciwan û şahane da *Mem û Zîn* hevdîtî pêk tînin û di nava vî baxçeyî de bi hev şa dibin. Di vê çarçoveyê de di *Mem û Zînê* de erotîzma edebî jî weku taybetmendiyeke edebiyata bajarî derdikeve pêşberî me ku ev diyarde di encama jiyana bajarî û serayê de derdikeve holê. Lewra çawa me pêştir jî behs kir weku yekemîn berhema edebî ya bajarî di Destana Gilgamêşê de û weku yekemîn berhema bajarî ya kurdî di Zembîlfiroşê de jî di peywendiya jin û mêran de unsûra erotîzmê hatibû bikaranîn û ev weku taybetmendiyeke berhemên bajarî hatibû nîşandan. Herçend evîna *Mem û Zînê* di dawiya çîrokê de bi peyameke tesewufî biqede jî Xanî bi du sehneyên erotîk berhema xwe ji çarçoveya teng a tesewufî derdixe û têgihiştineke bajariyane dinimîne. Lewra fezaya azad a bajar û peydabûna refaha civakî rê li ber meylên zayendî û azadiya derbirîna van meylan jî vedikin û berhemên bajariyên ku jiyana xelkên bajarî nîşan didin bi vî awayî dibin wasiteya derbirîna van meylên mirovî. Xanî jî di *Mem û Zînê* de di du beşan de bi hûrdekarî cih dide van sehneyên erotîk. Sehneya yekemîn di qesra Tacdîn de derbas dibe û têde behsa şeva gerdekê ya Tacdîn û Sitiyê tê kirin. Xanî di vê beşê de bi zimanekî edebî û bi awayekî wêrekane hemû hûrdekariyên pevşabûna Tacdîn û Sitiyê nîşan dide û wêneyeke erotîk dikêşe. Sehneya duyemîn jî li baxçeyê seraya Mîr rû dide û di vê beşê de jî behsa pevşabûna *Mem û Zînê* tê kirin. Her du dildar dema hev dibînin pêşî ji kelecane zimanên wan kilît dibe, paşê destên hev digirin û hêdî hêdî dest bi axaftinê dikin. Piştî ku ji axaftinê têr dibin her du evîndar vê carê bi zimanê bedenî bi hev halî dibin. Lêv, çav, sîng, gerden, dêm, çene û binguhên hev didin ber maçan. Carina hev bêhn dikin, carina hev dimijin û carina jî hev digezin. Piştî demekê radibin diçin şehnişîna qesra nava baxçe û li vir jî bi heman awa bi hev şa dibin. Lê bi

⁵²² Xanî, h.b., r. 448.

⁵²³ Xanî, h.b., r. 454.

gotina Xanî her du dildar ji sînorê zerafetê ku ew jî kemer e derbas nabin û li wir disekinin.⁵²⁴

Rabû ku li pêşedestê Zînê
Fik'rî ku du dest di destê Zînê

Man her du gelek li pêşê yek lal
Ne nutq û xeber, ne qîl û ne qal

Ewwel dikirin bi dest îşaret
Paşê ku vebû li wan îbaret

Ewçendi kelam bi yek ve gotin
Ewçendi ji pêşê yek ve sotin

Ewçendi şeker bi yek ve rêtin
Ewçendi lebêd yek dimêtin

Ewçendi qedeh bi yek vexwarin
Ewçendi qeza ji nû bijarin

Çeşm û leb û sîne, gerden û dûş
Ruxsar û zeqen, ber û binagûş

Yek yekê bi dil ji yek dixwestin
Hin bûse didan û hin digestin

Ew teşnelebêd ji weslê yek têhn
Gerden dikirin li yêk û dû bêhn

...

⁵²⁴ Ji bo termînolojiya cînsî ya Mem û Zînê bnr.: Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, Werger û Şikariya Çemkî: Kadri Yıldırım, Avesta Yayınları, İstanbul, 2010, r. 111-114.

Dem ebri sîfet, hezîn û giryan
Geh xunçe mesel, letîf û xendan

Her dem dikirin qeza û sunnet
Ferza we ku bûse ne, çi minnet!

Herçendi ku ref'i bûn tekelluf
Lêkin evîşandibûn teserruf

Ew gerçi hebûn ji hev bi hêvî
Emma nediçûn qewî nişêvî

Hubba di dilan ji heddî der bû
Serheddê zerafetan, kemer bû ⁵²⁵

2.1.3. Di Mem û Zînê de Taybetmendiyên Bajarvaniya Cizîra Botan

Xanî piştî ku şayesandina meclis û baxçeyê seraya mîrê Cizîra Botan dike, bi çendîn boneyan me di kolan û seyrangêhên bajarê Cizîrê de jî digerin û derbarê kevneşopî û bajarvaniya Cizîrê de agahiyên girîng dide. Cejna Newrozê yek ji van unsûran e ku Xanî bi boneya vê cejnê geşbûna komel û zindîbûna dabûnêrîtên bajarê Cizîrê bi me nîşan dide. Xanî di bin sernavê “*Dastana Beyana Newroza Sultanî / Tesmiyeyê Mewsimê Sûrûr û Şadimanî / Bi Mersûmê Qedîmê Kurdistanî*” behsa gêrana cejna Newrozê dike û amaje bi dêrînbûna wê dike. Ji xwe Melayê Cizîrî jî bi malika “*Ev narê sîqala dil e, daîm li wî qala dil e / Newroz û sersala dil e, weqtê hilêtin ew sîrac*”⁵²⁶ behsa cejna Newrozê dike û vê boçuna Xanî piştrast dike. Di *Mem û Zînê* de Newroz di meha Adarê de tê pîrozkirin. Di vê rojê de hemû bajarî, ji biçûk, mezin û sipahiyan heta xatûn û pîr û kalan ji malan derdikevin, hinek bi peyatî hinek jî bi siwarî berê xwe didin seyrangêhên derûdora Cizîrê. Bi taybetî keç û kurên ezeb bi armanca zewacê û dîtina hevtayên xwe di vê rojê de xwe dixemilînin û di seyrangêhên Cizîrê de li pey qismetên xwe digerin.

⁵²⁵ Xanî, b.n., r. 434-436.

⁵²⁶ Cizîrî, b.n., r. 69.

Danayê muemmerê kuhensal
Ev renga he go ji bo me ehwal

Go: Adetê pêşîyê zemanan
Ev bû li hemî cih û mekanan

Weqtê we ku şehsiwarê xawer
Tehwîli fikir di mahê Azer

Yanî ku dihate bircê sersal
Qet kes nedima di mesken û mal

Bîlcumle diçûne der ji malan
Hetta digîhîşte pîr û kalan

Roja ku dibûye îdê Newroz
Te'zîmî ji bo dema dilefroz

Sehra û çemen dikirne mesken
Beyda û demen dikirne gulşen

Xasma ezeb û keçêdi bakir
Elqisse, cewahirêdi nadir

Têkda di muzeyyen û mulebbes
Vêkra li teferrucê murexxes

Lêkin ne bi tuhmet û bi minnet
Belkî bi terîqê şer' û sunnet

Lewra ku ewan xerez ji geştê
Meqsûdi ji çûyina bi deştê

Ew bû ku, çi talib û çi metlûb
Yanî du teref, muhîbb û mehbûb

Ev her du celeb ku hev bibînin
Kufwêdi xwe ew ji bo xwe bînin

Dewra felekê bextê feyroz
Dîsan ku numa ji nû ve Newroz

Mebnî li wî adetê mubarek
Şehrî û sipahîyan bi carek

Bajêr û kelat û xanî berdan
Teşbîhê bi nejdîyan û cerdan

Sef sef dimeşîne kûh û deştan
Ref ref dixuşîne seyr û geştan

Esnafê umem, sixar û kubbar
Qet'a venema di şehrî deyyar

Hindek bi peyayî çûne baxan
Hindek bi siwarî çûne raxan

Hindek bi tebayî û bi kesret
Hindek bi hevalî û bi wehdet

Rabûne ve xanim û xewatîn
Wan jî tijî gul kirin besatîn

Horan kire meskenê xwe cennet
Bê perde û bê melal û minnet

Dûşîze û duxter û ruwalan
Pakîzeîzar û zulf û xalan

Etrab û kewaibêdi ezra
Murdan û murahiqêdi zîba

Eshabê qumaşê lutfê ruxsar
Erbabê metaê husnê dîdar

Wan lêk dikirin metaê yek erz
Texmîn dikirin bi tûlê wel-erz

Sewdakirê işqê bûn di bazar
Hem bayiê husn û hem xerîdar

Sersalî û bakir û ruwalan
Sedsalî w ciwan û pîr û kalan

Sersali li resm û rahê me'hûd
Gêran di cih û meqamê mehmûd⁵²⁷

Newroz nîşaneyê herî girîng a sosyâlîteya bajarvaniya Cizîrê ye. Lewra bi vê boneyê keç û xortên bajêr bi awayekî serbest derfeta hevdîtinê bi dest dixin û ev jî dibe sedema peydabûna bûyerên evîndariyê û bizavtina hestên estetîk û edebî. Ji xwe di *Mem û Zînê* de cejna Newrozê destpêka bûyera çîrokê ye ku bi saya vê nêrîta komelayetî û şahiya cemawerî *Mem û Zîn* digel Tacdîn û Sîtiyê rûbirûyê hev dibin û ev hevdîtin jî dibe destpêka evîneke mezin û destanî. Di rojê Newrozê de Mem û Tacdîn cilên keşan û Zîn û Sîfî jî cilên kuran li xwe dikin û mîna keç û xortên din ên bajêr derdikevin kuçe û kolanên Cizîrê. Di kûçe û taxên bajêr de û li ber pencereyên malan bi sedan lawên Cizîrî di nava cilên hevrişm ên giranbûha de mîna darên serwan bejin û bala xwe nîşan didin. Keç û kur, pîr û kal û her cure jin û mêr ji çîna bilind û nizm tevlihev dibin. Hinek ji van kesan bicil in, hinek rût, hinek pêxwas in hinek serqot, hinek serxweş in,

⁵²⁷ Xanî, b.n., r. 220-226.

hinek bêhnçikiyayî, hinek dipeyîvin hinek bêdeng in, hinek digerin hinek ji xwe çûne, hinek cilên wan qetiyane, hinek serên wan şikiyane, hinek diqîrin hinek jî ji hişê seriyan bûne û bi vî awayî her yek bi tiştêkî ve daketiye û haya kesî ji kesî tune. Ev sehneya kuçe û taxên Cizîrê mîna tabloyeke karnavalê ya bajerekî hevçerxê îroyîn e ku refah û ewlehiya bajarê Cizîrê nîşan dide herwuha asta bajarvanî û heterojeniya komela Cizîra Botan jî berçav dike.

Îlla ku tenê Memo û Tacdîn
Wan dane xwe duxterane tezyîn

Yanî di dema ku bûye tehwîl
Ew her du bira di cametebdîl

Îstebreq û sundusin di ber da
Çend mî'cer û meqreme bi ser da

Pûşîde lîbasê dîlberanî
Seyran dikirin bi sergiranî

Wan her du kurêdi cametebdîl
Weqtê dikirin di şehrî tehwîl

Dîtin di mehelle û zikakan
Her kuçe û xurfe û şibakan

Sed taze ciwan ji rengê serwan
Dîba û herîr û xez di ber wan

Pansed ji keç û kur û ruwalan
Ew çende ji qismê pîr û kalan

Enwaê muzekker û muennes
Hindek di berehne, hin mulebbes

Hindek di ealî û ekabîr
Hindek di edanî û esaxir

Pêxwasi hinek, hinek di serkol
Kaşo ji pîyan û ser wekî hol

Sermesti hinek, hinek di serxweş
Dembeste hinek, hinek di demkeş

Goyende hinek, hinek di xamûş
Pûyende hinek, hinek di medhûş

Hin camederîde, hin di serxeş
Hin aq'leremîde, hin muşewweş

Hindan dikirin fîxan û feryad
Hin bûyî ji qeydê aq'î azad

Her yek di meqamekî digergûn
Her yek bi cefayekî cegerxûn⁵²⁸

Di *Mem û Zînê* de boneyeke din a ku dibe sedema nîşandana çanda gel û kolanên bajarê Cizîrê, daweta Tacdîn û Sîtiyê ye. Di vê dawetê de hemû jin û mêrên bajarî bi cilên xwe yên xemlîner pêl bi pêl ber bi qesra Sîtiyê ve diherikin. Sîfî di nava texterewana ku ji darê sendelûsê û bi cewherên curbicur hatiye nexşîkirin ji Qesra Mîrekiyê tê derxistin. Texterewana Sîtiyê li ser destên gelek mirovan ber bi mala zava ve tê birin. Texterewan di nava coş û xuroşa dawetgêran de ji kolanên Cizîrê tê derbaskirin, hemû bajarî tevî sofî, mela, feqîr û paşayan tîna temaşaya dawetgêran. Li ber her deriyek govend tê gerandin û li dora vana jî temaşavan dicivin. Saz, dawul, erbane, kerrena û naqûrên ku tîna lêdan miriyan jî vedijînin. Di nava vê şahiyê de texterewana Sîtiyê tê ber koşka zava. Tacdîn û Mem digel mirovên mezin li şaneşîna

⁵²⁸ Xanî, h.b., r. 228-232.

koşkê rûniştî ne û dema texterewana bûkê tê ber derî, zava û şoşbîn radibin tebeq bi tebeq zêr, zîv, cewher û mirariyan direşînin ser texterewana bûkê. Tacdîn û Mem ewçend zêr û mirarî direşînin ku xizanên bajêr pê dewlemend dibin û wusa lê tê ku êdî zengîn û xizan ji hev nayên ciyakirin. Di vê navê de bengî û serxweşên Botan li ber deriyê koşka bûk û zava çerx û baz û lotan didin xwe û govend, bêrîte û sema tê gerandin. Kurên ruwal û keçên rind tevlihev dibin. Hemû mirovên ser banan û serayan ji keyfxweşî û şahiyê sermest dibin û bi vî awayî dawet heft roj û heft şevan dirêj dikêşe.

Xanî di vê beşê de behsa rindî û cazîbeya keçên Botan jî dike. Lewra rindî û cazîbeya jinan ji mêj ve hêmayeke edebiyata bajarî ye. Bajarvanî û ciwankariya bajarî weku berhemê jinan tê qebûlîkirin û nîşandana rindî û cazîbeya jinan di heman demê de tê wateya ciwanî û cazîbeya bajêr. Xanî jî di vê çarçoveyê de bi hûrdekarî behsa keçên Botan dike. Kirasê li ser wan mîna pelê gul û yasemînan in, li ser navtengên wan ên ku mîna mûyan zirav in kemerên zêrîn hene, kofiyên serê wan ji nazdariyê xwar bûye, xetên wan genimgûn, laşê wan weku zîv e, zeniyên wan mîna sêvan, memikên wan mîna hinaran, birûyên wan mîna çarşeva reş, keziyên wan jî mîna marên reş in. Ev keçên çarde salî yên peyv şîrîn bi her hal û taybetiyên xwe dişibin horî, melek, perî û wîldanên bihiştê û di daweta Tacdîn û Sitiyê de cazîbe û ciwaniya Cizîra Botan nîşan didin.

Şehrî, ji mezekker û muennes
Fîlcumle muzeyyen û mulebbes

Teşbîhê bi behrê pirr temewwuc
Cunbuş dikirin, xerez teferruc

Nageh gerîya bi cûdî meftûh
Dergahê kerem li keştîya Nûh

Yanî ku îmareta Sitî tê
Qesra perîya bi rasiî tê

Her texte ji ûdê sendelûsî
Textek, xetebendê abenûsî

Erşek ji cewahiran muresse'
Belqîsi celîsê wî murebbe'

Dest bestî ji pêş ve pêşekaran
Zerrînkemer û guherguharan

Hilgirtine ser serê xwe ew mehd
Dest dest direvan ji hev bi sed cehd

Ew texterewan wekî gemî bû
Behra ku bi ser ket, Ademî bû

Sofî û mela, feqîr û paşa
Vêkra li teferruc û temaşa

Xelqê ku ji dest xeman biferyad
Ferdek qe nema nebûyî dilşad

Her berderekê, şemateyek lê
Her mecmeekê, temaşeyek lê

Te d'go ku erûsi eynê can e
Lew bûne beden li pey rewane

Sazan mirî hey kirin, wekî Sûr
Kûs û def û kerrena û naqûr

Tacdîn bi xwe bûye padîşahek
Mem jî li tenîştê şubhê mahek

Rûniştî di şehnişînê alî
Cem'ek ji ekabiran hewalî

Rabûn li teferrucê vewestan
Wan cumle, tebeq di her du destan

Manendê tîbaqê asîmanî
Yaqût û zumerredê di kanî

Rêhtin tebeqê durê nîsarê
Jor da li îmareya nîgarê

Xîzan û geda we bûne mun‘em
Muflis bûye zenperest û muxlem

Xîzan û geda, xenî û zengîn
Şadan û hezîn û şa û xemgîn

Êdî nedibûn ji hev muşexxes
Ted’go hemî mîrek in, murexxes

Têkda di munasib û muwafîq
Vêkra di musafih û muaniq

Hasil, ku ji meqdema seramest
Bûn ew der û ban û ew sera mest

Hin mest û hinek dîger di bengî
Xwanende û bezlego û çengî

Her bengî û serxweşê di Bohtan
Têk hatine çerx û baz û lotan

Bêrîte, sema û saz û govend
Şîrîn û şekerleb û şekerxend

Ezra û ruwal û bikr û murdan
Hor û melek û perî û wîldan

Gulpîrehen û semenqebayan
Şekerdehenan û qendexayan

Zêrînkemeran û keckulahan
Tel'etqemeran û xetsîyahan

Sîmînbeden û semen'îzaran
Sêvînzeqen û memikhînan

Ev mûyemîyan û maregêşû
Ev çaridesale, çareebrû

Murdan û murahîq û mucerred
Lawê we ku xet wekî zumerred

Xweşdengi hinek, hinek di xweşreng
Hin cergebezî û hin dîger leng

Bîlcumle li rexmê vê ecûzê
Yanî li xîlafê piştekuşê

Kêjêd sivik, kurêd lawîn
Manendê benat û mîslê perwîn

Hin daîrebend û hin di dewwar
Hin sîlsîlebend û hin di seyyar

Encum sîfet encumen, firûzan
Heft şev di temam û hefti rûzan

Bezma Sitîyê û cem‘ê Tacdîn
Gêran bi vî rengî zîb û tezyîn ⁵²⁹

Sehneya ku şîna Memê têde tê behskirin jî yek ji wan beşên *Mem û Zînê* ye ku Xanî bi vê boneyê wêneyeke giştî ya bajêr dikêşe û hin taybetmendiyan çanda Cizîrê dixe rû. Çawa ku hemû bajarî ji bo nîşandana keyf û şahiya xwe di daweta Tacdîn û Sitîyê de beşdarî dikin herwuha ji bo derbirîna xem û dilêşîya xwe jî pêkve tevî gêrana şîna Memî dibin. Dema xebera mirina Mem tê bihîstin di nava bajêr de dengê hawar û zarîne bilind dibe û Botan ji ber dengê girîna bajariyan diheje. Ji biçûk, keç, bûk, jin û kesên ji rêzê heta xort, mîrza û kesên giregir herkes ji ber vê rûdana diltezîn şîn digire. Jin ji bo şîna Mem reş girê didin, keziyên porên xwe vedikin, bi ser dêmên xwe yên gulgûn de histirên xwînîn dirijînin û bi nalîn û kalîna xwe mîna teyrê goyîn dixwînin. Piştî şayesandina dîrûdirêj a bajariyan Xanî di dawîya vê sehneyê de radigihîne ku ev adeta reşgirêdana jin û keçên Botan ku heta roja îro jî dewam dike ji roja şîna Mem vir ve di nava Cizîriyan de bi cih bûye û heta qiyametê jî dê dewam bike. Ev çavdêriya Xanî nîşan dide ku bi rastî jî Xanî wênegirekî realîst ê komel û bajarê Cizîrê bûye û ji bilî mubalexeya edebî ew beşên ku şayesandina bajarê Cizîrê dike hemû jî çavkaniya xwe ji jiyana rasteqîne ya xelkê Cizîrê werdigirin. Li aliyê din heta îro jî berdewamiya adeta reşgirêdana keç û jinên Cizîrê, hebûna goristana *Mem û Zînê* li Cizîrê û ji aliyê Xanî ve zindîkirina vê çîrokê nîşan dide ku di navbera komela bajarî, rastiyên dîrokî û edebiyatê de peywendiyê rasterast heye.

Go: can ku ji hebsê ten cuda bû
Feryad û fixan di şehrî rabû

Bû welwele û fixan û zarî
Bû zelzele û bezîn hewarî

Bohtan, ji mezin heta biçûkan
Nîswan û keç û benat û bûkan

⁵²⁹ Xanî, h.b., r. 316-326.

E'yan û ekabir û ealî
Mîrza û ruwal û laubalî

Yek ferdi nema di şehrî dilxweş
Bîlcumle di serxweş û muşewweş

Vêkra dibezîn bi ser Memê ve
Wan derdi birin bi ser xemê ve

Hindî ku di şehrî Ademî bûn
Têkda bi lîbasê matemî bûn

Hindî ku hebûn di şehrî meşhûr
Xatûn û muxedderat û mestûr

Gêsûvekirî, bi tayê terpoş
Ser ta bi qedem hemî sîyehpoş

Bê me'cer û burqe û serendaz
Reşgirtî ji bo Memê bi dilxwaz

Neyyahe û mîhreban û dayîn
Goyende bi nale, şubhê goyîn

Wan mersîye distiran bi aheng
Zîn rabûye pê, bi qamete şeng

Nahîde sîfet, li dengê sazê
Reqqasi diçûye ber cenazê

Dam û ded û Ademî û mûran
Dar û ber û camid û tuyûran

Bîlcumle ji bo Memê dinalîn
Her yek bi meqamekî dikalîn

Telpê reş ê wan sîyahepoşan
Reh şubhetê ewrekî xuroşan

Ewçendi li arizêdi gulgûn
Vêkra diwerîn sirişkê pirrxûn

Goya ku di fêslê nûbuharî
Barani li gulşenan dibarî

Ev matem û ev sîyahepoşî
Ev çareşev û îzar û poşî

Bohtan wî zemanî kirne adet
Bû resmê qedîmî, ta qiyamet⁵³⁰

Mem û Zîna Xanî ji hemû aliyan ve nimûneyeke serkeftî ya berhema edebî ya bajarî ye û hemû taybetmendiyan bajarên serdema navîn û îslamî di nava xwe de dihevine. Ji ber ku di serdema navîn de edebiyat di bajarên paytext û navend ên rêvebiriyê de li dora serayên hukumdarên geş dibû, di *Mem û Zînê* de jî bûyer li bajarê Cizîrê li paytexta Mîrektiya Cizîra Botan li derûdora seraya Mîr Zeyneddînê mîrê Cizîra Botan rû dide. Ji ber vê, mîna ku me di beşên pêşî de jî nîşan da, Xanî bi çendîn wêneyên edebî seray û xasbaxçeyê seraya mîr berçav dike û behsa jiyan û taybetmendiyan nava serayê dike. Ji bilî van sehneyên navborî peyvên ku di *Mem û Zînê* de hatine bikaranîn jî amaje bi jiyanê bajarî û çandê berz dikin. Bo nimûne ji rêvebir û karmendên nava serayê behsa mîr, wezîr, wezîrê dîwanê, şehzade, debîrvan, debîrê dîwanê, şehne (zêrevan), muhtesib, ewan (berpîrsê karûbarê dîwanxaneyê), sûbaşî (berpîrsê karûbarê qawexaneyê dîwanxaneyê), serheng (fermandarê leşkerî, berpîrsê zindanê), xezenfer, cindî, sipahî, silehdar, hacib (nobedar), paseban, qapûçî, qella' (Kelehdar), dîzdar, qehweçî, karesaz, xulam, pêşekar (xizmetkarê serayê), nedîm,

⁵³⁰ Xanî, h.b., r. 570-576.

perestar (nedîme), carîye, dayîn, meşşate, mihreban, xasekî, xadim, reqqas, dergevan, çasnîgîr (xizmetkarê ku tama xwarinê mêze dike), benî (xulam) û qasid tê kirin. Xanî derbarê rêvebirî û desthilatê de jî cih dide van navan: padîşah, şah, hukumet, şehriyar, resm û ayîn, dadarî, dewlet, serdarî, sewlet, siyanet, xundekar, zindan, mehbes, reîyye. Ji bo nîşandana jiyana serayê ev peyvên tîkî bikaranîn: seray, dîwan, meclis, bezm, sehna heremê, herem, heramseray, gulzar, bax, bustan, gulşen, eywan, şehnişîn, koşk, qesr, texterewan, asîtan, jinên bikofî û koter, cilên zerbefte, zerbenî, îstebreq (cilên avzêrkirî) û sundus (hevrişm). Ji bo berçavkirina heterojenîya civakî ya bajêrê Cizîrê peyvên mîna şêx, mela, derwêş, sofî, xenî, feqîr, edanî, esaxir, axa, ekabîr, ealî, e'yan, xewas, paşa, mîrza, axa, begzade, xanim, xatûn, tebîb, hekîm, remmal, aşivan, rezvan, nejdî (rêbir), cerd (çete) tîkî bikaranîn. Ji bo berçavkirina taybetiyên bajarvaniya Cizîrê peyvên mîna bajêr, şehir, şehîr, heyşet (cihê jiyanê, qerebalixa bajêr) kelat, birc, mehelle, kuçe, zikak, xanî, xurfe (jûr, ode), pencere, şîbak, bazar, qeyserî, sûk, çaresû, dikan, bayi' (firoşkar), xerîdar (kiriya) nuzhetgah, seyrangah tîkî bikaranîn. Ev hemû peyv her yek di nava çarçoveyê de jî hatibe bikaranîn, di *Mem û Zînê* de derbasbûna van peyvên bi serê xwe nîşaneyê peywendîya bajar û berhema edebî ya bajarî ye.

Ji van nimûneyên ku ji nava *Mem û Zînê* hatin derdikeve ku Xanî girîngiyê mezin daye jiyana bajarî û bi riya *Mem û Zîna* xwe çanda bajar û serayên kurdan berçav kiriye û weku di helbestê de wî de jî hatiye, xwestiyê ku kurdan han bide, da ku dest ji jiyana koçeriyê berdî û berê xwe bidin bajar û qesran. Lewra aşkera ye ku Xanî jîngeha bajarî ji bo pêşketinê mirovî û civakî tiştekî zerûrî zaniye. Ji xwe ji ber vê çendê ye ku Xanî di wateya huner û edebiyatê de eşq ji xwe re kiriye armanc. Loma jî Xanî bi *Mem û Zîna* xwe çîrokeke bajarî pêşkêş dike û hemû zerafet û xweşiyên jiyana bajarê serdema xwe li ber çavan radixe.

Kurd!

Koh û zozan kirî mesken, deşt û şar hîştin ji kê ra?

Der gerdûna şar û qesran, bo xwe hilde cî û wara⁵³¹

⁵³¹ Ebdullah M. Varlî, *Dîwan û Gobîdeyê Ahmedê Xanî Yêd Mayîn*, Çapxaneyê Erkam, Stenbol, 2004, r. 81.

2.2. FEQIYÊ TEYRAN

Derbarê jiyana Feqiyê Teyran de herçend Aleksandir Jaba, M. Emîn Zekî Beg, Mînorsky û hin kesên din sedsala XIVan destnîşan bikin jî ev ji rastiyê dûr e, lewra li gorî piraniya lêkolerên edebiyata kurdî, ji hin helbestên Feqiyê Teyran derdikeve ku helbestvan di navbera sedsalên XVîan û XVIIîan de jiyaye. Bo nimûne di danberheva Mela û Feqî de di rêzekê de dîroka “*hizar û yek û sihan*” derbas dibe ku ev dîroka koçî dike 1621ê zayînî. Di helbesta çîrokî ya Şêxê Sen'an de jî di rêzekê de dîroka “*Li dehsed û sala sihê*” derbas dibe ku ev jî dike 1620ê zayînî. Di rêzehelbesteke din de jî ku tê gotin têde dîroka wefata Melayê Cizîrî hatiye diyarkirin “*Heft eyn û lam ji hev bûn cuda*” bi hesabê ebcedê îşaret bi dîroka 1050ê koçî tê kirin ku dike 1640ê zayînî. Ev nimûne jî nîşan didin ku Feqiyê Teyran di nîveya duyem a sedsala XVîan û nîveya yekem a sedsala XVIIîan de jiyaye.

Ji bo diyarkirina dîroka jidayîkbûna Feqiyê Teyran ev parçe helbesta wî weku jêder hatiye nîşandan:

Mîm û Hê heftê felek çûn
Ji hicretê dewran gelek çûn
Sal hizar û çil û yek çûn
Ev xezel anî diyare⁵³²

Di vê helbestê de Feqiyê Teyran hem dîroka helbestê hem jî dîroka ji dayîkbûna xwe diyar dike. Dîroka nivîsîna helbestê 1041ê koçî ye, lê “Mîm û Hê” wate Feqiyê Teyran li ser dewrana (sedsal) koçî de weku heftê felek (sal) derbas bûye ku bi vê amajeya helbestî Feqî nîşan dide ku heftê sal berî dîroka 1041an ji dayîk bûye ku ev jî dike 971ê koçî û 1563ê zayînî.⁵³³ Lê bi dîtina Seîd Dêreşî du guhertoyên helbesta jorîn hene û di guhertoya duyemîn de rêza yekem a helbesta jorîn weku “*Li Mihemed heft felek çûne*” hatiye tomarkirin. Li gorî wî ev guherto rastir e û ji ber ku di îlmê feleknasiya berê de her felekek beramberî duwazde salan dihat, heft felek dike heştê û çar sal û ev jî nîşan dide ku Feqiyê Teyran di sala 1549an de bûye.⁵³⁴ Lê piraniya lêkolerên edebiyata kurdî

⁵³² M. Xalid Sadîni, *Feqiyê Teyran*, Nûbihar, Çapa Duyem, Îstanbul, 2003, r. 250.

⁵³³ Sadîni, h.b., r. 46-47.

⁵³⁴ Seîd Dêreşî, *Bermayêt Dîwana Feqiyê Teyra*, Çapxana Zankoya Dihok, Çapa Yekem, Dihok, 2011, r. 60-61.

li ser raya yekem in. Ji xwe Meruf Xeznedar jî di wê baweriyê de ye ku Feqî di navbera salên 1563 û 1641ê de jiyaye.⁵³⁵

Li gorî destnivîseke helbestên Feqiyê Teyran navê Feqî, Muhemed e. Cihê jidayîkbûna wî gundê Warezûzê ye û cihê veşartina wî jî gundê Şandîsê ye.⁵³⁶ Ji ber vê çendê Feqiyê Teyran hem jî gundê Werezûzê ya ser bi Muksê hem jî li gundê Şandîsê ya ser bi Hîzanê tê qebûlkirin. Li ser peywendiya Feqiyê Teyran digel van her du gundan di çîrokeke nava gel de hatiye gotin ku Feqî li gundê Şandîsê zewicî ye û li wê derê miriye, lê ji ber ku Feqî mirovekî navdar û hezkirî bûye gundiyên wî xwestine Feqiyê Teyran bibin cihê jidayîkbûna wî veşêrin. Şandîsiyan jî vê daxwaza Werezûziyan qebûl nekiriye û li ser vê meseleyê di nava wan de nakokî peyda bûye. Li ser vê rûdanê melayê gund gotiye hûn ê sibeh li mizgevtê du tabût bibînin, her yek rahêjin yekê û bibin gundên xwe veşêrin. Sibehtirînê her du alî rabûne, her yekî rahêjtiye tabûtekê û birine li gundên xwe veşartine.⁵³⁷

Feqiyê Teyran di helbestên xwe de çendîn nasnav bikaranîbe jî herî zêde nasnavê “Mîm û Hê” bi kar aniye. Ji bilî vî nasnavî, nasnavên weku “Mîm Hê Dal”, Feqiyê Teyran, Feqîhê Teyran, Feqê Têra, Feqê, Feqe, Meksî, Muksî jî bi kar aniye. Bi dîtina Xalid Sadînî “Mîm û Hê” kurtkirina navê Mihemedê Hekarî ye, lewra Muksa ku gundê Feqiyê Teyran li ser e, di wê serdemê de li ser bajarê Hekariyê bûye.⁵³⁸ Lê bi dîtina Meruf Xeznedar “Mîm Hê” nîşana tîpa yekem û duyem a navê Mihemed e ku ev navê rastî ye helbestvan e. Ji xwe Feqî di helbesteke xwe ya din de jî weku nasnav “Mîm Hê û Dal” bi kar tîne ku ev jî kurtkirina her sê tîpên navê “Mihemed” e.⁵³⁹

Di destnivîsa Mela Hisên Elî de jî di helbesteke Feqiyê Teyran de nasnavê Mîr Mihê derbas dibe. Ji ber vê çendê Xalid Sadînî û hinek kesên din li ser vî nasnavî pêde diçin û dibêjin Feqiyê Teyran jî malbata mîrê Muksê ye.⁵⁴⁰ Cegerxwîn jî di jimareya 22an a kovara Hawarê de weku çîrokeke gelêrî behsa Mîr Mihê dike û bêtî ku amaje bi navê Feqiyê Teyran bike dibêje Mîr Mihê digel Melayê Cizîrî hevaltî kiriye û ji bo îspata vê jî cih dide beşek ji danberheva Feqî û Mela.⁵⁴¹ Ev jî nîşan dide ku Mîr Mihê weku nasnavê Feqiyê Teyran di nava gel de hatiye bikaranîn.

⁵³⁵ Xeznedar, b.n., c. 2, r. 205.

⁵³⁶ Dêreşî, h.b., r. 41.

⁵³⁷ Feqiyê Teyran, *Ey Avê Av*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Çapa Yekemîn, Îstanbul, r. 5-6.

⁵³⁸ Sadînî, b.n., r. 31.

⁵³⁹ Xeznedar, b.n., c. 2, r. 205-206.

⁵⁴⁰ Sadînî, b.n., r. 36-37.

⁵⁴¹ Cegerxwîn, “Mîr Mihê”, *Hawar*, j. 22, Weşanên Nûdem, Stockholm, 1998, r. 600-601.

Derbarê Feqiyê Teyran de di nava ragihandin û efsaneyan de gelek agahiyên dijber peyda bûne. Herçend piraniya çavkaniyan cihê jidayîkbûna Feqî Werezûza Muksê jî bizanin Cegerxwîn di vê çîroka xwe ya navborî de dibêje Mîr Mihê kurê mîrê welatê Hîzanê bûye. Piştî mirina bavê wî mîrîtî derbasî mamê wî bûye. Hêja di temenê xwe yê biçûk de bi keça mamê xwe re hatiye nîşankirin, lê piştî ku tê ber zewacê mamê wî jê re dibêje heta tu şehadetnameya îlmên dînî wernegirî ez keça xwe nadime te. Li ser vê Mîr Mihê diçe Cizîra Botan û piştî çend salan şehadetnameya îlmên îslamî werdigire. Lê dema vedigere welatê xwe dibîne ku termê destgirtiya wî Sînemê radikin, Mîr Mihê jî ji ber sewdayê bi çol û çîyan dikeve û helbestan dibêje.⁵⁴²

Bêguman Feqiyê Teyran ji ber peywendiya wî ya digel Cizîra Botan dibe mijara xebata me. Piraniya çavkaniyên ku li ser jiyana Feqî hatine nivîsîn diyar dikin ku Feqiyê Teyran demekê li bajarê Cizîrê û li bajarokê Finikê maye û li medreseyan Cizîra Botan xwendiyê.⁵⁴³ Ji ber vê jî di çîrokeke zargotinî de hatiye ku nasnavê Feqiyê Teyran bi xwe ji aliyê Mîrê Cizîra Botan ve hatiye danîn. Li gorî vê çîrokê, rojekê hin diz xezîneya Mîrê Cizîra Botan didizin. Di heman rojê de jî Feqî diçe Cizîrê û di derwazeya Cizîrê de ji aliyê zêrevanên bajêr ve bi gumana dîzan wî û hevalê wî digirin û dibin pêşberî Mîr. Mîr dema Feqî û hevalê wî dibîne wan nas dike û wan dide berdan. Feqî piştî ku meseleyê fêhm dike hinek diponije û paşê ji Mîr re dibêje mîrê min ez gelek diz û rêbiran dinasim û ji bilî vê jî ez zimanê teyran jî dizanim. Mîr jî dibêjiyê ku tu wan dîzan eşkera bikî ez ê nivê xezîneyê bidim te û navê te jî bikim Feqiyê Teyran. Li ser vê Feqî digel çend pisporên Mîr bi rê dikeve li cihekî bi kevokên li ser dara maziya reş re diaxife û cihê xezîneyê ji wan hîn dibe. Piştî ku xezîneyê derdixe Mîrê Cizîra Botan para wî didiyê û ji vir pê de navê wî weku Feqiyê Teyran li çar aliyê Kurdistanê belav dibe.⁵⁴⁴ Dîsan di nava xelkê Botan de tê gotin ku Feqî li ser riyekê di bin dara tûyekê de rûdinişt û helbestên xwe li wir dinivîsî. Ji ber vê çendê di nava xelkê Botan de baweriyê wuha belav dibe ku, goya kî li bin vê darê rûne destnivîsa wî xweş dibe.⁵⁴⁵

Ji bilî van çîrokên zargotinî, danberheva Feqî û Mela nîşaneyê herî bihêz a peywendiya Feqî ye digel Cizîrê û Melayê Cizîrî. Weku di vê danberhevê de jî derdikeve, ev diyaloga helbestî li Cizîrê di navbera her du helbestvanan de rû dide. Ev jî nîşaneyê wê yekê ye ku Cizîr weku bajarekî navendî û Melayê Cizîrî weku

⁵⁴² Cegerxwîn, h.g., r. 601.

⁵⁴³ Ebdurreqîb Yûsif, *Dîwana Kurmancî*, Latînzekirin: Ziya Avci, Dîwan, Stenbol, 2012, r. 37

⁵⁴⁴ Amêdî, b.n., r. 123-124.

⁵⁴⁵ Yûsif, b.n., r. 37

helbestvanekî mezin hemû wan helbestvanên der û dorê bi aliyê xwe ve kêşane û bûne navenda cazîbeyê ya helbestvanên derveyê Cizîrî jî. Di danberheva Feqî û Mela de diyar dibe ku Feqiyê Teyran li hemberî Melayê Cizîrî gelek dilnizm e û wî ji xwe mezintir û hêjatir dibîne, ji ber vê çendê ye ku cara pêşî Feqî dest bi helbest gotinê dike û selama xwe pêşkêşî Mela dike.

Feqî:

Selama min heqîrî sedefek tivê tê kin

Îro di Cezîrê heqq e li Melê kin

Ku ji derba tîrê derman heye lê kin⁵⁴⁶

...

Feqî:

Birîndarê ‘îşqê me dûr im ji siha bihan

Dizanim meddahê kê me d’hezar û yek û sihan

Senaxwanê Melê me li hemû erd û cîhan

Mela:

Hindî ku digazehim dikêşim sebr û xîrê

Şubhetê çeng û zeh im hilak in j’derba tîrê

Senaxwanê Feqeh im îroke di Cizîrê⁵⁴⁷

Melayê Cizîrî weku damezrînerê xwendingeha edebî ya Cizîra Botan karîgeriyeke mezin li ser Feqiyê Teyran çê kiriye. Ji ber vê jî ne tenê di danberheva Mela û Feqî de di çend helbestên din ên Feqî de jî navê Mela dibihûre û Mela weku hêmaya zanîn û otorîteyê tê nîşandan:

Rast e qewî ev mesela

Eslê qisan d’zanî mela

Hîna ku bû qal û bela

Ma hûn nebûn di hizretê⁵⁴⁸

⁵⁴⁶ Cizîrî, b.n., r. 311.

⁵⁴⁷ Cizîrî, h.b., r. 320.

Seher her rojê meyxanê
Xerab û serxwoş û mest im
Mela uzra me meqbûl e
Ku dilber mahê sîma ye⁵⁴⁹

Digel vê karîgeriya Mela ya li ser Feqî, ji ber hel û mercên jiyana wan di navbera Feqî û Mela de ciyawaziyên girîng hene. Di serî de Feqî weku Mela helbestvanekî serayê nîne. Lewra Feqî di dirêjahiya jiyana xwe de bi awayekî derwêşane jiyaye. Di navbera gund û bajaran de bi awayekî seyar geriyaye û bi dîtina Sadiq Behaedîn Amêdî şeş mehan jî li cihekî akincî nebûye.⁵⁵⁰ Ji ber vê jî Feqî weku helbestvanekî nîv-bajarî piştî xwe bi tu mîr û hukumdarekî ve girê nedaye. Loma jî di nava helbestên Feqî de tu qesîdeyeke ku ji bo mîrek yan hukumdarekî hatibe nivîsîn li berçav nakeve. Di şûna pesnê mîr de Feqî bi helbesta xwe ya “*Ellah çi zatek ehse e*” û di hin helbestên xwe yê din de rasterast berê pesnên xwe daye Xweda û xwe tenê hewcedarê lutf û îhsana wî zaniye. Ji ber vê çendê ye ku Feqî herçend di helbesta xwe ya *Dilberê* de wesfên dilbereke dunyewî bide jî dema mirov hemû helbestên wî li berçav digire muxatebê evîna Feqî bi awayekî aşkera Xweda ye. Ji ber vê jî Feqî digel “bilbil”ê ku di helbestên helbestvanên bajarî û serayê de weku hêmayê evîndarên dunyewî tê qebûlkirin diyalogeke helbestî datîne û di şûna evînen mecazî de şîreta evîna îlahî lê dike.

Feqî go bilbil taze
Tu bilbilek sewda yî
‘Îşqa gulê mecaz e
Tu yarek bê wefa yî
Dostê ebed bixwaze
Da lê nebit fenayî⁵⁵¹

⁵⁴⁸ M. Xalid Sadîî, *Feqiyê Teyran Jiyan, Berhem û Helbestên Wî*, Nûbihar, Çapa Çarem, Îstanbul, 2010, r. 137.

⁵⁴⁹ Sadîî, b.n., r. 238.

⁵⁵⁰ Amêdî, b.n., r. 121.

⁵⁵¹ Sadîî, b.n., r. 152.

Feqî ne tenê di helbesta navborî de di gelek helbestên xwe de li beramberî evînên mecazî û dunyawî şîreta evîna îlahî û jiyana uxrewî dike. Di helbesta “*Dilo Rabe*” de deng li nefsê dike. Di çîroka helbestî ya *Bersîsê Abid* de behsa xerabiya meylên şehewî û şeytanî yên mirov dike û pêwîstiya rêberiya şêxekî terîqetê destnîşan dike. Di çîroka *Şêxê Senan* de evîna mecazî û îlahî berawird dike û dawiyê de evîna mecazî werdigerîne ser evîna heqîqî ya Xwedayî. Di çîroka helbestî ya *Zembîlfiroşê* de jî li hemberî sefaheta jiyana serayê pesnê zuhd û teqwaya mirovekî selikfiroş ê hejar dide û bi hemû awayî xwe ji unsûrên jiyana serayê û bajêr diparêze.

Feqî herçend yekemîn berhema edebî ya bajarî nivîsebe jî, ji ber vê têgihîştina wî ya nîv-bajarî digel jiyana bajarî û serayê hertim nakok bûye û li hemberî refah û sefaheta vê jiyane zuhd û xweparêziya jiyana gundayetiyê derxistiye pêş. Ji ber vê jî ne tenê naveroka helbestên wî zimanê Feqî jî rewşa jiyana wî ya nîv-bajarî berçav dike. Weku nîşaneyê vê nîv-bajarîbûna wî, Feqî herçend li cihina hin mezmûnên tesewufî û peyvên erebî û farisî bikaranîbe jî zimanê wî yê edebî ji zimanê klasîk ê tijî hêma yê Mela ciyatir zimanekî gelêrî û sivik e. Di şûna kêşa erûzê ya klasîk a erebî jî kêşa kîteyî ya heşt libî bi kar anîye û vê rewşa nîv-bajarîbûna xwe bi vî awayî destnîşan kiriye.

ENCAM

Me di vê xebatê de xwest ku di peydabûna edebiyata nivîskî de rola bajarên û li bajarê Cizîrê di peydabûna edebiyata kurdî de karîgeriya bajarvaniya Cizîra Botan destnîşan bikin. Di vê çarçoveyê de di dawiya vê xebatê de em gihîştin van encamên jêrîn.

1. Bajarên pêşî yên ku li herêma Mezopotamyayê peyda bûn weku nimûneya pêşî ya bajarên ser rûyê erdê li ser bingehên şoreşa cotyariyê, nişteciybûn, xanedan, perestgehên dînî û çînên ciyawaz ên civakî ava bûn û ev hokarên bajarvaniyê heta demeke dirêj nasnameya bajarên diyar kirin. Ji ber vê çendê, ji bajarên antîk heta bajarên pîşesaziyê; bazar weku bingeha aborî û civakî, seray weku navenda rêvebirîya hukumdaran, sûr weku hêza bergirî ya desthilatdariyê û perestgeh jî weku navenda dîn û zîlamên dînî çar hêmayên girîng ên bajarvaniyê pêk anîn û di peydabûna edebiyata bajarî de jî bûn unsûrên sereke.

2. Peywendiya bajarên û edebiyata nivîskî ji bajarên pêşî û vir ve peywendiyê berdewam û danebirî ye, ji ber ku dahênana nivîsê cara pêşî li bajarên herêma Mezopotamyayê pêk hat, edebiyata nivîskî jî li van bajarên derket holê, loma jî yekemîn berhema edebî ya bajarî Gilgamêş di bajarekî sumerî Urukê de peyda bû. Ji ber vê jî bajar ji destpêkê heta îro weku bingehên herî bihêz ên nivîs û edebiyata nivîskî roleke girîng gêrîne.

3. Edebiyata nivîskî ji ber ku li bajarên peyda bû, ew berhemên pêşî yên bajarî jî rasterast di bin karîgeriya serayên hukumdaran û perestgehên dînî de hatin nivîsîn, ji ber vê jî naveroka van berhemên edebî zêdetir li ser pesindana hukumdaran, jiyana serayê û çîrokên dînî ne. Loma jî desthilat û dîn weku du unsûrên pêkhêner ên edebiyatê derdikevin pêş.

4. Zembîlfiroş weku yekemîn berhema bajarî ya kurdî herçend di sedsala XVIIan de hatibe nivîsîn jî, di vê xebata me de derket holê ku bingeha vê çîrokê digihîje sedsala XIan serdema Merwaniyan. Lewra ji ber bingehên bihêz ên bajarvaniya Farqînê çîrok di vî bajarî de li dor seraya Mîrê Merwaniyan derdikeve holê. Di vê çarçoveyê de cihê derketina vê çîrokê û naveroka wê nîşan dide ku mîna berhemên pêşî yên neteweyên din, berhemên edebî yên kurdî jî peywendiya wan digel bajarên û xanedanan hene.

5. Cizîr weku bingeheke girîng a edebiyata kurdî yek ji wan bajarên herî dêrîn ê cîhanê ye ku dîroka wê digihîje bûyera tofanê, ji ber vê jî bajar xwedî nasnameya bajarekî antîk e, lê piştî fethên îslamî weku bajarekî îslamî careke din tê avadankirin û taybetmendiyên bajarên serdema navîn û îslamî werdigire. Bajar di dirêjahiya dîrokê de ji ber ku gelek caran dikeve ber pêlên dagîrkeriyê, samanên wê yên çandî û bajarvaniyê tîn talankirin û ji nav diçin. Ji bo derxistina van taybetmendiyên bajarê Cizîrê bi dîtina me pêwîstî bi xebatên arkeolojîk û dîrokî yên dorfireh hene da ku dîroka şaristaniya vî bajarî aşkera bibe.

6. Cizîra Botan ji sedsala XIVan heta sedsala XIXan di bin rêvebirîya Mîrektiya Azîzan de dimîne û bajar di vê maweyê de ji ber taybetmendiyên xwe yên bajarî yên mîna rêvebirî, avadanî, aborî, heterojenîya civakî û bingeheke xwendin û edebiyatê dibe navendeke edebî. Li Cizîra Botan di bin rêvebirîya mîrektiyeke kurd de di sedsala XVian piştî ku seqamgîriya siyasî tê peydakirin bajar dibe cihê dahênana berhemên edebî yên kurdî. Ji ber vê çendê piştî van unsurên bajarî û seqamgîriya siyasî Cizîra Botan dibe navenda pêgihandina helbestvanên mezin û cihê kombûna edîb û alimên hawîrdorê.

7. Melayê Cizîrî weku damezirînerê edebiyata klasîk a kurdî û helbestvanê herî mezin ê Cizîra Botan, bi helbestên xwe peywendiyê xurt di navbera edebiyat û bajarvaniya Cizîra Botan de çê kiriye. Loma jî weku helbestvanekî bajarî di dîwana Melayê Cizîrî de karîgeriya serayê, damûdezgehên xwendin û rewşenbîriyê û heterojenîya civakî ya Cizîrê tê dîtin. Ji ber vê jî Melayê Cizîrî li gorî zanyariyên ber dest di heman demê de yekemîn helbestvanê bajarî yê kurdî ye.

8. Li ser muxatebê her du qesîdeyên Melayê Cizîrî ku têde pesnê hukumdarekî dide, em gihîştin vê encamê ku ev hukumdar, ne sultanekî Osmanî ye ne jî Xan Şeref e, belku Mîr Şerefê Sêyem ê mîrê Cizîra Botan e. Lewra di her du qesîdeyan de jî paytexta hukumdar Cizîr e û Mela dixwaze bikeve bin xizmeta wî. Ev jî nîşan dide ku ev hukumdar hevçaxê Melayê Cizîrî ye. Ji ber ku salên kemalê yên Mela rastî serdema Mîr Şerefê Sêyem tê û Mîr Şeref weku di Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî de jî derbas dibe ji aliyê xelkê Cizîra Botan ve gelek tê hezkirin, bi dîtina me muxatebê qesîdeyên Mela Mîr Şerefê Sêyem e.

9. Melayê Cizîrî weku damezirînerê xwendingeha edebî ya Cizîra Botan li ser gelek helbestvanan karîgerî çê dike û li dora wî bizaveke edebî peyda dibe. Danberheva

Mîr û Mela, Danberheva Mela û Feqî, şeşristeyiya Remezanê Cizîrî ya li ser xezala Mela, nîşan dide ku li dora kesayetiya Melayê Cizîrî, Cizîra Botan dibe navendeke girîng a edebiyatê.

10. *Mem û Zîna* Xanî weku berhema herî navdar a edebiyata klasîk a kurdî li ser çîrokeke bajarê Cizîrê hatiye nivîsîn û hemû taybetmendiyan bajarvaniya Cizîra Botan berçav dike. *Mem û Zîn* jî weku berhemeke bajarî heman mîna berhemên din ên bajarî li dora seraya mîrê Cizîra Botan pêk tê û digel jiyana serayê, taybetmendiyan bajarvaniya Cizîrê jî nîşan dide.

11. Piştî sedsala XVIan û XVIIan li Cizîra Botan derneketina helbestvanên mezin ên di tayê Melayê Cizîrî de bi lawazbûna Mîrekiya Cizîra Botan a li hemberî dewleta Osmanî ve girêdayî ye. Bûyerên siyasî yên vê serdemê nîşan didin ku di navbera endamên xanedana Azîzan de gelek caran li ser mîrîtiyê şer û pevçûn çêbûne û rayedarên dewleta Osmanî jî bi destêwerdana nava kar û barên mîrekiyê, xweseriya mîrên Cizîra Botan berteng kirine û dest danîne ser bac û dahata mîrekiyê. Bi têkçûna bingeha aborî ya mîrekiyê û bi derketina aloziyên siyasî, piştgirî û handana seraya mîrekiyê ji bo helbestvanan kêmbûye û bi vî awayî dezgehên xwendin û rewşenbîriya Cizîra Botan zerar dîtine û ev jî bûye sedema lawazbûna edebiyata vî bajarî. Ji ber vê çendê piştî sedsala XVIIan heta dawiya mîrekiya Cizîra Botan em rastî helbestvanekî nayên.

12. Di sedsala XIXan de bi hilweşandina mîrekiya Cizîra Botan edebiyata bajarî ya Cizîrî hildiweşe. Ji ber vê jî herçend piştî vê serdemê li dora tekya û medreseyan Cizîrê helbestvan derketibin jî ev edebiyateke lawaz e û ji bingeheên jiyana bajarî bêpar e. Ji ber vê jî piştî têkbirina mîrekiya Cizîrê dawî li edebiyata bajarî ya Cizîrê tê û Cizîr weku navendeke edebî ji holê radibe.

ÇAVKANÎ

- Adak, Dr. Abdurrahman: “Melayê Cizîrî û Cihê Wî di Edebiyata Kurdî de”, g.ç., Panela Komeleya Nûbiharê, Batman 30.10.2011.
- Aliağaoğlu, Alparslan: “İslam Şehri”, *Hece*, j. 150/151/152, Ankara, 2009, r. 195-204
- Amêdî, Sadiq Behaedîn: *Hozanvanê Kurd*, Wergera ji Tîpên Erebi: Zeynelabidîn Zinar, Pencînar, Stockholm, 1998
- Andrews, Walter G.: *Şiirin Sesi Toplumun Şarkısı*, İletişim Yayınları, Wergêr: Tansel Güney, Çapa Şeşem, İstanbul, 2009
- Arabî, Muhyiddîn-i: *Fusûsu'l Hikem*, İnsan Yayınları, Amadekar: Hamza Kılıç, Çapa Duyem, İstanbul, 2009
- Azîzan, Herekol: “Melayê Cizerî”, *Hawar*, j. 6, 1932, r. 3
- Badî, İsmail: *Remezanê Cizirî -Di duyvçûn û Tuyjandineka Dîtir da Qeftek ji Helbestên Wî*, Senterê Vekolînên Kurdî û Parastina Belgenaman-Fakeltiya Zanistên Mirovayeti-Sikola Adabê / Zankoya Duhok, Duhok, 2011
- Baluken, Yusuf: “Kuruluşundan Osmanlı Hakimiyetine Kadar Cizre Buhti Beyliği”, *Uluslar arası Şırnak ve Çevresi Sempozyumu*, Ankara, 2010
- Baluken, Yusuf: *Mervaniler Devrinde Dini Gruplar Arasındaki Münasebetler*, Yüksek Lisans Tezi, t.ç., Van, 2010
- Bedir, Atıf: “Dünyanın Anası: Kahire ve Kütüphane Şehri İskenderiye”, *Hece*, j. 150/151/152, Ankara, 2009, r. 257-273
- Bedlîsî, Şerefxanê: *Şerefname*, Wergêr: Ziya Avcı, Avesta, Çapa Duyem, Stenbol, 2007
- BOA 004, 29. 1263
- BOA 118, 17R. 1262
- BOA O89, 9M.1118
- Bruinessen, Martin Van: *Ağa, Şeyh, Devlet*, İletişim Yayınları, Çapa Duyem, İstanbul, 2003
- Bruinessen- Boeschoten, Martin Van-Hendrik: *Evliya Çelebi Diyarbakir’de*, İletişim Yayınları, İstanbul, 2003
- Can, Yılmaz: *İslam Şehirlerinin Fiziki Yapısı*, Türkiye Diyanet Vakfı, Ankara, 1995

- Cansever, Turgut: *İslamda Şehir ve Mimari*, İz, İstanbul, 1997
- Chédeville, André: “Burjuvanın Kökeni”, *Şehirler ve Kentler*, İmge Kitabevi, Çapa Duyem, Ankara, 2000
- Casanova, Pascale: *Dünya Edebiyat Cumhuriyeti*, Wergêr: Saadet Özen-Filiz Deniztekin, Varlık Yayınları, Çapa Yekem, İstanbul, 2010
- Cegerxwîn: “Mîr Mihê”, *Hawar*, j. 22, Weşanên Nûdem, Stockholm, 1998, r. 600-601
- Çelebî, Evliya: *Seyahatname*, Amadekar: Robert Dankoff, Seyit Ali Kahraman, Yücel Dalı, Yapı Kredi Yayınları
- Çelik, Celalettin: *Şehirleşme ve Din*, Çizgi Kitabevi, Çapa Yekem, Konya, 2002
- Cizîrî, Melayê: *Dîwan*, Fırat Yayınları, Amadekar: Zeynelabîdîn Zinar, İstanbul, ?
- Cizîrî, Melayê: *Dîwan*, Nûbihar, Amadekar: Selman Dilovan , Çapa Yekem, İstanbul, 2010
- Cizîrî, Melayê: *Dîwan*, Berhevkirin û Vebijartin: Tehsîn Îbrahîm Doskî, Nûbihar, Çapa Yekem, İstanbul, 2012
- Cîhanbahş, Ferheng: “Veysel Karani ve Üveysilere Nörolojik ve Genetik Yeni Bir Bakış”, *Uluslararası Veysel Karenî ve Manevî Kültür Mirasımız Sempozyumu*, Başbakanlık Vakıflar Genel Müdürlüğü, Ankara, 2012, r. 33-37
- Dastana Gilgamêş*, Wergêr û Amadekar: Deham Ebdulfettah, Enstîtuya Kurdî ya Amadê, Çapa Duyem, Stenbol, 2006
- Demirci, Mustafa: “İslamın Ümran Şehri: Bağdat”, *Hece*, Jimare: 150/151/152, Ankara, 2009, r. 249-256
- Dêreşî, Seîd: *Bermayêt Dîwana Feqiyê Teyra*, Çapxana Zankoya Dihok, Çapa Yekem, Dihok, 2011
- Don Martindale: *Pêşgotina Şehîra Max Weber*, Yarin, İstanbul, 2010
- Doru, M. Nesim: *Melayê Cizîrî Felsefî ve Tasavvufî Görüşleri*, Nûbihar, Çapa Yekem, İstanbul, 2012
- Duby, Georges: “Kent”e ve “Kır”a Bakmak”, *Şehirler ve Kentler*, İmge Kitabevi, Çapa Duyem, Ankara, 2000

- Eagleton, Terry: *Edebiyat Kuramı*, Wergêr: Tuncay Birkan, Çapa Sêyem, Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2011
- Ebûş, Ferhad Hacî: *El Medîne Kurdiye*, Spîrêz, Çapa Yekem, Erbîl, 2004
- Erkan, Rüstem: *Kentleşme ve Sosyal Değişme*, Bilim Adamları Yayınları, Çapa Sêyem, Ankara, 2010
- Ertekin, M. Zahid: *Cizre'deki Mimari Eserler*, 100. Yıl Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Yüksek Lisans Tezi, t.ç., Van, 2005
- el Cizîrî, Şeyx Ehmed: *Dîwanuş Şeyx Ehmed el Cizîrî*, Weşangêr: Muhammed Şefîq Arwasî, İstanbul, 1919
- el Hemewî, Yaqut: “Cezîretu İbnu Umer”, *Mucemu'l Buldan*, Daru İhya-î't Turasî'l Arabî, Beyrût, b.d.
- el-Meqdîsî, Ebû Same: *er-Ravzateyn fi Ahbari'd-Devleteyn*, Beyrut, 2002
- Ğandur, Muhammed Yusuf: *Ortaçağda Cizre Tarihi*, Wergêr: Fadıl Bedirhanoglu, Çapa Yekem, Ankara, 2008
- Hassanpour, Amir: *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil*, Avesta Yayınları, İstanbul, 1997
- Hejar: *Dîwanî Rebbanî Şeyx Ehmedî Cizîrî*, Çapa Yekem, Siruş, Tehran, 1361
- Hewramî, Heme Kerîm: *Mêjûy Perwerde û Xwêndin Le Hucrekanî Kurdistanda*, Çapxaney Wezaretî Roşinbîrî, Bergî Yekem, Hewlêr, 2008
- Hodgson, M.G.S.: *İslam'ın Serüveni*, İz Yayıncılık, İstanbul, 1993
- Holton, R. J.: *Kentler, Kapitalizm ve Uygarlık*, Wergêr: Ruşen Keleş, İmge Kitabevi, Çapa Yekem, Ankara, 1999
- Huot-Thalman-Valbelle, Jean-Louis- Jean-Paul-Dominique: *Kentlerin Doğuşu*, Wergêr: Ali Bektaş Girgin, İmge Kitabevi, Çapa Yekem, Ankara, 2000
- Kardam, Ahmet: *Cizre-Botan Beyi Bedirhan Direniş ve İsyan Yılları*, Dipnot Yayınları, Ankara, 2011
- Keleş, Ruşen: *Kentleşme Politikası*, İmge Kitabevi, Çapa 11., Ankara, 2010
- Kılıçbay, Mehmet Ali: *Şehirler ve Kentler*, İmge Kitabevi, Çapa Duyem, Ankara, 2000
- Kudret, Cevdet: *Batı Edbiyatından Seçme Parçalar*, İnkılap ve Aka Basımevi, İstanbul, 1980

- Kurdo, Qanatê: *Tarîxa Edebiyata Kurdî*, Lîs, İstanbul, 2010
- Lapidus, Ira M.: *İslam Toplamları Tarihi*, İletişim Yayınları, Wergêr: Yasin Aktay, Çapa Sêyem, İstanbul, 2005
- Lazarev, M. S.: “19. Yüzyılda Kürdistan” *Kürdistan Tarihi*, Çapa Sêyem, Avesta, İstanbul, 2010
- Le Goff, Jacques: *Ortaçağda Entelektüeller*, Fransızcadan Çev: Mehmet Ali Kılıçbay, Ayrıntı, Çapa Duyem, İstanbul, 2006
- Le Goff, Jacques: “Ortaçağ Kenti”, *Şehirler ve Kentler*, İmge Kitabevi, Çapa Duyem, Ankara, 2000
- Lescot, Roger: *Memê Alan*, Weşanên Avesta, İstanbul, 1997
- Löwy, Michaël: *Walter Benjamin: Yangın Alarmı*, Versus Kitap, Wergêr: U. Uraz Aydın, İstanbul, 2007
- Lütfi (Ahmed Ramiz): *Emir Bedirhan*, bgst Yayınları, Çapa Yekem, İstanbul, 2007
- Izady, Mehrdad R.: *Kürtler*, Wergêr: Cemal Atila, Doz Yayınları, İstanbul, 2004
- İbn Haldun: *Mukaddime*, Amadekar: Süleyman Uludağ, Dergâh Yayınları, Çapa Duyem, İstanbul, 1991
- İbnul Ezrak: *Mervani Kürtleri*, Wergêr: M. Emin Bozarslan, Koral Yayınları, İstanbul, 1990
- İbnü’l Esir: *el Kamil fi’t Tarih*, Wergêr: Heyet, Bahar Yayınları
- İnalcık, Halil: *Şair ve Patron*, Doğu Batı Yayınları, Çapa Sêyem, Ankara, 2010
- İslam Ansiklopedisi*, Türkiye Diyanet Vakfı, İstanbul, 1993
- İbnu Hewqel: *Kîtabu Sûretîl Erd*, Daru Mektebetî’l Heyat, Beyrût, 1992
- İbnu Şeddad: *el Alaqu’l Xetîre fî Zikrî Umera-îş Şam wel Cezîre*, Tehqîq: Yahya Ebbara, Wezaretu’l Seqafe wel İrşadî’l Qewmî, Dimişq, 1978
- Makdisi, George: *İslam’ın Klasik Çağında ve Hristiyan Batı’da Beşeri İlimler*, Wergêr: Hasan Tuncay Başoğlu, Çapa Yekem, Klasik Yayınları, İstanbul, 2009
- Mailsels, Charles Keith: *Uygarlığın Doğuşu*, Wergêr: Alâeddin Şenel, İmge Kitabevi, Çapa Yekem, Ankara, 1999

- Mendelawî, Mehemed Mehmûd: *Mêjûy Şaristanîyetî Kurd*, Wergêr: Mehemed Wesman, Hewlêr, 2009
- Mes'udî: *Murucu'z – Zeheb*, Darul Fîkr, Beyrut, 1973, c. 1, r. 41
- Metin, Ali K.: “Şehir ve Ötekisi”, *Hece*, Jimare: 150/151/152, Ankara, 2009, r. 177-180
- Mumford, Lewis: *Tarih Boyunca Kent*, Wergêr: Gürol Koca, Tamer Tosun, Ayrıntı Yayınları, Çapa Yekem, İstanbul, 2007
- Narozî, M. Emîn: *Dîwana Melayê Cizîrî*, Weşanên Roja nû, Stockholm, 1987
- Nurdoğan, Muhammet: “Divan Şiirinde Şehir Kültürü”, *Hece*, r. 153-154, Ankara, 2009, r. 286-299
- Ocak, Ahmet Yaşar: *Ortaçağlar Anadolu'sunda İslam'ın Ayak İzleri Selçuklu Dönemi*, Kitap Yayınevi, Çapa Duyem, İstanbul, 2011
- Ong, Walter J.: *Sözlü ve Yazılı Kültür*, Wergêr: Sema Postacıoğlu Banon, Metis Yayınları, Çapa Pêncem, İstanbul, 2010
- Özer, Ahmet: *Beş Büyük Tarihi Kavşakta Kürtler ve Türkler*, Hemen Kitap, Çapa Duyem, İstanbul, 2010
- Poting, Clive: *Dünya Tarihi*, Wergêr: Eşref Bengi Özbilen, Alfa, Çapa Yekem, İstanbul, 2011
- Resul, İzeddin Mustafa: *Ehmedê Xanî ve Mem û Zîn*, Wergêr: Kadri Yıldırım, Avesta Yayınları, İstanbul, 2007
- Ridênî, Wesfî Hesen: *Beyta Zembîlfiroş Dîrok-Wargeh-Çend Deq*, Çapxaney Hecî Haşim, Çapa Yekem, Hewlêr, 2008
- Roberts, J. M.: *Avrupa Tarihi*, Wergêr: Fethi Aytuna, İnkılâp Kitabevi, İstanbul, 2010
- Qurana Pîroz, Amadekar: *Mele Muhammed Garsî Farqînî*, Nûbihar, İstanbul, 2003
- Sadînî, M. Xalid: *Feqiyê Teyran*, Nûbihar, Çapa Duyem, İstanbul, 2003
- Sadînî, M. Xalid: *Feqiyê Teyran Jiyan, Berhem û Helbestên Wî*, Nûbihar, Çapa Çarem, İstanbul, 2010
- Safa, Zebîhullahî: *İran Edebiyatı Tarihi*, Wergêr: Hasan Almaz, Nûsha Yayınları, Çapa Yekem, Ankara, 2002

- Sağrıç, Feqî Huseyn: *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Çapa Yekemîn, İstanbul, 2002
- Sami, Şemseddin: “Cezire”, *Tarihteki İlk Türkçe Ansiklopedide Kürdistan ve Kürdler*, Wergera ji Osmanî: M. Emin Bozarslan, Deng Yayınları, Çapa Yekem, İstanbul, 2001
- Secadî, Eladîn: *Mêjûy Edebî Kurdî*, Çapxaney Mearîf, Bexda, 1952
- Selefî-Doskî, Hemdi Abdulmecîd- Tehsîn Îbrahîm: *Mu'cemu's-Şu'eraî'l-Kurd*, Spîrêz, Duhok 2008
- Sevgen, Nazmi: *Doğu ve Güneydoğu Anadolu'da Türk Beylikleri*, Amadekar: Şükrü Kaya Seferoğlu, Halil Kemal Türközü, Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü, Ankara, 1982
- Şatıroğlu- Okan, Ayşen-Oya: “Çarşı: Şehrin Toplumsal Merkezi”, *Hece*, r. 153-154, Ankara, 2009, r. 130-136
- Tanpınar, Ahmet Hamdi: *XIX. Asır Türk Edebiyatı Tarihi*, Yapı Kredi Yayınları, Çapa Heştem, İstanbul, 2010
- Taşdelen, Vefa: “Antik Kentlere Doğru”, *Hece*, r. 153-154, Ankara, 2009, r. 23-36
- Teyran, Feqiyê: *Ey Avê Av*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Çapa Yekemîn, İstanbul, b.d.
- Tuna, Korkut: “Şehirlerin Serüveni”, *Hece*, r. 153-154, Ankara, 2009
- Tuncel, Metin: “Adını Kuruluş Yerinden Alan Şehirlere Örnek Cizre”, *Hiz. Nûh'tan Günümüze Cizre Sempozyumu*, İstanbul, 1999
- Tuncer, Orhan Cezmi: “Mardin-Cizre Kırmızı Medrese”, *Vakıflar Dergisi*, j. X, Ongun Kardeşler Matbaası, Ankara, 1973, r. 425-434
- Varlî, Ebdullah Memê Mehmed (Hoko) Xanî: *Dîroka Dugelên Kurdan*, Hoşka Weşan û Lêkolîna Sîpan, İstanbul, 1997
- Varlî, Ebdullah M.: *Dîwan û Gobîdeyê Ahmedê Xanî Yêd Mayîn*, Çapxaney Erkam, Stenbol, 2004
- Varlî, Ebdullah M.: *Dîwan û Jinewarî ya Ahmedê Xanî*, Çapxaney Erkam, Stenbol, 2004

- Varlî, Ebdullah: *Tevahiya Jinewariya Ehmedê Xanî*, Sempozyuma Ehmedê Xanî ya Navneteweyî, Weşanên Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê, Diyarbekir, 2008
- Weber, Max: *Şehir*, Wergêr: Musa Ceylan, Yarin, İstanbul, 2010
- Xanî, Ehmedê: *Mem û Zîn*, Nûbihar, Şiroveker: Perwîz Cîhanî, Çapa Yekem, İstanbul, 2010
- Xanî, Ehmedê: *Mem û Zîn*, Werger û Şikariya Çemkî: Kadri Yıldırım, Avesta Yayınları, İstanbul, 2010
- Xanî, Ehmedê: *Mem û Zîn*, Weşanên Deng, Wergêrê Tîpên Latînî û Kurdiya Xwerû: M. Emîn Bozarslan, Çapa Duyem, İstanbul, 2005
- Xanî, Ehmedê: *Mem û Zîn*, Şîrove û Kurdiya îro: Jan Dost, Avesta, Stenbol, 2010
- Xeznedar, Maruf: *Mêjûy Edebî Kurdî*, Dezgay Çap û Bellawkirawey Aras, Çapî Duwem, Hewlêr, 2010
- Vasilyeva, E. Î.: “Arap ve Türk-Moğol Fetihleri Devrinde Kürdistan”, *Kürdistan Tarihi*, Avesta, Çapa Sêyem, İstanbul, 2010
- Vasilyeva, E. Î.: “Osmanlı İmparatorluğunun ve İran’ın Yapısı İçinde Kürtler”, *Kürdistan Tarihi*, Avesta, Çapa Sêyem, İstanbul, 2010
- Yaşın, Abdullah: *Tarih Kültür ve Cizre*, Ankara, 2007
- Yiğit, İsmail: “Kuruluşundan Mervaniler Dönemine Kadar Cizre”, *Hz. Nuh’tan Günümüze Cizre Sempozyumu*, İstanbul, 1999
- Yıldırım, Kadri: *Ehmedê Xanî’nin Fikir Dünyası*, Ağrı Kültür Yardımlaşma Derneği, Berdan Matbaası, Ağrı, 2011
- Yusif Hesên Hirurî, Derwêş: *Welatê Hekarê*, Wergêr: Musedeq Tovî, Çapxana Xanî, Duhok, 2010
- Yûsif, Ebdurreqîb: *Dîwana Kurmancî*, Latînîzekirin: Ziya Avcı, Dîwan, Stenbol, 2012
- Zekî Beg, Mehmed Emîn: *Dîroka Kurd û Kurdistan*, Wergêr: Ziya Avcı, Avesta, Çapa Yekem, Stenbol, 2002
- Zeydan, Corcî: *İslam Uygarlıkları Tarihi*, Wergêr: Nejdît Gök, İletişim Yayınları, Çapa Duyem, İstanbul, 2009

Zivingî, Molla Muhamed : “Muqeddîme”, *Mînel Iqdî’l Cewherî fî Şerhî Dîwanî Şeyxi’l Cezerî*, Qamişlî b.d.

TC
Mardin Artuklu Üniversitesi
Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Ana Bilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

CİZÎRA BOTAN’DA KÜRT EDEBİYATININ ORTAYA
ÇIKIŞINDA ŞEHİRLEŞMENİN ETKİSİ

ZÜLKÜF ERGÜN

10711006

TEZ DANIŞMANI
PROF. DR. KADRİ YILDIRIM

Mardin-2012

